# GIRTÎ

## Firat CEWERÎ



# GIRTÎ

# G I R T Î

# Firat CEWERÎ

Wêne: Khaled Mohammed

© *Firat Cewerî 1986*
*Wêneya bergê:Xelîl Kakeyî*
*Printed in Sweden*
*ISBN 91-970865-0-9*

## Naverok

*Pêşgotin* ---------- 7
*Zoro Axa* ---------- 9
*Xewna Orhanov* ------ 59
*Lawikê Nexweş* --- -- 71
*Hemîdo û Avûkat* ---- 79
*Kevoka Dîlan* ------ 93
*Boyaxkerê Solan* ---- 111
*Ciwangeyê Temo* ----- 129
*Xewna Nebixêr* ----- 161
*Qaçaxkerên Cigaran* --- 167
*Girtî* -------------- 191
*Kurmê Darê Ji Darê ye* -197
*Çîroka Muxtêr* -------211
*Bisiklêt* --------- -- 225
*Qaçaxkeriya Bûbê* -----235
*Serîhildana Zarokan* --253
*Diya Miho* ------ - --331

# Pêşgotin

Bi rastî ne hewce bû ku ez pêşgotinê binivîsim, lê dîsan jî min pêwîstiya çend rêzikan dît. Carinan nivîsandina pêşgotinekê ji nivîsandina pirtûkekê jî dijwartir dibe. Nemaze gava ku mirov pêşgotinê ji bo xwe û li ser xwe binivîse. Yek ji dijwariyên pêşgotina ji bo xwe nivîsîn jî, lêkolîna li ser xwe û li ser hunera xwe kirin e. Lê di vir de ez dê tu lêkolînan li ser çîrokên xwe, an jî li ser uslûb û zimanê xwe nekim. Ez hêvîdar im, ku dê çîrok bi xwe tiştekî bide we; lêkolîn û rexne jî ez dê bispêrime we. Weke ku Cervantes di pêşgotina romana xwe ya bi navê Don Ouijote de dibêje: "Ku hun bi nebaşî behsa vê pirtûkê bikin, kes we ceze nakin. Hun bi başî jî behs bikin kes tu xelata bi we venakin.

Yên ku dinivîsin bi dijwariya nivîsandinê zanin. Nemaze nivîsandina bi kurdî...

Îcar, di gel van dijwariyan me ev ji xwe re kiriye kar û em li ser vê riyê dimeşin. Em dixwazin, ziman, huner û edebiyata xwe ya li ber mirinê ye, rakin; bi jiyan û bi giyan bikin, pê neyaran rûreş û xwe jî serbilind û bi rûmet derxin. Ji rûreşderxistina neyaran jî, piştgirî û alîkariya yaran pêwîst e.

Weke ku hun dibînin, ev pirtûk ji çîrokan pêkhatiye. Bi gorî zanebûn û têgihîştina min çîrokên nûjen... Ev çîrokan, ji sala 1980 yî û vir de hatine nivîsîn. Hema hema nêviyên wan di kovarên kurdî, mîna Berbang, Organa Federasyona Komelên Kurdistanê li Swêd; Hêvî, Kovara Instîtuta Kurdî li Parîs; Têkoşer, Yekîtiya Karker û Xwendekarên Kurd li Belçîqa; Beyan, Kovara Kurdî li Iraqê hatine weşandin.

Min ji mêj ve dil hebû ku ez van çîrokan di pirtûkekê de bigihînim hev û çap bikim, lê ne firsend, ne mecal, ne jî îmkanên min yên aborî hebûn. Nexasim îmkanên aborî... Lê, min di ber xwendin û nivîsandina xwe re kar kir, hin pere gîhande ser hev û pê ev pirtûk çap kir. Di warê aborî de ez bi çapa vê pirtûkê hebekî êşiyam; lê, ji ber ku ez zanim ev êşa min dê ji hin birînan re bibe derman û wan bikewîne, ez niha bextiyar û kêfxweş im.

# Zoro Axa

# I

Gava ku Zoro Axa ji hespê daket, Cindî bi serê hespa wî girt û bir tewiland.

Zoro Axa bûbû weke îsotê, zû di derencan de bi jor ket û ber bi oda banî çû. Li odê Çolo, Mîro û Bozo rûniştî bûn. Gava ku Axa kete hundir, herse jî ji cihê xwe rabûn, destên xwe dane ser hev û serê xwe li ber Axê tewandin.

Zoro Axa çavên xwe li ser wan gerandin. Paşê hêdî destê xwe avêt simbêlê xwe û ba da.

Zoro Axa yekî dirêj û bi navmil bû. Ruyê wî gurover û çavin mezin û fereh li ser bûn. Simbêlê wî mezin û boq bû. Tim şelwer, êleg û gomlegê bi stûkur li xwe dikir; şewqe dida serê xwe û tezbîhek libgir û zer di dest de bû. Gava ku tiştek nehata hesabê wî, kanî bû agir bi erdê bixista; qermîçokên eniya wî dibûn weke cihokan û çavên wî sor dibûn.

Zoro Axa sê-çar caran di hundirê odê de çû û hat. Çolo, Mîro û Bozo hîn jî şewqên wan di destên

wan de bûn û xwe li ber Axê daqûl kirî bûn.

Îcar Zoro Axa berê xwe bi wan ve kir û bi hêrs got:

—Divê hun rahêjin tivingên xwe û berî bidin Gundê Girik û bênamûsê Qado û zariwên wî ji nav erd derxînin. Ku dernekevin, divê hun wî û herdu zariwên wî li ser erd bikujin. Hun vê nekin û destvala vegerin, nanê we li vî gundî namîne. Erê! We fêhm kir?

Nabûn ji gotina Axê re tune bû. Her dem wisa bû; ku hinek li ber wî rabûna, an ew dê bihatana kuştin, an jî girtin...

Hersê peyên Axê tivingên xwe avêtin milên xwe, li hespên xwe siwar bûn û bi çargaviyê berê xwe dane Gundê Girik. Gava ku gihîştin nav erd, dîtin ku Qado û herdu lawên xwe bi kêşkeran keviran ji nav erd didin hev û davêjin. Çaxa Qado çav li wan peyan ket, bi devkenî got:

—Kerem bikin, ji hespan peya bin û cigareke me bikişînin.

Lê nizanî bû Axê ew şandine nav erd, da ku wî ji nav erd derxînin.

Çolo hespa xwe rakir ser herdu lingên paşiyê û bi hêrs got:

—Zû ji nav erd derkevin!

Qado bi şaşmayî jê pirsî:

—Çima bavo, ji bo çi emê ji nav erd derkevin?

Çolo ji hespê daket, xwe avêt stûkura çakêtê wî û ew hejand:

—Ez ji we re dibêjim, ji nav erd derkevin! Zû...Ma erdên wisa belaş li ku hene, ku hun lê dibin xwedî?

Lawê Qado yê mezin xwe li wan rakişand, lê Qado ew da rawestan û got:

—Na lawê min, na! Li cihê xwe rûnî! Bela wan li ber deriyê wan be! Ji me re nelazim e, lawo! Tu erd ji me re nelazime! Jehr di nav erd keve! Em nikanin ji bo parîk erd xelkê bikujin, lawê min!

Gava ku Qado qala kuştina xelkê kir, Çolo qûna tivinga xwe li nav milên wî xist û got:

—Ehh... Tiro wê xelkê bikuje! Tu dê bi vî awakê xwe çawan xelkê bikujî tiro?

Îcar lawê Qado yê biçûk xwe rakişand, dehfek da Çolo û got:

—Ev erd, erdê me ye. Em ji nav erdê xwe dernakevin! Hun me hersiyan di ser hev de bikujin jî dîsan em dernakevin. Ev erd hukûmetê daye me. Erdê hukûmetê daye me tu kes nikane ji me bistîne. We fêhm kir?

Hingî Çolo gule ajot ber tivinga xwe, tiving xist zikê wî û bi hêrs got:

—Zû ji nav erd derkevin!

Lêwik destê xwe li tivinga wî xist û ew bi paş de dehf da. Çolo li kevirekî hulkumî û li ser piştê kete xwarê; gula ku ajotibû ber, bi hewa de teqiya. Çer ku ji erdê rabû, gulek din ajot ber û ji lêwik nîşan girt. Vê carê Bozo bi tivinga wî girt û bi dostanî jê re got:

—Çolo, Çolo! Ma tu dikî çi bikî? Ma tu dikî bi rastî bera wan bidî?

Hîn Bozo peyva xwe xelas nekiri_bû, Çolo bi çend gavan ji wan fireh ket û pêşî bera Qado da. Qado hejiya û ket. Herdu lawên Qado kirin qîrîn û êriş birin keviran; lê Çolo û Mîro qet fersend neda wan, li wan reşandin û herdu li nik bavê wan dirêj kirin.

## II

Êdî roj bilind bû. Germa rojê xwe berda ser çol û erdan. Tu kesekî ku bi kêr bihata di gundê Girik de nema bûn. Yên çûbûn cot, yên çûbûn hevdana keviran, yên çûbûn danînê û eşêfê û yên ku çûbûn ber pez û dewaran. Lê tenê Xezalê, çend kal û pîr û hin zarok li gund mabûn. Xezalê jî piştî dewê xwe kula, cewdikek dew, çend serî penîr û hin rûnê nîvişk xiste nav kevnikekî û berê xwe da erd.

Gava ku Xezalê gihîşte nav erd, ew çi bibîne; ku sê heb di nav xwînê de, li erdê dirêjkirî ne. Xezalê pêşî ecêbmayî ma, bi çavên xwe bahwer nekir. Dû re fatîhanek xwend. Lê xwe negirt, xwarina di destê xwe de avêt û bi lez reviya ser wan. Nihêrî ku mêrê wê û herdu lawên wê li erdê dirêjkirî ne û yek ji wan di nav xwînê de dipeipite. Ev yeka lawê wê yê biçûk bû. Xezalê xwe bê rohnî avête ser wî. Devê lêwik du-sê caran çû û hat, lê tu peyv ji dev derneket; wî jî can da û li erdê rep ma.

Hema Xezalê bi qeramûşkan kişiya ser çavên xwe, kire hewar û qîrîn û ber bi gund bazda.

Gundî, yên ku li mal mabûn hemû bi gaziya Xezalê ve hatin. Xezalê destmal mesmal li serî nem' bû. Weke ku mirov ser çavê wê bide ber guzanan, wisan xwîn ji şûna qeramûşkên wê diherikî. Porê wê ji hev belav bûbû. Xwîna ku ji ser çavê wê diherikî, li ser kincên wê belav dibû.

Gundî ecêbmayî mabûn, di çîroka Xezalê de dernexistin; wan nizanibûn, ku çi bi serê wê de hatiye.

Xezalê her dikir hewar:
—Mala min wêran bûûû... Warê min kor bûûû...Ez kurdûnde maam...
Wer ku giriya bû dengê wê keti_bû. Dengê wê wek dengê pîreke heyştê-nod salî dihat.

Pir tê neçû, melê gund kirasekî spî lê, qurana wî di dest de bû û bi gaziya Xezalê ve hat.
Gundî ji ber melê vekişiyan û rê danê. Mele rast çû ser Xezalê, bi destên wê girt û got:
—Bismilah, bismilah! Piştî ku bêdeng tiştin xwend, sê caran tif kir ser Xezalê.

Ji melê û gundiyan webû, Xezalê dêhn bû ye. Hinekan jî di dilê xwe de digotin "cin minan li vê jinikê xistiye". Ji ber ku bi kêmasî salê yek-du li wî gundî wisan nexweş diketin û dêhn dibûn.

Xezalê îçar bi dengekî bilind gazî kir:
—Meleee...Meleee... Ez bi qurbaan... ez dêhn nebû meee... aaaxx...aaaxx... Mala min wêran bûû... Warê min kor bûûû... Aaaxx...

Mele û gundî şaş mabûn. Hema hemûwan ziq li Xezalê û li rewşa wê dinihêrîn. Ma ev çi bobelat bû bi serê wê de hati‿bû gelo? Ma ev çi giriyê wê bû? Gelo ji bo çi wê evqas li xwe dixist? Ji bo çi wê evqas dikir hewar û gazî? Tu kesî ji gundiyan nikani‿bûn ji van pirsan re bersivê bibînin.

Hîn wisan,dengek kirin:
—Miriiin...Miriiin... Hersê jî miriiin...

Hemû gundiyan dev ji Xezalê berdan û berê xwe bi wî dengî vekirin. Dîtin ku lawikek bê rohnî ber bi gund de baz dide. Ma bazdan jî peyve? Weke ba dihat.
Ji nav pîrekan yekê wa bi ecêbmayî got:
—Weleh ew lawikê min e, ma xêr e evqasî baz dide? Gelo hinan pezê wî jê stendine?
Dû re reviya pêşiya lêwik. Ji xwe lêwik nêzîkî li wan kiri‿bû. Jinikê ew hemêz kir:
—Çi ye lawê min, got bi heyecan, ma te xêrî?
Lê, lêwik her digot:
—Mirin...

Devê hemû gundiyan ji hev mabû. Hemûwan dev ji Xezalê berdan û li ser lêwik kom bûn. Hemû şaş û ecêbmayî mabûn. Kesî nizani‿bûn, bê ev lawik ji bo çi wisan digirî û tim dibêje "Mirin". Lê tenê Xezalê tê derxisti bû. Xezalê zanî bû lawik çi dibêje.

Wer ku lêwik bazda bû, hulma wı diçikiya. Dîsan hinan ji gundiyan jê pirsîn:
—Çi ye kuro, ma çi qewimî ye, tu evqas digirî?

Ma te xêr î?

Tiştên lêwik digotin ne safî bûn. Ji ber ku hulma wî diçikiya û peyv diqurmiçand. Heya peyvek digot, berî bigîhije peyva dudan, hulma wî diçikiya û tu tişt jê nedihat fêhmkirin.

Piştî deqîqekê du deqîqan, êdî gundiyan fêhm kirin, ku lawik dibêje: "Apê Qado û herdu lawên wî mirin, hersê jî di nav xwînê de mane".

Êdı bû weke agir têkeve nav gund. Gundî her yek bi derekê de reviyan. Qîj û wîj, hewar û gaziyê di nav gund de olan da. Gundî her yek ji xwe tirsiyan. Hin pîrekên pîr ji xwe pirsîn: "Gelo tu dijminên wan hebûn? Na, na! Dijminên çi, halê çi? Weleh gêrikek ji Qado û zariwên wî nediêşiya. Ma rojekê dilê me kîjan gundî hiştibû? Ma rojekê ji me kê re peyvek nexweş kiribû? Welleh milyaket bûn, milyaket...".

Di wê navberê de, du pîrekên pîr hevdu kişandin qorziya xaniyekî û ji hev re kirin pistînî:

—Gelo ma ne Zoro Axa be dîsan? Welleh ew beraz wê bike. Dilê wî berazî bi tu kesî naşewite. Tiştek ku neyê hesabê wî, kane agir bi erdê bixîne. Tew ku hinek li ber çavên wî têkevin nav erdê wî û lê bibin xwedî... Ma ne te bihîst xwehê? Wê roja han Zoro Axa bi hespê di nav erd de derbas bûbû û ji Qado re gotibû: "Ji nav erd derkevin, an na hun dê di nav vî erdî de bibin meyt". Qado jî gotibû: "Em zanibin ku emê bibin meyt jî, em ji nav vî erdî

dernakevin. Erdê ku hukûmetê daye me tu kes nikane ji me bistîne". Dibe ku ev peyva Qado li telê Zoro Axa ketibe û Zoro Axa peyên xwe şandibin ser wan û ew bi kuştin dabin. Ma ne wisa xwehê? Ma qey nakeve serê te ku Zoro Axa ev kiribe?

—Wî wî wî, ma ji Zoro Axa pê ve kî dê vê yeka han bike? Welleh hezar kes jî ji min re bêjin, ne ew e, ezê bêjim, ew e. Ji ber ku ew beraz e, ew hov e. Dilê wî tu caran bi feqîr û belengazan naşewite. Ey lawo, çar gundên te hene, ma ji bo vî parîkê erd, ne tu sê mêran li erdê rast bikî nabe? Hey hovê hov! Xwehê roja ez bibihîzim tiştek bi Zoro Axa hatiye, ezê destên xwe hine bikim, ezê bi vê pîrîtiya xwe dîlanê bigirim.

Piştî ku herdu pîran gilî û gazinên xwe ji hev re gotin û li ser Zoro Axa peyivîn, herdu jî rewşa Xezalê dilêş bûn û hêstir rijandin.

## III

Weke tu tişt neqewimî be, hêdî hêdî hespên xwe diajotin. Gava ku nêzîkî li gund kirin, her yekî cigarek vêxistin. Bozo du hulmên kûr li cigara xwe xist û serê xwe vir de û wê de hejand.

Çolo lingê xwe li bin zikê hespa xwe xist û ji Bozo pirsî:

—Çi ye Bozo, çima tu evqas difikirî?

Bozo dîsan hulmek kûr li cigara xwe xist û bi keder got:

—Ma ta bi kengî? ... (qederê deqîqekê bêdeng ma û tu tişt negot, dû re dom kir) Ta bi kengî emê mêrkujiyê ji axê re bikin? Ta bi kengî emê feqîr û belengazan bikujin û malên wan wêran bikin? Bes e, bes e, bes e! Bes e birano, bes e! Ji niha pê de ez nikanim mêrkujiyê ji tu kesî re bikim. Ez nikanim mala feqîr û belengazan wêran bikim! Ez nikanim zarokên kesî sêwî bihêlim. Bi kurtebirî bes e!..

Çav di serê wî de bûbûn weke tasan. Rûyê wî zer bûbû û mûyên canê wî lê gij bûbûn. Hema cigare li

ser cigarê pê dixist.

Êdî gihîştin gund, hespên xwe dagerandin hewşê û xwe ji hespan avêtin xwarê.

Zoro Axa qapûtek avêti bû nav milên xwe, tezbîhek ji wan tezbîhên libgir di destê wî de bû û li ser dika ber deriyê odê diçû û dihat.

Hersê peyan piştî ku hespên xwe li hewşê tewilandin, çûn bi derencan de bi jor ketin; Şewqên xwe xistin destên xwe, bi rêzê serê xwe li ber axê tewandin û gotin:

—Temam axa, me hersê jî kuştin!

Zoro Axa serê xwe kil kir, destê xwe avêt simbêlê xwe û keniya:

—Aferîn, derbasbin hundir!

Piştî ku Zoro Axa derbasî hundir bû, wan jî dane dû wî û ketin hundir.

Ode ji kulav û xalîçan mirov şerm dikir ku têketa hundir. Behlîfên hirî û neqişandî bi rêz bûn. Televizyon, radyo û teybê, xweşikbûna odê hîna jî xweşiktir dikir. Li gund elektirîk tune bû, lê mala Zoro Axa her dem rohnî bû. Şeş lampên mezin bi ber beştan ve bi dar de kirî bûn û her şeş lampe saet ji şeşê êvarê vêdiketin û hundir rohnî dikirin. Êvaran ku hinekî biyanî bihatina gund, wan dê bigotina, qey ji mala Zoro Axa pê ve tu mal li gund tune ye. Ji ber ku êvaran ji şewqa xaniyê Zoro Axa pê ve, tu

xaniyên din şewq nedidan.

Hîn wilo, lawê axê kete hundir; Pirtûk û defterên xwe danî quncikeke xênî û rûniştin. Lawê axê yekî zeyif, ne kin, ne jî dirêj bû. Ew jî weke bavê xwe rûbiken bû, lê ne weke wî zalim û bêûcdan bû. Gundiyan rojê hezar carî bavê wî dikirin qurbana serê wî. Bi qasî ku gundiyan jê hez dikirin, hevalên wî yên dibistanê jî evqasî jê hez dikirin. Lawê axê xwendevan bû; du salên wî mabûn bibûya doktor.

Axê berê xwe pê vekir û wa bi hêrs jê re got:

—We dîsan gûyekî mezin xwariye ha! Kuro ji te re çi lazim e lawo? Ji te re çi lazim e, karker, gundî û quzê kerê? Tu ji xwe şerm nakî ker lawê keran? Ne xelk dibêjin, lawê Zoro Axa ye! Lawê wisan bênamûs ji Zoro Axa re ne lazim e! Şerm bike lawo, şerm bike! Çi ji te re tiştên wisan lazim e?..

Karê Zoro Axa û lawê wî herdem ev bû. Karê wan herdem pevçûn û xirecir bû. Lêwik li bajarê Diyarbekirê dibistana doktoriyê dixwend. Ew her ji mehê carekê dihate gund. Her gava ku ew dihate malê, ew û bavê xwe pevdiçûn. Ew tim li ber bavê xwe radi bû û jê re digot:

—Bila ûcdan bi te re hebe, ûcdan... Ma çi ye te ev rebenên gundiyan ji xwe re kirine kole? Ma rehm di dilê te de tune ye? Ma dilê te bi mirovan naşewite?

Lawik vê carê hîn bêtir hêrs bûbû. Di xebata ji bo grevê (karberdanê) de du hevalên wî hati bûn girtin û pir lêxistin û îşkence li wan hati bûn kirin. Ga-

va ku dîsan axê peyvên wisan nexweş jê re kirin û xeber ji gundiyan re da, lawik rabû ser herdu lingan û bi hêrs got:

—tu hovî, mejiyê te ne mejiyê mirovan e! Bi qasî qirşekî mirovantî bi te re tune ye!

Bi wan gotinên lêwik, Zoro Axa bû weke îsotê; ji cihê xwe rabû, bi ser wî de kir qîrîn û du sîle avêtê. Lêwik xwe ji sîlên wî parast, dehfek dayê û ber bi xaniyê malê çû.

Zoro Axa bi hêrs bi dû wî de got:

—Hey bênamûs, lingê te hew dikeve vê malê! Şîrheramê şîrheram!

Çavên wî sor bûbûn. Qermîçokên eniya wî bûbûn weke cihokan. Ji hêrsan fîrnikên pozê wî radibûn û dadiketin. Di hundirê odê de bûbû kufa kufa wî, diçû û dihat.

Di wê navberê de Çolo wa bi axkêşîneke re got:

—Ev karê Xwedê carinan çewt e. Xwedê zariwên xerab dide camêrên weke milyaketan.

Zoro Axa peyva wî dom kir:

—Lê... Ewê li ber min rabe! Ewê sibehê li min jî xe! Ev bêbav in lawo, bêbav...

Paşê li ser yan (dîwan) rûnişt û qalûna xwe pê xist. Di wê navberê de deng ji tu kesî derneket. Ji bêdengbûnê, mirov digot, qey tu kes li hundir odê tune ye. Piştî Zoro Axa qalûna xwe kişand, rabû ser xwe û du-sê caran di hundirê odê de çû û hat. Dû re li ser doşekê rûnişt û got:

—Çolo!
Çolo bi derbekê de veciniqî û rabû ser piyan:
—Kerem bike axa!
—Here qereqolê binihêre bê serçawîş li wir e. Ger ku li wir be, bila bê, emê îşev xwarinekê bi hev re bixwin.

Çolo weke ku leşkerek ji çawîşekî re silavê bide, silav da û got:
—Ser serê min axa!
Derket û ber bi qereqolê ve lezand.
Qereqol bi qederê kîlometreyekê dûrî gund bû. Serçawîşekê qereqolê hebû, ku ji Zoro Axa ne zalimtir biwa jî, weke wî zalim bû. Herduwan pir ji hev hez dikirin û destbirakên hev bûn. Di wî gundî de, ji Zoro Axa pê ve, kesekî ku ji serçawîş xweş biwana tune bûn. Wisan jî, ji serçawîş pê ve, kesekî ku ji Zoro Axa xweş biwana tune bû. Ku tek tûk hebûya jî, ji ber ku wan û Zoro Axa ji zimanê hevdu fêhm dikirin. Li gundyên ji serçawîş fêhm bikirana û bi tirkî zanîbûna pir kêm bûn.

Piştî nîvsaetek di navberê de çû, Çolo û serçawîş bi hev re ketin hundir.

Zoro Axa û herdu peyên xwe rabûn ser xwe û destên xwe dane serçawîş. Zoro Axa kete bin milê wî û ew li ser doşeka herî nerm û xweş rûniştandin da. Dû re berê xwe bi Bozo ve kir:
—Bozo, li jîpê siwar be û here bajêr ji me re hin araqî bikire!
Bozo wa bê dilê xwe û bi dengekî nizim got:

—Baş e axa.

Dû re Zoro Axa, Çolo û Mîro jî şandin nav pez, da ku berxekî bigirin û bînin serjêkin.

Zoro Axa û serçawîş bi serê xwe man. Cigare îkramî hevdu kirin û li rewşa hevdu pirsîn. Paşê Zoro Axa destê xwe avêt bêrîka xwe, çend pelên hezarî derxistin û dirêjî serçawîş kirin. Serçawîş ew pere jê girt û xist bêrîka xwe:

—Min bihîst li gundê jor hin kes hatine kuştin, gelo haya te jê heye?

Zoro Axa bi destê xwe yê rastê simbêlê xwe bada û got:

—Erê, haya min jê heye; zarokên me ew kuştine. Gundîkî bi pênc peran ketibû nav erdê min yê bi avî û lê bûbû xwedî û ji nav dernediket. Bûbû bela û ketibû stûyê min. Digot: "hukûmetê ev erd daye min û ev erd yê min e". Hukûmet çi, halê çi... Hukûmetê ew erdê min yê bi kevir ji min kirî bû û li hin gundiyan belav kiribû. Îcar ew jî li erdê min yê bi avî asê bûbû û digot: "Hukûmetê erd daye min".

Serçawîş serê xwe hejand:

—Min fêhm kir. Ji xwe ev gundiyan ji kuştinê pê ve tu tiştekî din fêhm nakin. Yan divê mirov wan bikuje, yan jî wan bigire û bavêje zîndanan. Ew ji peyv û munaqaşan fêhm nakin.

Zoro Axa bi nermî peyva wî birî:

—Hebe tune be ewê bêne cem we gilî.

Serçawîş bi devkenî got:

—Ew ne mersele ye, camêr!

Bozo ji bajêr vegeriya. Sê şûşe wîskiyên mezin, hin meywe û hin jî çerez kirî bû. Çolo û Mîro jî berx serjêkiri_bûn û bi gurandina berxê bilî bû_bûn.

Piştî du saetên din hertişt hazir bû. Pîrekan xwarin xistin tacikan (temsîk, sênîk), kişandin odê û li ser sifrê bi cih kirin. Ser sifra wan tije tişt bûbû. Ji xwarinê bigire heya bi meywe. Ji wîskiyê bigire heya bi fistiqan, findiqan û nokên şor...

Goştê berxê di sêlê de çêkiri_bûn. Hin bacan, îsot û firingî jî di nav de hûr kiri_bûn. Weke tirşikê xuya dikir, lê ne tirşik, goştê sêlê bû. Bêtir koçeran bi wî awayî xwarin çê dikirin. Nemaze koçerên Bêrtê... Ew xwarin wisa xweş çêbûbû, ku mirov tiliya xwe pê re dixwar. Ji xwe gava ku mirov lê dinihêrî, mirov têr biwa jî, dîsan mirov birçî dibû û dixwest wê xwarinê bixwe.

Zoro Axa ber bi sifrê çû, berê xwe bi serçawîş vekir û got:

—De kerem bike beg!

Serçawîş ji ser yanê peya bû û li ber sifrê çarmêrkî veda. Piştî ku serçawîş û Zoro Axa xwarin û nîvtêr bûn, Zoro Axa berê xwe bi hersê peyên xwe ve kir:

—Ma hun jî naxwin, hun ne birçî ne?

Bi xwe jî zanî bû, ew birçî ne. Zanî bû ku ji sibehê de tu xwarin neketiye devê wan.

Hersê peya bê deng man. Zoro Axa dîsan got:
—De werin, werin! Hun jî niha birçî ne!

Hersê peyan weke sê gurên birçî li dor sifrê rûniştin û dest bi xwarinê kirin.

Piştî ku têr xwarin, Çolo rahişt çend tacikên vala û çû bang pîrekan kir, ji bo werin firaxên vala bidin hev. Pîrek jî, tenê jina axê û berdestka wan bû.

Jina Zoro Axa û berdestk hatin firax dan hev û hundir hebekî paqij kirin.

Serçawîş çav berda berdestkê. Ew ji neynûkên lingan heya bi porê serî di çav de derbas kir. Paşê herdu lêvên xwe dane ser hev, lêva xwe ya jêr mêt û serê xwe du caran ber bi xwe ve hejand.

Piştî firax hatin hevdan, her yekî cigarek vêxistin û goştên ber diranên xwe bi neynûkan û bi darikên çixatan derxistin.

Lawê axê di oda xwe de bûbû weke dêhnan. Hema cigare li ser cigarê pê dixist û di hundirê odê de diçû û dihat. Paşê bang diya xwe kir. Diya wî hate hundir û li rewşa wî nihêrî. Berî ku diya wî tiştekî jê bipirse, wî ji diya xwe pirsî:

—Ma ta bi kengî emê di destên vî berazî de hêsîr bin? Ez hew îdare dikim, hew... Ez dikim ji kerbên wî biteqim. An ezê xwe bikujim, an jî wî... An ezê ji vê malê derkevim, an jî ew...

Dû re bi hêrs destê xwe li masê xist. Qedeha li ser masê gindirî, li erdê ket û şikest. Ava ku di qedehê de hebû li ser xalîçê belav bû.

Hêstirên diya wî bi ser hinarikên wê de herikîn. Bi lez xwe avêt lawê xwe, ew hembêz kir û got:

—Em çi bikin lawê min? Ma em kanin çi bikin? Xwedê bela wî bidiyê, xwedê ava reş bi çavên wî de bîne.

Law û dê wisan li ser lingan bîskê bêdeng, di hemêza hev de man. Di wê navberê de berdestka wan kete hundir:

—Jinapê, apê Zoro got, bila ji me re hinek cemed bîne.

Gozelê û lawê xwe hevdu berdan, Gozelê keserek kûr kişand û ber bi sarincê (buzdolabı) ve çû. Tasek cemed (qeşa) derxist, xist nav paçikekî û şikand. Dû re ew cemed xist du sênîkên biçûk û bir odê.

Ji diwê cigaran, mirov digot, qey hundir mij girtiye. Her yekî qedeha wan ya araqiyê li ber wan bû, vedixwarin, dipeyivîn û dikeniyan.

Jina axê cemed danî ber wan û xwest ku dîsan bi paş de vegere; lê axê nehişt, qedeha xwe jê re bilind kir û got:

—Noş!

Jinikê guh nedayê û bi lez ji hundir derket.

Axê îcar qedeha xwe ji serçawîş re bilind kir.

—Noş!

Gişkan qedehên xwe bi hev re bilind kirin:

—Noş!

Di wê navberê de serçawîş devê xwe xist guhê axê û bi pistînî jê re got:

—Hela tu dîsan bişîne dû berdestkê, bila ji me re

hinek cemeda din jî bîne.

Lê armanca serçawîş ne cemed bû. Hîn herdu tacikên wan tijî cemed bûn.

Zoro Axa berê xwe bi Çolo ve kir:

—Çolo, ka tu here bang berdetkê bike, bila were vir.

Çolo qurtek din jî li qedeha xwe xist û derket. Pir tê neçû, Çolo û berdétk bi hev re ketin hundir.

Zoro Axa bang berdestkê kir:

—Were keçê, tu jî hinekî ji vê şerbeta me vexwe.

Berdestkê bi şermokî bersiv da:

—Na apo, min navê!

Zoro Axa îcar bi sert got:

—Were, qîza qehpan!

Rebena berdestkê stûyê xwe xwar kir, çû cem Zoro Axa û li ser túti kan rûnişt

Serçawîş qedeha xwe direjî wê kir:

—Vexwe.

Berdestkê bi hêsirpaqij kirinê re got:

—Ez naxwazim! Ez vê jehra we naxwazim!

Serçawîş destê xwe avêt ser stûyê wê û ew ber bi xwe ve kişand. Lê berdestkê dehfek dayê, xwe bi paş de kişand, kire qîrîn û ber bi der ve baz da. Ku mala axê di nava gund de bûya, dê hemû gundî bi qîrîna berdestkê re derketina der. Lê mala axê ne di nav gund de bû. Mala wan li ser girikê nêzîka gund bû. Tu cîran mîranên wî tune bûn. Xaniyê wî sê qatî bû û bi qûm û çimento hati bû lêkirin.

Bi qîrîna berdestkê re lawê axê bi hêrs ji oda xwe derket. Lê diya wî xwe avêt pêşiya wî û li ber wî geriya:

—Na lawê min, ez di bextê te û Xwedê de me dev ji wan berde. Serê me nexe belayê.

Ger di wê deqîqê de refek peya jî bihatana, nikanî bûn ew bidana rawestan. Lêwik bi zor xwe ji nav lepên diya xwe filitand û ber bi odê ve bazda. Gava ku kete hundir û çav li rewşa wan ket, ji hêrsan herdu çavên wî bûn weke du bizotên êgir. Bi wî awayî devê xwe dagirt û bi hêrs got:

—Hun hemû bê hisyet in, hun bênamûs in, hun hov in, hun mêrkuj in!

Lêwik debança xwe ji ber xwe kişand, berê wê da bavê xwe û got:

—Haydê, zûka belav bibin! Ger ku hun di hundirê deqîqekê de belav nebin, ezê we hemûwan bikujim.

Serçawîş bi dizî destê xwe dirêjî debança xwe kir, lê, Bozo destê xwe li destê wî xist û debança wî ji dest avêt.

Lawê axê destek bi hewa de berda. Yên ku di hundirê odê de bûn, hemû ji tirsan lerizîn û piştî sêçar deqîqan ode vala bû. Di hundirê odê de tenê şûşên araqiyê, qedeh û dixana cigaran ma.

Zoro Axa û serçawîş di wê navberê de hevdu xewle kirin û bi dizî tiştin ji hev re gotin. Lê dengên wan neçû tu kesî. Kesî dengên wan nebihîstin. Kî zane, bê çi ji hevdu re gotin?

## IV

Gundiyan hersê miriyên Xezalê di nav xwe hilgirti bûn û anî bûn gund. Lê hîna jî, kesî tu rê ji hev dernexisti bûn.

Gava ku gundiyekî tiştek digot, pêşî hemû gundiyan digotin: "Erê, dibe wisan be", lê dû re nediket serê hinekan. Hingî gişan dev ji wê ramanê berdidan û diçûn ser ramaneke din.

Ji xwe Xezalê keti bû rengê miriyan. Wer ku giriya bû, çavên wê sor bûbûn, bûbûn weke hirmiyên xerabe. Xwîna ku ji şûna qeramûşkên wê hati bû, li ser riwê wê hişk bûbû. Destmal li serî nema bû. Porê wê ji hev de keti bû û li nava serê wê belav bûbû, bûbû weke cineke çîrokan.

Êdî bû derengê şevê. Lê heyva weke topekê li asman, şev rohnî dikir. Stêrk li asmana diçûrisîn. Gundiyên ji karê xwe vegeriyan, pêşî xwe li kalabalikê girtin û çûne ser Xezalê û miriyên wê. Gundî hemû li ser Xezalê û miriyên wê kom bûbûn. Ji aliyekî dengên giriyên zarokan, ji aliyekî dengên kund

û wawîkan, ji aliyekî urîna gayan û çêlekan û ji aliyekî ve jî, dengên reyina segan bi zûrandin, li gund, li hev vedigeriyan. Ji wan dengan mirov digot, qey ceng e. Kesên texmîn dikirin, ku ji aliyê Zoro Axa de ev bobelat bûye, newêrîn_bûn bigotana. Gava ku pîrekekê xwest, tiştên texmîn dike bibêje, bi awirên mêrê xwe sekinî û peyv ji dev derneket. Lê dawî jinikê hew xwe girt, tiştên ku texmîn dikirin got:

—Welleh Bileh, kî ji min re dibêjin çi bila bibêjin, ew e! Ji wî berazê Zoro Axa pê ve tu kes vê hovîtiyê nakin. Tu kes mala feqîr û belengazên wisan wêran nakin. Yê min ez dibêjim, ew e! Ji wî hovê Zoro Axa pê ve, tu kes vê bobelata han nakin!

Hingî terpînek li dilê hemû gundiyan ket. Gişan texmîn kirin, ku Zoro Axa ev yeka han kiriye. Ji wî pê ve ma dê kê bikira? Ma Qado dilê kîjan gundî hişti_bû? Ma rojekê ji kê re goti_bû: "quzelqurt"? Welleh gêrikek jê nediêşiya, gêrikek...

Hema gundiyan çiqas zanî_bûna, Zoro Axa ew bi kuştin dane, bila zanî_bûna; ma kê tola wan ji Zoro Axa hilaniya? Kê kanî bû ev tişt li ber guhên Zoro Axa xista? Zoro Axa peyvek wisan ji devê kîjan gundî bibihîsta, dê ew tavilê ji gund derxistana. Dibû ku bobelatek jî bi serên wan de bianiya.

Zoro Axa xwedî çar gund bû. Mirovên wan herçar gundan, bi şev û roj ji Zoro Axa re kar dikirin. Zoro Axa bi qasî ku dewlemend bû, evqasî jî bêûcdan û stemkar bû. Gava ku kêfa wî ji hin gundiyan re nehata, asaq di wan de dikirin û ew ji gund derdi-

xistin.

Lê... Dê îcar kîjan gundî mala xwe wêran bikira, bigota, Zoro Axa ev bobelata han kiriye. Emê bêjin, kesî newêrî bû bigota, Zoro Axa ev hovıtî kiriye, lê hukûmet? .. Ma qey kes newêrî bû biçûya gilî jî? Çawa, hukûmet dê û bavê gundiyan bû(!) Hukûmet dê li dû mêrkujan bigeriya û ew derxistana meydanê. Tu tişt ji ber destên hukûmetê winda nedi bûn. Ew têketina "qula gur" jî, dê dîsan hukûmetê ew bigirtina û derxistana meydanê.

Ji nav koma gundiyan peyakî kal, rihdirêj û bi gopal bi dengê xwe yê ketî got:

—Bavo, weha nabe. Divê em awakî bikin! Divê em biavêjin camêrna! Em herin hukûmetê gilî bikin! Ma emê bi vî awayî çi safî bikin, ku em hemû li hev kom bûne?

Tu deng ji kesî derneket. Tew weke dengê kalo neçû tu kesî. Hingî du-sê kes bi dizî ji nav komê derketin û çûne malên xwe.

Kalo dîsan got:

—Ma qey namûs ji we kesî çê nabe lawo? Ma qey mirovantî nema ye? Îro bi serê vî gundiyê me de hat, dê sibê bi serê me de jî bê...

Jina kalo, ji paşiyê de çakêtê wî kişand, ew ji nav koma gundiyan derxist û bi pistînî jê re got:

—Ma kuro, çi îşê te pê heye? Ew çi dikin bila bikin. Çavên te lê ye Zoro Axa me ji gund derxîne?

Kalo bi a jina xwe kir û hew tişt got.

Her ku şev dereng dibû, gundî hêdî hêdî ber bi

malên xwe ve dikişiyan. Ji Xezalê û çend gundiyên dilşewat pê ve, tu kes li ser miriyan neman.

Şev nîvê şevê, Xezalê miriyên xwe emanetî wan gundiyan kirin û berê xwe da qereqolê. Qereqol bi meşê qederê saetekê dûrî wan bû. Ji xwe gava ku mirov bi şev diçû gundê ku Zoro Axa lê rûdinişt, mirov zanî bû, ku kîjan mala Zoro Axa ye û kîjan qereqol e. Mirov digot, qey ji mala Zoro Axa û qereqolê pê ve, tu kes li wê [illegible] najîn. Hîn ji dûr ve, şewqa elektirıkên mala Zoro Axa û qereqolê li ser çavên mirovan dixist.

Ew riya mirov bi meşê saetekê diçû, Xezalê di nîvsaetê de çû. Ku gihîşt ber qereqolê, hema bi lez kete hewşê. Lê, leşkerek hate pêşiya wê û jê pirsî:

—Çi ye, ma te xêrî vê şevê?

Xezalê bi stûxwarî çîroka xwe jê re got. Ji xwe gava ku mirov li rewşa wê dinihêrî, mirov digot, ne sê, lê deh kes ji mala wê hatine kuştin.

Paşê leşker serê xwe hejand, kire niçe-niç, ew da pêşiya xwe û bire hundir.

Serçawîş dîsan weke hercar şûşa wî ya araqiyê li ber bû û araqiya xwe vedixwar. Gava ku leşker bi Xezalê re kete hundir, serçawîş di çîrokê de derxist. Xezalê çû dest û lingên wî û dest pê kir û got. Serçawîş dehfek da wê û ew wê de şand. Bi dehfa serçawîş re, Xezalê weke miriyekê li ser çimento li erdê ket. Lê dîsan rabû ser xwe, bi stûxwarî li ber serça-

wîş geriya û rewşa xwe jê re got:

—Ez bi qurbano, min xwe li Xwedê girtiye, li we girtiye. Warê min kor bû, ez kurdûnde mam, ez bî mam, ez li ber derî û dîwaran mam, aaxxx... Ez bi qurbaaan... Gelo ji Zoro Axa pê ve kî dê vê bobelatê bike? Ma dijminatiya me û kê hebû? Aaaxx...Ew e! Welleh ji wî berazî pê ve tu kes vê nakin! Welleh ji wî pê ve tu beşeran ev nekiriye... Bi riwê wî yê bi ken û bi nermîtiya wî ya xav nexapin!

Serçawîş ji serî heya binî bi çîroka wê zanî bû. Piştî ku qurtek din jî li araqiya xwe xist, got:

—Erê erê, bes e! Min fêhm kir! Emê li dû wan bigerin û wan bigirin. Kengî me ew girtin, emê haya we jî bighînê. Tu tişt ji ber destên me winda nabin.

Gava ku serçawîş ew peyvên han kirin, Xezalê ew bobelata ku bi serê wê de hati bû ji bîr kir. Bêhna Xezalê bi derbekê re fireh bû. Îcar herdu destên xwe dane ser hev, stûyê xwe xwar kir û got:

—Ez bi qurbana serî, Welleh Zoro Axa ev kiriye. Zoro Axa ev hovîtî kiriye.. Ji wî pê ve tu evdên Xwedê vê yeka han nakin.

Serçawîş peyva wê birî, ji cihê xwe rabû û bi ser de qîriya:

—Bes e, de haydê biceheme!

Dû re bang du leşkeran kir û got:

—Bi milên vê bigirin, bavêjin nezaretxanê.

Du leşker bi bazdan hatin, bi milên wê girtin û ew ber bi nezaretxanê ve birin.

Serçawîş bi dû wan de bang kir:

—Wê berdin, bila here. (Dû re bi Xezalê re peyivî) Ku tu niha neçe, emê te bavêjin nezaretxanê, ta ku em mêrkujan bigirin. Tu kîjanê ji xwe re dineqînî? Tu dixwazî herî, an di nezaretxanê de bimînî?

Xezalê tu tişt negot, stûyê xwe xwar kir, weke zarokan kire îskîn û derket der ve.

Ew destê sibehê gihîşte gund. Pêşî dengê banga dîkekî hat. Dû re yekî din... û yekî din... Bi wî awayî hemû dîkên gund bi dengên hev hişyar bûn û bang dan. Ji gund du kûçikên xurt û mezin êriş birin Xezalê. Lê gava ku kûçikan ew nas kirin, weke ku şerm bikin, serên xwe xistin ber xwe, teriyên xwe kil kirin û dîsan bi tolazî ber bi gund de bazdan. Xezalê ji kalekî heştê salî pê ve tu kes li ser miriyên xwe nedît.

Kalo yekî rihspî û bi gopal bû. Eslê xwe ermenî bû. Lê ji ber ku pir di nav kurdan de mabû, bûbû weke kurdan. Ji xwe ji kurdî pê ve bi tu zimanên din nizanî bû. Kalo destebirakê mêrê Xezalê bû. Ew cîranên hev bûn û her êvar şevbuhêrka xwe bi hev re derbas dikirin. Kalo bi xwe xwediyê perçak erd bû. Wî ew erdê xwe ji gundiyekî ku bar kiribû bajêr, kirî bû. Her sal ji xwe re diçand û pê debara xwe dikir. Carinan gava ku baran nedihat, zadê wî jî weke yên pir gundiyan nedihat; lê, ji ber ku bi tenê bû dîsan zêde nediket bin deynan.

Xezalê xwe avêt hemêza wî û bîskê giriya. Ew girî bi Xezalê pir xweş hat, ji ken xweştir hat. Kalo jî

xwe negirt û giriya. Ji xwe cara pêşî jî kalo çav li wan keti bû, li ber serê wan rûniştibû û weke zarokan giriya bû. Dibû jî xweşbûna giriyê Xezalê, ji ber dostanî û germiya ku kalo dida wê, bû.

Êdî rojê hêdî hêdî serê xwe di paş çiyan de derxist. Tîrêjên wê Gundê Girik bi yek derbê re rohnî û germ kir. Xezalê û kalo wisan li dor miriyan diçûn û dihatin. Birayê Xezalê, yê ku li gundê nêzîkî wan rûdinişt, bi derketina rojê re li hespê siwar û kete gund. Hespê xwe ajot nik miriyan û xwe ji hespê avêt xwarê.

Xezalê bi lez çû pêşiya wî, ew hemêz kir û bîskê jî di hemêza wî de giriya. Lê birayê wê negiriya. Cigare li ser cigarê pê xist û li dora miriyan çû û hat. Dixwest tiştekî ji xweha xwe re bibêje, lê dikir nedikir nikanî bû bigota; devê wî nedigeriya. Dawî, çû li ser kevirekî rûnişt, serê xwe xist nav çokên xwe û weke qûçekê, bêdeng ma.

Bi bilindbûna rojê re, melê û gundiyan mirî di nav xwe de hilgirtin û birin hewşa mizgeftê. Dîsan bi alîkariya hin gundiyên xwedîxêr, melê mirî şuştin, ew kefen kirin û her du-sê kesan yek di nav xwe de hilgirtin û ew ber bi goristana binya gund birin. Piştî ku ew kirin goran, hemû gundiyan serê xwe xistin ber xwe û bêdeng ber bi gund ve meşiyan. Kalo jî keti bû bin milê Xezalê û herdu bi dilên birîn, di dawiya gundiyan de, hêdî hêdî dimeşiyan.

## V

Roj û meh di navberê de derbas bûn, Karê Zoro Axa û lawê wî herdem pevçûn bû. Her ku lawê wî ji xwendinê dihate malê, bi bavê xwe re pevdiçû. Danûstandina lawê Axê û xortên gundiyan baş bi hev re çê bûbû. Her gava ku lawê axê ji bajêr dihat, bi koman pirtûk bi xwe re tanî û li xortên gundiyan belav dikir. An bi awakî din mirov kane bêje, ew bûbû mamostayê hemû xortên gund. Bi wî awayî, lawê Zoro Axa wisan di gund de hate naskirin û hezkirin, ku hemû gundiyan xatirê wî digirtin. Lê ne weke ku xatir ji bavê wî re digirtin. Xatir û qîmeta gundiyan ji bavê wî re digirtin, hemû ji tirsan bû. Ku gundiyan xatirê Zoro Axa negirtana, Zoro Axa asaq di wan de dikir û ew ji gund derdixistin. Çend caran jî wisan bûbû. Carekê gundiyekî bi nebaşî li dû wî peyivî bû, lê, li gundî nebûbû êvar, ew bi zora peyên Zoro Axa ji gund hatibû derxistin. Hemû gundî ji ber Zoro Axa di emana Xwedê de bûn. Ji bavê kîjan gundî zêde bû xatirê Zoro Axa negirtana? Ji bavê kîjan gundî zêde bû, Zoro Axa di derekê de biçûya û rê nedanayê? Bi kurtebirî, Zoro Axa bi zor û stema xwe xati-

rê xwe li ba gundiyan çûkiri bû.

Lê rewşa lawê wî ne wisan bû. Danûstandina lêwik tenê bi gundiyên feqîr, belengaz û perîşan re hebû. Rojekê lawê axê neçû tu qereqolan, ne jî tu çawîş û serçawîş ezimandine mala xwe. Ji xwe her ku bavê wî serçawîş ji qereqolê diezimande mala xwe, lêwik pê re pevdiçû û gotinên xerab jê re û ji serçawîş re dikir. Lê bavê wî dev ji wê ramana xwe bernedida. Her roj an ew li qereqolê bû, an jî serçawîş li mala wî bû.

Zoro Axa bi xwe pir ji peyivandina tirkî hez dikir. Gava ku ew bi serçawîş re bi tirkî dipeyivî, wî xwe peyakî pir mezin didît.

Rojekê bi şev, lawê axê pirên gundiyan li mala Silo civandin û şîret li wan kirin. Di şîreta wî de, hovîtiya bavê wî û zilm û stema leşkeran cih girt.

Hingî gundiyekî bi emir û rihspî jê pirsî:

—Bavo, Welleh em baweriyê bi te jî naynin! Peyvek me pêşiyan heye: "Nokê wê bê li kokê".

—Na apê Hecî, her tişt tê guhertin, got xortekî nozdeh-bîst salî. Lawê axan jî kanin baş bibin û bibin hevalên karker û gundiyên perîşan û belengaz. Ji ber ku bavê wî axa ye, ne ku ew jî axa ye. Ma hun nabînin, herdem ew û bavê xwe şer dikin û pevdiçin? Roja ew û bavê xwe dilên hev nehêlin û şer nekin heye gelo? Ji ber ku ew wisan, ji bo mafên me gundiyan li ber bavê xwe radibe, ew jî hertim weke xortên gundiyan bê pere ye.

Îcar lawê axê destûra peyvê xwest û peyivî. Her tişt weke pisporekî zane, ji serî heya binî ji wan re got. Rewşa xwe, rewşa dibistanê, rewşa bajarên mezin, rewşa welatên xwe azad kirine; her tişt yek bi yek ji wan re got û li ber xistin. Ji ber ku lawik xwende bû jî, gundiyan bêtir baweriya xwe pê tanîn û lê guhdarî dikirin.

Ev bû. Lawê axê her roj gundî li malekê dicivandin û şîret li wan dikirin. Nemaze wî bêtir guh dida xortan û ew hînî tiştên baş û merovî dikirin.

Çawan bû, ev rojekê li ber guhên Zoro Axa ket. Zoro Axa bihîst, ku lawê wî û xortên gundiyan li hev dicivin û bi nebaşî qala wî dikin. Nebaşî jî peyv e? .. Dixwazin an wî bikujin, an jî wî ji gund derxînin.

Rojekê, gava ku lawê axê ji bajêr hate malê, dît ku kincên diya wî di nav xwînê de mane û diya wî bi dengekî bilind digirî. Lêwik ji kerban xwe negirt, êrîş bire ser bavê xwe, xwe gihandê û du-sê hutikên baş lê xistin. Hingî peyayên Zoro Axa bi wan ve hatin û ew bi zorê ji hev kirin.

Di wê deqîqê de, xeberên hatin ber devê Zoro Axa ji lawê xwe re kirin. Baş bû debança wî ne li piştê bû. Debança wî li piştê biwa, wî dê muheqeq lawê xwe bikuşta.

Piştî ku ew bi alîkariya peyên Axê ji hev hatin kirin, lawik bi keder ber bi diya xwe çû. Diya wî hîn

jî digiriya; lê ne weke giriyê berê... Îcar bi dengekî nizim digiriya û dinuhurand.

Lawê wê li ber wê rûnişt, huburya wê ji serî kir û hêdî porê wê da alî. Piştî ku cihê şikestî dît, hêdî bi milê wê girt û ew bire hundir. Ji ber ku dibistana doktoriyê dixwend, her tiştên wî li mal hebû. Sindoqek tijî derman, heb û pembû bû. Ew sindoqa xwe ji ser text daxist, vekir, meqesek piçûk û hin derman û pembû jê derxist. Pêşî porê li dor birînê qusand, dû re hin derman danî ser û bi paçikekî spî girêda. Gava ku wî ew derman danî ser, weke mirov bizotek agir deyne ser, wisan şewitî û janê da dilê jinikê. Lê qet ne xema jinikê bû. Ji ber ku lêxistina her roj lêdiket, pir ji vê birînkewandinê dijwartir bû. Ew ne weke jina Zoro Axa bû, lê weke ku kola wî bû. Roja Zoro Axa li wê nexista û erza wê neşikanda tune bû. Ji bo vê yekê jî her dem lawê wî pê re pevdiçû û hovîtî û nemirovantiya wî jê re digot.

Du roj di navberê de derbas bû. Dîsa lawê axê çû bajarê Diyarbekirê ji bo ku xwendina xwe bidomîne. Piştî çûyina wî bi rojekê, Zoro Axa bang Bozo kir û ew xewle kir.

Bihar bû, qîvar bi çokekê bilind bûbûn. Gul û kulîlkên renga reng vebûbûn. Giya ku bi bostekê bilind bûbû, weke ku baran lê hatibe, ji xunaviyê (avî) şil bûbû. Bêhna xweş, bêhna gulçîçek û kulîlkan li ser çavên mirovan dixist. Ji xwe çive-çiva çivîkan, ew sibeha biharê hîn jî xweştir û bi giyantir dikir.

Piştî ku Zoro Axa û Bozo hebekî ji gund dûr ketin, Zoro Axa ji nişkê ve berê xwe Bozo ve kir û got:

—Bozo!

Bozo veciniqî û wa bi şaşmayî bersiv da:

—Kerem bike axa.

—Di vî karî de pere heye, Bozo! Ev kar, divê ku tenê di navbera min û te de bimîne. Perakî baş di vî karî de heye, Bozo! Tu dê bi van peran heyata xwe û zarokên xwe xelas bikî. Ev pere têra te û deh salan heye.

Bozo çiqas fikirî nefikirî tu rê ji hev dernexist. Zoro Axa tu caran bi vî awayî û nerm bi wî re nepeyivî bû. Zoro Axa çiqas bi xweşî bi wî re dipeyivî. Mesela Zoro Axa çi bû gelo? Ew ji bo çi evqasî bi xweşî bi wî re dipeyivî? Bozo çiqas fikirî nefikirî tu bersiv ji wan pirsan re nedît. Dû re serê xwe li ber axê tewand û got:

—Tu çi bêjî ser serê min axa! Ma heya niha min kengî peyva te şikandiye? Min kengî tiştên ku te gotine nekiriye?

Zoro Axa bi pêçana cigara xwe biliya bû. Wî ew cigara xwe vêxist û du-sê hulm li ser hev lêxist.

Dîsan herdu bêdeng di nav wê mêrga şil de meşiyan. Diwên cigarên wan, weke pinpinîkên spî ber bi asman de dikişiyan. Piştî ku çend gavên baş meşiyan, axê got:

—Binihêre Bozo, ev kar pere tê de heye! Tu kes... Divê tu vî tiştî ji jina xwe re jî nebêjî.

Bozo wa bê sebir got:

—No no, ma ezê çawa ji xelkê re bibêjim? Ma karên ku min heya niha kirine, min ji kê re gotiye? No axa, tu bi her awayî baweriya xwe bi min bînî. Karên ku ez bikim ez ji tu kesî re nabêjim; ewê tenê di navbera min û te de bimînin.

Zoro Axa bi kêf serê xwe kil kir û dîsan weke berê got:

—Binihêre Bozo, ev kar pere tê de heye! Debançê jî ezê bidime te. Tu dê Sîdar bikujî, Sîdarê me... Vî bênamûsê lawê min...

Gava ku Zoro Axa wa got, mirov heft xencer li Bozo bixista piça xwînê jê nedihat. Ew wisan di cihê xwe de sar ma. Êdî nizanî bû çi bigota. Kê bihîstiye ku bav lawê xwe bi kuştin dide? Ev tiştê han nekete serê Bozo, ji wî tirê ku şaş têgihîşt; bi ecêbmayî ji Zoro Axa pirsî:

—Te got, Sîdar?

Zoro Axa bi hêrs serê xwe ber bi jêr ve hejand:

—Erê, Sîdar! Wî bênamûsê lawê min... Divê tu wî bikujî, Bozo! Tu wî bênamûsî bikujî... Ew bênamûs ji min re nabe law. Ewê dawî serê min bixwe. Ew bi xwe li kuştina min digere. Ev sûtal mûtalên gundiyan hemû hînî fêlên pîs û kirêt kirine. Ma qey te nebihîst Bozo? Te ne bihîst, ku hin sûtalên gundiyan gotibûn: "An emê Zoro Axa ji gund derxin, an jî emê wî bikujin". Lê... (piştî ku kire niçe-niç) sûtalên gundiyan dê min bikujin, sûtalên gundiyan dê min ji gundê min derxin. Weh... Ma kesî tiştên wisan dıtiye Bozo? Kesî bobelatên weha dîtiye lawo? Ez kanim niha hemû gundiyan ji gund derxim.

Lê kî dê ji min re kar bikin? Kî dê erdan bajon? Kî dê heywanan biçêrînin, Bozo? Lê ev bênamûs... Ku ev bênamûs bête kuştin, gundê min dibe buhişt. Gund dibe buhişt, Bozo! Wî niha li vî gundî wisan kir, ewê sibe li gundên min, yên din jî wisan bike. Ewê sûtalên gundiyên din jî li hember min rake! Ewê li wan jî wisan bike, Bozo! Ma ka namûsa axatiyê lawo? Vî bênamûsî şerefa min anî perakî, Bozo! Ez rezîl kirime...

Carina bi bergerîn, carina jî bi qîrîn ji Bozo re digot. Ji dev bêtir bi destan dipeyivî. Xuya bû pir hêrs bûbû. Weke ku gêrik di qunê de be, xwe diavêt vî alî û wî aliyê Bozo. Bi wî awayî, hebekî ji gund bi dûr ketin; gihîştin ser qîşikekî, li wir xwe dane ser tûtikan û her yekî cigarek pêçan. Bi cigarepêçanê re, Zoro Axa her dipeyivî. Lê Bozo serê wî di ber de bû û peyv ji dev dernediket. Wisan hêrs bûbû, ku destên wî dilerizîn. Piştî ku Zoro Axa têra xwe peyivî û tiştên hatin ber devê wî gotin, Bozo got:

—Bila ne Sîdar be, kî dibe bila bibe. Ezê çawan Sîdar bikujim? Destê min dê çilo li Sîdar bigere? Na, axa! Ez vê yeka han nakim, ez Sîdar nakujim!

Zoro Axa cigara ku di dest de bû avêt, rabû ser pê û bi hêrs got:

—Bozo, guhên te dibihîzin, devê te çi dibêje? Ger tu vê yeka han nekî, ji îro pê ve mala te li gund nema! Divê tu malê ji vî gundî bar bikî û tu bi ku de dicehemî, biceheme! Qey tu jî hevalê wan î ? Tu jî hevalê wan î Bozo? ..

Bozo li ber wî geriya û bi stûxwarî got:
—Axayê min, ez bi xulam, ma ezê bi ku de bar bikim? Ma ezê bi ku de herim? Ez hevalê wan û çi me ez bi xulam? Ez...

Zoro Axa nehişt ew zêde bipeyive. Peyva wî birî:
—Tu malê bi ku de bar dikî bike! An tu dê vê bikî, an jî tu dê ji vî gundî derkevî, Bozo!

Bozo çiqas fikirî nefikirî, tu rê ji hev dernexist. Zoro Axa dîsan got:
—An tu dê vê bikî, an jî tu dê ji gund bar bikî?

Bozo mecbûr ma û qebûl kir. Debança çardeh derb ji axê girt û bi hev re bi gavên giran ber bi gund meşiyan. Heya ku ew gihîştin gund, Zoro Axa her tişt jê re got. Bazara peran bi wî re kir û cihê lawê xwe û dibistana wî jê re got.

Her çiqas beyî dilê Bozo bû, dîsan mecbûr ma û qebûl kir.

Piştî wê bi rojekê, Bozo berî da Diyarbekirê û çû dora dibistana Sîdar. Li dora hewşa dibistanê du caran çû û hat; cara sisiyan çavên wî li sîdar ket. Ger ku Sîdar ew bidîta, wî dê bazda û bihata ew hemêz bikira. Wî pir ji Bozo hez dikir. Wî hertim ji Bozo re digot: "Kekê Bozo, ma çi dibe, dev ji vî hovê bavê min berde". Bozo jî rewşa xwe jê re digot. Hingî Sîdar bi derd serê xwe dihejand û bêdeng dima.

Bozo bi wî awayî, bîskê li ber hewşa dibistanê rawesta; Çavên xwe ji Sîdar nediqetand. Dît ku Sîdar û hevalên xwe ji nav xwendevanan derketin û çûn xwe dane ber berojk. Bozo hêdî bi qulûsî çû pêşiya dibistanê û li hember Sîdar rawesta. Lê Sîdar ew nedidît, her dipeyivî û ji hevalên xwe re tiştin digot. Ji ber ku ew dûr bûn, dengê wî nedihate Bozo. Bozo hêdî destê xwe danî ser debança xwe, debançe derxist û ji nîvê pişta wî nîşan girt. Çend caran wisan li ser hev ji pişta wî û ji serê wî nîşan digirt, lê dikir nedikir destê wî lê nedigeriya û nikanî bû berdayê. Ger ku destê wî lê bigeriya û berdayê, wî dê bi gula pêşî ew li ser piştê li erdê bixista.

Hîn wilo, Sîdar û hevalên xwe dîsan çûn ketin dersxana xwe.

Bozo debançe xiste nav kefa destê xwe, lê nihêrî, pir kûr fikirî û hin xeyal anîn ber çavên xwe. Hêdî hêdî bi qulûsî dikete oda Zoro Axa û bi wê debança çarde derb, her çardeh gule di Zoro Axa de vala dikir. Hingî qîrîn bi hin gundiyan diket û bi qîrîna gundiyan re, serçawîş bi deh piyadan ve digirtin ser gund: ew digirtin, herdu destên wî li ser hev girê didan û ew şevekê li qereqolê dihiştin. Ji jina wî û herdu zarokên wî pê ve, tu kes nedihatine seredana wî. Gava ku jina wî diçû seredana wî, serçawîş dest diavêtê. Dengê qîrîna jina wî û zarokên wî, zarên guhên wî diqetandin.

Bozo di wê navberê de veciniqî, kete xwarê û debança wî ji destan ket. Ger ku cihê wî ne xewle bi-

wa, dê bi dehan xort li ser wî kom bibûna, ew bigirtina û her tişt jê bipirsiyana. Ji ber ku wê demê, dema tevgerek xurt bû. Tevger bêtir li dibistanan dest pê kiri bû. Di navbera rast û çepan de, hertim şer derdiket. Rojê bi kêmasî deh kes dihatin kuştin û ji dehan bêtir jî dihatin birîndarkirin. Jê wê de jî, di navbera çepan bi xwe-xwe de hin munaqeşên sert dihatine meydanê. Carinan jî wan munaqeşên wan, yên bi devkî, bi lêxistinê dawî dihat. Ji ber vê yekê her kes, her grûb û her şexsekî ku bi polîtîkayê re dilebikîn ji xwe ditirsiyan û çavên xwe çar vedikirin. Bozo bi xwe bi vê yekê zanî bû; çer ku ji erdê rabû, çû dawiya dibistanê û debança xwe ji tozê paqij kir. Lê, li wir jî pir nesekinî, dîsan çû kêleka hewşa dibistanê û li bendî Sîdar rawesta.

Pir tê neçû li zengilê dibistanê ket û hemû xwendevan ji dersxanên xwe derketin. Bozo çavên xwe ji wan nediqetand. Piştî ku refek du ref derketin, serê Sîdar jî hate xuyakirin. Sîdar weke her dem, dîsan tiştin ji hevalên xwe re digotin. Çentê wî di bin milê wî de bû û digel hevalên xwe ji hewşa dibistanê derketin.

Çaxa dibistan belav dibû, mirov ax biavêta ji mirovan li erdê nediket; ew rê û kuçeyên dora dibistanê, ji keç û xortan tijî dibûn.

Bozo destê wî li ser debança wî bû û bi qederê sed gavan bi dû Sîdar de dilezand. Çaxa ku nêzîkî li bajêr kirin, nêviyên xwendevanan yên pir, her yek bi derekê de belav bûn.

Hingî ji Bozo re pir baş bû. Bozo hema çavên wî li Sîdar bû û xwe diavêt vê kêleka rê û wê kêleka rê. Li firsendakê digeriya, ku bikuje; lê ji kalabalika mirovan qet firsend nedikete destan.

Destê wî yê rastê di bêrîka paltoyê wî de bû û li ser debançê bû. Ji lez û heyecana wî, mirov dizanî bû ku ewê tiştekî bike. Ji xwe şika çend kesan ji wî çêbûbûn , lê tu tişt jê fêhm nekiri bûn, tenê milên xwe hejandi bûn û jê derbas bûbûn.

Sîdar û hevalên xwe her dipeyivîn, carinan bilind dikeniyan û dimeşiyan. Piştî ku ji sûkê derketin, gihîştin cihekî xewle û bi kêm mirov. Ew yeka han ji Bozo re bû firsendeke mezin; xwe avêt nav bexçe û di paş darekê de ji Sîdar nîşan girt. Çend caran destên wî lerizîn û nexwest berdiyê. Carê li debançê dinihêrî, diranên xwe diqîriçandin û hin xeyal tanîn ber çavên xwe. Çend caran ku jê nîşan girt, hevalên wî ketin ber wî. Lê, dawî firsendeke baş ketiyê û nîşan tam ji cênîka wî girt û berdayê. Bi gula pêşî re weke ku li kevirekî hulkume, kete xarê. Bozo di nav bexçe de baz da û wunda bû. Tew hevalên wî nedîtin gule ji kîjan hêlê hatin.

## VI

Gava ku Sîdar kete xwarê, herdu hevalên wî vir de û wê de bazdan. Piştî ku kes nedîtin, dîsan vegeriyan ser Sîdar. Ji wan tirê ku rastan, an hinan ji çepan bera hevalê wan dan. Bi yek derbê re li ser Sîdar mirov kom bûn. Hevalên wî li ser wî daqûl bûn, dest û ser çavên wî pelandin û li dilê wî guhdarî kirin. Lê mixabin, can da bû, gule tam li cênîka wî ketibû û mêjiyê wî ji hev belav kiri bû. Nêviyê mêjiyê wî ji serê wî rijiya bû erdê.

Hinan ji wan kesên ku li ser wî kom bûbûn çûn hin rojname ji dikanên nêzîk anîn û li ser Sîdar raxistin. Lê kesî ji wan mirovan nizanî bûn bê çi ye û kê ev kiriye. Pir kesan jî ji hevalên wî pirsîn, lê hevalên wî *ji nizanîbûn.*

Piştı ku saetek di navê de çû, jîpa polîsan hate ser wî. Du polîs û komserek ji jîpê daketin û çûne ser. Yekî ji nav wan ew rojnameyên ku li ser wî ra-

xistî bûn da alî. Gava ku wî rojname da alî, mêşên ku xwe li ser danî bûn hemû firiyan. Polîs dest û serçavên wî pelandin; destê xwe da ser dilê wî, li komsêr nihêrî, serê xwe hejand û got:

—Miriye.

Komsêr jî xwe tewand û destê xwe da ser dilê wî. Dû re bi dengekî bilind û gur ji kalabalikê re got:

—Kesekî ku vî nas dikin di nav we de heye?

Herdu hevalên Sîdar gotin:

—Erê, ew hevalê me ye.

Komsêr emir da polîsan, da ku mirî di nav xwe de hilgirin û li jîpê siwar bikin.

Dû re berê xwe bi herdu hevalên Sîdar vekir û bi hêrs got:

—Haydê, hun jî siwar bibin!

Piştî ku hemû siwar bûn, şofêr pêl gazê kir û jîp weke bifire ji cihê xwe pekiya. Ew dixana ji şûna tekerên jîpê rabû, li ser wan mirovên ku li wir civiyabûn, belav bû.

Herdu hevalên wî du rojan di nezaretxanê de man. Di hundirê wan herdu rojan de lêxistina ku li wan hate kirin, mirov li heywanan nedikir. Ji wê lêxistina polîsan, mirov ser çavên wan nas nedikir. Ser çavên herduwan jî reş û şîn bûbû û werimî bû. Îşkenca herî mezin, roja sisiyan li wan bû. Sibehê zû dest û lingên herdiwan girê dan, bi dar û qamçiyan li wan xistin û tim jî digotin:

—Hun ji kîjan siyasetê ne û hevalên we kî ne?

Gava ku wan digotin:

—Em ne ji tu siyasetan in.

Hingî hemû polîs li wan diciviyan û bi hemû hêz û metodên xwe li wan dixistin.

Di bêrîka Sîdar de hin not, navên hin pirtûkên biyanî û dîroka du civînan derketibû. Lê polîsan ji destnivîsa wî fêhm nedikirin. Tiştên ku wî not digirt û bi xwe re digerandin, ji wî pêve tu kesekî din nikanî bûn bixwendina û jê fêhm bikirana. Ji ber ku nivîsên wî bi xwe re digerandin, weke reçeta doktoran dinivîsandin. Wî wisan dinivîsand, ji bo ku ji wî pêve kes ji nivîsên wî fêhm nekin.

Gava ku polîsan ji wan nivîsan fêhm nedikirin, dibehecîn û li herdu hevalên wî dixistin. Ji polîsa webû, ku ji aliyê hin siyasetan ve hatiye kuştin. Ji xwe armanca polîsan, ne bidestxistina mêrkujan bû; nêrînên wan yên siyasî derxînin meydanê û siyaseta wan nas bikin. Lê dikirin nedikirin, nikanî bûn tu tişt ji hevalên wî derbixistana. Geh hêrs dibûn, li wan dixistin, geh bi nermî ji wan re digotin. Geh çavên wan girê didan, ew dixistin falakê û li wan dixistin, geh psîkolog tanîn û bi wan re didane peyivandin. Lê digel vê zilm û îşkencê jî, dîsan tu peyv û gotin ji hevalên wî dernediket. Tiştên ku digotin, tenê "Nizanim" û "na" bû.

Roja çaran, sibehê zû, jîpa leşkeran li ber deriyê polîsxanê sekinî. Pêşî Zoro Axa, dû re serçawîş, dû re jî Bozo herdu destên wî li ser hev kelepçekirî, di nav destên du leşkeran de û ji jîpê hatine xwarê. Zoro Axa û serçawîş rast çûne oda komsêr. Herdu leşker û Bozo jî, li heywanê, li ser lingan rawestan.

Zoro Axa û serçawış li ba komsêr bi hev re giliyê Bozo dikirin. Debança ku Zoro Axa dabû Bozo, ji bo ku pê Sîdar bikuje, jê stendibû, danî bû ser masa komsêr û her digot:

—Lê, komsêr beg! Tiştên wisan jî dibin. Peyayê min, yê sibehê heya bi êvarê di nav mala min de û rabe lawê min bikuje. Û bi debança min... Lawo, ku nêta te û kuştina hinekan hebûya, tê dê ez bikuştima, ma rebenê lawê min çi kiri bû? Ma çi heqê te li wî rebenê xwendevan hebû? Hey malwêranê malwêran!

Zoro Axa gava ku dipeyivî, xwe hêrs dikir, serê xwe vir de û wê de dihejand û tim dikire axe-ax û niçe-niç.

Hema ku Zoro Axa çi bigota, serçawîş jî ew digot. Carinan wî jî xwe weke Zoro Axa hêrs dikir û digot:

—Bi rastî jî, tu kesekî weke van gundiyan bêaqil û nankor tune ne. Ev bi mirovantiyê nizanin. Ev dehbe ne, dehbe...

Îcar Zoro Axa bi hêrs dom dikir:

—Yaho, ma kesî tiştên wisan dîtiye? Hem nanê min bixwe û hem jî bixwaze mala min wêran bike. Te jî nanê min dixwar, lawo! Hey nanê min di qirikê de mawo!

Komsêr guleyên ku li Sîdar ketibûn û yên ku Zoro Axa bi xwe re anîbûn, dane ber hev û li hev girt; gule yek bûn. Ew guleyên ku li Sîdar ketibûn

jı, bi wê debançê hati bûn berdan. Komsêr ew gule di nav destmalek biçûk de girêda, xiste çavîka masa xwe, li Zoro Axa nihêrî û serê xwe hejand.

Zoro Axa, serçawîş û komsêr xwarina nîvro bi hev re xwarin. Piştî xwarinê, Bozo rakirine mehkemê. Gava ku bi giliyê Zoro Axa, bi delîl û şahidan sih sal ceze li Bozo hate birîn, Bozo li hember biryara ceza xwe derket û got:

—Zoro Axa ev rê nîşanî min da. Wî bi destê xwe debançe da min û bazara peran bi min re kir, da ku ez lêwik bikujim. Ez çiqas li ber Zoro geriyam negeriyam, min çiqas got, axayê min, ez bi qurban, vê yeka han bi min meke, Sîdar nestêle ye, ezê çawan Sîdar bikujim? Wî got: "Ger ku tu vê dikî bike, ger ku tu nakî, divê tu mala xwe ji gund bar bikî". Xwezî ku min mal ji gund bar kiribiwa û pars kiribiwa û min ev yeka han nekira.

Lê peyvên Bozo li mehkemê qet pere nekirin. Tiştên ku wî digotin, kesî bawer nedikir. Ji xwe nedikete serê tu kesan. Ma tiştên wisan qet hatine dîtin û bihîstin? Dê çawan bav, ne ji bo tiştekî lawê xwe bi kuştin bide? Na camêr, ma tiştên wisan hatine bihîstin? Ji xwe kesî li berxwedana wî li gilî û gazinên wî guhdarî nekirin. Bi wî awayî, li gorî hoyên qanûnên sih sal ceza lê hate birîn.

Di eynî rojê de Zoro Axa termê Sîdar bi jîpa leşkeran rakire gund. Hemû gundî li ser meytê wî hatin ser hev. Diya wî li ser wî li xwe xist û porê xwe weşand. Gundiyên dilşewat, yên ku ji Sîdar hez diki-

rin, hin ji wan giriyan û hinan ji wan jî xeber û gotinên herî nebaş ji Bozo re dan. Ji xwe kesên ku çîrok bihîstibûn, zanîbûn tu sûcê Bozo tune ye. Wan zanîbûn, ku hemû tişt Zoro Axa kiriye. Lê kesî newêribûn tiştekî wisan bigota. Kesên ku peyvek wisan ji dev derketa, diva bû ku ji gund barbikirana. An dê ji sedî sed Zoro Axa beleni bi serê wan de bianiya. Ji ber vê yekê, kesên dilxwazên Bozo û Sîdar û ne dilxwazên Zoro Axa li ser gora Sîdar kûr difikirîn û hêsir dirijandin.

Lê gava ku jina Bozo, digel herdu zarokên xwe hatin nava goran, ser gora Sîdar, nêviyê gundiyan yên ku li wir hatibûn ser hev, berê xwe jê guhertin û rû nedanê.

Rebena jinikê bi xwe li çîrokê şaş mabû. Wê bi xwe jî hezar carî nalet li mêrê xwe anîbû. Lê qet nedikete serê wê, ku mêrê wê Sîdar kuştiye. Wê bi xwe-xwe digot: "Ger ku yekî kuştinê hebûya, Zoro Axa bû, ma rebenê Sîdar çi kiribû".

## VII

Piştî veşartina Sîdar bi sê-çar rojan, Zoro Axa çû ber deriyê mala Bozo û li derî xist. Dengê jina Bozo wa bi nalîn ji hundir hat:

—Kî ye?

—Ez im keçê, derî veke!

Gava jina Bozo fêhm kir, ku Zoro Axa ye, ji cihê xwe pekiya û bazda derî vekir. Zoro Axa xwe tewand û di deriyê nizim de derbasî hundir bû. Jina Bozo bi lez doşekek ji kulînê derxist û li erdê raxist. Dû re jî behlîfek ku wê bi destê xwe neqişandî bû, danî ser doşekê, bi stûxwarî û bi şermokî ji Zoro Axa re got:

—Kerem bike axa, rûnê.

Zoro Axa li ser doşekê rûnişt,şewqê xwe daxist, danî kêleka xwe û got:

—Te dît Gulê! Te bihîst, bê wî bênamûsê mêrê te çi kir?

Jinikê tu tişt negot, tenê axînek kûr kişand û bêdeng ma.

Zoro Axa bi pişta destê xwe yê çepê, simbêlê

xwe ji devê xwe derxist, pê leyist û got:

—Binihêre Gulê, ez naxwazim te jî bi agirê mêrê te bişewitînim. Ger ne tu buwa, kî din buwa min dê agir bi mala wan bixista. Min dê mala wan bişewitanda. Min dê li ber çavên hemû gundiyan, ew weke keran bizirandina û dû re agir bera wan da.

Gulê tu tişt nedigot, bi stûxwarî û bi belengazî serê xwe dihejand.

Rast bû, ku ne bi destên Zoro Axa hatibiwa kuştin, dê Zoro Axa mala wan jî wêran bikira, dê ew li ber çavên gundiyan bizirandina û bişewitandina jî. Zoro Axa peyakî hov bû, bi qasî qirşekî ûcdan bi wî re tune bû. Wî çawan ku zilm û stem li gundiyan dikir, wisan li jina xwe jî dikir. Zoro Axa çar caran zewicî bû. Jinek wî miri bû, du jinên wî jî bi dû xortan de baz da bû. Tenê diya Sîdar li cem wî mabû. Ew zewaca wî ya pêşî bû û mabû ya dawî. Lê bi ya Zoro Axa êdî jinik pîr bûbû, weke ku wî dixwest nedi bû. Ji ber vê yekê, Zoro Axa her roj li wê dixist û xeber û gotinên nemayî jê re dikirin. Êdî ne jina wî, bûbû weke kole û berdestka wî. Sîdar çend caran ji bo diya xwe bi wî re pevçû bû jî, pere nekiribû. Zoro Axa her bi a xwe dikir û tiştên ku dixwest bi serê jinikê de tanî. Ev du salên Zoro Axa bû, ku çavên xwe berda bû jina Bozo. Lê nizanî bû, çi awayî ji Bozo re çêbike û jina wî li xwe mehr bike. Dawî dawî, vê ramanê di serê wî de cih girt, ku bi Bozo lawê xwe, yê ku her dem li hember wî radi bû, bi kuştin bide, dû re li Bozo gilî bike, Bozo biavêje girtîgehan û jina Bozo li xwe mehr bike.

Gulê qehwa ku çêkiri bû, danî ber. Zoro Axa bi qehwê re qalûna xwe jî vêxist. Piştî ku dû-sê gulp li qehwê xist, got:

—Gulê, sibehê çewalê xwe yê genim bîne û were ji xwe re, ji bo qûtê îsal hin genim bibe. Ûcdanêmin qebûl nake, ku ez bi agirê bênamûsê mêrê te, te û zarokên te jî bişewitînim. Gunehê min bi zarokên te tên. Ma ev zarok dê çawan bê bav bijîn? Heya ku ez sax bim, ez nahêlim hun birçî bimînin. Erê Gulê, kengê çi ji we re lazim bûfehêt meke, ha!

Gulê carinan serê xwe dixist ber xwe, carinan jî li Zoro Axa dinihêrî û weke ku digot "Erê" serê xwe ber bi xwe ve dihejand.

Gulê jinek bedew û pir spehî bû. Bejna wê weke bejna peyan direj û bi navmil bû. Nava wê zirav û herdu hêtên wê dagirtî bûn.

Gava ku kofiya xwe girê dida, herdu biskên xwe ji der ve dihiştin. Çavên wê weke çavên xezalan reş û spehî bûn. Bi kurtebirî ew bi xwe weke gulekê bedew bû. Dibe ku dê û bavê wê, ji bo ku ew wisan bedew û spehî bû, navê wê Gulê danî bûn. Gulê weke navê xwe bedew û xwînşêrîn bû.

Zoro Axa destê xwe hêdî li doşekê xist û got:

—Were Gulê, were li ser doşekê rûnî, erd cemidî ye.

Gulê li ser doşekê rûnenişt, ji erdê rabû, rahişt cewzikê qehwê û fîncana vala û bir danî quncika xênî, nav firaxan. Gava Gulê xwe tewand ku cewzik û

fincanê deyne erdê, Zoro Axa ji paşiyê de lê nihêrî û dilê xwe bijandê.

—De were Gulê, got Zoro Axa bi devkenî. Were ba min, li ser doşekê rûnî.

Gulê bi şermokî çû li ser doşekê rûnişt. Zoro Axa destê xwe avêt ser milên wê, serê xwe ber bi wê ve xwar kir û got:

—Erê Gulê, kengê çi ji we re lazim bû, şerm meke ha! Tu bixwazî!

Gulê bi şermokî bersiv da:

—Xwedê ji te razî be, tu çiqas merivekî baş î.

Zoro Axa ew hebekî din jî ber bi xwe ve kişand û di ser stûyê wê de destê xwe dirêjî pêsîrên wê kir.

Gulê destê wî ji ser sînga xwe da alî û bi qûnkişkê bi paş de vekişiya. Zoro Axa dîsan ew ber bi xwe ve kişand û destê xwe avêt pêsîr û hêtên wê. Gulê xwe ji nav lepên wî filitand û ber bi paşiya xênî ve bazda. Zoro Axa êrîş bir ser wê, ew di quncika xênî de zebt kir, hemêz kir û destên xwe avêtin hêtên wê. Gulê xwe dîsan bi zorê ji destên wî filitand û bazda quncika xênî ya din. Ji xwe tenê mezeleke (ode) wan bû. Lê mezela wan fireh û dirêj bû. Paşiya mezelê ji orta mezelê pir tarîtir bû. Li paşiya odê çend kîsên genim û textê firaxan hebû. Gulê li quncika xênî herdu destên xwe dane ser pêsîrên xwe û bi stûxwarî li ber Zoro Axa geriya. Lê Zoro Axa nedisekinî, wî her êrîş dibire ser wê. Gulê bê rohnî berepaş çû û li textên firaxan qelibî. Text ji jor de hate xwarê û her firaxek bi derekê de belav bûn.

Zoro Axa vê carê xwe gihande Gulê û kirasê wê ji hev tîştîşî kir. Gulê ji navê berjor tazî ma. Zoro Axa bi hêz destên xwe li nava wê gerand û devê xwe xiste nav herdu pêsîrên wê. Gulê dîsan bi zorê ew ji xwe veqetand û berepaş bazda. Zoro Axa dev jê berneda, wî her êrîş bire ser jinikê. Bi derbekê re çavên Gulê li dasa ku bi dîwêr ve bi dardekirî bû, ket. Hema xwe avête dasê û das xiste destê xwe. Cara dawî, ku Zoro Axa xwest biavêjê, Gulê das di orta serê wî de lêxist. Serê wî ji hev perçe bû, çavên wî çûn û hatin û weke dîwarekî li erdê ket. Xwîna ku jê pijiqî li hundir mezelê belav bû.

# Xewna Orhanov

Piştî deh salan li Swêd, Orhan biryara xwe da ne ji bin, lê serîkî here welêt.

—Ez çûyina xwe ji tu kesî re nabêjim, got bi xwe xwe. Ne ji hevalên vir re, ne jî ji malê re. Ku ez ji Serdar re bibêjim, ewê ji her kesî re bibêje, ew bi devê xwe nikare. Ez nabêjim. Ez zanim ewê dilê xwe bigire, lê tişt nabe, ezê dîsa dilê wî xweş bikim.

Piştî ku du roj di navberê de derbas bûn, firax miraxên xwe xiste tev, baholek tijî kinc û diyarî kir; lê ji nişkê ve ramanek hatiyê.

—Na, got, ez tu tiştî bi xwe re nabim. Ezê destvala herim. Tew nebe ezê li Tirkiyê diyariyan bikirim. Oooxx... Dê çiqas xweş bibe. Azadê birayê min çav li min keve, ewê ji dûr ve baz de pêşiya min û mizgînê bide diya min. Lê niha bênamûso mezin bû ye. Erê, erê, mezin bû ye... Ma ne bavê min carekê di nameya xwe de nivîsî bû û goti bû: "Azad êdî mezin bû ye, porê xwe şe dike û ji keçikan re difikîne." Haa!.. ya baş ewe ez bi şev herim, beyî ku kes min bibînin. Ezê hêdî herim ber derı û li derî xim. "Kî ye? " dê bêje diya min bi dengê xwe yê zirav. Lê

ezê dengê xwe biguherim; ezê bi dengekî stûr bêjim: "Derî vekin". "Tu kî ye? " dê bêje diya min. Ezê îcar dengê xwe zirav bikim: "Derî vekin, zû!" Birayê min Xelîl dê ji nav nivînê xwe bipeke û pirtûkên xwe di nava kîsên genim de veşêre û dê diya min bibêje: "Lawê min ne li mal e, em cihê wî nizanin!" Hingî ezê bêjim: "Dayê, ez im, derî vekin!" Dê birayê min yê navê bi dengekî nizim bêje: "Derî venekin, esker in, derewa dikin." "Derî vekin" ezê bêjim dîsa. Bavê min dê bêje: "Weleh ev dengê Orhan e." Dê gişkê bi hev re baz din û derî vekin. Hingî ditirsim ku dilê diya min bisekine. Na, na,ez wa naçim. Ya baş ew e, ku ez bi roj herime mal. Dibêjin muxbir pir bûne, ma kî dê min nas bikin? Ev deh salên min in ku ez ji welêt derketime. Hingî ne riha min, ne jî simbêlê min hebûn. Niha ez hatime guhertin; rih û simbêlê min şîn hatine û cênîkên min spî bûne.

Hîn wilo, çend caran li deriyê wî ket. Wî zû bi zû bahola xwe xiste dolabê û bilêta xwe ya balafirê ji ser masê hilanî û xiste bêrîka xwe; baz da derî vekir.

Serdar kete hundir.

—Oo, got Serdar bi devkenî. Ev çi kinc in te li xwe kirine? Tu dê herî konferansan, an herî ba keçik meçikan?

— ...

Bi hev re derbasî hundir bûn û heryekî cigarek vêxistin.

—Weleh êdî ez aciz bûme, got Serdar bi derd. Ev deh salên me ne ku em li vî welatî ne, ka me çi ji xwe fêhm kir?

Bîskê li ser dûriyê, li ser keçikan û siyasî peyivîn. Dû re,

—Va ez diçim, got Orhan. Ezê herime mala we jî.

—tu dê herî ku?

—Ezê herime welêt.

—Eh, çawa ku ez diçim, tu dê jî wilo herî.

—Weleh ezê herim.

—Loo, de tu dev ji van awayan berde. Ma tu dê min bixapînî.

—Ê baş e, tu bawer neke.

—Ji te tirê ku ez bawer dikim?

—Tu zanî, dixwazî bawer bikî, dixwazî bawer nekî.

—De tu dev ji van awayan berde, got Serdar dîsa.

Orhan bilêta xwe ya balafirê derxist û nîşanî wî da:

—Tu îcar bawer dikî?

Serdar bilêt ji dest girt û lê nihêrî:

—Tu dikî bi rastî herî?

—Erê, piştî nîvsaeta din divê ez herim. An na ezê ji balafirê bimînim.

—Ma haya mal jê heye ku tu diçî?

—Na, min ji kesî re negotiye. Min ji te re jî nedigot, lê tişt nabe, em hevalên hev in.

Serdar hin temî lê kirin û bi hev re çûne balafir-

xanê. Gava ku Orhan li balafirê siwar bû, Serdar got:
—Wî tiştê ku min ji te re got, ji bîr nekî ha!

Her du hevalan destên xwe ji hev re hejandin û Orhan bi hewa ket û çû.

Çaxa li balafirxana Stenbolê peya bû, kal û pîrek û sê xort hatine pêşiya wî. Pîrê xwe avêtê û bi girî got:
—Ooxx... Şukur, tu hatî lawê min. Maşale, maşale lawê min bû ye weke şêrekî.

Dû re peyayê kal û hersê xortan xwe avêtinê.
—Ooh Gud, vi trodde aldrig att vi skulle träffa dig igen (1), got peyayê kal.

Ew dê û bavê wî û hersê birayên wî bûn.
—We ji ku zanî bûn ku ezê îro bêm, got Orhan bi ecêbmayî.
—Vi visste, got bavê wî. Det är Gud som meddelar oss (2).
—Tu ji ku hînî swêdî bû yî? pirsî Orhan bi şaşmayî.
—Hemma pratar vi svenska (3), got diya wî.

Bavê wî yekî bejinkurt bû. Porê xwe yê spî li ser piştê şe kiri bû. Berçavkeke doxdarînî û hebekî reş li ber çavan bû û her dikeniya. Diya wî bi du tiliyan bi ser bavê wî diket. Berî ku Orhan ji welêt derkeve, diya wî sernixumandî bû. Lê niha tu tişt li serî tune bû; serserqot bû. Kirasekî kurt û vezelekî milkurt lê bû, zeyif bûbû û herdu gepên wê kort çûbûn. Ne dê,

ne jî bavê wî ku ne ji lixwekirina wan biwa zêde nehatibûn guhertin. Lê birayên wî? Orhan tenê yê mezin naskir. Ku birayê wî yê mezin resimê xwe jê re neşandi biwa wî ew jî nas nedikir.

Hersê bira jî bi ser wî diketin. Yê piçûk ji herdiwên din dirêjtir bûbû. Bejna wî zirav bû û katek kincên reş lê bû. Herdiwên din jî heryekî katek kincên spî lê bûn û solên rengomengo di lingên wan de bûn.

—Êê, we ji ku zanıbûn ku ezê îro werim, got Orhan bi dengekî nîvgirî û bi hêvî.

—Me zanî bû, me zanî bû, got bavê wî. Erê tu ji Xwedê bawer nakî, lê wî ji me re got.

Dîsa wan yek bi yek Orhan hembêz kirin.

—De, em herin, got bavê wî, ancax em bigihîjin ser otobusê.

Hemû bi hev re ber bi termînala otobusê ve meşiyan; li otobusê siwar bûn û berên xwe dane Diyarbekrê.

Di rê de diya wî ji aliyekî, bavê wî ji aliyekî û birayên wî ji aliyekî ve di pencereyên otobusê de bi destan der û dor nîşanî wî didan û digotin:

—Binihêre, me ji te re dinivîsand û digot welatê me xweş bû ye, bû ye cenet, te bawer nedikir. Esker mesker nemane, polîs nemane, tu kes hevdu nakujin, herkes ji hev hez dikin. Ma ne te jî wisa dixwest? Binihêr, binihêr bê çiqas xweş bû ye.

—Erê Wele, got Orhan. Welatê me ji Swêdê jî xweştir bû ye.

—Lo lo! Tew tu bajarê me bibînî!

Saet nehê êvarê otobusa wan li bajarekî sekinî. Bajar wêran bû û xaniyên bajêr yên bilind ji şûna gulan bûbûn weke seradê.

—Ev e bajarê me yê weke cenetê? got Orhan bê hêvî. Çima we li min wa kir, çima we ez xapandim?

Bavê wî,

—Na lawê min, got. Ev Bêrûdê ye, Lubnanê... Xelk li vir hevdu dixwin, herkes bi hev ketine, herkes hevdu dikujin. Ev jehrtêketiya Bêrûdê ye!

Orhan şaş û ecêbmayî mabû.

—Ku ev Bêrûdê be çima otobus di vir de diçe?

—Ew çîrokeke dûr û dirêj e lawê min, got bavê wî. Bi xêr ku em bigihîjin mal ezê ji te re bibêjim.

Gava ku Orhan li birayên xwe zîvirî ku tiştekî ji wan bipirse, nihêrî ku di şûna hersê birayên wî de hersê xwişkên wî rûniştine. Serê xwe vir de zîvirand, wir de zîvirand, lê birayên xwe nedît.

—Ev xewn e, got bi xwe xwe. Ev dîsa weke hercar xewn e!..

Otobusa wan gihîşte Diyarbekir. Çaxa ji otobusê peya bûn û ber bi mal ve meşiyan, bavê wî got:

—Me ji te re negot, ku bajarê me bû ye cenet. Binihêr, ne weke cenetê ye?

Bi rastî jî bajar weke buhuştê bû. Bedena wê ji

nû ve hati bû lêkirin, hemî xanî spî bûn û herder hêşnayî bû. Merov, dikan, otomobîl hema hertişt hatibû guhertin.

—Erê Weleh, got Orhan. Bajarê me bû ye weke cenetê.

Hersê xwişkên wî dısa bûbûn hersê bira. Birayê wî yê biçûk got:

—Te ji me bawer nedikir. Ka polîs? Ka esker? Ew çûn, dema wan çû. Dewleta wan jî çû... Em niha bi xwe xwe ne, em bi xwe dewlet in.

Ji bo Orhan sê rojan li dehol û zurnê ket, berx û beran hatin serjêkirin û şekir li zarokan hate belavkirin. Roja çaran çar peyayên bejindirêj û di dest xwe de hatine mala bavê Orhan û bixêrhatinî danê. Piştî ku rûniştin, yekî ji wan peyan got:

—Em endamên hukûmeta Kurdısatanê ne û me bihîstiye ku te li Swêdê ekonomî xwendiye, ji ber vê yekê em dixwazin ku tu jî di hukûmeta me de cih bigirî.

Hîn berî ku Orhan bêje erê, an na, lawikek bi bayê bezê kete hundir û bi heyecan got:

—Apê Orhan, baz de! Xwe veşêre, esker hatin!

Hîn peyva lêwik di dev de bû, li telefonê ket. Lê kesî bersiv neda. Telefonê her dikire zire zir. Orhan rabû ser xwe ku baz de, ew herçar peyan jî rabûn û kîmlikên xwe nîşanî wî dan:

—Em polîs in, gotin. Tu çûyî Swêdê û tu li dijî dewleta me xebitî yî. Bide pêşiya me!

XXX

Hingî Orhan ji xew hol bû, di karyole wer bûbû, lê li ser wê erdê cemidî dîsa laşê wî di xwêdanê de mabû. Saeta wî jî her dikire zire zir. Saet li ser heftê sibehê lêdixist. Bi hêrs destê xwe li saetê xist û axînek kûr kişand. Rabû ser xwe ku here daşirê, posta wî hat. Du name, dîploma wî ya ekonomî, kovarek û du rojname jê re hatin. Yek ji wan naman jê re ji mal hati bû. Wî bi lez ew name vekir û xwend. Gava ku di namê de bihîst ku birayê wî hatiye berdan, bi lez kincên xwe li xwe kir û çû mala Serdar.

Serdar hê di xew de bû, bi tena derpîkê kinik rabû û jê re derî vekir.

—Çi ye, te xêr e vê sibehê, got Serdar.

—Tu zanî, Serdar...

—Ez çi zanim? Te dîsa xewnin dîtiye?

Orhan keniya:

—Erê.

Serdar jî bi ken got:

—Weleh tu li me bûyî Oblomov. Dawiya xewnên te nayên bavo. Xêra Xwedê yek derketa û xewnên te binivîsanda û navê pirtûka xwe jî bikira, Xewnên Orhanov. Êê, de ka bêje, tu dîsa dibûyî serokwezîrê Kurdistanê, an wezîrê kulturê.

Orhan keniya, bi hev re derbasî mitfaxê bûn û ji xwe re taştê çêkirin. Heya derengê rojê li ser xewna

Orhan peyivîn, li ser rewşa xwe ya li Ewropa û li ser rewşa welêt peyivîn.

Ez wa zanim, heya niha jî tişt safî nekirine, lê her dipeyivin û xewnan dibînin.

---

(1). Oo Xwedêyo, me qet bawer nedikir ku emê carek din te bibının.
(2). Me zanı bû. Em bi her tiştı zanin. Xwedê haya me digihınê.
(3). Li mal em bi swêdı dipeyivin.

# Lawikê Nexweş

Gava ku ketin nav nivînan, dîsan dengê giriyê lêwik hat. Diya wî zû ji nav nivınên xwe rabû û pêsîra xwe xiste dev. Lê, lawik bi pêsîrê jî aş nebû, qet devê xwe neda pêsîrê. Wisan digiriya, ku carina lal dibû. Jinikê lihêfa mêrê xwe ji ser çavên wî avêt û bi ser de qîriya:

—De rabe ha! Qe tu rabe awakî ji vî lawikî re çê bike! Qe rabe xwe biavêje camêrna! Ev lawik mir!..

Mêrik vê carê erza jina xwe neşikand, zû ji nav nivînan rabû û hebekî lampe bilind kir. Cigarek qalind pêça, vêxist û li ber serê lêwik rûnişt. Dû re destên xwe dirêjî lêwik kir, ji jinikê stend, bir ber lampê û lê nihêrî. Ruyê lêwik zer bûbû. Gava ku digiriya, wek darekî, hişk dibû. Lê giriyê wî ê îşev ne wek giriyê tu şevan bû. Ji giriyê her roj û her şev cihê bû.

Dilê mêrik bi rewşa wî şewitî û bê hemdî wî çend dilop hêsir ji çavan hatin. Hêstirên ku ji çavên wî hatin di ser riwê wî ê bi rih de herikîn ser simêlê wî ê gur û qalind. Ji roja ku wî bîr biri bû heya bi îro tu caran negiriyabû. Ji xwe li cem wî girî ji peyan re şerm bû, girî karê pîrekan bû. Lê ew di wê deqîqê de têgihişt, ku peya jî kanin bigirîn û dilên wan jî diêşe.

Jina wî ya ku ji kerban û ji girî nikarî bû di cihê xwe de rawistiya, ber bi wî çû û bi stûxwarî jê re got:

—Ma tu dibêjî em çawan bikin lo? Em çi awayî ji vî lawikî re çê bikin?

Mêrik serê xwe vir de û wê de hejand û bi keser got:



—Ez nizanim!

Jinik îcar bi dengekî bilind giriya û got:

—Ma ku tu nizanibı, kî dê zani be? Ma ezê bi vê pepûkiya xwe zanibim?

Mêrik tu bersiv neda, weke zarokan kirîskîn û bi pişta destê xwe hêstirên xwe paqij kir. Ji bo ku giriyê xwe bisekinîne cigarek vêxist. Lê giriyê wî nesekinî. Çend caran diranên xwe qiriçand û bi pistînî tiştin got. Hersê jî digiriyan, lê yê mêrik tenê hêsir ji çavan dihat. Dengê giriyê wî weke yê jina wî û yê layê wî nedihat. Piştî ku cigarek din jî vêxist, got:

—Mîratê niha ku gund biwa, min ê biçûya xwe biavêta camêrna, qe çawan biwa me dê awak çê bikira. Lê bajar e, ka ezê xwe biavêjim kê ha! Ezê çi bikim?

Bîskê deng ji herduwan hate birîn. Lê lawikê nexweş her digiriya. Carina ji nişkê ve qîrîn pê diket û li ser piştê lal dima.

Şev dereng bûbû. Saet sê-çarê şevê bû. Donê ku di lampa wan de mabû dawî hat. Lampê sê-çar caran kir pit-pit û agir bi fitîlê ket; Pir tê de neçû vemirî, hundirê xênî bi derbekê re tarî bû.

Gava ku lampe vemirî, mêrik rabû ser xwe û çû derî vekir, da ku bi şewqa ronahiya der ve, hebekî hundir rohnî bike. Barana ku dihat hîn xurtir dibû. Ewr ji jor de weke zihakî ber bi rojava de dikişiya. Gire-gir û şîrqe-şîrqe asmana qidûmê mirovan dişikand. Ji xwe her carekê ku ewran birûsk vedida, weke şîşek sor li dilê mêrik keve, çavên wî fireh dibûn û tirsa mirinê dikete dilê wî.

Mêrik dîsan derî girt û bi destpelînkê li hestê xwe geriya. Hestê xwe li ber nivînê xwe dît û vêxist. Jina wî lawik di dest de bû û xwe li quncika xênî kiri bû qomik. Lawikê nexweş her digiriya. Ew çend rojên wî bûn, ku pêsîr nexisti bû devê xwe. Carinan ku diya wî bixwesta pêsîrê têxe dev, qîrîn pê diket, digiriya û li ser piştê lal dima.

Gava ku mêrik di bin şewqa rohniya heste de, jina xwe û lawê xwe di wê rewşê de dît, weke ku agir têkeve dilê wî, dîsan ji kerban hêstir ji çavên wî hatin. Dû re daqûl bû û bi heste sobe dada. Ji xwe êzingên wan ên ku mabûn hew ew bûn. Du roj berê ew êzing xisti bûn sobê û li bendî rojek pir sar û dijwar sekinî bûn. Sar û seqema herî dijwar hîn mabû, lê ji ber ku don di lampê de nema û hundir tarî bû, mêrik ji bo ku hebekî hundir rohnî bike sobe pêxist. Deriyê sobê jî vekirî hişt, da ku hundir baş rohnî bibe. Êzingên di sobê de hişk bûbûn. Gava ku mêrik agir berdayê, alawiyê avêt ser çavên wî û hin ji porê wî û simêlê wî kizirî.

Di wê bîskê de hundir piçekî germ û rohnî bû. Şewqa agirê sobê li dıwêr wek hêlkanê dihejiya. Mêrik ber bi jina xwe çû, li ser tûtikan rûnişt, lawik ji destên wê girt û bi dilşewatî lê nihêrî.

Spîkên çavên lêwik zer bûbûn, çavên wî carina fireh dibûn û dihatin girtin. Wer ku giriya bû dengê wî keti bû. Mêrik serê xwe hejand û got:

—Weleh ev lawik dê bimire, xelasiya wî tune!

Jina wî peyva wî birî:

—Qe bila devê te ji xêrê vegere, çi ye tu qala mirina lêwik dikî!

Mêrik tişt negot, lawik da destê jinikê, rabû ser xwe û cigara xwe bi agirê sobê vêxist. Piştî ku çend

hulm li cigarê xistin, li jina xwe zîvirî û got:

—Ez dê rabim herim mala cîranê Seydo hin êzing û don deyn bikim; ev soba me biqede, em dê perîşan bibin.

Jinikê bi dengekı nıvgirı got:

—Tu zanı, ku te bivê, here.

Her ku diçû şîrqîn û gire-gira ewr zêdetir dibû. Dengê xuşîna baranê weke dengê xuşîna çemekî ji der ve dihat. Hîn ew wilo bi hev re dipeyivîn, dilopek li ser serê mêrik ket. Mêrik pêşî bawer nekir ku dilop e. Piştî ku destê xwe da serê xwe, têgihîşt, ku bi rastî jî xanî dilopan dike. Di hundirê demek kurt de, dilopên xênî zêdetir bûn. Tew ji qorziya xênî weke ku mirov bi kulman avê birijîne, av herikî hundir. Jin û mêr bi lez firaxên ku hebûn danîn ber dilopan, lê firaxên wan têra hemû dilopan nekirin, pir dilop bê firax man.

Mêrik qapûtekî leşkeran ê kevin avêt nav milên xwe û ji jina xwe re got:

—Ez herim bê ez hinek don deyn nakim; ku dinya li me rohnî bibe, dibe ku Xwedê rêkê nîşanî me bide.

Jinikê piştî ku keserek kûr kişand, got:

—Weleh nakeve serê min, ku tu kes vê şevê li te derî vekin, lê dîsan jî here, dibe ku camêr bi xwedî ûcdan derkevin; ezê jî rabim herim ser xênî du gundoran lêxim û hinek ka lê bireşînim, dibe ku hinekî dilop bisekinin.

—Baş e, got mêrik bi derd û derket der ve.

Piştî ku mêrik ji hundir derket, jinikê lawik di nav lihêfekê de pêça, kevnikek avêt nav milên xwe û derket der ve. Baran hîn xurtir bûbû, mirov digot qey bi kûzan tê. Ji ba û baranê mirov nikanî bû çavên xwe vekira. Jinikê teneka kayê xist destê ras-

tê û bi mêrdewanê (sêlim, derence) de bi jor ket. Çaxa ku gava xwe avêt ser xênî, kevirê bin lingê wê şemitî û jinik ji jor de weke gomagî li ser dika çimento, ya li ber devê derî li erdê ket. Serê wê ji hev belav bû, bû meyt û li erdê ma.

Piştî deh-panzdeh deqîqan, mêrik bi çend qutik dar û bi şûşek don vegeriya û di deriyê paşiya xênî de kete hundir. Ku kete hundir, zû qapûtê xwe yê ku ji baranê şil bûbû ji xwe kir, hestê xwe ji bêrîka xwe derxist û vêxist.

Ji dengên dilopan pê ve tu deng ji hundir nedihat. Mêrik şaş û ecêbmayî ma. Hestê xwe ê vêketî xist destê xwe ê çepê û ber bi lihêfa lawê xwe çû. Dît ku lawik bêdeng, li wê erdê, di nav lihêfê de dirêjkirî ye. Pêşî di dilê xwe de got; "Ox, qe wa bîskê xew kete çavan", dû re weke ku tiştek niqutî dilê wî hêdî ji bo ku lêwik hişyar neke, lihêfa wî ji ser çavan hilanî. Lêwik qet xwe tev nelivand, weke darekî hişk, rep ma. Mêrik hema rahiştê û bi qêrîn bang jina xwe kir. Gava ku tu deng ji der ve nehat, mêrik digel lêwik bazda der ve û dîsan bi qêrîn bang kir:

—Xatêê... Xatêê... Malşewitiyê lêwik can da ye!

Hîn peyva wî di devê wî de bû şîrqınek ji ewr hat û birûskê veda. Bi vedana birûskê re, çavên wî li jina wî û xwîna ser wê ket. Hema bi derbekê re qîrînek jê hat û xwe tevlî lawê xwe avêt ser wê.

# Hemîdo û Avûkat

Hemîdo li deriyê daîra avûkat xist û kete hundir. Avûkat ji cihê xwe rabû, destê wî hejand û cih dayê. Dû re cigara xwe ya Marlboro ji çavîka masê derxist û dirêjî wî kir:

—Kerem bike, cigarê bikişîne, got bi ken.

Hemîdo cigarek ji pakêtê kişand û vêxist. Piştî ku du-sê hulm li cigarê xist, ji avûkat pirsî:

—Ma gelo rewşa lêwik çawan bû ebûkat beg? Ewê vê îfadê bê berdan an na?

Avûkat destê xwe avêt simbêlê xwe, hûrik hûrik pê leyist û bersiva Hemîdo da:

—Min ji te re carekê soz daye camêr... Vê carê ewê bê berdan.

Gava ku avûkat wilo got, Hemîdo ji cihê xwe rabû, ku destê wî maçî bike, lê avûkat destê xwe kişand û nehişt:

—Ez rice dikim Hemîd, got, em birayên hev in.

Hemîdo dîsa li cihê xwe rûnişt:

—Wisa kêfa min tê, ebûkat beg. Ji kêfan ez nizanim bê çi bikim. Axx... Ku di vê mehkemê de Seydo bihata berdan. Wele ez di van riyan de mirim, ez di bin deynan de şewitîm.

Avûkat destmala xwe ya kaxizî ji bêrîka xwe derxist û pozê xwe paqij kir:

—Lê bazara ku me kiri bû nabe, got. Divê ku tu pênc hezar lîrayên din jî bidî.

Gava ku avûkat welê got, ew kêfa Hemîdo hemî lê bû kul û derd. Ji hêrsan û heyecanê lerizî û çavên wî weke du fîncanên qehwê vebûn. Kîsikê xwe yê

titûnê ji bêrîka xwe derxist û bi lez cigarek pêça. Gava ku cigare dipêça, ji hêrsan tiliyên wî weke hêlkanê dihejiyan û bi qasî cigarekê jî titûna wî rijiya ser şalwarê wî. Ew cigare hestê xwe yê gazê vêxist û du hilmên kûr li ser hev lê xist. Dû re kursiya xwe ber bi masa avûkat ve kişand:

—Me berê bazara xwe bi deh hezaran kiri bû, lê te kir panzdeh û te soz da, te got, ku ezê lêwik bidime berdan. Lawik nehate berdan. Dû re te pênc hezarên din jî li min zêde kir û te got, ku çawa bibe, bila bibe ezê vê carê lêwik bidime berdan. Lê lawik nehate berdan. Va niha tu pênc hezarên ji li min zêde dikî. Ma ezê van peran ji ku bînim ebûkat beg? Ezê herim xwe biavêjim kê û peran ji wan deyn bikim? Ma tu kesên ku min pere ji wan nexwestibin mane? ..

Avûkat hebekî bi sert peyivî:

—Tu peran ji ku tînî bîne. Ger tu pênc hezar lîrayên din jî zêde nekî, dibe ku lawik vê carê jî neyê berdan.

Lawê Hemîdo du pirtûkên kurdî pê re hati bûn girtin. Ji bo herdu pirtûkan qala heft sal ceze dibû. Hemîdo ji bo ku lawê xwe bide berdan, tiştên ku ji destên wî dihatin dikir. Mala wan tê li Diyarbekrê bû. Lê ew ji bo îfada kurê xwe ji heftê carekê diçû Edenê. Ji ber ku lawik li Edenê hati bû girtin û diva bû ku îfada wî li Edenê bihata dayin. Avûkatê ku girti bû hertim li wî holê dikir. Her car digot "A ezê vê carê kurê te bidime berdan" û carê pênc hezar lîra lê zêde dikir û lawik nedihate berdan.

Dibû ku jî berdana lêwik ne di destên avûkat de

bû. Lê her dem Hemîdo dixapand û digot "Bi soz ezê lêwik bidime berdan". Cara pêşî bazara wan deh hezar lira bû, lê dû re avûkat lê zêde kir û kire bîst. Her carê ku lê zêde dikir, digot "Ezê lêwik bidime berdan". Hemîdo jî ji bo berdana kurê xwe diçû xwe davêt nas û dostan, pere ji wan deyn dikir û tanî dida avûkat. Lê hêviya Hemîdo ya mezin di vê carê de bû. Gava ku vê carê jî avûkat behsa pênc hezar lîra kir, Hemîdo di dilê xwe de got:"weleh vê carê jî lawik nayê berdan". Piştî ku hebekî hizirî:

—Baş e, got bi dengekî nizim, ezê vê carê jî qebûl bikim. Lê ku lawik vê carê jî neyê berdan?

Avûkat hebekî kursiya xwe bi paş de kişand, herdu lingên xwe avêtin ser hev û got:

—Yaho min ji te re carekê soz daye. Soza min soza mêran e"! Ma qey tu ji min bawer nakî?

Wextî Hemîdo bigota, te berê jî digot "Soza min soza mêran e", lê negot, rabû ser xwe û jê pirsî:

—Îfada wî saet di çi de ye?

Avûkat milê çakêtê xwe hebekî hilda jor û li saetê mêze kir.

—Îfada wî saet di sisiyan de dest pê dike, got. Saet niha deh e. Piştî pênc saetên din divê em li wir hazir bin.

Hemîdo xatir jê xwest û ji hundir derket.

Hemîdo yekî dirêj û zeyif bû. Emrê wî an çil hebû an tune bû. Lê porê wî giş spî bûbû. Ne tenê porê wî, her wisa simbêl û birûyên wî jî spî bûbûn. Ku ne ji lixwekirina wî ya Diyarbekrî biwa, mirov dê bigota, kalekî şêst salî ye.

Wî bi wî awayî serê xwe xiste ber xwe û bi dilkulî ber bi mala dostê xwe ve meşiya. Gava ku gihîşt ber mala dostê xwe û kete hewşê, dostê wî digel jin û zariwên xwe li hewşê, li bin siya mêwê rûniştî bûn. Ku ew çav li Hemîdo ketin, hemî ji cihê xwe rabûn û cih danê. Piştî ku Hemîdo rûnişt, jinikê berî mêrê xwe jê pirsî:

—Kekê Hemîdo, ma rewşa lêwik çilo bû gelo?

Hemîdo herdu destên xwe ber bi hewa vekirin:

—Ez li ber rehma xwedê me.

Mêrik ji cihê xwe rabû û cih da Hemîdo:

—Hela tu cihê xwe xweş bike kekê Hemîd, got û li jina xwe zîvirî. Keçê niha kekê Hemîdo birçî ye, hela tu malhaziriyekê jê re bîne.

Jinikê destên xwe danî erdê ku rabe ser xwe, Hemîdo nehişt:

—Na xwişka min, got. Tu li cihê xwe rûnî. Ez têr im.

—Ma tu çayekê jî venaxwî?

Hemîdo destê xwe yê rastê danî ser sînga xwe, serê xwe tewand û got:

—Xwedê zêde bike. Weleh dilê min naçe tu tiştî. Lê tenê riceke min ji we heye.

Mêrik bi pêş de hat:

—Estexfurula kekê Hemîd, got, em birayên hev in. Tiştê ku tu dixwazî ser serê min û ser çavên min, lê tenê ku ji destên min bêt.

Hemîdo qederê deqîqekê fikirî:

—Wele pênc hezar lîra ji min re lazim e, got bi stûxwarî. Hêda lêwik îro saet di sisiyan de ye. Wî bênamûsê ebûkat dîsa pênc hezar lîra li min zêde kir. Ku ez îro peran negihînimê berdana lêwik tune ye.

Qala heft sal ceze dibe.

Mêrik ji jina xwe nepirsî, bê tu perên wan li mal heye an na, weke ku milyonên wî li mal hebin, got:

—Wey ser serê min û ser çavên min. Mirov carekê li hev diqewime. Jibo Seydo tiştên ku ji destên min bên ezê bikim. Ferqa Seydo û Silêman li ba min tune ye. Li ba min ew jî weke Silêman e. (Silêman lawê wî bû)

Piştî wan peyvên mêrik, hêvîyek ji Hemîdo re çê bû. Dîsa ew kul û derd hemî ji bîr kir û şûna wan kêf û şahiyê girt:

—Çer ku ez vegerim ezê perekên we ji we re poste bikim, got bi dilşahî.

—Hela hişbe lo, jehr di nav peran de be. Bila lawik bê berdan, bavo ji min re tu pere nelazim e. Dû re rabû ser xwe û çû hundir. Piştî du-sê deqîqan jina wî jî da dû, çû hundir û jê pirsî:

—Kuro ma ka emê evqas pere jê re ji ku binîn? Ma tu pere li mal hene?

—Na wele, evqas pere tune ye. Lê çi dibe bila bibe, divê ku em jê re peyda bikin. Tu nizanî bê Hemîdo çi peya ye. Ku ez lê biqewimiyama wî dê canê xwe ji min re feda bikira.

—Ku evqas pere li mal tunebin, ka tu dê jê re ji ku peyda bikî?

—Ma gelo dê li ba cîranê me Elî tune be?

—Ku tu bi a min dikî li ba wî hebe jî jê nexwaze, ew dinya nediya wê me di koda ribabê ke. (Yanî ewê ji herkesî re bibêje).

Mêrik tiliya xwe ya eşedê danî ser cênîka xwe û

hebekî fikirî:

—Ma dê wekî din li ba kê hebe, got dû re. Gelo ez ji kê bixwazim?

—Ma dê li ba cîranê me Bozo tune be gelo?

Mêrik herdu destên xwe li hev xistin:

—A weleh dê li ba wî hebe, got bi ken. Wî erdê xwe yê li gund firotiye. Ku li ba wî hebe, ew ji min re nabêje na.

—De zû here, berî ku ew ji mal derkeve, got jina wî û çû çaydan tijî av kir.

Mêrik bi kêf derket der, çû ba Hemîdo; destûra neh-deh deqîqan ji wî xwest û ji hewşê derket.

Hemîdo di çîrokê de derxisti bû. Lê dê çibikira? Ger ku ew ne di wê rewşê de biwa, wî tu caran dostê xwe fedîkar dernedixist.

Piştî ku mêrik ji hewşê derket, jinik di gel siniya xwarinê hate bin siya mêwê, ba Hemîdo:

—Te dê zehmet nekira xwişka min, got Hemîdo bi devkenî.

—Ma çi zehmeta wê heye heye kekê Hemîd? Me ji te re tu berx ser jê nekiriye. Weleh malhazirî hew ev bû, divê ku tu li qusûra me nenihêrî.

—Ezê çi li qusûra we binihêrim? Yên ku li qusûra min nenihêrin hun in.

Dû re li ber siniya xwarinê çarmêrkî veda û xwar. Piştî ku têr xwar, av vexwar û ji siniyê vekişiya:

—Xwedê zêde bike, min têr xwar, got.

Jinikê dîsa siniya xwarinê ber bi wî def da:

—Çima kekê Hemîd, ji bo çi te nexwar? Ma

qey xwarina me ne xweş bû?

Xwedê zêde bike, got Hemîdo dîsa. Weleh min têr xwar. Xwarina we ji serê min û bavê min zêde ye.

Piştî ku Hemîdo cigarek pêça û vêxist, mêrik hat, silav da Hemîdo û xwe bi kêf da ser mînderê. Hemîdo cigarek pêça, dirêjî wî kir û bi stûxwarî got:

—Mehmûd, divê ku tu li min bibûrî, tu li qusûra min nenihêrî. Ez çi bikim, ku ez ne di vê rewşê de biwama, min tu caran tu fedîkar dernedixist. Lê ez mecbûr im, ku biraziyê te xelas bikim.

Mehmûd destê xwe xist bêrîka xwe, ew pênc hezarên ku ji cînarên xwe deyn kiri bû, dirêjî Hemîdo kir:

—Ez rica dikim kekê Hemîd, got, ne hewce ye, ku tu evqasî xwe kêm bibînî. Em birayê hev in. Ma bavê te hindikî alîkarî bi bavê min kiri ye?

Hemîdo ew pere ji destê wî girt, spasên xwe jê re got û cigareke din pêça û vexist. Piştî ku cigara xwe kişand, destûra xwe û rabûnê jê xwest:

—Ma gelo kêrek we ya zêde tune ye, got. Belkî ez ji xwe re li bajêr pê fêkî mêkî bixwim.

Jinikê bazda hundir, kêrek biçûk anî û da destê wî. Hemîdo ew kêr ji dest jinikê girt û xist bêrîka çakêtê xwe:

—Bi xêr ku ez carek din bêm ezê kêrika we ji we re bînim, got.

—Carek din çawa, got mêrik. Hun îşev mêvanê me ne. Bi xêr çer ku kurik hate berdan rast werin vir; bila kurik xwe rihet bike. Ev serê du mehan e, ku girtiye, niha ew pir westiya ye û aciz bû ye. Emê

îşev şîvekê bi hev re bixwin.

Hemîdo rabû ser xwe û destên wan hejandin:

—Bi xêr ku lawik bête berdan em îşev mêvanê we ne, got û derket û çû.

Piştî ku Hemîdo çû, mêrik lawê xwe şand bajêr ji bo ku hin goşt û hêşnayî bikire.

—Weleh heqê vî bênamûsê ebûkat kuştin e, got jinikê ji mêrê xwe re. Ma îcar ev çi ye, ku her carê pênc hezaran li vî belengazî zêde dike. Derewan jî lê dike, dibêje, ezê lawê te bidim berdan.

Mêrik serê xwe hejand:

—Ne keçê tu bi vê hukûmeta bêbext nizanî. Ev hukûmet hukûmeta bêbavan e! Bi rewşa feqîr û belengazan qet nizan e!

Êdî hew peyivîn. Mêrik cigarek vêxist, çakêtê xwe avêt nav milên xwe û derket der ve. Lê, jina wî bi dû de bang kir:

—Mehmûd, îro hebekî zû were mal ha! Dibe ku kekê Hemîdo û lawik zû werin.

Mêrik weke ku di ber xwe de bipeyive:

—Erê erê, got, ezê zû vegerim.

Gava ku Hemîdo gihîşt ber avahiya avûkat, saet bûbû du. Hemîdo destmala xwe ji bêrîka xwe derxist, xwêdana ser çavên xwe pakij kir û bi derencan de bi jor ket; çû ber deriyê oda avûkat, li derî xist û kete hundir. Avûkat pirtûkek mezin di destên wî de bû û lê dinihêrî. Gava ku Hemîdo kete hundir, avûkat pirtûka di destên xwe de danî, rabû ser xwe û

destê xwe da wî:

—Maşalê te pere anîbin, got bi dengekî ne zelal. Hemîdo di mana "erê" de serê xwe hejand û ew pereyên ku anî bûn dirêjî wî kirin.

Piştî ku avûkat ew pere hejmartin, çavîka masê kişand û xistiyê. Dû re li Hemîdo zîvirí:

—Divê ku em hêdî hêdî herin, got, tenê nîvsaeta me ma ye.

—Ma çi jê dikeve serê te ebûkat beg? got Hemîdo bi stûxwarî. Ma tu dibê wê lawik bê berdan vê carê?

—Erê erê, got avûkat. Ez texmîn dikim ewê bê berdan.

Paşê rabûn ser xwe, avûkat çentê xwe xist destê xwe, Hemîdo da dû wî û di derencan de daketin jêr; Li otomobîla avûkat siwar bûn û berê xwe dane dadgehê.

Hemîdo ji hêrsan dilerizî. Mûyên canê wî lê gij bûbûn, çavên wî fireh bûbûn û firnikên pozên wî radibûn û dadiketin. Wî hêdî destê xwe dirêjî bêrîka çakêtê xwe ya hundir kir û du-sê caran destê xwe di ser kêra xwe de bir û anî. Di dilê xwe de got:"Ku îcar jî lawik neyê berdan, ezê vî avûkatî bidim ber kêran, eyn ez zanibim ku ezê bême bi dar de kirin".

Gava ku ketin hundir avahiya mehkemê, wir tijî mirov bûn. Di hêwanê (eywan, salon) de du-sê caran çûn û hatin. Hemîdo kîsikê xwe derxist û cigarek pêça. Piştî ku cigara xwe vêxist, ji avûkat pirsî:

—Ma tu dibê wê vê carê lawik bê berdan ebûkat

beg?

Avûkat li ber pencerê bû, li der ve mêze dikir; weke ku dengê Hemîdo neçûyê, bêdeng ma.

Hemîdo dîsa got:

—Ma çi jê dikeve serê te, ebûkat beg? Ma tu dibê ewê vê carê bê berdan?

Berî ku avûkat deng bike, mehkeme vebû. Avûkat û Hemîdo bi lez ketin hundir. Herdu destên lêwik li ser hev bûn û di orta du eskeran de, di huzûra hakîm û sawcî de rawesta bû. Gava ku lawik çav li bavê xwe ket, herdu destên xwe jê re bilind kirin û got:

—Bavo, ma te çi kir?

—Hiş be, gotin leşkeran bi dengê nizim, lê bi sert.

Hemîdo şewqa wî di destê wî de bû û bi heyecan li wan du-sê gotinên ku avûkat gotin, guhdarî kir. Avûkat ew tiştên ku ji Hemîdo re goti bû, ezê bibêjim, qet negotin.

Bi wî awayî, bi biryara dadgehê heft sal ceze li lawê Hemîdo hate birîn.

Hingî Hemîdo bû weke dêhnan. Hêrs bû û lerizî. Mûyê canê wî lê gij bûn, çavên wî fireh, mezin û sor bûn. Mirov digot, a wextî çavên wî ji nava serê wî bipengizin. Destê xwe hêdî bir ser kêra di bêrîka xwe de û wextî êrîş bibira avûkat. Lê nekir, li lawê zîvirî û bi dengekî nîvhêvî got:

—Ez bavê te me, tu hîç meraqan meke! Ez zanibim ku serê min jî tê de here ezê te bidime berdan. Li xwe miqate be lawê min!

Lêwik xwest ku tişekî ji bavê xwe re bibêje, lê eskeran nehiştin, bi milên wî girtin û ew kişandin hundir.

x x x

Piştî wê bi mehekê, Hemîdo li Edenê, ji otobusê peya bû. Wê êvarê ew çû mala dostê xwe Mehmûd. Sibehê zû ku rabû ser xwe, bêyî ku taştê bixwe, rast çû ba avûkatê xwe. Ser masa avûkat dîsan wek hercar tije kaxiz û pirtûk bûn. Lê ji berdêla ku ew li pirtûkan binihêre, pere dihejmart. Gava ku çav li Hemîdo ket, ew perên di destên xwe de xistin çavîka masê, rabû û bixêrhatinî da Hemîdo. Hemîdo destê wî hejand û bi destê çepê ew kêra kalanî, ya ku ji mal anî bû, di zikê wî de çikand. Çokên avûkat sist bûn û ew laşê wi yê giran li erdê ket. Gava ku ket jî, serê wî li qorzîka masê ket û bi yek carê ve can da.

Hemîdo zû bi milên wî girtin û ew kişande paş masê. Dû re çavîka masê vekir, ew pere jê derxistin, xistin bêrîka xwe û derket der ve.

Sê-çar meh di navberê de derbas bûn nebûn, lawê Hemîdo hat berdan. Dibêjin, ku ba saloxan, Hemîdo bi peran sawcî bertîl kiriye û lawê xwe daye berdan.

# Kevoka Dîlan

Sibehê zû, gava ku Dîlan derket der ve, ku here dibistanê, çavên wî li hewşê, li bin darê, li kevokekê ket. Wî pêşî nizani bû ku kevok e. Bi rastî jî mirov nizanî bû kevok e. Ji ber ku xwe li ber darê melisandi bû, stûyê wê bi aliyekî de xwar bûbû û ling û baskên wê bi aliyê din de... Lê ji bo Dîlan her yek bû. Kûçik, pisîk, çivîk, kevok û her heywan... Wî bi xwe tu ferq nedixiste navbera heywanan. Dibû ku hin heywanên ew jê aciz bû hebûn, lê dîsan wî ji heywanan hez dikir.

Dîlan hêdî hêdî xwe qilûs kir, xwe da ser pozikên solên xwe û ber bi kevokê ve meşiya. Kevokê xwe du-sê caran tev livand ku bifire, lê nikanî bû bifiriya, çend caran kire çivînî û di cihê xwe de rawestiya. Dîlan îcar hêdî di paş darê de çû û ji nişkê ve çakêtê xwe avête ser wê. Dû re xwe avêt ser wê û ew girt. Gava ku wî kevok girt û xiste nav destên xwe, dît ku lingekî wê şikestiye. Gava ku dîlan çav li lingê kevokê yê şikestî ket, pir li ber xwe ket û ji wî tirê, ku wî lingê kevokê şikestand. Lê gava ku çav li xwîna wê ya hişk ket, hingî têgihîşt, ku ne wî lingê kevokê şikandiye. Ne tenê lingê kevokê, lê baskê wê jî

şikestî bû.

Dîlan çentê xwe ji pişta xwe kir, li bin darê rûnişt û bi cebir andina ling û baskê kevokê bilî bû. Dû re rahişt kevokê û çentê xwe, dîsan bi paş de vegeriya hundir û çû mezela mêvanan. Çentê xwe danî ser masê, çakêtê xwe avêt ser kursiyan û beyî ku solên xwe ji pê bike derbasî ser merşan bû. Ew pûrta ku li dor birînê peritand û dîsan bi cebirandina birînên kevokê bilî bû.

Ling û bask li kevokê xilxilî bûn. Lê bask bi parîkî ji lingan çêtir bû. Piştî ku Dîlan pûrta li dor birînên kevokê peritand, kevok danî ser masê û rabû ku here hin hevîr û rûn bîne ku pê ling û baskên kevokê bicebirînê. Ew vê yeka han ji pîrika xwe hîn bûbû. Hema ku pizikek, an birînek di giyanê kê de bihata, pîrika wî hinek hevîr dikir, dû re hinek rûn li nav dixist û datanî ser pizik û birînên wan û bi paçikekî, hişk girê dida.

Piştî ku Dîlan bi du-sê gavan ji kevokê bi dûr ket û çû ber derî ku derkeve here mezeleke din, kevokê firek da xwe û xwe li ser textê firaxan danî. Dîlan ji kêfan kirî bifiriya, di cihê xwe de rawesta û li kevokê nihêrî. Kevokê jî li wî nihêrn û nikulê xwe du-sê caran li tacikekê xist. Lê di livandina kevokê de xuya bû, ku dixwest fireke din jî bide xwe. Dîlan hêdî kursî kişand bin text, çû ser kursiyê û herdu destên xwe direjî kevokê kirin. Gava ku wî destên xwe direjî kevokê kirin, kevok çend caran perpitî û ji ser text firiya, hingî text ji jor de, di gel firaxan hate xwarê û her firaxek bi derekê de bela bûn. Ku dengê teqereqa firaxan çû diya wî, wê ji mezela din bazda û

hate mezela ku Dîlan lê bû. Gava ku çav li Dîlan, rewşa wî û firaxên hundir ket, weke dêhnan lê hat, herdu çavên wê fireh bûn û ji hêrsan laşê wê lerizî. Ew sibehê zû rabûbû ser xwe û bi malişti û paqijkirina malê ve bilî bû. Bi hêrs, bi ser Dîlan de qîriya:

—Kuro, ma ev çend car in ez ji te re dibêjim, bes e bi van kevokan re bide û bistîne? Ma qey tu nizan î, ku ruyên kevokan ne bi xêr e? ..

Dîlan heşt salî bû, lê ji ber ku qama wî kurt bû, di heftan de xuya dikir. Porê wî reş û çavên hêşin bûn. Du şanik li ser ruyê wî hebûn. Yek jê li bin çavê wî yê çepê, ya din jî li ser çenga wî bû. Gava ku li mirov dinihêrî, mirov digot, qey dikene.

Diya wî ber bi wî çû, bi milên wî girtin, ew hejand û bi hêrs got:

Tew dikene jî, lê, ma qey xema te ye? Ma qey tu û bavê xwe malê paqij dikin û firax û kincan dişon?

Lê wê bi xwe jî zanî bû, ku Dîlan di rewşên welê de nake û ji xwe ew welê dixuye.

Wê Dîlan berda, çû ku rahêje kevokê û bavêje der ve, lê kevok ji nav destên wê firiya û xwe li ser kulînê danî. Çer ku xwe li ser kulînê danî, zelq kir. Ku diya Dîlan çav li zelqê ket, hîn bêtir hêrs bû:

—Hah... Ev ji min kêm mabû ha!...

Rahişt melkesê û bi êriş çû ser kevokê. Lê Dîlan xwe avêt destên wê, bi dengekî bilind û bi nîvgirî got:

—Dev ji kevokê berde, dev ji kevokê berde... Bê

ûcdana bê ûcdan!

—Lê lê, lê lê, Îcar ev ji min kêm mabû ha! Îcar lawê min peyvên welê ji min re bike? Ha ezê melkesê deynim û tu çi dikî bike. Lê bavê te wê êvarı were malê, ku ez hemûyê yek bi yek jê re nebêjim bila tu di niza çiyê minî... Lê niha tu çi dikî bike. Ez nikanim bi te re pevbiçim û cîranan bi xwe bihesînim.

Gava ku Dîlan ber bi kevokê çû û destên xwe avêtê, kevok dîsan firiya. Piştî ku çû vî alî û wî aliyê xênî, xwe li ser wêneyê kalikê wî (bavê diya wî) yê ku bi dîwêr ve bi dardekirî bû, danî. Lê ew di gel wêne ji jor de hate xwarê û cama çarçewa wêne hûrhûrî bû.

Îcar diya wî bû weke dêhnan, bi hêrs û bi dengekî bilind got:

—Zû vê kevokê ji hundir derxîne, zû!..

Dîlan îacar bi lez çakêtê xwe avêt ser kevokê û ew girt. Gava ku wî kevok girt, hebekî bêhna diya wî hate ber wê. Îcar bi dengekî nizim û weke ku rehet bûbe, got:

—Lawo ji bo xatirê xwedê vê kevokê bibe çolekê berde. Tu dibînî bê çi bi serê me de anî. Gerek tu bi lez here dibistana xwe. Ku îcar jî ji dersên xwe bimînî, bavê te wê te bi dar de bike.

Dîlan çer ku kevok girt, bi bayê bezê derket der ve. Diya wî bi dû wî de ban kir:

—Dîlan, kuro te çentê xwe ji bîr kir lawo!..


Khaled 86

Lê Dîlan li wê venegeriya, wî bi xwe jî zanî bû, ku çentê xwe ji bîr kiriye. Lê kevok? Ma qey wî dê ew kevoka kulek û birîndar berdaya çolê? Na, wî kiri bû serê xwe, ku ling û baskê kevokê bicebirîne û wê rihet bike.

Gava ku Dîlan gihişte serê kuçê, sekinî û hebekî bêhna xwe berda. Dilê wî weke defekê lê dixist, radibû û dadiket. Xwêdan jî dabû, lê ew jî qet ne xema wî bû. Dîsan lezand, lê îcar nereviya, leza wî bi xwe weke revê bû. Di rê de çend caran daqûl bû û bixuşkên ku diketin sola xwe derdixist, tavêt û dîsan dimeşiya. Carekê ji nişka ve sekinî û bi xwe-xwe got:

—Ma ez welê serserî bi ku de diherim?

Dû re hevalên wî Ferxo û Îso hatin bîra wî. Îcar ber bi mala Ferho ve lezand. Piştî ku qederekî meşiya, dîsan sekinî û bi xwe-xwe got:

—No, ez naçim mala Ferxo. Bavê wî herdem pê re dixeyide û lê dixe. Tew ew vê kevoka kulek û birîndar bi min re bibîne, ewê bi min re bixeyide û li min xe...

Ew li mala Îso fikirî. Kêfa wî ji nav hemû hevalên wî bêtir ji Îso re dihat. Gava ku ew diçû mala Îso, wî xwe rehet didît. Dê û bavê Îso tu caran bi Îso re nedixeyidîn û erza wî nedişkandin. Îso çi bixwastaya, dê û bavê wî jê re nedigotin na û jê re dikirin. Bi qasî ku dê û bavê Îso ji Îso hez dikirin, evqasî jî ji hevalên wî hez dikirin. Îso bi tenê bû. Ne tu xwişkên wî, ne jî tu birayên wî hebûn; ew delaliyê malê bû. Ji ber vê yekê dê û bavê wî tu caran erza wî nedişkan-

din.

Dê û bavê Dîlan jî jê hez dikirin, lê ne niha... Ew jî hîn gava ku ew biçûk û bi tenê bû. Ev yeka han baş dihate bîra Dîlan. Dê û bavê wî jî weke dê û bavê Îso jê hez dikirin. Lê piştî ku ew hebekî mezin bû û birakî wî yê din çêbû, êdî dê û bavê wî weke berê jê heznedikirin û bêtir ji birayê wî yê biçûk hez kirin. Rojekê ji qehran Dîlan destên xwe xistin qirika birayê xwe yê biçûk û wextî ew bifetisanda; ku diya wî pê re negihişta, wî dê birayê xwe yê biçûk bifetisanda, da ku dîsan bi tenê bimaya û dê û bavê wî jê hez bikirana.

Dîlan wextî bigihişta nik mala Îso, lê hate bîra wî ku Îso çû ye gund, mala apê xwe.

Îcar wê çi bikira gelo? Ji nişka ve pîrika wî hate bîra wî. Wî xiste serê xwe ku here mala pîrika xwe. Mala pîrika wî li gundekî nêzîkî bajêr bû. Ji xwe Dîlan zûde pîrika xwe nedîti bû û pir bêriya wê kiri bû. Wî zanî bû, ku dê pîrika wî alîkariya wî bike û ling û baskê kevoka wî bicebirîne.

Her ku diçû dinya germtir dibû. Wê bîskê ji barkêşan û ji çend pîrekên gundî pê ve tu kes li sûkê nema bûn. Pirên dikandaran dikanên xwe girti bûn û çûbûne malên xwe. Yên ku li dikanên xwe mabûn jî ji bo ku meyweyên xwe ji germê û rojê biparêzin, her yekî tiştekî weke merşekê avêti bûn ser çend daran û ji wan re sî çêkiri bûn.

Dılan di wê kelekela germê de kete riya gund û bi gavên xurt lezand. Gava ku hebekî ji bajêr bi dûr ket, weke ku mirov ew ji serî heya bi lingan di avê dakiribe, şil bûbû. Sekinî û hebekî xwêdana xwe paqij kir. Dû re çû ser qûçekê û li gund nihêrî. Gund ji dûr ve di nav leylanê de xuya dikir. Lê xaniyê Dewran axa, yê spî û du qatî hîn baştir dihate xuyakirin.

Dîlan ji ser qûçê daket, kete rê û dîsan weke berê bi gavên xurt meşiya. Bi xwe-xwe got:

—Ku ez bi ser vî girikê han kevim, ez î li gund im.

Lê wî ew peyvên han bi dengekî bilind gotin, ji ber vê yekê li dora xwe û li paş xwe nihêrî. Gava ku li paş xwe nihêrî, traktorek ji dûr ve dît.

Dîlan meşa xwe doman û dîsan bi xwe-xwe got:

—Maşalê ku traktor di vê riyê de were.

Dîlan pir tih bûbû. Wer ku xwêdan da bû piça avê di laşê wî de nema bû. Kevoka wî jî tih bûbû. Çavên wê carna dihatin girtin û stûyê wê bi aliyekî de xwar dibû. Carina jî bêhêz diket û herdu baskên wê bi wê ve dadiliqiyan.

Ku traktorê nêzîkî li wî kir, wî destê xwe jê re hilda û ew da rawestan.

Şofêrê traktorê yekî xort bû, di bin bîstan de xuya dikir. Berçavkek reş li ber çavên wî bû û porê wî ji tozê spî dikir.

Şofêr berçavka xwe ji ber çavên xwe daxist, bi kujê çakêtê xwe paqij kir û ji Dîlan pirsî:
—Ma tu dê bi kude herî?

Ji bo ku ji gire-gira traktorê deng heriyê, Dîlan bi dengekî bilind got:
—Ezê herim vî gundikê han!..

Piştî ku şofêr berçavka xwe da ber çavên xwe, wî jî bi dengekî bilind got:
—De siwar be, siwar be!

Dîlan kirî li kêleka wî siwar bibûya, lê şofêr ew şande erebê. Dîlan bi destekî bi kevoka xwe girt û bi destê din jî li siwarbûna ereba traktorê mijûl bû.

Şofêr çend caran li ser hev got:
—Haydê, de zû siwar bibe!..

Berî ku bigihêjin gund, ji gund çend kûçikên xurt bi reyîn êrîşî wan kirin. Bi dû wan kûçikan de jî, cewrikekî biçûk direya û ber bi wan baz dida. Gava ku kûçik gihîştin nik traktorê û şofêr nas kirin, ji xwe şerm kirin; teriyên xwe xistin nav lingên xwe, serên xwe xistin ber xw û dîsan berepaş ber bi gund ve bazdan.

Dîlan ji erebê daket, spasên xwe ji şofêr re gotin û ber bi gund ve meşiya. Dîlan zû de neçû bû mala pîrika xwe, lê dîsa jî mala wê zû derxist. Li ber derî sekinî, li derî xist û kete hundir. Pîrika wî ne li mal bû, hundir bêdeng bû. Dîlan bi êriş ber bi kûp çû, ta-

sek du tas av li ser lingan vexwar, dû re hinek av xiste tacikekê, li ser wê merşa ku li erdê raxistî bû, rûnişt û kevoka xwe jî av da. Wî newêrî bû kevok ji destên xwe berdaya. Kevokê di nav destên wî de çend caran nikulê xwe xiste avê û derxist. Piştî ku têr vexwar, îcar serê xwe tê da kir. Dawî xwest ku xwe di avê de bişo.

Dîlan rabû, av kire tacikeke hîn mestir û anî danî ber kevoka xwe. Kevokê xwe hol kir ser tacikê, pêşî nikulê xwe tê da kir, dû re serê xwe û dû re jî xwe avête nava avê û xwe şuşt; çend caran xwe dawşand û dîsa ji nav avê derket. Çer ku ew ji nav avê derket, Dîlan ew girt. Dîlan ji ber bi tirs bû, ku bifire û firaxên pîrika wî hemûyî li hev bixîne.

Çaxa ku pîrika wî gava xwe avête hundir û sewta miroveki ji hundir hatiyê, veciniqî û şaş ma; gava çavên wê li Dîlan ket hilma wê hate ber wê, keniya û bi devê xwe yê bê diran got:
—Te xêrî Dîlankê min, tu û van deran?

Dîlan jî keniya, ji cihê xwe rabû û çû destên wê maçî kir.

Emrê pîrika wî di dora heftêyî re bû. Porê wê spî bû û ji du diranan pê ve diran di devê wê de nema bûn. Herdu gepên wê kort bûbûn û rûyê wê di nava qermîçokan de mabû. Ji ber ku pişta wê tewiya bû, qama wê pir kurt xuya dikir.

Pîrê jê pirsî:

—Tu çawanî lawê min, dê û bavê te çawan in?
—Ez baş im pîrkê (pîrê) tu çawanî?
—Ez jî baş im bavê pîrê.

Piştî ku pîrê satila ava xwe berda kûp, got:
—Ma te xêrî vê germê bavo, ku dê bihata, tu dê di hênkayiyê de bihata. Ma kî di vê kelekela germê de ji malên xwe derdikevin?

Tew weke ku dengê pîrê neçû Dîlan, beyî ku bersiva pîrika xwe bide, jê pirsî:
—Pîrê, ma hîna berxik û karikê te hene?
—Berx û kehr mezin bû ne bavê pîrê. Hingî bihar bû, ew nû zabûn, lê niha ew mezin bûne, bûne bizin û mîh.

Çavên pîrê hîna li kevokê neketi bû, ango ew lê hayî nebûbû. Ji xwe gava ku mirov ji der ve, ji ber rohnî û tîrêjên rojê dikete hundir, mirov dibû weke koran, hundir pir tarî xuya dikir.

Piştî demekê çavên pîrê li kevokê ket, ji Dîlan pirsî:
—Ew çi ye dîlan, ma te ew kevok ji kuderê anî ye?
—Pîrê, ke... kevok birîndar e...
—Çima? .. Ma çi pê hatiye?
—Ling û baskên (bazikên) wê şikestine pîrê.

Lê gava ku Dîlan ew peyvên han gotin, lêva wî ya jêr lerizî û girî kete qirika wî. Pîrika wî destê xwe

di serê wî da, ew aş kir û got:

—Na na, lawê min, a niha pîrika te dê ling û baskên kevoka te bicebirîne. Piştî ku li ling û baskê kevokê nihêrî, domand:

—Birîna kevoka te ne xedar e, ne ling, ne jî baskê wê şikestiye, lê kevok êşiya ye û birîndar e.

Hingî pir kêfa Dîlan hat, kirî tiştek ji pîrika xwe re bigota, lê pîrika wî berî wî peyivî:

—Ma tu ne birçî yî lawikê min, tu henek mast naxwî?

Çawan dê Dîlan ji mêst re bigota "na". Ev zêdeyî du mehên wî bû, ku devê wî bi mêst nebûbû.

Pîrika wî satila mêst, textê firaxan û selika nên nîşanî wî da û got:

—Tu ji xwe re henek mast têxe tacikekê û bixwe, ezê jî henek hevîr bikim û ling û baskê kevoka te bicebirînim.

Dîlan zû ji xwe re henek mast xiste tacikekê, perçak nanê tenûrê ji selikê derxist û weke gurekî birçî kişiyayê û xwar. Pîrika wî jî hevîr kir û bi hevîr û rûn ling û baskê kevoka wî cebirand.

Êvarî, piştî ku roj çû ava û pîrika wî nivîn li ser xênı pehn kirin, Dîlan tiştên ku di navbera wî û diya wî de qewimî bûn û hatina xwe ya gund, ya beyî ku ji dê û bavê xwe re bibêje, ji pîrika xwe re got.

Pîrika wî bi şaşmayî jê pirsî:

—Ku haya dê û bavê te ji hatina te ya gund tunebin, ma ewê niha nebêjin çi? Ma ewê nebêjin ka tu bi ku de çû ye? Çima tu bê destûra wan hatî lawê min? Weleh niha wan bajar hemû li hev xistine... Niha tu der nema ye ku ew li te negeriyane.

Dîlan zanî bû ku wî şaşî kiriye û beyî dê û bavê xwe hatiye. Wî zanî bû ku niha dê û bavê wî ji hemû hevalên wî yên dibistanê û ji mamostê wî pirsî ne. Wî zanî bû ku niha dê û bavê wî li her derê bajêr li wî geriyane û heta çûne polîsxanê û li wî pirsîne. Dîlan pir poşman bûbû, ji ber vê yekê xwest ku pîrika xwe bi xwe re bibe bajêr, da ku dê û bavê wî, wî bidine xatirê pîrka wî û li wî bibûrin.

Dîlan li ber pîrika xwe geriya:

—De pîrê, lê... Weleh ku bavê min bibihîze ez neçûme dibistanê ewê têra xwe li min xe, ew hew kincan û pirtûkan ji min re dikire.

—Heh... ma qey tu neçû yî dibistana xwe jî?

—Na...

Pîrê kire niçe-niç, piştî ku qederekî fikirı, ji ser xênı bang cîrana xwe kir:

—Xezalê... Xezalê...

Xezalê di bin çêlekê de bû, şîr didot? gava wê dengê pîrê bihîst, ji bin çêlekê rabû û got:

—Kerem bike pîrê.

—Xezalê, ma gelo Mecîd dê îşev neçe bajêr?

—Na Weleh pîrê, ew îşev naçe, lê ez ne şaş bim ewê sibehê zû here...

Dengê Mecîd ji ser dikê hat:

—Ezê sibehê zû herim bajêr pîrê, di berbangê de.

Pîrê:

—Ma tu dê karibî me jî bi xwe re bibî, Mecîd?

—Erê pîrê, erê, çawa? Lê divê ku hun sibehê pir zû rabin; ji ber ku ezê berî rohelat herim.

Pîrê û Dîlan sibehê zû, hîn berî ku roj derkeve rabûn ser xwe û çûn ser devê rê, li bendî traktora Mecîd rawestan.

Pir tê de neçû traktor ji gund derket û hate ser devê rê, li ber pîrê û Dîlan rawesta. Şofêrê traktorê Mecîd, destê xwe li ba kir û got:

—De pîrê, zû siwar bibin.

Pêşî Dîlan, dû re jî pîrê bi alîkariya çend gundiyên ku di erebê de bûn, siwar bûn.

Mecîd pêl gazê kir û xurt ber bi bajêr ve ajot.

Pîrê û Dîlan kirî têketina hundir, li ber derî, li bavê Dîlan rast hatin. Bavê Dîlan şaş bû, devê wî ji hev ma û çavên wî beloq bûn; wextî tiştek bigota, lê pîrê firsend neda wî û got:

Îcar ji bo xatirê min divê ku hun Dîlan bibexşînin; ew careke din hew tiştekî welê dike.

Bi dengê pîrê re diya Dîlan ji hundir bazda hewşê, xwe bê rohnî avête Dîlan, ew çend caran maçî kir û got:

—Ma tu bi ku de çû bû lawê min? Me ji duhî de hemû bajar li hev xist. Ku tu dê biçûya cem pîrka xwe, çima te ji me re negot? Ma mirov weke te di-


Khaled 86

ke? ..

Dû re hemû bi hev re ketin hundir. Dê û bavê Dîlan li hal û wextê pîrê pirsîn û pîrê jî li hal û wextê wan... Lê di wê navberê de Dîlan kevoka di hemêza xwe de berda. Kevokê berkurka xwe dagirt, dest bi xwendinê kir û di hundirê mezelê de çû û hat.

# Boyaxkerê Solan

Osman xwe kelegirî kir û ji diya xwe re got:

—Dayê, ji min re sindoqekê bikire, ezê ji xwe re boyaxê bikim û dirav bidim hev.

Diya wî lê vegerand:

—Lawê min, tu nikarî, tu ê çawan boyaxê bikî?

Osman xwe hebekî delalî kir û got:

—Wele ez dikarim bikim. Çima kincên lawê cîranê me xweşik in û solên wî nû ne, yên min kevn in? Ezê ji xwe re boyaxê bikim û ji xwe re pê kincan bikirim.

Diya wî stûyê xwe xwar kir û bi keser got:

—Lawê min, bavê te çûye kar, ewê cejna qurbanê vegere malê. Hingî ezê ji lawê xwe re qatek kinc û cotek solên xweşik bikirim.

Lê, Osman dîsan qebûl nekir, herdu lingên xwe li erdê xistin, kelegirî bû û got:

—Na, na! Wele tu ji min re kincan nakirî! Tu ê wek par bêje "Emê pê kirya xênî bidin û ji xwe re pê genim bikirin".

Diya wî ber bi wî çû, hembêz kir, maç kir û got:

—Bi soz, ezê îsal ji lawê xwe re kincan bikirim.

Lê Osman jê bawer nekir. Ji ber ku her sal digotin "Emê ji te re kincan bikirin" Lê nedikirîn. Cejna Remezanê, gava ku Osman û zarokên hevalên xwe li malan, li şekir geriya bûn, hevalekî wî nehişti bû bi wan re bigere, dehfek dabûyê û goti bû:

"Bi me re negere. Kincên te pînekirî, solên te qetiyayî ne" û lêxisti bû.

Osman jî hingî giriya bû, bazda bû malê û bi ser diya xwe de qêriya bû.

Gava ku ev tişt dihatin bîra Osman, Osman hîn bêtir bi ser diya xwe de diqêriya.

Diya wı ji ber nekir der, rabû ser xwe û ber bi kulînê meşiya. Ji kulînê destê xwe xist nav lihêfekê, perên xwe yên ku di nav kevnikekî girêdayî bû, derxist û du heb pelên deh lîrayî jê derxistin. Paşê ew desmalka xwe girêda û dîsan bir xist nav lihêfê. Bîst lîrayên ku derxisti bû dirêjî Osman kir û got:

—Ha ji te re lawê min, here ji xwe re sindoqekê bikire.

Osaman ji kêfa kirî bifirya. Hema bi herdu destan êrîşî wan peran kir. Lê gava ku bi tenê biçûya ser xerêt, dibû ku apo Ehmed jê re sindoq çênekira. Ji ber ku hîn zarok bû. Dibû ku apo Ehmed baweriya xwe pê neanîba.

Îcar li ber diya xwe geriya û bi stûxwarî jê re got:

—Yadê! Ma çi dibe lê, bi min re were ser xerêt bila zû ji min re sindoqekê çêke.

Diya wî lê nihêrî û dilê wê pê şewitî, nexwest ku kêfa wı bişikîne û got:

—Xwe ragire lawê min, ez hevîr bikim, ezê bi lawê xwe re werim ser xerêt.

Osman lê vegerand:

—De yadê qurban, zûka hevîr bike.

Diya wî rabû, çû teşta hevîr derxist û bir da ber kîsê êrd; sê-çar mist ard berda binê teştê, rûnişt û hevîr kir.

Osman tebatî neketê, li dora diya xwe her dida lotikan. Geh av bera ber destên wê dida, geh jî hevîrê ku ji deştê dipekiya dida hev û dixist teştê.

Diya wî hevîrê xwe qedand, kevnikek avêt ser û teşta xwe danî quncikekê.

Osman hîn jî vir de wê de baz dida. Hema digot: "Zû yadê".

Diya wî jî ew qet nedişkand. Her ku wî digot: "zû yadê", diya wı jî digot: "Erê qurban,emê herin".

Diya wî, piştî ku hevîrê xwe danî quncikê, dawa xwe dawşand, destên xwe şuştin û ji Osman re got:

—De haydê lawê min, em herin, berî ku bibe êvar.

Osman destê xwe avêt kirasê wê û derketin. Mala wan li qiraxa bajêr bû. Çemekî mezin di ber mala wan re derbas dibû. Gava ku dibû zivistan, ew çem carnan radibû, ava wî pir dibû, dibû wek lehiyekê.

Lê niha havîn bû. Ava di çem de, bi delkan diçû. Roj dijwar bû. Ji german leylan rabûbû. Heke mirov satilek ava cemidî daniya ber tavê, ewê di hundirê pênc deqîqan de bikeliya. Di wê germê de Osman û diya xwe ber bi bajêr ve dilezandin. Osman hîn jî dawa diya xwe bernedabû. Te digot qey dê diya wî ji destan baz bide. Destekî wî bi kirasê diya wî vebû û destê din jî li ba dikir. Gava ku çem xelas kirin, Osman xwe avêt pêşiya wê û got:

—Yadê,ezê bêjim:


haled 86

Boyax, boyax!..
Apo, boyax!..
Xalo, boyax!..
Ez solan dibiriqînim!..
Ger hun xwe tê nebînin,
Çerxîkî jî nedine min!..

Ji bo ku ez peran pir bidim hev û ji te re jî hubuyekê bikirim.

Kêfa diya wî ji wan peyvên wî re hat, daqûl bû, maç kir û got:

—aferîn lawê min. Lawê min jêhatî ye. Lê, tu û zarokên xelkê li hev nexin haa!..

Osman got:

—Na, na!

Riya xwe nêvî kiri bûn; bi qasî bîst deqîqan mabû, ku bigihan ser xerêt. Lê roj hîn germtir dibû, mirov digot, qey agir bi erdê ketiye. Osman û diya xwe di xweydanê de mabûn; lê qet ne xema Osman bû, hîn jî destê wî bi kirasê diya wî ve bû û xwe li ba dikir. Êdî ketin nav bajêr, xwe dan kêlekeke dikanan û xurt meşiyan. Dikan bi rêz bûn. Li ber hin dikanan sindoqên bacan, îsot, firingî û pîvazên şîn hebûn. Li ber hin dikanan jî, tayên rengo mengo bi dar de kirî bûn. Osman û diya xwe her dimeşiyan. Berî ku bigihêjin ser xerêt, bi çar dikanan, Osman got:

—Dayê, dayê, ka binêre!

Tu nabê hin zarokên boyaxker dîtibû. Diya wî sekinî û li wan zarokan nihêrî.

Çar zarok bûn. Herçaran jî sindoqên xwe li pêşiya xwe danî bûn û rûnişti bûn. Lê yekî ji wan çiqas xweş dikir. Gava ku wî firça xwe li sindoqê dixist, mirov digot qey ew li tembilkê dixe. Wisan xweş lê dixist. Hema Osman li firça wî û li sindoqa wî dinihêrî, eger bi ya wî biwa ewê li wir pir bimana, lê, diya wî destê wî kişand û got:

—Zû lawê min, êvar e, ancax em bigihêjin.

Osman xwe piçekî delalî kir:

—Yadê, ezê jî karibim wisan bikim?

Diya wî serê xwe kil kir:


—Erê lawê min, tu ê jî hîn bibî.

Ew meşiyan, ketin nav dikanên xeratan. Çavên xwe li dikana Hoste Ehmed gerandin. Hoste Ehmed, destebirakê bavê Osman bû. Demekê wî û bavê Osman, bi hev re qaçaxî dikirin. Pir caran hati bûn girtin, pir caran jî ji mirinê filitî bûn. Rojekê jî, gava ku bi şev li tixûb dixin, bi lingê Ehmed de bombe diteqe. Ji wê rojê bi vir de, dev ji qaçaxê berdidin. Bavê Osman her havîn diçû bajarên mezin û li wê kar dikir; Ehmed jî, bi wan perên ku ji qaçaxê dabûn hev, ji xwe re pê dikanek xeratiyê vekiri bû û kar dikir.

Piştî çend dikan derbas kirin, gihaştin ba dikana Ehmed û derbasî hundir bûn.

Hoste Ehmed tenê dergûş çêdikir. Bi qasî deh dergûşan li hundir hebûn û yek jî di destên wî de bû, çêdikir. Hoste Ehmed serê xwe hilda banî, por û bijangên wî ji toza textan spî bûbûn.

Xatûnê rojbixêrbûn dayê.



Hoste Ehmed:

—Wey tu ser, ser û çavên min re hatiyî, Xatûn! Kerem bike, derbas be!

Xatûnê derbas bû, xwe da ser textikekî û rûnişt.

Hoste Ehmed şalawarê xwe dawşand û pirsî:

—Êêê... Xatûn, de ka bêje, bê hun çawan in. Hun ji birakê min Misto naman digrin an na?

Xatûnê piçekî din jî cihê xwe xweş kir:

—Erê Wele, kekê Ehmed, wî çendê berê nameke wî hat, di nameya xwe de gotibû: "Ezê berî cejna heciyan bi pênc rojan werim"

Hoste Ehmed:

—Nabêje karê wî çawa ye?

Xatûnê:

—Xwedê zane, di avahîkê de kar dike.

Vê carê Osman, ji bêhna toza textan kuxuya. Bi kuxîna wî re, Hoste Ehmed berê xwe pê vekir û pirsî:

—Êêê Osmankê min, tu çawan î?

Osman wekî ku fedî kir, bi dengekî nizim bersiv da:

—Ez baş im, apo.

-Xatûn, Hun dê kengî Osmên bişînin dibistanê?

—Bi xêr sala were, kekê Ehmed. Mesrefa dibistanê giran e, lê Osman dixwaze heriyê.

Hoste Ehmed, wa bi dengekî gur got:

—Na, na! Lêwik bişînin! Dibistan baş e Xatûn! Bila ji xwe re bixwîne, bibe tiştekî.

Kêfa Osman wê bîskê ji sohbetê re nedihat. Hema dixwest, ku deqekê berî deqekê sindoqa wî çêbi-

be, ji xwe re boyaxê bike û pê kincan bikire. Îcar xwest, ku bala diya xwe bikişîne ser xwe, ziq li çavên wê mêze kir.

Diya wî lê hayî bû. Zanî bû, ku tebatî nakevê. Ji ber vê yekê, zû ji Hoste Ehmed re got:

—Kekê Ehmed, riceke min ji te heya.

Hoste Ehmed wa bi şaşmayî li çavên wê nihêrî.

—Kerem bike, Xatûn!

—Osman dixwaze ji xwe re boyaxê bike.

—Êêê!..

—Lê sindoqa wî tuneye. Em hatine nik te, ji bo ku tu jê re sindoqekê çêbikî.

Hoste Ehmed keniya:

—Rice gişt ev bû, Xatûn?

—Erê Wele, kekê Ehmed.

Di wê navberê de, Osman ew bîst lîrayên ku pê re bûn, dirêjî Hoste Ehmed kir.

Hoste Ehmed destê wî guvaşt:

—Na lawê min, ma ezê peran ji te bistînim? Tu ji xwe re bi wan peran firçe û boyaxê bikire. Lê piştî du rojên din were sindoqa xwe bibe.

Piştî ku Hoste Ehmed weha got, Xatûnê nizanî bû, ku bi çi awayî sipasên xwe jê re pêşkêş bikira, lê, piçekî hizirî û bi stûxwarî got:

—Xwedê ji te razî be, Xwedê kêmasiyê nede te, kekê Ehmed!

—Tu çi dibêjî Xatûn? Min û bavê Osmên tam deh salan bi hev re kar kiriye.

Xatûnê dîsan got:

—Xwedê kêmasiya te nede!

Paşê rabûn ser xwe ku herin.

Hoste Ehmed jî rabû ser xwe û bi wan re derket heta bi devê derî.

Osman û diya xwe ji Hoste Ehmed xatir xwestin û berî dan malê. Piştî ku du roj di navberê de derbas bûn, Osman dîsan çû cem Hoste Ehmed. Hoste Ehmed sindoqa wî çêkiri bû. Osman qayişa sindoqa xwe avêt stûyê xwe û bi lez ji dikanê derket. Gava ku Osman çû, Hoste Ehmed bi dû wî de bang kir:

—Osman, Osman!

Osman lê vegerand:

—Çi ye, apo?

—Binêr lawê min, li xwe miqatebî, tu nekevî ber tu makînan haa!..

Osman bi dengekî bilind bersiv da:

—Na, apo! Na!

Ew ber bi dikana boyaxê çû. Ji xwe re firçe û boyax kirî, çû li nik zarokên boyaxker rûnişt û bang kir:

Boyax, boyax!..
Apo, boyax!..
Xalo, boyax!..
Ez solan dibiriqînim!
Ger hun xwe te nebînin,
Çerxîkî jî nedine min!

Hema zilamekî dirêj, bi navmil, sola xwe danî ser sindoqa wî û got:

—Zû birazî, qondera min boyax bike, berî ku ma-


Khaled 86

kîne here!

Osman fîrçe û boyaxa xwe derxist û got:

—Baş e apo, ezê niha di deqîqakê de boyax bikim!

Piştî ku qondera wî boyax kir, mêrik du lîra avêt ser û çû.

Osman ew du lîrayên xwe avêtin çavîka sindoqê û got:

—Ev sifteh e.

Heta êvarê, panzdeh lîra kar kir. Hîn jî boyaxa wî bi têra du rojan mabû. Berî ku here malê, çû dikanê qevdek pîvazên hêşîn kirî û dû re berê xwe da malê û lezand.

Gava ku gihîşt mal,dît ku diya wî li ber kuçik e û agirê bin beroşê tev dide.

Osman berî ku têkeve hewşê, bang diya xwe kir:

—Yadê, yadê!

Diya wî rabû ser xwe û bi kêf got:

—Tu hatî, lawê min?

Osman ji kêfan devê wî nediket hev, wî jî bi ken got:

—Erê yadê, binêr! Va min pîvaz jî kirî ye û hîn çardeh wereqe jî bi min re hene.

Diya wî ber bi wî çû, ew maç kir û got:

—Aferîn lawê min! Lawê min dê ji xwe re pê kincan bikire.

Paşê qevda pîvazan ji destên wî girt û çû hundir.

Kincên Osman, dest, ser û çavên wî di boyaxê de mabûn. Diya wî kincên wî jê kirin û bi ava cemidî serê wî şuşt. Paşê şalwarekî kurt û vezelekî milkurt lêkir.

Şev êdî tarî bû, bû wextê şîvan. Diya Osman rabû, çû şîva xwe ji ser êgir daxist, xist firaxekê û anî danî ser sifrê. Paşê ban Osman û birayê Osman ê piçûk kir û li ser sifrê rûniştin û xwarina xwe xwarin.

Osman di ser şîvê de, sirf qala xwe û boyaxa xwe kir. Tew bi ya wî bûya, wî dê birayê xwe ê piçûk jî bi xwe re bibira lê, diya wî nehişt û got:

—Na, lawê min, hê Hesenkê min piçûk e. Kengî ew jî weke te mezin bû, hingî bila apê wî Ehmed jê re sindoqekê çêbike û ew jî bi lawê min re were boyaxê bike.

Osman şîreta diya xwe qebûl kir û lê vegerand:

—Dayê, gava ku kekê min jî bi min re were, hingî emê pir peran bidin hev û emê ji bo dibistanê ji xwe re pê pirtûk û pênûsan jî bikirin.

Diya wî dîsan keser berda:

—Erê lawê min, hun ê ji xwe re pê her tiştî bikirin.

Paşê rabû ser xwe, çû nivînê wî li erdê raxist û ban wî kir:

—De Osman, were razê, ji bo ku tu sibehê zû rabî, lawê min.

Osman ji cihê xwe hol bû, çû ket nav nivînê xwe û raza.

Bi rojhelat re rabû ser xwe, ser çavê xwe şuşt, xurîniya xwe kir û rahişt sindoqa xwe, avêt milê

xwe, berê xwe da sûkê û çû li cihê xwe ê berê rûnişt. Heta bi nîvro, bi deh lîran boyax kir. Paşê çû ji xwe re perçek nanê firnê û çend lib zeytûn kirî û hat li ser sindoqa xwe rûnişt û xwar.

Wê rojê sûk pir kalabalik bû. Nemaze ji gundan pir mirov hatibûn; yên mast anî bûn ji bo firotinê, yên hêk û yên barên êzingan...

Ji bilî wan jî, ew roj, roja çûna eskeriyê bû. Sûk tije xort,kal, pîr û zarok bûbû.

Wê rojê, Osman tam bi sîh lîran boyax kir. Berî ku tarî dakeve erdê, rabû ser xwe, sindoqa xwe avêt milê xwe û berê xwe da malê.

Gava ku gihaşt malê, hîn roj bi qamekê bilind bû.

Diya wî şaş ma, ji wê tirê, belene hatine serê wî. Lê, gava ku gihaşt cem, Osman keniya, diya wî xwe negirt û pirsî:

—Xêr e, lawê min? Çima tu weha zû hatî?

Osman destê xwe avêt bêrîka xwe, sî lîra nîşanî wê da û got:

—A ez ji bo van zû hatim, dayê! Ma qey ne bes e?

Diya wî nû ve ruh pê de hat. Wê sindoqa wî ji milan kir û bi hev re meşiyan malê. Paşê şîva wî danî ber, li cem rûnişt û bi stûxwarî jê re got:

—Osmankê min!..

Osman serê xwe rakir, pariyê di devê xwe de cût û got:

—Çi ye, dayê?

—Lawê min, sibê şûşa gazê bi xwe re bibe û ji me re gaznê bikire.

Osman dîsan kevçîk li xwarinê xist û got:

—Bila dayê, bila!

Ew şev di ser wan de derbas bû. Sibehê zû Osman rabû ser xwe, weke her car ser çavên xwe şuşt, xurîniya xwe kir û rahişt sindoqa xwe, avêt milê xwe û çû li cihê berê rûnişt.

Heta bi nîvro kar kir. Paşê nihêrî ku cîpek sekinî û çend zilaman xwe jê avêtin. Gava ku wan zilaman xwe avêtin, zarokên li cem Osmên gişan baz dan. Lê, Osman şaş ma, nizanî bû ku çi ye, an ji bo çi hevalên li cem giş reviyan. Hîn wisan dihizirî, dît ku yekî bi milê wî girt û şîmaqek lê xist. Paşê pehînek li sindoqa wî xist û got:

—Hey bêjî, lawên bêjiyan! Ev çend carin ku em dibêjin "Li vir boyaxê nekin". Hingî Osman fêhm kir, ku çawîşên belediyê ne. Hema rahişt sindoqa xwe û ji destên wî baz da. Çawîş da dû. Di wê navberê de, texsiyek ji jor de bi xurt dihat. Texsiya ku bi xurt dihat, ji nişkê ve li nav guhên Osmên ket.

Tenê dengek ji Osman derket, dengekî bi qêrîn. Esnaf, nanpêj û barkêşên wê dorê tevda baz dan, hatin ser Osman. Nihêrîn, ku sindoq, boyax, firçe û şûşa wî ya gazê her yek bi derekê de belav bûne, Osman di nav tekerên texsiyê de bûye nanik.



# Ciwangeyê Temo

Ne çengek don, ne jî qutek dar di mala wan de ma bû. Ev sê rojên wan bûn, ku her şev di tariyê de û ji serma dirikrikîn. Hema ku tarî dikete erdê, ew ji bo ku necemidin diketin nav nivînên xwe û wisan di tariyê de, beyî ku rûyê hev bibînin bi hev re dipeyivîn. Wan welê heya bi dereng bi hev re dipeyivîn, henek dikirin, dikeniyan û carinan jî pevdiçûn, lê rûyê hevdu nedidîtin. Şeva çaran, hîn berî ku tarî dakeve erdê, mêrik berê xwe bi jina xwe vekir û got:

—Wele ku em vî ciwangeyî nefiroşin rewşa me xerab e, emê vê zivistanê perîşan bibin.

Jinikê hebekî bi sert bersiv da:

—Rewşa xerab ji mêrên xerab dertê! Kuro ma tu jî peya yî, tu jî weke Soro yî! Ha ha tu dinihêrî jina Soro nikane di bin zêran de bimeşe. Tu komên êzingên li ber deriyê wî dibînî! Ma ka çî te ji ê wî kêm e? Weleh ku bi qamê be, tu du caran li wî yî. Bi simbêlan be simbêlên te bi qasî yê wî ne. Bi peyvê be, zimanê te ji yê wî dirêjtir e. Kuro aqilê te tune ye, aqil... Dilê te bi te naşewite, bila bi me bişewite... Ev çar jojên me ne, ku em di vê tariyê de ne û ji serma dirikrikin, ma qumara te ji me kêm e?

Mêrik wê bîskê tu tişt negot, ji wê peyva xwe ku kiri bû, poşman bû. Weke yekî ku bi sûcê xwe zani be, bêdeng ma.

Piştî ku ji sifrê vekeşiya, got:

—Weleh, bi serê Temo ez hew bi qumarê dileyizim! Ku ev zivistana han di ser me re derbas bibe, bi soz ezê îcar weke mirovan li kar û îşê xwe binihêrim û dev ji qumar mumarê berdim.

Jinikê destê xwe li ba kir, serê xwe vir de û wê de hejand û got:

—Lo Weleh ez ji te bawer nakim. Ma ev cara te ya çendan e, ku tu sozan didî û dibêjî "ez hew bi qumarê dileyizim". Te par jî soz da, ku tu bi qumarê naleyizî; te perê karê me hemû da hev û te got:"ezê herim bajêr genim bikirim". Piştî wê bi du rojan tu bi destvala bi ser min de vegeriyayî.

Mêrik cigarek pêça û vêxist. Gava ku wî cigara xwe vêxist, bi şewqa heste hundir rohnî bû. Hingî çavên wî li Temo ket. Temo lêva xwe daliqandi bû û dikire îskîn. Mêrik bi ser de qêriya:

—Çi ye kuro? Ma te xêr î? Derdê te çi ye? ..

Ji berdêla Temo diya wî bersiv da:

—Ma qey tu nizanî, bê derdê wî çi ye? Ma ji ciwangeyê wî pê ve çî wî heye gelo? Te jî çav berdayê ku bifroşî.

Gava ku jinikê holê got, Temo bi dengekî bilind giriya:

—Weleh ez nahêlim tu ciwangeyê min bifroşî...

Bavê wî bi nermî bang wî kir, destê xwe li mîndera ber xwe xist û got:

—Hela tu were li nik bavê xwe rûnê, hela were...

Temo dîsa bi kelegirî got:

—Weleh ez nahêlim tu ciwangeyê min bifiroşî!

—Erê lawê min, hela tu were.

Temo kire îskînî, ji cihê xwe rabû û çû nik bavê xwe, li ser mînderê rûnişt. Bavê wî destê xwe danî ser serê wî û tiliyên xwe di nav porê wî de bir û anîn. Dû re ew ber bi xwe ve kişand, destê xwe avêt paş stûyê wî û got:

—Lawê min, tu rewşa me dibînî, tu dibînî em di çi rewşê de ne. Em niha vî ciwangeyî bifiroşin, bi soz ezê havînê ji lawê xwe re keleşêrekî (dîkekî) bikirim. Keleşêrekî şer...

Temo îcar bi delalî giriya. Bavê wî pê re nexeyidî û ew neşikand; dîsan ji bo firotina ciwange li ber geriya. Temo di wê bîskê de hebekî nerm bû, êdî ne giriya, ne jî pozê xwe daliqand.

Diya wî di wê navberê de, donê ku ji mala cîranê xwe deyn kiri bû, berda lampê û lampe vêxist. Bi vêketina lampê re hundir rohnî bû. Gava hundir rohnî bû, weke ku germ jî bû.

Temo xwe hîn bêtir ber bi bavê xwe de dikişand. Hêdî hêdî ber bi wî çû û dawî di hembêza wî de rûnişt. Piştî ku jinikê lampe bi dar de kir, rahişt secadakê, avêt nav milên xwe û ew jî li kêleka wan rû-

nişt. Dû re berê xwe bi Temo vekir û devkenî got:

—Tu û bavê xwe çiqas ji hev hez dikin.

Mêrik destên xwe li nava Temo gerand, ew hebekî hejand û got:

—Lawê min şêr e, şêr... Bavê wî dê jê re havînê keleşêrekî şer bikire.

Jinik wextî li hember peyva wî derketa û bigota "tu dîsan lêwik dixapînî" lê negot; nexwest ku kêfa wan li wan bişikîne û nexweşiyê têxe nav malê.

Temo îcar destên xwe li destên bavê xwe gerandin û ji diya xwe re got:

—Yadê, ma tu zanî, ku dê bavê min ji min re dîkekî şer bikire?

—Erê yadê bi qurban, ez zanim.

Mêrik îcar hebekî lawik da alîkî, xwe direjî qutiya xwe kir û cigarek qalind pêça. Dû re berê xwe bi jina xwe ve kir û bi dilşahî got:

—Hela tu bi xêra bavê xwe ji me re çayekê çêbike.

Jinikê dil kir ku dîsan tiştekî li dijî wî bibêje, lê negot. Wê nedixwest kêfa mêrik û Temo li wan bişkîne. Heta ku ji wê dihat bi nermî bi wan re dida û distand. Bi gotina mêrê xwe rabû ser xwe, çû çaydan tijî av kir û bir danî ser paporê.

Bi çayêvexwarinê re mêrik çîrokek jî got. Di dû çîrokê re bîskê qala leşkeriya xwe û şerê yewnan

kir. Dû re jinêkê jî çîrokek got. Lê çîroka jinikê, Temo bi zorê bi wê da gotin. Temo li ser wê çîrokê ruh û can dida; pir jê hez dikir. Ku diya wî jê re bigota, wî kanî bû bi saetan li wê çîrokê guhdarî bikira; ew tu caran ji wê çîrokê aciz nedibû. Çawa ku Kulor Badîno ji tirsonekiyê dibû mêrxas, an bi tesadufî welê jîr dibû û her heft hûtên bira dixapandin û ew dixistin bin saw û tirsa xwe.

Bi çîrokê re Temo di xew re çû. Êdî şev baş dereng bûbû. Jin û mêr jî baş westiya bûn û li ser hev dibawişkîn. Ji bo ku don zêde xerc nekin, wan jî rabûn nivînên xwe li erdê pehn kirin, pif kirin lampa xwe û razan.

Mêrik sibehê zû, berî roj derkeve, rabû ser xwe. Bi dengê teqe-reqa wî jina wî jî hişyar bû, herdu çavên xwe firikandin, piştî ku bawişkî got:

—Ma qey tu dikî bi rastî jî ciwangeyê lêwik bififroşî, kuro?

—Ma ka tu riyeke din heye?

—Weleh lawikê xwe ji bo ciwangeyê xwe bikuje. Tu bi a min dikî dev ji firotina ciwange berde. Em herin xwe biavêjin camêrna, dibe ku em tiştekî ji wan deyn bikin. Tew nebû, ezê herim xwe biavêjim birayê xwe tiştekî jê deyn bikim.

—Keçê min bi zorê bi lêwik da ye qebûlkirin. Ma emê ji ku herin xwe biavêjin xelkê û peran ji wan deyn bikin? Tew belengazê birayê te dê ji me re peran ji ku bîne? Tu dibînî ku ew bi xwe di bin deynan de ye.

Bi dengên peyv û munaqeşa wan Temo hişyar bû,

xwe du carn vir de û wê de qulipand, rabû û li ser xwe rûnişt. Dû re du-sê caran xwe vezeland û bawişkî.

Gava dê û bav dîtin ku Temo rabû, dev ji munaqeşa xwe berdan û peyva xwe guhertin ser tiştekî din. Dû re mêrik berê xwe bi Temo ve kir û bi devkenî jê re got:

—Temo, de rabe lawê min, berî ku bibe dereng!

Temo wê şevê baş raneketi bû. Wî heya bi sibehê xewnên tewlo-mewlo dîti bû. Ji ber ku ew baş raneketi bû, pir bê xew û westiyayı xuya dikir. Her ji deh saniyan carekê dibawişkî û devê wî digihîşt guhên wî.

Bavê wî dîsan got:

—De rabe Temo! Rabe bavê min, dereng e!

Temo ji nav nivînan rabû ser xwe û rast çû daşirê. Piştî kû ji daşirê vegeriya û dest û ser çavên xwe şuşt, hema zû-zû kincên xwe li xwe kir. Dû re bi dê û bavê xwe re çû êxur, da ku ciwanga bigirin û bibine bajêr. Gava Temo ber bi ciwange çû, ciwange serê xwe ber bi wî ve kir û destê wî alast. Wê bîskê jin û mêr li çavên hevdu nihêrîn. Wextî jinikê dîsan bigota "dev ji firotina ciwange berde" lê negot. Hersiyan alî hevdu kirin û werîs xistine serê ciwange. Gava ku ciwange derxistin û derketin ber derî, mêrik li paş xwe zıvirî û ji Temo re got:

—Temo, lawê min, ku tu bi a bavê xwe dikî li mal bimîne. Dinya sar e û rê bi herî û çirav e. (Dû re

berê xwe bi asman ve kir) Binihêre, li ku be wextî baran bibare; emê perîşan bibin lawê min. Tu bi a min dikî neyê.

Diya wî jî got:

—Tu neçe kuro, tu dê di rê de ji serma biqefilî!

Lê Temo kiri bû serê xwe, an bavê wî duhî êvarî jê re soz da bû, ku dê wî jî bi xwe re bibe û dê jê re nanê firnê bikire. An na Temo firotina ciwange qebûl nedikir.

Temo lêva xwe daliqand:

—Weleh ezê bêm. Çima te duhî êvarî got, ku tu dê min bi xwe re bibî?

—De baş e, wê çaxê here vezelîkî din jî li xwe ke.

Temo bi kêf baz da hundir, buxçika ku li ser sindoqê bû daxist, bi lez û bez vezelekî din jî di ser vezelê xwe de li xwe kir, dû re çakêtê xwe li xwe kir û reviya der ve.

Diya wî bi wan re derket heya bi ser devê rê; gava ku vegeriya got:

—Temo, lawê min, tu bi a min dikî neçe!

Temo dîsan lêva xwe daliqand:

—Weleh ezê biçim.

Law û bav ketin rê û meşiyan. Dinya her ku diçû nexweştir dibû. Ewr weke merşeke reş li asman vir de û wê de diçerixî. Piştî ku ji gund bi dûr ketin, ba-

ranê dest pêkir. Lê çi baran... Mirov digot, qey bi kûzan tê.

Temo carina neh-deh gavan li dû bavê xwe dima. Piştî ku hebekî din jî meşiyan, êdî ciwangeyê wan hew meşiya. Mêrik werîs li nava xwe gerand û sê-çar caran ew welê kişand, lê dikir nedikir ciwange xwe tevnedilivand; tenê serê xwe li ba dikir. Dû re mêrik baş werîs li destê xwe gerand û ji Temo re got:

—Temo, ciwange dehf bide lawê min, dehf bide...

Temo hema bi jîrî çû paş ciwange, herdu destên xwe dane hêtên wî û dehf da. Ciwange îcar weke hespa ku serî ji siwêr bistîne, xwe hol kir û çend zîtik avêt Temo. Bi zîtokên ciwange, Temo li ser piştê, di nav heriyê de li erdê ket. Mêrik xwe şaş kir, bi lez reviya ser Temo û got:

—Temo, ma tu êşiya lawê min? Hela tu rabe ser xwe.

Temo di herî û çiravê de ma bû. Gava ku rabû ser xwe av û herî jê diherikî. Hîngî poşman bûbû ku bi bavê xwe re hati bû. Lê dê çi bikira, ew ji gund pir bi dûr keti bûn, nêzîkî li bajêr kiri bûn.

Bavê wî kire niçe-niç, serê xwe vir de û wê de hejand, li rewşa wî nihêrî û got:

—Hun bi a mirov nakin, lawo! Min ji te re got, neyê, dinya ne xweş e, baran e, şilî ye, şepelî ye... De îcar bimeş e ha! De bimeşe, hela bê kî poşman dibe?


Khaled 86

Mêrik bi hêrs ho kir ciwange û werîsê wî kişand.

Vê carê ciwange weke ku tî be û mirov berê wî bide avê, zû meşiya. Temo dîsan da dû bavê xwe û ciwange û bi wan re xurt meşiya. Dû re lêva xwe daliqand û bi dengekî nîvgirî got:

—Ma ne te duhî êvarî ji min re got, ku tu dê min jî bi xwe re bibî bajêr?

—Erê lawê min, min ji te re soz da, ku ezê te bi xwe re bibim bajêr, ma min ji ku zanî bû, ku dê welê bi şilî û şepelî be.

Saet li dor yekê rojê gihîştin bajêr û rast berê xwe dane mazatê. Li mazatê, mirov ji însan û heywanan nikanî bû gava xwe biavêta. Wer ku baran bariya bû, mazat di herî û çiravê de ma bû. Temo û bavê xwe ciwange ajotin orta mazatê.

Her ku diçû hîn bêtir dinya dicemidî. Piştî wexteke kurt, êdî ew herî û çirava mazatê hemû bû cemed û qeşa.

Temo werîsê ciwange li destê xwe gerandi bû û ji serma dirikrikî. Dû re ji bavê xwe pirsî:

—Ma ka wê kengî ciwange bê firotin, bavo?

Gava ku Temo ev peyv gotin, diranên wî ji serman li hev ketin. Bavê wî bi pêçana cigarê bilûbû bû. Piştî ku cigara xwe pêça û vêxist, got:

—Bi bêhna fireh lawê min, ewê niha bê firotin.

Pişta mêrik ji ber firotina ciwange qewîn bû. Di hemû mazatê de ciwangeyekî weke ciwangeyê wî qe-

lew û bi goşt tune bû. Wî zanî bû ku dûr nêzîk dê ciwangeyê wî bê firotin û bi buhayekî baş...

Hîn welê, dît ku peyayekî qelew û serbitar bi Temo re dipeyive.

Temo bang wî kir:
—Bavo were, xalo li ciwange dipirse.

Ji xwe bavê Temo ne pir dûr bû, li mêrik zıvirı, destê xwe da yê û got:
—Kerem bike!

Mêrik destê bavê Temo berda, destmalek ji bêrîka xwe derxist, fîş kir û dîsan ew destmala xwe xiste bêrîka qapûtê xwe. Dû re du-sê caran li dû ciwange çû û hat; piştî ku destê xwe li hêt û pişta ciwange xist, got:
—Tu dê vî ciwangeyî bi çiqasî bidı?
Bavê Temo milên xwe hejandin:
—Tu dê bi çiqasî bikirî?
Mêrik dîsan destê xwe li pişta ciwange xist:
—Ev malê te ye, tu dê bi çiqasî bidî?

Bavê Temo baş bi buhayê mazatê nizanî bû. Gelo bigota bi çiqasî? Piştî ku hebekî fikirî û li Temo nihêrî, got:
—Ezê bi du hezar û du sed lîran bidime te.

Mêrik bi destê wî girt, hejand û got:
—Niha du hezarên rast çawan e?


Khaled 86

Ji xwe armanca bavê Temo jî du hezar bû. Wî bi qestî got:"Du hezar û du sed". Gava ku wî di destpêkê de bigota "Du hezar" mêrik dê kêmî du hezaran tê bidaya.

Bavê Temo ji Temo pirsî:
—Tu dibêjî çi lawê min? Em bi du hezaran bidine apê te?
—Bide, got Temo û hûkir destên xwe.

Mêrik destê xwe xiste bêrîka şalwarê xwe, deh lîrayên kaxizî derxist, dirêjî Temo kir û got:
—Ev jî ji biraziyê min re; li bajêr ji xwe re pê tiştekî bikire.

Gava ku Temo destê xwe dirêjî perê destê mêrik de kir, li bavê xwe nihêrî.
Bavê wî:
—Rahêje lawê min, rahêje! Perê di destê apê xwe de bigire...

Temo ew deh lîrayê kaxizî girt û zû xiste bêrîka xwe. Ji roja ku wî bîr biri bû heya bi niha tu caran deh lîra bi yek carê neketi bû destên wî.

Dû re mêrik cuzdanê xwe derxist, du hezar hejmart destên bavê Temo, bi werîsê ciwange girt û got:
—Tu hezar xêrî ji perên xwe bibînî.
—Tu jî hezar xêrî ji ciwangeyê xwe bibînî.

Mêrik keniya û bi henekî got:

—Ma ezê çi xêrê jê bibînim, birako? Ewê sibehê bê serjêkirin.

Dû re werîsê ciwangeyê xwe kişand, xatir ji wan xwest û çû.

Temo û bavê xwe jî ji nav mazatê derketin û ber bi sûkê ve meşiyan. Gava ku hebekî bi nav bajêr de çûn, bavê Temo jê pirsî:
—Tu ne birçî yî, lawê min?

Zikê Temo ji birçîna dikire qure-qur, lê ji bo ku peran zêde xerc nekin, got:
—No, ez ne birçî me...

Bavê wî keniya:
—Tu çawan ne birçî yî, lawo? Yê min, ji birçîna êş kete serê min.

Lê Temo tişt negot, tenê milên xwe hejandin û weke berê meşiya.

Law û bav her dimeşiyan. Ji xwe bi meşê bajarê Erzeromê xelas nedi bû. Erzerom bajarekî mezin e. Bi gorî mezinbûna xwe jî sar e. Zivistana Erzeromê pir dijwar e. Zivistanan, ji bilî termên teyr û teban û heywanên din, termên (meytên) pir merovên ku ji serman diqefilîn tê dîtin.

Temo û bavê xwe qederê nîvsaetekê welê meşiyan. Lê hîna jî ew negîhaştibûn nava bajêr. Bavê Temo çiqas lêhên li ser dikanan xwendin jî, çavên

wî ne li restoranteke ket, ne jî li xwaringehek biçûk. Piştî ku qederê deh-panzdeh deqîqeyên din jî meşiyan, gihaştin ber xwarigehek biçûk. Berî ku ew têkevin hundirê xwaringehê, Temo du-sê caran li ser hev lerizî (ricifî) çokên wî sist bûn û kete xwarê. Ji bavê wî tire, ku ew şemitî bû, herdu destên xwe avêtê û xwest ku wî rabike. Lê Temo nikanî bû li ser lingan rawestiya, dîsan lerizî û ket. Bavê wî ew bi herdu destan hejand û bi heyecan got:

—Temo,Temo! Ma çi bû lawê min? çi bi te hat? ...

Tu deng ji Temo derneket, rengê wî bi careke hate guhertin. Ruyê wî û lêvên wî zer û hêşîn bûn, bûne weke kevzê. Reşikên çavên wî du-sê caran wenda bûn, tenê sipîk man...

Bavê wî dîsan ew hejand:

—Temo! Temo!..Temo!.. Ma çi bi te hat lawê min? .. Temo!..

Dû re têgihîşt, ku Temo diki ji serma biqefili; hema zû rahiştê, avêt ser milê xwe û di wê sûkê de baz da. Lê nizanî bû bi ku de baz dide, an dê bi ku de here.

Gava ku gihîşte serê qorzîkekê, çav li çayxanakê ket. Hema zû kete hundir çayxanê û lawik bire ber sobê.

Hundirê çayxanê tijî peya bûn. Ji diwê cigaran mirov digot, qey hundir mij girtiye. Yên bi kaxezan dileyistin, yên bi dame û yên bi domîne... Çend pe-

yayên kal jî kursiyên xwe kişandi bûn ber sobê, rûnişti bûn û cigarên xwe dikişandin.

Peyayekî kal berê xwe bi bavê Temo ve kir û wa bi heyecan jê pirsî:

—Kuro ev lawik ji serma qefiliye lawo! Wî zêde nede ber sobê...

Dîsan reşikên çavên Temo wenda bûn, tenê spîk man.

Kalo îcar bi hêrs got:

—Kuro ev lawik mir, lawo!..

Dû re rahişte Temo û ji bavê wî re got:

—Bide dû min em herin mal, an na ev lawik dê bimire, ji serman qefilî ye.

Ji ber ku Temo giran bû, kalo nikanî bû rahişta wî. Li ber deriyê çayxanê, bavê Temo ew ji destên kalo girt û bi dû de lezand.

Mala kalo li paş çayxanê bû; tenê du dikan di - navbera mala kalo û çayxanê de hebûn. Ku ketin hundir, kalo bi dengekî gur ji jina xwe re got:

—Keçê zû qatek nivîn deyne û du-sê lihêfan daxe.

Ji xwe gava ku jinik bi wî awayî çav bi wan ket, şaş ma. Hema zû doşekek û du lihêfên hirî ji kulînê derxist û li erdê pehn kir. Dû re lawik ji destên wan girt, li ser doşekê dirêj kir û ew di nav wan herdu lihêfên hirî de pêça. Kalo jî agir berda sobê û sobe dada. Paşê jina kalo ji bavê Temo re got:


Khaled 86

—Bila dilê te ji ber lawik saff be, birayê min, tu tişt bi lawikê te nayê. Bi xêr piştî nivsaetek din ewê rabe ser xwe...

Jinikê kulavek jî ji bo wan li erdê pehn kir.

—Hun kerem bikin rûnên, ezê li lêwik binihêrim.

Herdu li ser kulêv rûniştin û cihê xwe xweş kirin. Lê dilê bavê Temo pir bi tas û was bû. Ew ji ber Temo pir bi tirs bû. Wî di dilê xwe de digot: "Temo ji destên min çû". Lê ji aliyê din, ji ber mêvanperweriya malikê, ji wî re hêviyên pir mezin çêdibûn.

Kalo cigarek pêça û dirêjî bavê Temo kir. Bavê Temo cigare ji destê kalo girt, lê vênexist. Piştî kalo qalûna xwe vêxist, ji bavê Temo pirsî:

—Wer xuya ye ku hun ji gundan in, ma xêr bû, ku hun vê sar û qeşemê hatine bajêr?

Bavê Temo çîroka xwe ji serî heya binî ji kalo re got. Kalo serê xwe hejand, du hulmên din jî li qalûna xwe xist û bang jina xwe kir:

—Xecê, hela tu bi xêra bavê xwe ji me re çayekê bide ser êgir.

Jinikê bi devkenî got:

—Min çayê zûde daye ser êgir, wextî bikele...

Gava ku keliya, du qedeh danî ser siniyekê û di gel çaydên danî ber wan. Dû re çû metbaxê û ji bo lêwik jî şorbe da ser êgir.

Heya ku şorbe nivkelî bû, lawik çavên xwe veki-

rin û weke ku nû ji xew rabe, bawişkî û xwe vezeland.

Jinikê berê xwe bi bavê wî ve kir û bi ken got:

—Min ji te re negot, ku ewê di hundirê nivsaetê de rabe ser xwe. Binihêr, hîn nîvsaeta wî jî neqediyaye...

Kalo henek kir û ji bavê Temo re got:

—Bavo Weleh heqê wê jina min, ku doxtor bûya, ew ji her tiştî fêhm dike.

Dû re li ser siniyê nihêrî, ku ji çay û qedehan pê ve tu tişt nedît, dîsan henek kir û got:

—Lê çi feyde, porê wê spî bû ye hîna jî nebû ye tu kevanî. (Berê xwe bi alî jina xwe vekir) Hela ka pariyek nan û çend lib zeytûn jî ji me re bîne, niha mêvan biçî ye.

Lê jinikê ne tenê çend lib zeytûn, penîr, rîçal û du nanên firnê jî danî bû ser siniyeke din, ku bîne ji wan re. Gava ku jinik di hundirê saniyan de di gel sifra xwarinê vegeriya, kalo şaş ma û jê pirsî:

—Te çi zû anî, ma qey tu firiya?

Jinikê berê xwe bi bavê Temo ve kir, keniya û bi henek got:

—Bavo tu guh mede vî kalê rih spî û xurifî. Yê wî ew bi zimanê xwe nikane.

Kalo bi ken got:

—Keçê halê biraziyê min çawa bû?

—Biraziyê te weke şêrekî ye, ewê niha rabe...

Kêfa bavê Temo pir ji kalo û pîrê re hat. herdu jî welê komîk bûn, ku mirov bi her peyvên wan dikeniya. Ew carina jê welê bi hev re dipeyivîn, ku mirov digot, qey ew pevdiçin. Lê ew ne pevçûn bû·, ya wan her henek bû. Bavê Temo dil kir ku ji wan bipirse, bê tu zariwên wan hene an na, lê nepirsî û di dilê xwe got:"Xwedê ji wan razî be, çiqas mirovên baş in".

Dû re hersê li ser Temo hatine hev. Temo rabû li ser doşekê rûnişt. Herdu gepên wî guhên wî ji germê sor bûbûn. Çend caran kire fişe-fiş û li bavê nihêrî.

Bavê wî jê pirsî:
—Tu çawan î lawê min? ..

Temo bersiv neda û ziq li sifra xwarinê nihêrî. Jinikê tê derxist, ku çavên Temo li xwarinê ye. Hema zû rabû ser xwe, çû şorba wî jê re xiste tacikeke kûr, anî danî ser siniyê û bang hersiyan kir.

Pêşî kalo, dû re jî Temo û bavê xwe çûn li dor sifrê rûniştin. Temo welê bîrbir bû, ku heya kalo ji wan re negot·"kerem bikin" wî destê xwe dirêjî xwarinê nekir.

Wê rojê kalo û pîrê ew bernedan. Heya bi derengê şevê peyivîn·, qala gund û bajaran kirin, qala zemanê berê kirin, qala mirovantiyê kirin... Berî ku têkevin nav nivînan û rakevin, pîrê henek kir û ji bavê Temo re got:

—Niha tu Temo ji me re nahêlî?

Ev peyva pîrê kete serê kalo. Kalo ji dil ji bavê Temo pirsî:

—Niha bi rastî tu Temo li cem me nahêlî? Bila weke lawekî me be û emê wî bişînin dibistanê jî, bila ji xwe re bixwîne.

Tew ew peyvên kalo weke tiştekî ku bi mêjiyê bavê Temo ve bizeliqe, cih girt. Ji xwe ew jî li tiştekî welê digeriya; bi çi awayî dibû bila bibûya, lê tenê bila Temo ji xwe re bixwenda û bibûya tiştekî.

Bavê Temo jî ji Temo pirsî:

—Ma te bihîst lawê min? Tu dixwazî ku li cem kalikê xwe û pîrka xwe bimînî?

Temo wa bi delalî got:

—Lê diya min? ..

Kalo bi alîkariya destên xwe ji cihê xwe rabû, çû li ba Temo rûnişt, destê xwe di serê wî da û got:

—Ji heftê carekê, nebû, ji mehê carekê ezê te bibime gund. Ma ne baş e Temokê min?

Temo tu bersiv neda, serê xwe xiste ber xwe û bi neynûka xwe leyist.

Îcar pîrê got:

—Erê erê, wê lawikê min Temo li ba me bimîne; ma ne wa Temo?

Temo pêşî li bavê xwe nihêrî, Dû re hêdî di mana "erê" serê xwe ber bi jêr ve hejand.

Wê êvarê heya bi derengê şevê bavê Temo, kalo û pîrê li ser rewşa dinyayê, li ser başî û xerabiyê peyivîn. Adinî rojê sibehê zû Temo berî hemiyan hişyar bû. Wî herdu destên xwe xistine bin serê xwe û demekê welê bê deng, weke mezinan li hewa mêze kir. Hîn wilo, kalo û pîrê jî rabûn û dawiyê bavê Temo jî rabû ser xwe. Çer ku bavê Temo çavên xwe vekirin, li saetê nihêrî û got:

—Ooo... Saet tê heftan.

Dû re li Temo zîvirî û peyva domand:

—Divê ku em herin lawê min, diya te di meraqan de mir.

Pîrê zû rabû ser xwe û ji bo xurîniyê tiştin hazir kir. Piştî ku xuriniya xwe kirin, rabûne ser xwe ku herin. Lê berî ku herin, Temo çû destên pîrê maçî kir ku xatir jê bixwaze, lê pîrê ew sê-çar caran li ser hev maçî kir û got:

—Tu me ji bîr nekî Temo, divê ku tu li ser soza xwe rawestî û werî ha!

Temo sê-çar caran serê ber bi xwe ve hejand:

—Erê pîrê, başe, bi soz ezê bêm!

Dû re xwest ku here destên kalo, lê kalo destên xwe di serê wî da û got:

—Ezê jî bi we re derkevim lawê min.

Bavê Temo:

—Na apo, tu zehmet neke.

—Ma çi zehmeta wê heye lo?

Law û bav û kalo ji hundir derketin û ber bi sûkê ve meşiyan. Pîrê bi dû wan de bang kalo kir:

—Şêxo, tu ji dikana Hecî Silêman ji Temo re vezelekî bikirî baş dibe. Dinya sar e.

Kalo li jina xwe vegeriya:

—Erê Wele, baş bû ku te anî bîra min; zivistan î-sal dijwar e.

Sar û seqema der, weke gûzanan rûya mirov dibirî. Ku mirov tif dikir, tifa mirov qeşa digirt. Ji xwe simêlê bavê Temo û yê kalo spî bûbûn, mirov digot qey berf lê hatiye.

Gava ku sermayê da laşê Temo, wî di dilê xwe de got:

—Oxx... Çi xaniyekî xweş û germ bû. Weleh ezê ji xwe re li ba van mirovan xenê bibim.

Berî ew bigihîjine ba dikana Hecî Silêman, Hecî Silêman çav li wan ket, rabû ser xwe û bi devkenî got:

—Hoo, kerem bike apê Şêxo, ev çendakî te bû tu nexuya bû, ma tu bi dernan de çûbû yî gelo?

Kalo dîsa weke hercar henek kir:

—Hela tu bisekine em bêne hundir, dû re bipirse, camêr.

Hecî Silêman yekî dirêj, lê ne zeyif ne jî qelew

bû. Porê wî reş bû, lê herdu cênîkên wî spî bûbûn. qatek kincên wî hebû, havîn biwa, zivistan biwa, hertim wî ev qatê kincên xwe li xwe dikir.

Kalo:

—Silo, tu ka vezelekî ku li biraziyê min bê derxîne.

Hecî Silêman li lêwik nihêrî, dû re çû ji dawiya dikanê, vezelek anî û got:

—Ev vezelên han nû hatine apê Şêxo. Ev vezelên îngilîz in. Weleh tenê ev maye, ku li lêwik were baş e.

Ew vezelê ha li Temo hat, mirov digot, qey ji bo wî hatibû çêkirin.

Temo rast çû destê kalo maçî kir. Kalo destê xwe di serê wî da û ji dikandar re got:

—Wî jî li ser hesabê min yê kevn binivîsîne.

Hal û wextê kalo baş bû. Ne zêde dewlemend bû, lê, ne feqîr bû jî. Sê-çar dikanên wî hebû, ku dida bi kirê û xaniyê wî jî li ser hesabê wî bû. Di jiyana wî de tu tişt ji bilî zarokan ji wî kêm nebûbû û wî hesreta tu tiştî nekişandibû. Hesreta wî ya herî mezin kurdûndetiya wî bû.

Dikandar ew jî li ser hesabê wî yê kevn nivîsand û deftera xwe dîsa weke berê xiste çavika masa xwe.

Kalo ji dikandar pirsî:

—Niha deynê min pir bû ye ha!

Dikandar destê xwe li ba kir, keniya û got:
—Eh, ma wê çi bibe, apê Şêxo?

Dû re dikandar li saeta xwe mêze kir û peyva xwe domand.

—Çayxane jî hîn venebûne ku ez ji we re çay bixwazim, balo cigareke min bikişînin.

Rahişte pakêta xwe ya li ser masê û ew ezimandin. Herdu peyan cigare jê girtin û vêxistin. Piştî ku cigarê xwe kişandin, rabûne ser xwe û destûra xwe ya çûyinê ji dikandar xwestin. Li sûkê, piştî ku tiştên ji wan re lazim bûn, kirîn; Temo û bavê xwe xatir ji kalo xwestin û çûn.

Kalo bi dû wan de bang kir:

—Tu Temo bişînî ha, ji bîr meke!

Bavê Temo:

—Erê erê, emê wî bişînin.

Temo:

—Erê kalo, ezê bêm!

Berî ku ew bigihîjine gund, diya Temo secadeke ji eyarên berxa avêtibû nava milên xwe û ji dûr ve hate pêşiya wan. Gava gihîşte ba wan, bi heyecan got:

—Ma hun li ku man? Weleh ji duhî de xew neketiye çavên min? Ez her li ser xênî bûm û min li riya we dinihêrî. Ku reşek dihate xuyakirin, min digot, hun in û ez diçûme pêşiya wan. Ma qey hun duhî venegeriyan?

Mêrik hinek ji wan firaxên di destên xwe de di-

rêjî wê kirin û bi devkenî got:

—Hela tu ji kerema xwe re rahêje van firaxan; emê dû re li ser nehatina xwe bipeyivin.

Jinikê hinek firax ji destên wî girtin û hinek jî ji Temo xwest:

—Ka bavê diya xwe, tu jî hinek firax bi diya xwe de.

Temo kîsikê şekir dirêjî diya xwe kir. Piştî ku diya wî ew kîsik ji dest girt, bi kêf got:

—Weleh we qûtê me yê vê zivistanê hemî danî, ma qey ciwangeyê we biha hate firotin?

Mêrik keniya, serê xwe hejand û ber bi malê ve meşiyan. Di rê de ne Temo, ne jî bavê wî tu tişt li ser serpêhatiya xwe negotin. Lê, êvarî piştî ku şîva xwe xwarin, bi çayrvexwarinê re mêrik pêşî qala firotina ciwange kir, dû re jî qala serpêhatiya Temo û malbata kalo kir. Ji ber tiştên ku bi serê Temo de hati bûn, jinikê çend caran kire axe-ax, çend caran xwe kire qurbana lawê xwe û heya ji kerban çend dilop hêsir jî ji çavan hatin. Piştî demeke kurt serpêhatiya Temo ji bîr kir. Lê çîroka kalo û pîrê ji bîra wê nediçû. Piştî ku bîskê li Temo nihêrî, berê xwe bi mêrê xwe vekir û got:

—Kuro ma qey tu dêhn î, ma emê çawan lawikê xwe bidine sût-mûtên bajaran?

—Keçê, a dêhn û a ku gotin di serî de naçe tu yî! Ez ji te re dibêjim, camêr bi emir in, mezin in, camêr in. Ew tew ne bi emir bin, tew ne bi emir bin, di emrê Sitê û Îso de ne. (Sitê û Îso gundiyên wan bûn û emrên wan di dora şest-heftê salan de bûn) Û Weleh heya bi niha ez li camêrên welê rastnehatime. Min jî digot, qey kesên ku li bajaran rûdinên tolaz û pê-

xwas in. Lê ne welê ye, Weleh yekî weke wan di vî gundê me de tune ye.

—Ew ne gawir mawir bin kuro? Ma qey tu nizanı ku gawir têne zarokan dikirin û dibin?

—Na keçê, ev camêr ne welê ne. Ew jî weke me ne û ji me hîn çêtir in. Her tiştên wan hene. Lê tenê tiştê ku ji wan kêm zarok in. Xwedê mal û pere daye wan, lê zarok nedane wan. Ew kurdûnda ne; ew bi hesreta zarokekı ne...

Temo peyva bavê xwe birî, li diya xwe nihêrî û got:

—Weleh min divê ku ez herim mala kalo û pîrê. Min divê ku ez li ba wan bimînim û ji xwe re herime dibistanê.

Diya wî milên xwe li ba kir:

—E... Piştî ku tu bixwazî,ji min re çi lazim?

Wan wê êvarê li hev kirin, ku ewê lêwik bişînin ba kalo û pîrê. Mersela şandina Temo hemî ji bo xwendina dibistanê bû. Ewê li ba kalo û pîrê bimaya, ji xwe re biçûya dibistanê û dê weke lawekî wan biwa. Ku ne ji bo şandina dibistanê biwa, dê bavê Temo bi a diya wî bikira, tu caran ew bi deran de nedişand. Qe çawan biwa nanê wan zikê Temo jî têr dikir. Lê bavê wî dixwest ku lawê wî bixwîne û ji xwe re bibe tiştekî.

Piştı wê bi heftekê dê û bavê Temo di gel wî çûne mala kalo û pîrê. Tiştên ku diya Temo di derheqa kalo û pîrê de fikirî bû qet ne welê bû. Gava ku wê ew germî û ew mêvanperweriya kalo û pîrê ya li

hemberî xwe dît, ji tiştên ku berê lê fikirî bû şerm kir. Wê di dilê xwe de got: "Mirovên evqas nefsbiçûk tu caran nehatine dinyayê".

Ew du rojan mêvanê kalo û pîrê man; roja sisiyan jî kalo û pîrê ew bernedidan, lê dê û bavê Temo li ber wan geriyan û gotin:

—Weleh destê me ji we nabe, lê hun bi rewşa gundan zanin, divê ku em herin.

Wan Temo li ba kalo û pîrê hiştin û vegeriyan gund.

Berî niha bi çendakî riya min bi gundekî Erzeromê ket û ez li mala dostê xwe Selîm bûme mêvan. Êvarê, piştî şîvan hin gundiyên din jî hatine şevbûhêrka me. Weke civata her gundan, civata me jî bi qerf û henekan dest pêkir û peyv li ser feqîrîû dewlemendiyê rawesta.

Hingî peyakî navsal û serserqot got:

—Bavo, hin hene bi qasî dewlemendiya xwe zalim in, bi rewşa feqîr û belengazan nizanin. Ji wan bê ewê xwîna feqîran vexwe. Hin jî hene xwedê dide wan ew jî didine yên din. Temo jî wa ye; bi namûs û bi ûcdan derket. Ne ji wî biwa tu zarokên me hînî xwendin û nivîsandinê nedibûn û ewê jî weke me nezan û cahil rabûna.

Min hingî ji mazûbanê xwe pirsî:

—Ev Temo kî ye?

—Temo lo, mamostayê gund. Dibêjin, serpêhatiyeke wî ecêb heye. Ev yeka han berî ku ez werime gund bûye. Malbata Temo feqîrê gund bûye. Rojekê xalanê Temo golikekî didinê. Temo golikê xwe xwedî dike û wî mezin dike. Ciwangeyekî baş ji golik derdikeve û navê wî dikine Ciwangeyê Temo. Rojekê, dîsa weke pir caran tişt di mala bavê Temo

de namîne. Ne xwarin ne vexwarin û ne jî don...Req û rût û perîşan dimînin. Bavê Temo biryar dide ku ciwangeyê wî bifiroşe. Hem Temo û hem jî diya Temo li hember fîrotina ciwange derdikevin, lê bavê Temo bi wan dide qebûl kirin û bi Temo re ciwange dibine bajêr. De vir Erzerom e, serma Erzeromê ne weke ya ba we ye. Zivistanan simbêlên peyan bûz digire. Li bajêr serma zorê dide Temo û Temo dikeve. Bavê wî jî radihêjê û wî vir de wê de dibe. Dawî diçe çayxanakê û dide ber sobê. Li çayxanê peyakî kal rûniştiye. Gava ku bi wî awayî çav li Temo dikeve, ji bavê wî re dibêje: "Rahêje lêwik û bide dû min". Temo dibine mala kalo. Kalo ermenîkî maldar û kurdûnda bû ye. Xwedê mal dabûyê, lê zarok nedabûyê.

Kêfa kalo û pîrê (jina kalo) ji Temo re tê û ji bavê Temo tika dikin, ku Temo li ba wan bihêlin. Bavê Temo jî bi diya wî dişêwire û bi riza Temo, Temo li ba kalo û pîrê dimîne.

Kalo wî dide xwendin û dibe mamosta. Pir dibistanên din jî xwendine, lê ez nizanim. Tiştê ez zanim ew pir zîrek e. Lo bi her tiştî zane. Gundî hemî bi serê wî sond dixwin. Haa! Min ji bîr kir ku ez bêjim. Pêşî pîrê dimire, dû re hîn berî ku kalo bimire, kalo cihê zêrên xwe ji Temo re dibêje û mal û dikanan jî li ser navê wî dide nivîsandin. Temo jî piştî xwendina xwe û piştî mirina kalo û pîrê xênî û dikanan difiroşe, zêran hûr dike û li çar gundan çar dibistanan ava dike.

Dotira rojê, ez digel dostê xwe Selîm çûme mala Temo. Jineke ciwan û devbiken li me derî vekir, bi-

xêrhatinî da me, da pêşiya me û em birine oda ku Temo lê rûniştî. Gava ku Temo çav li me ket, ji cihê xwe rabû, destên me hejand û em dane rûniştin. Bejna Temo dirêj bûbû, an jî dirêj bû. Riha xwe tenê li ser çenga xwe berda bû û simbêlê wî ser lêva wî ya jorîn girti bû. Berçavkeke doxzîv û girover li ber çavan bû; gava ku dipeyivî ew berçavk carinan dadixist û dîsa bi paş de dixiste ber çavên xwe. Mezela ku lê rûniştî, mirov nikanî bû ji pirtûkan gava xwe biavêta. Ne tenê li erdê, her wisa li her çar dîwarên xênî, li ser refan tijî pirtûk bûn.

Temo bîskê ji me re behsa gund û bajaran, jin û mêran, xort û zarokan, xwendin û nexwendinê kir. Dû re gava ku bala wî kişand, ku ez not digirim, bi kurtebirî behsa serpêhatiya xwe kir. Min jî serpêhatiya wî li jor nivîsand. Dê ji min re behsa pir tiştên din bikira, lê ne wexta min, ne jî wexta wî hebû. Me ji bo hevdudîtinek û civînek nû roj dane hev û cih da xuyakirin. Bi xêr, kesî nemire dê pir serpêhatiyên Temo û yên mîna Temo bêne nivîsandin.

# Xewna Nebixêr

Bi dengê teqîna tivingan re hişyar bû, herdu çavên xwe firkand, ji nav nivînan rabû û bazda hewşê. Gava ku çav li leşkeran ket, dîsan bi paş de bazda hundir.

Jina wî û herdu zarokên wî di xew de bûn. Mêrik çû ber paçê, hêdî perde da alî û li der ve nihêrî. Dît ku komek mirov li qadê (meydan, hol) hatine civandin, destên wan li ser serê wan û di nav leşkeran de ne. Mêrik dîsa hêdî perde weke berê kir û li hundir vegeriya.

Jina wî weke ku mirov zixtikan lê bixe ji nav nivînan pekiya, xwêdana ser çavên xwe paqij kir, bi tirs û bi heyecan ji mêrê xwe re got:

—Min çi xewnek ne bi xêr didît!

Lê xewna xwe ji mêrê xwe re negot.

Mêrik li ber serê wê, li ser tûtikan rûnişt û jê pirsî:

—Xêr e inşaleh, te çi xewn dît?

Jinikê axînek kûr kişand û got:

—Tu bi a min bikî ez nabêjim.

Mêrik îcar hebekî bi hêrs got:

—De bêje ha! Xêr e, ma te çi xewn dîtiye, ku te evqasî xwêdan da ye? Tu hertim xewnên wisa tewlo mewlo û bi ecêb dibînî. Xwedê zane tu dîsan di ser çiyan miyan re difiriyayî.

Jinik ji xwêdanê weke ku mirov satilek av bi ser de rijandibe, şil bûbû.

—Na malxerabo, min xewn dît ku eskeran tu dikuştin.

Hingî bi yek derbê re çokên mêrik sist bûn, canê wî sar bû û xwêdanek cemidî ew girt. Tevzî li ser tev-

ziyê li dila ket û tirsa mirinê lê peyda bû. Pênc salan xwînî û li çiyan mabû, tu caran tirsên wisa li wî peyda nebûbûn. Dû re bi dengekî nîvqurmiçî ji jina xwe re got:

—Ma tu zanî, ku leşkeran girtine ser taxê, ew li ku bin wextî bigirin ser mala me jî.

Ji tirsan û heyecanan zimanê jinikê negeriya, di cihê xwe de sar ma. Mêrik dîsan got:

—Keçê, Welleh xewnên te carinan rast in! Te wê dema han xewn dît, ku cîranê me Xelo miri bû, sibehê em rabûn, ku ew bi rastî jî miribû. Ev xewna te jî ne rast be? Welleh ez jî çer vê sibehê çav li wan ketim, tirsa mirinê kete dilê min. Ez bi rastî jî nême kuştin?

Jinikê bi dengekî hebekî bilind got:

—Hela hiş be, bila devê te ji xêrê vegere gidî! Ma çi ye tu vê sibehê qala mirina xwe dikî? Ev çi sibehek ne bi xêr!

Mêrik bersiv neda, keserek kûr berda û cigarek vêxist. Piştî ku hebekî fikirî, ji jinikê re got:

—Rabe, zû ji min re qatek kincên xwe derxe, leşker li ku bin wextî bigirin ser me. Welleh ku îcar ez bê me girtin berdana min tune ye.

Jinik zû ji cihê xwe pekiya û ber bi sindoqa xwe ya kincan çû. Kirasekî dirêj, derpiyek û hubiryek jê derxist û anî danî ber mêrê xwe.

Mêrik qederê deqîqekê li wan kincan nihêrî. Piştî ku cigara xwe di xwelîdankê de vemirand, dîsa rabû ser xwe, çû hebekî perda pacê da alî û li der ve nihêrî.

Yên girtî, hîna jî destên wan li ser serên wan bûn û di nav xeleka leşkerên bi tiving di rêzê de bûn.

Mêrik perde bi hêrs perda û dageriya hundir. Zû zû ew kincên ku jina wî jê re derxisti bûn, li xwe kirin û çû ber neynikê li xwe nihêrî. Piştî dît ku kinc lê tên, jina xwe hemêz kir, zaroka xwe ya di xew de beyî ku hişyar bike, maçî kir, rahişt du satilên avê û derket.

Erê kincên jinan li xwe kiri bû, lê ji meşa wî dîsan mirov zanî bû, ku peya ye. Taxa wan tije leşker bûbûn. Nemaze dora mala wan ji leşkeran mirov nikanî bû gava xwe biavêta. Mêrik bi wî awayî di nav leşkeran de derbas bû. Çaxa ku bi çend gavan ji wan bi dûr ket, hubiriya wî ji serî ket. Mêrik xwe tewand ku rahêje hubiriya xwe, leşkerekî gule ajot ber devê tivinga xwe û got:

—Di cihê xwe de raweste, tev melive!

Mêrik li peyvên leşker guhdarî nekir, rahişt hubiriya xwe û bazda.

Du leşkerên din jî gule ajotin ber devê tivingên xwe, ji wî nîşan girtin û gotin:

—baz mede, di cihê xwe de raweste!

Mêrik reva xwe domand, kirî bigihîşta serê kuçê, leşkeran lê teqandin.

Mêrik li ser piştê li erdê ket, ji her derê wî xwînê pijiqand.


Khaled 86

# Qaçaxkerên Cigaran

—Marlboro, kent... marlboro... kent...marlboroo..

Polîsên sivîl dora wî girtin. Ne yek, ne du; sê dolmîş tije polîs, giş polîsên sivîl û ji şuba duwemîn bûn. Gava ku Bozan çav li wan ket, bazda û kete nav kalabalikê. Ji wî webû, ku xelas bû, lê hew nihêrî, ku destek li nav milê wî ket:

—Tu dê bazdî, ha!.. De bazde! Çima tu baznadî, bêjî lawê bêjiya? Ev çend carin, ku em dibêjin "Li vir cigaran mefroşin". We ev Îzmîra weke gulekê kire gû! We gu xiste nav vî bajarê weke zêr!" Dû re milê wî girt û ew bire cem dolmîşê.

Di hundirê dolmîşê de sê nefer polîs hebûn. Hersê jî navsal û rûtirş bûn. Ew polîsan bekçiyên zarokên ku bihatana girtin bûn. Polîsê ku Bozan girti bû, pehînek lê xist, avête hundirê dolmîşê û ji yên ku di hundirê dolmîşê de bûn re got:

—Ha ji we re, emê hemûwan bigirin, emê koka wan biqelînin. Dû re paş de vegeriya.

Yekî ji nav wan polîsan hutikek li çenga Bozan xist û got:

—Hey bêjî, ma hun nizanin, ku cigarefirotin qedexe ye? Ma hun nizanin, ku ev cigarên qaçax in? Ma hun nizanin, ku qaçaxkeriya cigaran qedexe ye,


Khaled 86

qedexe...

Paşê bi guhê wî girt, diranên xwe qiriçand û got:

—Hela tu dersek baş li polîsxanê bistînê, hingî dê heşê te bê serê te, hingî tu dê fêhm bikî, ku ev gûxwarinî qedexe ye, an na.

Bozan hîn zarok bû, du meh mabû ku yanzdehan dagire. Wî polîsê ku di çenga wî de lêxist, dibû ku bavê zarokekî wisan bû, dibû ku zarokek wî jî di emrê Bozan de hebû. Lê wer xuya bû, ku ji zarokên xwe pê ve ji zarokên tu kesî hez nedikir. Nizani bû, bê zarokhezkirin çi ye?

Bi wê kulma wî, di nav diranên Bozan de xwîn pijiqî. Xwîna ku ji devê wî hat, li ser qoltixên dolmîşê belav bû.

Polîs yeka din jî li çenga wî xist û bi ser de qîriya:

—Xwînê daqurtîne, xweziya xwe daqurtîne, bêjî! Tif meke ser qoltixan!..

Xwîndaqurtandin, xwezîdaqurtandin, di wê demê de ne tiştek bû li ber Bozan. Hişê wî li hersê pakêt cigarên wî bû. Hersê pakêt jî, ji cigarefiroşê wê taxê deyn kiri bû. Li her taxekê serokekî cigarefiroşan hebû. Vî serokî bi deyn cigare difrote zarokan. Gava ku zarokan di hundirê rojekê de perên wan li wan venegeranda, cihê wan li wê taxê nedima. Wan hew kari bûn li wê taxê cigare bifirotina.

Tirsa wî ya herî mezin razana girtîgehê bû. Ji ber ku apê wî Keleş deh salan di girtîgehê de razabû. Piştî ku hati bû berdan, Ji wan re û ji temama nas û dostan re rezîlî û perîşaniya girtîgehan goti bû. Û go-

ti bû "Heta ku ji we bê xwe ji girtîgehan biparêzin".

Bozan ji tirsan dilerizî, xwe negirt û giriya; Paşê li ber wan geriya ji bo ku wî berdin.

Îcar polîsê ku li pêşiyê rûnişti bû, xwe di ser qoltixan de dirêj kir, destê xwe bi hêz li ser çavên wî xist û got,

—Hişşş, bêjî!.. Ker lawê keran! Lawê kahpê digirî jî!..

Hîn polîs peyva xwe dom dikir, dîtin ku yekî din jî bi kulm û pehînan kete hundirê dolmîşê. Polîsê ku lawik avête hundir, ji polîsên ku di hundir dolmîşê de bûn re got:

—Me îro ev girtin. Lê emê koka wan biqelînin. Hela em dersek baş li polîsxanê bidin van, dê hingî têbigihên ku firotina cigaran qedexe ye. Hingî hişê wan dê baş bê serên wan.

Polîsê şofêr ji yên din pirsî:

—Em van bibin kîjan polîsxanê?

Ji dawiya dolmîşê, polîsekî bi rih û rûtirş got:

—Bajo, emê van bibin polîsxana Fuarê!

Ji xwe tirsa hemû zarokan jî polîsxana Fûarê bû. Komserekî polîsxana Fuarê hebû, zarokan navê wî kiri bûn "Xwediyê darê bê Xweda". Berî ku li zarokan xista, pêşî navê darê xwe ji wan dipirsî. Yên ku navê darê wî nizani biwana deh dar zêde li wan dixist.

Hersê dolmîş ji qada Konakê derketin. Du heban ji wan berê xwe dane Mezarlikbaşi û ya ku zarok tê de jî, berê xwe da polîsxana Fuarê. Piştî ku dolmîş ji meydana Konakê derket, polîsê ku li nik Bozan û

Misto rûniştî bû, bi guhên wan girt, serê wan li hev xistin û bi hêrs got:

—Hey bêjiyên heram, ma emê hertim bi we dakevin? Ma hun nizanin, ku cigarên biyanî qedexe ne?..

Polîsê şofêr peyva wî birî û ji zarokan pirsî:

—Hun ji ku ne?

Herduwan bi hev re bersiv dan:

—Em ji Mêrdîn in.

—Hun ji hundirê Mêrdînê ne an ji qezayên wê ne?

—Ez ji Dêrikê me.

Dû re Misto:

—Ez jî ji Nisêbinê me.

Polîsê ku li dawiyê rûniştî bû, bi dengekî bilind got:

—Yaho min fêhm nekir! Cigarefiroş ji Mêrdîn! Qaçaxker ji Mêrdîn! Meywefiroş ji Mêrdîn! Mêrkuj ji Mêrdîn! Ev çi ye yaho?..

Polîsê ku li nik şofêr rûniştî bû:

—Çima dê ne ji Mêrdîn bin? Ev li malê belaş digerin. Ev tu karekî weke mirovan nakin. Ev bêbav in, bêbav... Li paş xwe zîvirî serê herdu zarokan li hev xist, diranên xwe qiriçand û got:

—Hey lawên keran, bes e ji derdên we. Ma emê ta bi kengî li dû we bin?

Polîsê şofêr piştî ku zîvironekê zîvirî ser riya rast, got:

—Hun ji kîjan siyasetê ne?

Bozan milên xwe hejand û got:

—Yê min ez ne ji tu siyaseta me.

Misto jî eyn weke wî:

—Yê min ez jî ne ji tu siyaseta me.

Polîsê ku li dawiyê rûniştî bû, ji paşiyê de heryekî gurmistek di paş stûyê wan de lêxist û got:

—Derewa mekin, hun çawa ne ji tu siyasetan in?

Bozan:

—Welleh ez tu siyaset miyasetan nasnakim.

Misto jî weke wî got:

—Welleh ez jî tu siyaset miyasetan nasnakim.

Hema ku Bozan çi bigota, Misto jî ew digot. Ji ber ku Bozan bi salekê ji Misto mestir bû. Carna gava ku polîsan ji wan nuqurçk vedidan, Misto xwe nedigirt û digiriya. Lê Bozan nedigiriya, tenê rûyê wî sor dibû û bêdeng dima.

Êdî mînubus ji polîsxana Fuarê derbas bû. Armanca polîsan ew bû, ku hin zarokên din jî bigirin û roja xwe bibin serî. Lê ji Bozan û Misto webû, ku ewê bêne berdan. Ji Bozan bêtir kêfa Misto dihat. Tev pakêtên ku di destên wî de hatî bûn girtin, deh pakêt cigare çêdi bûn. Lê her şeşê din di ber gorên xwe de veşarti bûn. Wisa kêfa Misto hat, ku xwe negirt û spasên xwe ji wan re got:

—Pir spas! Welleh ez carek din cigaran nafroşim, ezê di çayxana xalê xwe de şagirtiyê bikim.

Polîsê ku li nik wî rûniştî bû, di devê wî de lêxist û got:

—Hiş be, bêjiyê heram! Tu dê îcar me bixapînî ha!..

Misto dîsa pozê xwe daliqand û kire îskîn.

Êdî dolmîşa wan gihişte Tepecîk û ajotin ber devê hewşa kerxanê. Mirov ax biavêta li erdê nediket. Li ber devê hewşa kerxanê her tişt dihate frotin. Lê yên ku cigare difrotin, diva bû ku çar çavên wan hebûna; tirsa wan ji yên din bêtir bûn. Her kesî jî nikarî bû li ber devê hewşa kerxanê cigare bifrota. Yên ku li wir cigare difrot, diva bû ku dilê wan kevir tê de bûya. Ji ber ku bîst û çar saetan polîs li wir peyda dibûn. Ji xwe li wir ji sê cigarefiroşan pê ve cigarefiroş tune bûn. An kesî newêri bûn li wir cigare bifiroşta. Ku ne ji Çeto biwa kesî li wê taxê cigare nedifirot. Êdî taxa Tepecîk keti bû destên Çeto. Bi kurtî Çeto bûbû serokê cigarefiroşan li wê taxê. Yanî navê taxa tepecîk, bûbû taxa Çeto. Çeto jî berê li Konakê cigare difirot. Piştî ku wî û serokê cigarefiroşê Konakê li hev nekirin, êdî serokê cigarefiroşan nehişt, ku ew li wir cigaran bifiroşe. Wî jî êdî li wir cigare nedifirot. Pêşî çû nik serokê cigarefiroşê Bornowa. Lê li wir jî li hev nekirin. Dû re çû nik yê li Alsancak. Piştî ku li wir jî li hev nekirin, êdî çû taxa Tepecîk û ji xwe re çend cigarefiroş jî peyda kirin û bû serokê cigarefiroşan. Ew tax, bû taxa wî. Ji temama serokê cigarefiroşan bêtir jî ew dihate naskirin. Dost û hevalên wî ji yên hemiyan bêtir hebûn. Hema hema polîsên sê polîsxanan ew nasdikirin. Tenê peywendiyên wî bi polîsên Fuarê re tune bû. Gava ku peywendiyên xwe bi polîsên Fuarê re jî çêbikira, tirsa wî nedima. Polîsên din ku dihatin, digotin:

—Çeto!

Çeto jî digot:

—Temam, temam! Me fêhm kir! Bi dizî pakêtek

cigare dixiste bêrîka wan û ew ji ser xwe der dikirin. Carna jî destê xwe dikir hutik, li zikê wan dixist û digot:

—Hun wek gurên birçî ne!

Ji xwe temama cigarefiroşan navê polîsan kiribûn "Gurên birçî"

Gava ku polîs ji dolmîşê daketin, Çeto fîkand û ji hevalê xwe re got:

—Xwe bidin alî, gurên birçî hatin!..

Şika mirov tew ji Çeto çênedibû. Ew tu caran jî nehati bû girtin. Derbekê kirî bihata girtin, ew jî sûcê hevalê wî bû.

Çeto dîsa fîkand, lê hevalê wî lê hayî nebûn, her ban dikir:

—Marlboro, kent... Marlboro... Kent... Marlboro..

Polîsek ji wan çû, bi qestî cuzdanê xwe derxist û bazara cigaran kir:

—Kent bi çiqasî ye?

—Liba wan bi sî lîrayî ye, tu li Konakê bi pêncî bi dest naxînî.

Polîs hîn bêtir xwe li nezaniyê danî:

—Na, ezê bîst û pênc lîran bidime te. Ez cigarên wekî din nakişînim. De bi bîst û pêncan bide min!

—Na apo, çênabe! Ji te tirê ku ev samsûn e?

Polîs du lîra û nîvên din jî lê zêde kir. Ji xwe nêta wî û kirînê tune bû, armanca wî bîskê lêwik bixapîne:

—Niha tu bîst û heft û nîvan jî nadî?

—Bîst û heft û nîv kirîna wan e, apo! Serê pakêtê

em du lîra û nîvan kar dikin. Çavên te lê ye ku em bê kar bidin û li vir li ser lingan birikrikin. Ji xwe tirsa polîsan ne tê de.

Çeto li hember wî rawesta bû û jê re bi destanîşaret dikir. Lê, lêwik qet li dora xwe nedinihêrî, wî her bazara cigarê dikir.

Polîs dîsa got:

—Birazî, bi bîst û heft û nîva bide min, ne hewcî ku ez ewareyî Bornova bibim. Ku ez herim Bornova, li wir liba pakêta kent bi bîst û pênc lîran e.

Lêwik berê xwe jê guhert û got:

—Baş e apo, here ji xwe re ji wir bikire.

Polîs heta ku jê hat şîmaqek lê xist, bi milê wî girt û got:

—Bide pêşiya min, bêjiyê heram!..

Hingî lêwik fêhm kir, ku polîs e. Pêşî xwest ku bazde, lê kir nekir fîrsend neketê.

Pakêteke marlboro û du pakêtên kent di destan de bû. Çeto hêdî di ber wan de çû, dada pakêtên di destên lêwik de û bazda. Polîs bera dû wî da. Lê ne polîsek, deh polîsan bi hev re jî bera dû Çeto bidana ew zept nedikirin. Gava ku polîs bera dû Çeto da, lêwik kuçe li xwe zîvirand û winda bû.

Ji xwe sê polîs daketi bûn ji bo ku zarokan bigirin. Piştî wextekî kurt, hersê jî destvala ber bi dolmîşê vegeriyan. Gava ku ketin dolmîşê, yekî ji wan destê xwe li ser çavên Bozan û Misto xist û got:

—Hun dê bazdin jî ha!.. Hun dê me bixapînin...

Dolmîş ajotin, kirî bigihaştina Basmahanê, Misto dîsa li ber wan geriya ji bo ku wî berdin.

Polîsê ku li paş wî rûnişti bû, bi qemçîka paş stûyê wî girt, ew bi hêz hejand û got:

—Emê te berdin ha!.. Bêjiyê bêjî!..

Polîsê ku li kêleka wan rûnişti bû, çeka di destê xwe de nîşanî wan da û got:

—Ger ku hun navê vê çeka di destên min de zanibin, emê we berdin.

Bozan û Misto bi hev re lê nihêrîn. Gelo dê navê wê çi bûya? Wer ku li welêt qala tifingên Almanî dibû, ji Misto tirê ku tifinga Almanî ye, lê Bozan pê keniya û got:

—Ma ev ji ku tifinga Almanî ye, malwêran! Ev keleşnîkof e.

Hingî temama polîsan li çavên hevdu nihêrîn. Yekı ji wan dısa jê pirsı:

—Te got, navê wê çi ye? ..

Bozan milê xwe hejand:

—Ez baş nizanim, lê ez texmın dikim, ku ev keleşnîkof e.

Polîsê ku li herî/dawiyê rûnişti bû, bi dengekî gur got:

—Min ji we re negot, ku ev bi her tiştî zanin. Ev kurd in. Gava ku mirov bibêje "Kurd" divê ku mirov pênc deqîqan bihizire...

Yê şofêr peyva wî domand:

—Welleh rast e, her tişt ji van tê; ji mêrkujiyê bigire ta bi qaçaxkeriyê.

Êdî gihiştin ber deriyê polîsxanê, dolmîş dane

sekinandin, her du heban bi milê yekî girtin û ji dolmîşê daketin. Gava ku ketin hundirê polîsxanê, komsêrê ku li ser masê rûnişti bû got:

—Baş li van bigerin û bavêjin nezaretê.

Hingî ji tirsan çokên Misto lerizîn, xwe negirt û giriya. Gava ku polîs li wan geriyan şeş pakêt cigarên din jî di ber gorên Misto de dîtin. Teva pakêtên ku di destên wî de hati bûn girtin, tam deh pakêt cigare çêdibûn.

Piştî ku polîsan her yekî deh dar li wan xistin, paşê avêtin nezaretê. Ji Bozan bêtir Misto digiriya. Gava ku bi serê xwe, di nezaretê de man, Bozan şîret lêkir û ew da rawestan. Dû re destên xwe nîşanî hev dan. Kefên destên herduwan jî reş û şîn bûbûn. Dîsa ji Bozan bêtir janê dida dilê Misto; ew nikarî bû li ser lingan rawestiya, daqûl bû û li ser tûtikan rûnişt. Paşê herdu destên xwe dane ser hev, xistin nav çokên xwe û guvaşt. Dikir nedikir tebatî nediketê, wisa janê dida dilê wî, ku nikari bû di cihê xwe de rawestiya. Piştî ku hebekî jana dilê wî temirî, rabû ser xwe, eyn weke girtiyên girtîgehan du-sê caran di hundirê nezaretê de çû û hat. Dû re devê xwe xiste guhê Bozan û got:

—Tu bi a min bikî emê bazdin.

Bozan destê xwe li sînga wî xist,

—De here kuro! Emê çawa ji destên van polîsan bazdin? Ma te navê komsêrê Fuarê nebihîstiye, bê çi bêbav e?

—Ez di bêbaviya wî nim. Ew bêbav be, ez jê bêbavtir im, oxlım!

Bozan xwe avêt sînga wî, ziq li çavên wî niherî û


Khaled 86

got:

—Devê xwe temîz bigire, careke din nebêje "Oxlum"

Misto destê Bozan ji sînga xwe daxist û got:

—Binêr, Welleh ez rast dibêjim, ger ku tu bi a min bikî emê bazdin.

Bozan serê xwe kil kir,

—Zor e, zor...

—Çi zor e loo... Apê min panzdeh sal ceze lê hati bû birîn, bazda; yê te tu dibêjî zor e.

Bozan destê xwe danî ser devê wî û bi pistînî got:

—Hişbe lawo, qala tiştên wisa meke, dibe ku mîkrofon li van deran hebe; dê dengên me bê girtin, hingî emê di girtîgehan de birizin.

Misto destê xwe ber bi wî ve hejand:

—Here lo, tu biziya. Çi mîkrofon û çi hal. Ma mîkrofon hebe ewê di ku de be, ma ne tenê ev hundir e?

—Belê, tenê ev hundir e, lê ew karin cihê mîkrofonê di dîwêr de jî çêbikin.

Êdî, hêdî hêdî tarî dikete erdê. Her ku der ve tarî dibû, hundir nezaretê tarîtir dibû. Bozan û Misto êdî di hundir de aciz bûbûn. Dev ji acizbûnê berde, ji birçîna nikarîbûn li ser xwe rawestiyana. Geh xwe li erdê dirêj dikirin, geh di hundir de diçû û dihatin. Ji xwe nezaretxane tenê cihê sê peyan tê de hebû. Lê di hundir de tu tişt tunebû. Textikek jî tunebû ku xwe bidana ser. Li ser çimento bûbûn weke du daran

Her ku dereng dibû, hîn bêtir hundirê nezaretxanê dicemidî. Baş bû, ku Misto çakêtê wî lê bû. An na ewê ji serma biqefiliya. Bozan jî tim sola xwe di-

xiste bin serê xwe û xwe li ser çimento dirêj dikir. Misto çend caran li derî xisti bû, ji bo ku here daşirê, lê polîs pê re xeyidî bûn û derî lê venekiri bûn. Misto hew xwe girt, bi lez bişkokên şalwarê xwe vekirin û di quncikeke nezaretê de mîst. Gava ku xwişîna mîza wî hat, Bozan ji cihê xwe pekiya û bi ser de qîriya:

—Lawo lawo, ma tu çi dikî? Emê çawa di vir de bimînin ji bêhna mîza te? Emê çawa di vir de razên îşev?

Misto fedî kir, tu bersiv neda.

Dengên ken û henekên polîsan di hundir polîsxanê de olan dida. Wer xuya bû, ku êdî dor dihate guhertin. Ji dêvila polîsên ku bi roj xebitî bûn, êdî polîsên şevê dihatin. Di wê nîvê de yek ji wan polîsên ku nû hat, çû ber deriyê nezaretê û pirsî:

—Sûcê we çi ye, kuro?

—Cigare bi me re hatine girtin.

Polîs destê xwe di nav şîşên derî de dirêjî serê herduwan kir, serê wan li hev xist, diranên xwe qiriçand û got:

—Cigare bi we re hatine girtin, ha? .. Tew cigarên biyanî!

Piştî ku ew polîs çû, yekî din hat; çar-pênc nifte di destê wî de bûn û hate ber derî. Berî ku ew bipirse, Bozan got:

—Sûcê me cigarefirotin e.

Ji ber ku zêdeyî deh polîsan ji wan pirsî bûn. Gava ku digotin "Sûcê me cigarefirotin e" polîs bi ser wan de radi bûn, xeber û gotinên pîs ji wan re diki-

rin. Carinan jî bi guhên wan digirtin û serê wan li hev dixistin.

Misto jî rabû;

—Sûcê me cigarefirotin e.

Polîs wa bi dilşewatî serê xwe hejand û got:

—Ez zanim, ez zanim! Ez zanim hun qaçaxkeriya cigaran dikin...

Misto peyva wî birî:

—Na Welleh ne em in. Em bi tirên û keştiyan qaçaxkeriya cigaran nakin.

Bozan niqurçk jê veda:

—Bêaqilo, ew heneka dike.

Polîs keniya, serê xwe hejand û ji wan pirsî:

—Hun dixwazin herin daşirê?

Herduwa bi hev re gotin:

—Em çawa naxwazin herin daşirê?

Polîs ji wan re derî vekir, herduwan bi hevre bazdan daşirê. Piştî ku ji daşirê vegeriyan, polîs ji wan pirsî:

—Hun ne birçî ne? Ma we tu xwarin marin xwariye an na?

Dîsa herduwa bi hev re gotin:

—Em birçî ne, me tu xwarin nexwariye.

Polîs çû ji wan re nanekî firnê yê mezin û hin zeytûn û helaw kirî û anî da wan.

Herduwa weke du gurên birçî nan ji destên hev revandin. Piştî ku zikên xwe dagirtin, polîs dîsa ji wan re derî vekir. Çûn têr av vexwarin, dest û çavên xwe şuştin û vegeriyan cihê xwe. Piştî ku polîs derî li ser wan girt, ji wan pirsî:

—Min nepirsî, gelo hun ji ku ne?

Pêşî Bozan bersiv da:
—Ez ji Dêrikê me.
Dû re Misto got:
—Ez jî ji Nisêbînê me.
Polîs jî xwe bi wan naskirin da:
—Ez jî ji Wanê me.

Di wê nîvê de herdu hevqas kêfxweş bûn, ku nizani bûn di nezaretê de ne. Gelo ji bo çi ew polîs ji wan re baş bû? Gava ku polîsên din dihatin, tenê ji wan re xeber didan û serê wan li hev dixistin.

Polîs dîsa ji wan pirsî:
—Dê û bavê we li virin an na?
Bozan:
—Na!
—Lê hun çawa û ji bo çi hatin?
Dîsan Bozan bersiv da:
—Apê min li vir çayxana wî heye. Gava ku hati bû welêt, hat mala me û ji bavê min re got: "Çi ye ev zarok marok bêkar di ser hev de genî bûne? Wan bişîne nik min, bi avfiroşiyê mabe dê we xwedî bikin". Bavê min jî ez şandim. Lê bê dilî diya min bû. Diya min çiqas kir nekir, çiqas li ber bavê min geriya negeriya, bavê min bi a wê nekir û ez şandim. Giriyê ku diya min li dû min kir, ez tu caran ji bîr nakim. Di despêkê de min pir dixwest ku ez werim Îzmîrê. Lê niha ez pir poşman bû me. Xwezî ku min bi a diya xwe bikira û ez nehatima. Li welêt tu kar tunebû. Bavê min û diya min ji bo kar pevdiçûn. Diya min tim ji bavê min re digot: "Bavê min kûçik be, ez hew di vî hundirî de disekinim. Qe tu jî weke

xelkê ji xwe re karekî bike, ma tu rewşa me nabînî"

Bavê min jî bi ser de diqîriya û digot: "Keçê ma ezê çi karî bikim? Ma tu nabînî ku ez hertim li kar digerim? Ma qey ez naxwazim ku zikê zarokên min jî têr bin weke yên xelkê? Hii, ma qey ez naxwazim? "

Gava ku bavê min û diya min pevdiçûn, min nedixwest, ku ez di hundir de bisekinim. Min dixwest ku ew bi min re pevbiçin, lê bi hev re pevneçin. Min qet debar nedikir. Min dixwest ku ez karekî bikim, ku êdî diya min û bavê min dilê hev nehêlin û bi ser hev de neqîjin. Pêşî min barkêşî kir. Gava ku diya min dît ku pişta min diêşe û ez bi şevan nikarim razêm, nehişt ez êdî barkêşiyê bikim û got: "Layê min, ger tu kanibe ji xwe re karekî din bibîne, dev ji vê mîrata barkêşiyê berde, jehr di nav van peran de be. Pişta layê min ji peran bi qîmettir e."

Her ku diçû êşa pişta min zêdetir dibû. Gava ku ez hebekî zêde bimeşiyama, janê dida pişta min û ez ji qidûm diketim. Min rabû dev ji barkêşiyê berda û min dest bi boyaxkeriyê kir. Lê jiyan ji boyaxkeran re tune bû. Her ku çawîşên belediyê em digirtin sindoqên me dişkandin û em didane ber şîmaqan. Dawî dawî, min dev ji wî karî jî berda. Lê gava apê min hat, qala Îzmîrê û karê Îzmîrê kir, bavê min ez şandim. Çend rojên destpêk min hin pere dan hev û li ser navê apê xwe ji malê re şand. Lê tu dibînî, em hertim di bin saw û tirsên de ne. Gava ku em tên girtin jî mala me wêran dibe.

Îcar polîs ji Misto pirsî:

—Dê û bavê te jî li welêt in an li vir in?

—Bavê min tuneye, lê diya min li vir e. Piştî ku bavê min hate kuştin, xalê min mala me bar kir nik xwe.

Polîs wa bi şaşmayî pirsî:

—Bavê te hatiye kuştin? ..

—Erê, bavê min hatiye kuştin. Bavê min barkêşiya qaçaxkeran dikir. Canê wî hertim di talûkê de bû. Carna jê bi mehan me ew nedidît. Şevekê saet çarê şevê li tixûp xistin, da ku derbasî binxetê bibin, lê, wan û leşkeran li hev teqandin. Hingî mirov digot, qey li Nisêbînê ceng e. Heta bi saet heftê sibê weke mirov xwê bavêje agir teqîna tifeng û bomban dihat. Wê şavê heta sibê xew nekete çavên min û diya min. Me xwe li hev dipêça û em digiriyan. Diya min li ser hev dia dikir û digot: "Qe îcar jî tişt nebûya, qe îcar jî bavê te sax bifilitiya, bes bû, bila bes bi vê mîrata qaçaxê re bilebikiya."

Saet heft heft û nîvê sibê dengê teqîna tiving û keleşkofan hate birın. Piştî wê bi saetekê me bihîst, ku neh qaçaxker hatine kuştin. Ez û diya xwe ji hundir derketin û me ber bi tixûp ve bazda. Hîn em negişti bûn nîvê bajêr, me dît ku tirimpêlek leşkeran sekiniye û kuştiyan dixin traktorekê. Li dora tirimpêlê pir mirov hati bûn ser hev. Min û diya xwe, xwe di nav wan rakirû em çûne ser kuştiyan. Kesî kes nasnedikir. Yên serê wan jê bûbûn, yên dest û lingên wan... Ku ne ji kincên bavê min bûya, me ew nasnedikir, nîvê serê wî firiya bû.

Êdî hew tişt got, sê-çar dilop hêsir ji çavan hat û bê deng ma. Polîs hilma dawî li cigara xwe xist û avêt. Wer xuya bû, ku pir hêrs bûbû; cigarek din jî vêxist, li dora xwe nihêrî û bi dengekî nizim got:

—Berî ku komsêr were divê ku em awakî bikin. Ger ku komsêr were xelasiya we tune, hun ji destên wî bêbavî nafilitin. Piştî saetek din ew li ku be dê bê.

Bozan wa bi heyecan:

—Ma em çawa bikin? Ka tu rêke nîşanî me bide!

—Binêrin, ezê ji we re paca daşirê vekirî bihêlim. Paca daşirê bi sê niftên hesinî tê girtin. Şansa we heye, ku hun niha hatine girtin. Piştî du mehên din ku hun bihatina girtin, dê ev îmkan ji we re tuneba. Ji ber ku nezaretek nû ava dikin û daşira wê nezaretê bê pace ye. De, ne hewce ye ku em dirêj bikin; komsêr li ku be, wextî bê. Gava ku komsêr were dê ban we ke, ji bo ku îfada we bigire. Ji xwe dê rast we bişînin mahkemê. Lê berî ku we bişînin, mafê we û çûyina daşirê heye. Hingî hun bêjin, em dixwazin herin daşirê. Yek ji we pêşî here, ava ku mirov pê destên xwe dişo, vekirî bihêle, dû re yê din here. Bi vî awayî hun dê herdu jî azad bibin. Lê, dibe ku hun bêne girtin jî. Hingî hun nebêjin ku min ev rê nîşanî we da ye, haaa!..

Herduwan bi hev re gotin:

—Na, na!

Polîs destên xwe di serê wan da, çav da wan û ji nik wan çû.

Pir tê de neçû, komsêr hat. Cigara wî a marlboro di devê wî de bû û derbasî odê bû. Berî ku rûnê, pa-

kêta xwe ya marlboro avêt ser masê û destê xwe da ser qonçekê, çayek xwest û rûnişt. Dû re ban hin polîsan kir û li girtiyan pirsî.

Di vê nîvê de, Bozan sê-çar caran li ser hev li derî xist. Polîsekî navsal û rûtirş bi wan ve hat.

—Çi ye, hun çi dixwazin?

Bozan herdu destên xwe xistin nav çîpên xwe û got:

—Zû derî veke, min bi xwe de mîst.

Polîs derî vekir û got:

—De ecele bike, divê ji pênc deqîqan derbas nebe.

Gava ku derî vebû, Bozan bi lez ber bi daşirê ve reviya.

Polîs bi dengê xwe yê qalind û gur ji Misto re jî got:

—Ger ku tu jî dixwazî here tuwaletê here, an na tu hew karî here tuwalet muwaletan. Piştî bîst deqîqên din emê herin mahkemê.

Hîn peyva polîs di dev de bû, Misto jî ber bi daşirê ve bazda. Gava ku Misto kete hundir daşirê, Bozan ne li hundir bû, wî jî zû destên xwe avêtin hesinê pacê û bi jor ket. Bozan xwe xelas kiri bû û ji der ve li benda wî sekinî bû. Gava ku misto jî xwe ji pacê avête jêr, herduwan bi destên hev girtin, bazdan û ketin nav koma merovan.

Polîs li deriyê daşirê xist û bi hêrs got:

—De haydê, ecele bikin, tenê deqeke we ma ha!

Tu deng ji hundir daşirê nehat, lê tenê avê dikire xuşîn.

Polîs dîsa li derî xist, gava ku tu deng ji hundir

nehat, derî vekir û kete hundir. Ew çi bibîne, ku paca daşirê li ser piştê ye û daşir vikîvala ye.

# Girtî

Ev tam meheke wî çê bûbû, ku girtî û di nezaretxanê de bû. Ji lêdan û îşkencê mirov ew nas nedikir. Porê wî û riha wî ya xelekî (kurîşk) ser ruyê wî ê zeyif winda kiri bû. Ji xwe mirov digot, qey devê wî tune ye. Simbêlê wî ser herdu lêvên wî girti bû û daketi bû ta bi ser çenga wî. Ji por û riha wî, serê wî ji gewdê wî mezin_tir xuya dikir. Bi wî awayî, destê xwe bi hêz li deriyê hesinî xist, da ku hin jê re derî vekin û here daşirê.

Wî du-sê caran wisa li ser hev li derî xist lê, kes pê ve nehatin. Dû re destên xwe avêt şîşên derî, pê girt û bi hemû hêza xwe hejand û bang kir. Bi dengê wî re herdu polîsan li çavên hevdu nihêrîn. Yekî ji wan araqiya ku di şûşê de mabû bi ser xwe dakir û rabû ser xwe. Lê rabûn û ketina wî bû yek. Hevalê wî rabû, ku wî ji erdê rake. Ew jî wisa diheji-ya, ku mirov digot, wextî ew jî bê xwarê. Lê wî xwe girt û neket; bi herdu milên polîsê ku keti bû girt, hejand û bi dengekî ne zelal (wek dengên serxweşan) got:

—Rabe, here xwe li ser qoltixan dirêj bike.

Polîsê ku li erdê, weke ku vereşe qirpika wî hilat. Bi pişta destê xwe simbêlê xwe paqij kir û wî jî bi dengên serxweşa got:

—Te got çi? .. Ma ji te tirê ku ez serxweş im? Ez ne serxweş im haa!..

—Erê erê, tu ne serxweşî! Lê rabe here xwe bîskê li ser qoltixan dirêj bike!

Dû re hejiya û wextî biketa, lê neket û bi hêrs ji polîsê ku keti bû xwarê re got:

—De rabe ha! Lawo tobe be, ku ez carek din bi te


Khaled 86

re araqiyê vexwim!

Yê ku li erdê, weke gayan kir ûrînî:

—Ji te weye, ku ez serxweş im ha! Bi hêz ji erdê rabû. Gava ku rabû, çokên wî hejiyan û wextî bike-ta; lê yê din kete bin milê wî, ew bir daşirê û serê wî da ber ava cemidî û şuşt. Piştî ku serê xwe daw-şand got:

—Yaho bi rastî jî vê mîrata araqiyê tesîr li min kir. Min digot qey ez tu caran nakevim.

Yê girtî ji serî heya binî li wan guhdarî dikir. Dîsan li derî xist û got:

—Derî vekin, derî vekin ez herim daşirê, min bi xwe de mîst!

Hingî polîsekî ji dê û jina wî re xeber da, lê deng neçû girtî, ji ber ku dengê wî hebekî ji dûr ve hat. Yê girtî her li derî dixist. Yek ji nav polîsan di daşi-rê de vereşiya. Piştî ku dev mevê xwe şuşt, çû û xwe li ser qoltixan dirêj kir. Yê din jî rahişt meqesê û ber bi nezaretê ve çû, da ku ji xwe re bîskê bi yê girtî bileyize û por û riha wî bide ber maqesan. Gava ku deriyê nezaretê vekir, gêj bû, şewişî, ket û dîsan rabû. Hema ku rabû, meqes avêt ji porê girtî de. Du sê caran li ser hev meqes avêt ji por û riha wî de û her carê gulokek ji serê wî tanî xwarê. Lê gava girtî tê derxist, ku ew bê hêz e, heya ku jê hat hutukek di paş stûyê wî de lê xist. Bi hutika wî re polîs heji-ya, çavên wî çûnû hatin û li ser piştê li erdê ket. Pê-şî girtî hebekî tirsiya, dû re serê xwe hêdî derxist der ve û li hundir polîsxanê nihêrî. Dîsan li hundir vegeriya, qederê deqîqakê ji xwe re fikirî û rê ji hev-du derxistin. Paşê zû zû daqûl bû ser polîs û kincên

wî jê kirin. Pêşî çakêt, dû re şalwar û dawiyê jî solên wî ji lingan kir. Şewqê wî ji xwe berê ji serî keti bû. Hema zû zû, ji bo ku wext winda neke, kincên xwe ji xwe kirin û ew kincên ku ji polîs kiri bûn li xwe kirin. Piştî ku kincên polîs li xwe kirin, di dilê xwe de got:"Xwezî ku niha neynikek li vir hebûya û min li xwe binihêriya". Dû re şewqe jî da serê xwe. Mirov digot qey ew kincan xisûsî ji bo wî hatibûne çêkirin, tam li gorî wî bûn. Lê ji ber ku ji lêxistin, îşkencê û birçîbûna zeyif bûbû, ew kinc hebekî jê re fireh dihatin. Lê wekî din tam li gorî wî bûn. Dû re bi herdu destên polîs girtin û weke ku mirov belatekê bikişîne, ew kişande qorzîka nezaretê, guhê xwe da ser dilê wî û li lêdana dilê wî guhdarî kir; dilê wî hîn lê dixist.

Bi derbekê ramanek hat girtî. Hema rahişt wê meqesa li erdê, bi riha xwe ket û qusand. Mekes tûj, wek gûzên (cilêt) bû. Di hundirê nîv deqîqê de ji bilî simbêlê wî pirç li ser ruyê wî nema. Dû re hêdî deriyê nezaretê li ser wî girt û derket. Ji dengê xirîna polîsê ku li ser qoltixan razabû pê ve, tu deng ji hundir polîsxanê nedihat. Girtî hêdî di ber wî re derbas bû û derket der ve. Tevlî tarîtiya şevê bû û bi gavên xurt lezand.

# Kurmê Darê Ji Darê ye

Gava ku bavê Kotên diya wî berda, Kotan hê du salî bû, bîra tu tiştî nedibir. Lê, niha mezin bûbû, bûbû çardeh salî. Ji zilma ku dêmariyê lê kiribû çavên wî venedibûn. Mirov destên xwe li ber çavên wî bihejanda, bijankên wî diçûn û dihatin û paşê çavên wî dihatin girtin.

Êvarekê, gava ku kete nav nivînê xwe, xewa wî nehat; xwe vir de livand, wê de livand, kir nekir xew nekete çavên wî. Hebekî jî birçî bû, lê nerazana wî ne ji birçîbûnê bû. Ji ber ku pir caran weke îşev birçî mabû, lê dîsan jî raza bû. Lê îşev... Çima îşev nikarîbû raza gelo? Te digot qey marek di nav nivînê wî de ye; dikir nedikir xewa wî nedihat. Paşê hêdî destên xwe xiste bin serê xwe û li hewa nihêrî.

Gelo ji bo çi vê jinikê her dem jê re digot:
"Dêkahp, dêqûnde" û bi ser de diqîjiya? Lê vê êvarê bavê wî jî bi wî bi ser de qîjiya bû û gotibû:
"Bêjiyê bêjî" û heta ku jê hatibû şîmaqek bi hêz lêxistibû.
Zilma dêmariya wî û ya bavê wî, weke sînemayê dihatin ber çavên wî.
Êdî debar nekir, destê xwe yê rastê ji bin serê

xwe kişand û bi hêrs li eniya xwe xist û çavên xwe firkand. Paşê wa bi dengekî nizim ji xwe re got:

—Ma gelo diya min kahp e? Ger ku ne kahp bûya, ji min re her dem ev peyvên han nedikirin. Ilim jî, bavê min ji min re peyvên wisa bikira, diva bû, ku wê qebûl nekira.

Hîn wilo, ji nişkê ve tiştek niqutî dilê wî. Dîsan bi xwe-xwe got:

—Ger ev diya min biwa, dê rojekê weke hemû diyan bigota: "Lawê min". Dê weke hemû diyan bi zimanekî xweş bi min re bipeyiviya.

Emrê wî bûbû çardeh, hîn nizanîbû, bê ev diya wî ye an dêmariya wî ye. Tiştê ku li ber guhan ketibû jî, guh nedabûyê. Êdî ji behca êş kete serê wî, xwest ku cigarekê bikişîne. Hêdî ji nav nivînê xwe rabû û çû oda din. Ji tirsa lampe vênexist, bi destpelînkê çû. Destên xwe li hundir, li cigara bavê xwe gerand. Piştî ku li ser masê û li ser qoltixan geriya, Paşê çû ber dolabê, çavîka wê kişand û destên xwe li hundirê çavîkê peland. Hingî pakêtek cigare û tiştekî giran kete destê wî. Ew tiştê giran çi bû gelo? Destê xwe yê din dirêjî wî tiştî kir û ji çavîkê hilda jor. Ji ber ku hundir tarî bû, bir ber pacê û lê nihêrî. Gava fêhm kir, ku debançe ye, canê wî bi derbekê re sar bû, çavên wî fireh bûn û lerizî.

Êdî diva bû, serê xwe bilind bikira. Diva bû, diya xwe ya kahp bikuşta. Eyn ew li perê asûman biwa jî diva bû lê bigeriya û ew bikuşta. Piştî ku qederekî li ser lingan hizirî û xeyal anîne ber çavên xwe, paşê bi qulûsî derket der ve.

Der ve rohnî bû. Lê Kotan nizanîbû, êvar e an jî

sibe ye. Gelo dê bi ku de biçûya? Gorî peyvên li ber guhên wî ketibûn, dê diya wî li gundekî çiyê biwa. Lê bi hezaran gund li çiyê hebûn. Dê berê xwe bi kîjan gundî vekira û bi ku de biçûya? Çiqas hizirî nehizirî tu rê ji hev dernexist; kete kuçekê û lezand. Di rê de bi xwe-xwe got:

"Hema ez ji mal bi dûr kevim, bila qet ez gund nebînim; ez ji zilma malê xelas bibim, besî min e"

Gava ku ji nav bajêr derket, dinya hîn rohnîtir bû. Êdî zanî bû sibe ye. Gava fêhm kir sibe ye, kêfekê ew girt, kirî bifiriya. Wextî ew tiştên berê hemû ji bîr bikira. Dû re destê xwe xist bêrîka xwe û pakêta xwe ya cigarê derxist; cigarek vêxist û kişand. Her hilmek li cigarê dixist, weke dûmana sobekê dûman bi ser serê wî diket. Bi çend hilman ew cigara xwe qedand. Xwest cigareke din jî bikişîne, lê hew kanîbû, ji ber ku serê wî gêj bû û dilê wî li hev ket; sê-çar caran li ser hev tif kir û dû re lezand.

Riya ew tê de diçû, ne riya tirimpêlan bû. Tirimpêlên di wê riyê de diçûn û dihatin an traktor bûn, an jî motorbisiklêt bûn. Carina jî gava ku leşkeran ji xafil de digirtin ser bajêr, hin tirimpêlên wan di wê riyê de dihatin.

Tirsa Kotan, ya herî mezin leşker bûn. Leşker lê rast bihatana, dê muheqeq jê bipirsiyana bê ji ku tê û bi ku de diçe. Ji ber ku pir caran leşkeran girtibûn ser bajarê wan. Vê dawiyê girtibûn ser dibistanan.

Derbekê gava ku leşkeran girtibûn ser dibistana Kotan, Kotan û du zarokên hevalên wî hatibûn girtin. Hingî du pirtûkên mamostê wî pê re hatibûn gir-

tin. Ji ber lêxistin û îşkenca leşkeran debar nekiribû û goti bû "pirtûk ne yên min in, yên mamostê min in". Ji ber ku emrê wî piçûk bû hati bû berdan. Dû re mamostê wî hati bû girtin û ceze xwari bû. Gava ku lêdan û îşkenca leşkeran dihate ber çavên wî, dilerizî, xwîna wî disekinî. Ji bo ku li leşker meşkeran rast nê, tim çolbeyar diçû. Piştî ku qederekî meşiya, êdî ket ser riya gundekî û lezand. Tiştên li ber guhên wî ketibûn dê diya wî li gundekî nêzîkî bajêr biwa. Ger ne ev gund biwa dê gundekî din biwa. Ji xwe li vî milî ji sê-çar gundan pê ve gund tunebûn.

Derbekê nihêrî ji dûr ve reşekî xuya kir; kerek bi bar di ber de ye û ber bi bajêr ve dilezîne. Gava ku nêzîkî li hev kirin, mêrik destê xwe yê rastê hilda jor û silav da Kotan. Kotan jî eyn weke wî destê xwe hilda û silava wî lê vegerand. Mêrik ji Kotên pirsî:

—Biraziyê delal, gelo agirê te heye?

Kotan bi herdu destan bêrîkên xwe peland û bersiv da:

—Erê apo, agirê min heye. Û çixat dirêjî peyê kir.

Ev rêwî, barê wî êzing bû. Emrê êzingvan di dora heftê re bû. Kincên wî pertalî û solên wî pînekirî bûn. Riha wî ya spî rûyê wî xemilandibû. Wer xuya bû westiya bû. Piştî cigara xwe vêxist, ji Kotên pirsî:

—Birazî, ger ecela te tune be, em rûnên, bi hev re cigarakê bikişînin?

Kotan li rewşa wî nihêrî û bi devkenî bersiv da:

—Ecela te tunebe, ya min tuneye, apo!

Kalo jî keniya:

—Eh... wê çaxê baş e, emê bi hev re cigarakê bikişînin. Dû re çû kera xwe li qiraxa rê, bi gomekî ve girê da û herdu li hev rûniştin. Gava ku kalo rûnişt canê wî kire qirpe-qirp û ji Kotên re got:

—Ohh... birazî! Halê me halê kûçika ye. Em mirin di van riyan de, em riziyan (destê xwe ber bi kerê xwe ve dirêj kir) ha tu dibînî, ji bo barek êzing em di ser çar gundan re tên. Hemû jî, ji bo kîlok şekir e, an ji bo kîlok rûn e. Carina jî hinek henin ji wan re dibêjin "Ormancî". Rehm di dilê wan de tuneye. Hem barê êzingên me ji me distînin, hem jî weîsên me diqetînin.

Hem dipeyivî û hem cigare dipêça. Di wê navberê de Kotan cigare îkramî wî kir. Kalo cigare ji dest girt û got:

—Ooo... cigarên biraziyê min bi qûnik in. Destê xwe dirêjî pakêta di dest Kotan de kir û ziq lê nihêrî; piştî ku qulipand vî alî û wî alî, dû re da Kotan.

Kotan fêhm kir û got:

—Ev cigare ne ya min e, apo! Tu nebêjî qey ez cigarekêş im û cigarên wisan dikişînim. Ev cigare ya bavê min e.

Mêrik keniya:

—Divê ku bavê te dewlemend be, ku cigarên wisa dikişîne. Ev cigare pir bihane, birazî! Ji ber ku lawê min cigarek wisan ji bajêr kirî bû carkê. Ji min re got:

—Bavo!

Min got:

—Ha.

Got:

—Tu zanî ev cigare bi çiqasî ye?

Min got:
—Na!
Got:
—Ev cigare, bi bihayê barê êzingê te ye. Navê wê jî got, lê baş nayê bîra min. "Melbo" bûûû... an tiştekî weke wê bû.
Kotan peyva birî:
—Qey Marlboro bû, apo!
—Ha, ha! Malbora bû, malbora...
Paşê ji Kotan pirsî:
—Wer xuya ye ku tu bajarî yî. Gelo tu ji kîjan bajarî yî? Tu ji Nisêbîna me yî, an ji bajarin din î?
Kotan:
—Ez ji Nisêbînê me, apo!
—Tu ji Nisêbînê yî?
—Erê, ez ji Nisêbînê me.
Piştî ku axînek kûr kişand, got:
—Bênamûsekî gundiyê me jî li Nisêbînê rûdine; bênamûs di ser wî re tune ne. Gelo tu li kîjan taxê rûdinî?
—Ez li taxa Zeynel-Abidîn rûdinim.
—Hah... ew bênamûs jî li wê taxê rûdinî. Dewlemedê gund bû. Hema, hema erdên gund tevde di destên wî de bûn. Lê niha tenê çend perçe erdê wî mane. Yên din hemû firote gundiyan û gundî xistine bin deynên xwe. Çû bi bavkûçikeke weke xwe re zewicî û ji bo wê jina xwe berda. Qebhet xiste stûyê rebenê, tiştên nemayî bi serê wê de anî. Hê zaroka wê li dest bû, zarok jê girt û ew bi serê wê hişt. Ma çi jin, birazî! çi jin... Weleh Milyaket e, Milyaket...

Kotan tê derxisti bû, ku qala bavê wî dike. Mû-

yên canê wî lê gij bûbûn, çavên wî weke du fîncanan vebûbûn. Gava ku hêrs dibû, canê wî dixuriya, xweydan dida û dilerizî. Niha jî lê wa hatibû. Ji hêrsan nikarî bû di cihê xwe de rawestiya. Emrê wî çardeh bû, lê di wê deqîqê de, di bîstan de xuya dikir. Qermîçokên eniya wî bûbûn weke yên kalan. Hema li devê kalo dinihêrî, dixwest ku tiştekî din jî bêje.

Kalo hew peyivî, destên xwe dane ser çokên xwe û xwest ku rabe, lê Kotan nehişt û got:

—Apo, cigarek din jî bikşîne, dû re here. Cigare îkramî kalo kir. Kalo cigare jê girt, vêxist, du hilmên kûr li ser hev li cigarê xist û diwê wê di dev û pozê xwe de berda.

Çavê Kotan hema li devê wî bû, dixwest tiştekî din jî bêje. Dixwest qala tiştekî din jî bike. Lê peyv ji kalo derneket, hilm li ser hilmê li cigarê dixist û dihizirî.

Kotan ji bo ku wî bipeyivîne jê pirsî:

—Êê... apo! Ma îcar ew peya (zilam) nayê gund carina?

Mêrik wa bi keder serê xwe ber jêr ve hejand:

—Belê, dihate gund. Pir caran li ser hev dihate gund. Lê niha evqas nayê. Bi nehatina wî jî tu gundî nizanin bê ji bo çi ye. Berê her ku dihat, mala gundîkî dişewitand. Lê niha hin gundî dibêjin, newêre. Ji ber par, gava ku hatibû gund, sê xortên me yên xwende çûbûn pê re peyivîbûn.. Piştî munaqeşa wan, hin xirecir di nav wan de derketi bû. Gava ku ew beraz vedigere bajêr, leşker û polîsan dişîne ser gund û hersê xortan jî bi girtin dide. Yê min ez nizanim, lê hin gundî dibêjin; "Muxbir"e. Wî geleeek xortên vî gundî bi girtin dan, geleek... Ha! Min çi di-

got? Lê, gundî dibêjin newêre. Dibêjin, xwendevanan li bajêr ew tehdît kirine; ji bo vê newêre. Bi saloxan tim li qereqol mereqola ye ew bênamûs.

Êdî nexwest, ku zêde bipeyive. Ji ber ku roj bilind dibû; gava ku di wextê xwe de negihişta bajêr, dê barê êzingê wî di stûyê wî de bima. Rabû ser pê, destê xwe yê rastê li milê Kotên xist û got:

—Lê, birazî! Te bihîst, bênamûsên çawa ji nav me dertên. Dibêjin: "Kurmê darê neji darê be, dar narize." Ev peyvek rast e. "Kurmê darê ji darê ye"

Xatir ji Kotan xwest û çû.

Gava ku ew çû, Kotan cigarek din pêxist û kişand. Bi cigarekişînê re hizirî. Gelo dê çi bikira niha? Tiştên ku berê lê hizirî bû, niha dibû berevajiyê wê. Bi dengekî bilind û bi hêrs got:

—Rast e, bavê min muxbir e, bavê min bênamûs e!

Ji xwe berê şika Kotan jê çê bûbû. Rojekê, gava ku hin pirtûk anî bûn malê, bavê wî lêxistina ku lê kiri bû mirov li keran nedikir. Derbekê jî, gava ku ew û du hevalên wî di ber mala wan re derbas bûbûn, hevalekî wî bi tiliya xwe mala wan nîşan da bû û gotibû:

—Ha hun vê mala han dibınin, ev mala muxbır Hemo ye; temama hevalan jî pê zanin, ku Hemo muxbir e û her roj li polîsxanê ye.

Lê, lêwik nizanî bû, ku ew mal mala Kotan bû. Tiştên ku hate ber devê wî gotin. Hingî Kotan dev li lêva xwe ya jêrîn kiri bû û bê deng mabû. Lê şika Kotan ya herî mezin ji vê çê bûbû. Telefonên ku ji

bavê wî re dihatin an ji polîsan bûn, an jî ji qereqola leşkeran bûn. Vê yeka han di serê Kotan de cih girt. Diva bû îcar awak bikira. Diva bû îcar serê xwe bilind bikira. Bi ya wî serbilindahî îcar di vê de bû. Pêşî xwest ku vegere bajêr, çîrokê ji hevalên xwe yên komelê re bêje. Lê, ramanek din hatê û xwest vê yeka han bi serê xwe bike.

Kotan ber bi gundê diya xwe de dilezand; diva bû, ku muheqeq diya xwe bibîne. Êdî roj bi qameke bilind bûbû. Tava rojê paş stûyê mirov dişewitand. Kotan di ser gundekı re derbas bû. Gorî ku kalo gotibû, diva bû ku sê gundên din jî derbas bikira. Hin traktor di rê de diçûn û dihatin, lê Kotan destê xwe li tu traktoran bilind nekir û ew nedane rawestan. Bi kurtî nedixwest bi kesî din re rûnî ûbipeyive. Li rêwiyên ku rast dihat jî, tenê silav li wan dikir û ji wan derbas dibû. Berî ku roj here ava, nêzîkî li gund kir; lê riya xwe dagerand û neket nav gund. Li bendî kalo ma. Zanî bû, dê kalo îro vegere mal. Kalo têketa kîjan malê, mala di rex de mala diya wî bû.

Bi tarîketinê re dît ku kalo li kera xwe siwar e û dikeve gund. Çavên xwe ji kalo neqetand. Dît ku kalo kera xwe ajot hundirê hewşekê. Xaniyê kalo bi keviran hati bû lêkirin, nizim û xerabeyî bû. Li hewşê kûçikek û çêlekek hebû. Li ser xênî jî gundorekî spî xuya dikir.

Mala di rex mala kalo de jî, di nota kalo de bû. Lê tu çêlek mêlek li hewşê tune bû. Tiştên ku li hewşê dihatin xuyakirin baş nedihatin dîtin, lê mirov hema hema zanî bû, ku mirîşk in.

Piştî ku baş tarî kete erdê, Kotan xwe berda gund. Ji tirsa kûçikê kalo di paş xênî de çû. Gava ku di pêşiya xênî de biçûya, dibû ku kûçikê kalo ew bidirya. Kete hewşa diya xwe û çû li ber derî guhdarî kir. Dengekî wa bi nalîn ji hundir bihîst.

Lê lê, pepûkê! Lê lê, porkurê!
Wey bê hevalê! Wey bê hogirê!
Ma ev qeder bû hate serê te?
Li te perçe kir, gurçik û dilê!

Kotan debar nekir û sê-çar caran li ser hev li derî xist. Diya wî bi yek derbê re dengê xwe birî û bazda derî vekir. Gava ku derî vebû, Kotan xwe bê rohnî avête hemêza wê. Jinik şaş ma. Ji wê tirê, lawik dest davêje namûsa wê. Hema ew ji xwe veqetand û dehfek dayê. Bi dehfa wê re pişta Kotan li dîwêr sekinî. Ji ber ku nêzîkî lampê bû, ser çavên wî baş dihate xuya kirin.

Devê diya wî ji hev mabû, tu caran tiştên wisa nebûbûn. Ev zarok jî ne ji vî gundî bû. Destên wê li ser pêsîrên wê û ber bi wî çû; ji şanika ber pozê wî nas kir, ku Kotan e. Heta ku jê hat xwe avêtê. Hema kêdera wî kete ber, maç dikir û digot:

—Lo, Kotano! Bavê diya xwe, bavê min... Berxikê diya xwe... Ruhê min... Maşaleh, maşaleh, maşaleh... Maşaleh lawê min bûye zilam.

Wer ku diya wî ew maç kir û hemêz kir, debança wî ji ber ket. Gava ku diya wî debançe dît, çavên wê beloq bûn û got:

—Welleh ez bê sûc im. Welleh gunê min tune. Welleh bavê te qebhet xiste stûyê min... Ha min bi-

kuje, ha min bikuje Kotanê min! Ger tu bi ya bavê xwe dikî min bikuje. Ji xwe mirin ji vê rewşa min çêtir e. Ma qey te nebihîst Kotano! Ma te nebihîst, ku çi anî serê min. Axx...ax...axx!..

Bi herdu destên xwe li sînga xwe dixist û digot: "Min bikuje". Kotan rahişt debançê, xiste ber xwe, xwe li diya xwe pêça û got:

—Yadê, ez zanim. Bes e! Bes bike lave lav. Ne hewceyî tu bêjî. Ez bi gişî zanim.

Piştî ku qederekî di hemêza hev de bêdeng man, Kotan dîsan peyva dom kir:

—Dayê, emê herin... Emê herin bajarekî dûr, bajarekî mezin! Ezê te ji vê rewşê xelas kim. Emê herin!..

Hingî ruh bi jinikê ve hat, zanîbû ku nêta Kotan ne xerab e. Ev tam donzdeh sal bûn, ku lawê xwe nedîtibû. Ji kêfa,hêsirên wê bi ser hinarîkên wê de dihatin xwarê. Geh ew hemêz dikir, geh maçî dikir. Piştî ku bêhna wan hate ber wan, êdî diya wî dest bi çîrokê kir. Her tişt ji serî heta binî jê re got. Ma tiştên ku kalo gotibûn jî peyv bûn... Ew ne tu tişt bûn, li ber tiştên ku jinikê digot.

Kotan ji nişkê ve ji cihê xwe pekiya, dîsa diya xwe hemêz kir û got:

—Dayê, ezê niha herim. Lê di wextekî kurt de ezê bêm te bibim. Emê bar kin, herin bajarekî dûr, bajarekî mezin...

Piştî wan peyvên han ji derî derket û bazda. Gava ku gihişte bajêr saet yek û nıvê şevê bû. Xwe di ser hewşe de avêt û çû li ber paçê sekinî. Di navbera

perdê de nêviyê bavê wî dihate xuya kirin; telefon li ber guhê wî bû û dipeyivî. Kotan debançe ji ber xwe derxist û ji nîvê serê wî nîşan girt. Çend caran wisa li ser hev nîşan digirt, lê bernedidayê; çavên xwe digirt û serê xwe ji hêrsan vir de û wê de dihejand. Dawî dawî, bi herdu destan bi debança xwe girt û ji pencerê nîşan girt. Bi gula pêşî re bavê wî ket, lê wî her şeş guleyên din jî li pencerê reşandin û berepaş ber bi gundê diya xwe de bazda.

X X X

Dibêjin Kotan derbasî Kurdistana Iraqê bû ye, zewicî ye, du lawik û keçikek jê re bû ye; di gel diya xwe li Kerkûkê bi cih û war bû ye û li nexweşxanê doktoriyê dike. Serpêhatiya xwe hîn ji tu kesî re negotiye; ne ji diya xwe re û ne jî ji jina xwe re... Lê, her li başbûn û nebaşbûna kirina xwe difikire.

# Çîroka Muxtêr

Zarokên ku li dora gund dileyîstin, gava ku çav li kamyonên leşkeran ketin, ber bi malên xwe ve baz-dan û bi qîrîn bang kirin:

—Esker hatiiin... Esker hatiiin... Eskeeeer...

Dengên zarokan li gund li hev vegeriyan. Bi dengên wan re hemû gundî derketin ber deriyên xwe û li riyan nihêrîn. Gava ku çav li kamyonên leşkeran ketin, bi diltirsî û bê hêvî dîsan hemû bi paş de ketin hundir.

Şeş kamyon tijî leşker û ketin gund. Kamyonên xwe li jêrî gund, li ba dibistanê sekinandin û wek kuliyan xwe jê avêtin. Dû re çawîş mîkrofon xiste destên xwe û bang kir:

—Mileeet kes ji hundiran dernekevin! Yên ku ji hundirên xwe derkevin û bazdin ewê bêne kuştiiin.. Kes ji hundiran dernekeviiin...

Bi banga wî re xortek ji gund derket û bazda. Leşkeran lê reşandin. Weke ku mirov xwê biavêje êgir, dengên teqînên tivingên leşkeran hatin. Di wê deqîqê de, mirov digot bû ye ceng. Lê ew xort qet bê qidûm neket û nesekinî. Wî her reva xwe domand. Bi vizînî gule di ber guhên wî re derbas dibûn. Gule

geh li tehtên ber wî diketin, perçek ji tehtê direvandin, geh di ber serê wî de dikirin vizînî û derbas dibûn. Dawî dawî gulekê şewqê wî revand. Hingî çokên wî sist bûn û dest avêt serê xwe. Gava dît ku gule lêneketiye, hîn gavên xwe ramedan û xurtir bazda; kete çiyê û ji ber çavên leşkeran winda bû.

Gund di quntara çiyê de bû. Çiya ji ber her awayê xwe ve asê bû. Kevir, gome, teht, dar, mar, dûpişk kêzik, kurmik; hema çi li wî çiyayî hebûna, hemû dost bûn. Ew pir mêvanperwer bûn. Wan tucaran mêvanên xwe nedidan dest, wan mêvanên xwe fedîkar dernedixistin. Lawik hebekî bi çiyê de bi jor ket, xwe avêt şikeftekê û winda bû. Êdê çar-pênc kamyon tije leşker, hezar helîkopter û balafir jî bihata hew ew beşer didîtin. Çiyê tu caran ew beşer nedida dest wan. Çiya dost bû. Çiya ne weke wan xayin û bêbext bû. Leşkeran bi xwe bi vê zanî bûn. Ji ber vê yekê bi paş de, li gund vegeriyan.

Li gund ji leşkeran pê ve tu kes nedihate xuyakirin. Kûçik çend caran bi dengên tivingên wan reya bûn, lê dû re ew jî winda bûbûn. Zarokên ku berî niha bi panzdeh deqîqan li dora gund dileyistin, ji tirsa her yekî xwe di derekê de veşarti bûn. Kal, jin û mêr dil bi tirs, di hundirên xwe de difikirîn.

Leşker ketin nava gund û her yek çû ser xaniyekî. Dû re çawîş û çend leşker çûn mala Muxtêr (keya).

Muxtar jî weke hemû gundiyan di hundir de dil bi tirs rawesta bû. Gava ku çawîş û leşker ketin hun-

dir, muxtar ji cihê xwe rabû û cih da wan. Çawîş ber bi wî çû, xwe avêt milên wî, ew ber bi xwe kişand û bi hêz çoka xwe li gunê wî xist. Bi lêxistina çawîş re, axîn bi muxtêr ket, destên xwe avêtin nav lingên xwe û xwe bi ser hev de epişand. Îcar çawîş çoka xwe li ser çavên wî xist. Muxtar li ser piştê li erdê ket. Jina wî û zarokên wî xwestin, ku xwe biavêjin ser wî, lê leşkeran nehiştin û bi pehînan ew dane alî. Dû re bi emrê çawîş, leşkeran bi milê muxtêr girtin, ew derxistin der, birin qada (meydan, hol) gund û bi kindirê, bi darê ve girê dan. Gava ku leşkeran girêka dawî li kindirê xistin, çawîş pehînek li zikê wî xist û got:

—Tu dê tivingên gund bidî hev an na?

Muxtêr bi dengekî nîvqurmiçî bersiv da:

—Min ji hemû gundiyan pirsiye, tu tiving li gund nema ye.

Çawîş sê-çar gurmist û pehînên din jî li zikê wî xist û bi ser de qîriya:

—Tu dê sîlahên gund bidî hev an na?

Muxtar îcar nikanî bû bipeyiviya, du-sê caran li ser hev kuxiya û vereşiya. Lê hemû verşiya wî bi ser wî de hat.

Çawîş tif kir ser çavên wî û got:

—Wisa bi ser xwe de verşe kero! Divê ku tu sîlahên gund bidî hev. An na tu dê wisan bi vê darê ve hişk bibî!

Muxtêr tu tişt negot, verşiya dawî ku ji dev hat, wek verşiya zarokên çelînî bû, bi ser lêva wî de herikî.

Çawîş ber bi wî çû, hişk bi porê wî girt, serê wî hejand û got:



—Tu dê tivingên gund bidî hev an na?

Gava ku muxtar got:
"Tu tivingli gund nemane" Çawîş sê-çar şîmaqên bi hêz li ser çavên wî xist û dîsa bi ser de qîriya:

—Tu tiving li gund nemane ha!

Di demek kurt de, hemû zilamên gund bi qunên tivingan û bi qamçiyan li qada gund hatine civandin. Leşkeran bi lêdanê ew kirin rêz. Piştî ku her yekî çend qemçiyên baş li wan xistin, dû re çawîş bi tiliya xwe muxtarê ku bi darê ve giridayî bû, nîşanî wan da û bi hêrs bi ser wan de qîriya:

—Hun wî kûçikê ku bi darê ve girêdayî dibînin ne? Ku hun sîlahên xwe neynin teslîm nekin, ezê we hemûwan têxim vê rewşê û hîn ji vê rewşê xerabtir.

—Sîlahên me yên ku hebûn me teslîm kirin, tu sîlah li gund nemane!

Ev deng ji nav rêza gundiyan hat. Dengê zilamekî kal û bi rih bû. Çawîş bi wî dengî re li gundiyan zîvirî û bi hêrs got:

—Ewê ku peyivî bila derkeve vir. (Bi destê xwe cih nîşan da.)

Gava ku kes ji nav rêza gundiyan derneket, çawîş ji hêrsan bû weke dêhnan. Emrê lêdana gundiyan da leşkeran. Leşkeran bi pehînan û bi qûnê tivingên xwe gundî ji wê rewşê derxistin xistin rewşeke din. Dîsan bi emrê çawîş, leşkeran gundî weke berê kirin rêzê.

Çawîş ber bi muxtêr çû û serê xwe du-sê caran ber bi jêr ve hejand. Dû re ji nişkê ve pişta destê xwe yê çepê li ser çavên wî xist û got:

—Hunê me bixapînin û derewan bikin haa! Hunê ji ber me sîlahan veşêrin!

Ji xwîna ku li ser çavên muxtêr hişk bûbû, mirov ew nasnedikir. Bi wê şîmaqa çawîş xwînê di nav diranên wî de pijiqand. Gava ku muxtêr tif kir, hemû xwîn bû. Lê tifa wî negihşt erdê. Ji ber ku hêz tê de nema bû û bê hêz tif kir. Tifa wî bi zorê ji devê wî derket û di ser çenga wî de herikî ser sînga wî.

Çawîş dû re emir da du leşkeran, ji bo ku muxtêr ji darê vekin. Leşkeran zû zû girêkên kindirê vekirin û muxtar ji darê vekirin. Muxtar nikanî bû li ser lingên xwe rawestiya, du-sê caran hejiya û ket. Leşkeran bi herdu milên wî girtin, ji erdê rakirin û ew li ser lingan rawestandin. Dû re leşkerekî din satilek ava cemidî bi ser serê wî da kir. Bi wî awayî muxtar bi zorê li ser lingên xwe rawestiya.

Çawîş bi gavên giran ber bi wî çû, tiliya xwe ya girdikê da bin çenga wî, serê wî bilind kir, ziq li çavên wî nihêrî û bi hêrs got:

—Tu dê sîlahên gund bidî hev an na?

Ji lêdanê deng di muxtêr de nema bû, bi zorê deng jê derket:

—Tu sîlah li gund nemane, tiştên ku hebûn me teslîm kirine!

—Tiştên ku hebûn we teslîm kirine? De zû kincên xwe ji xwe bike!

Muxtêr fêhm nekir bê çawîş çi got, di cihê xwe

de bêdeng ma.

Îcar çawîş çoka xwe li gunê wî xist û bi ser de qîriya:

—Ez ji te re dibêjim, kincên xwe ji xwe bike!

Bi lêdana wî re muxtêr destên xwe avêtin nav çîpên xwe. Wisan janê da dilê wî, ku wextî bêhiş biketa. Dû re hêdî hêdî çakêtê xwe ji xwe kir.

Çawîş:

—Qutikê xwe jî ji xwe bike, divê tu tişt li te nemîne!

Muxtêr êleg û qutik jî ji xwe kirin. Bi wî awayî ji navê bi jor de tazî ma. Pirça sînga wî ya spî ji xwîn û xwêdanê li hev geriya bû. Çawîş destê xwe li ba kir got:

—De, de! Ji xwe bike! Şalwar jî ji xwe bike! Divê ku tu tişt li te nemîne! Divê ku tu şût û tazî bimînî!

Muxtêr bişkokên şalwarê xwe jî vekirin û şalwar ji xwe kir, tenê derpiyê wî yê kurt û spî lê ma û bi stûxwarî li çawîş nihêrî.

Çawîş bi hêrs destê xwe ber bi derpiyê wî vekir û got:

—Wî jî ji xwe bike! Wî jî ji xwe bike! Min pêşî ji te re got "ku tu sîlahên gund nedî hev û neynî teslîm nekî, ezê te weke kûçikan tazî bikim û li nav gund bigerînim".

Muxtêr hedî destên xwe avêtin piziya derpiyê xwe û derpî jî ji xwe kir. Gava ku wî derpî ji xwe kir, hemû gundiyên ku li wir hati bûn civandin, li çavên hevdu nihêrîn. Leşkerekî dîsan satilek av bi ser mux-

têr da kir. Çawîş bi sê-çar gavan paş de çû û bi hêrs got:

—De! De xwe weke kûçikan dawşîne! Muxtêr xwe dawşand. Ava ku jê hat, weke dilopên baranê li li ser gundiyan hate reşandin.

Paşê çawîş emir da du-sê leşkeran, ji bo ku jina muxtêr bînin. Leşkeran zû ji çawîş re silav dan û bi rev çûn jina muxtêr anîn.

Gav ku jinik di wê rewşê de çav li mêrê xwe ket, kir qîrîn, ji leşkeran re xeber da û xwest ku xwe biavêje ser mêrê xwe. Lê, leşkeran hişk bi milê wê girtin û ew bi paş de kişandin. Dû re zor lê kirin, da ku li mêrê xwe siwar bibe. Hingî çend heb ji nav gundiyan xwe li leşkeran rakişandin û nemirovantiyan wan ji wan re gotin. Lê leşkeran, zû ew bi qunên tivingan û bi pehînan dane rawestan.

Muxtêr bi stûxwarî ji jina xwe re got:

—Were keçê, were li stûyê min siwar be! Tişt nabe!

Jinikê mêrê xwe neşikand, çû, destê xwe li stûyê wî gerand û li pişta wî siwar bû.

Çawîş pehînek li jinikê xist û got:

—Wisa nabe! Wisa nabe! Divê ku tu li kolana wî siwar bî.

Îcar muxtar li ser tûtikan rûnişt û jina wî li kolana wî siwar bû.

Çawîş serê xwe ber bi jêr ve hejand û bi devkenî got:

—Ha wisan ha... De, du caran here heya bi dibistanê û vegere!

Muxtêr berê xwe bi dibistanê vekir û meşiya. Dibistan qederê sed metreyî dûrî wan bû, camên wê şikestî bûn û li ser dîwarên wê hemû hatibûn xeritandin. Piştî ku muxtar du caran çû heya bi dibistanê û hat, vegeriya cem çawîş û jina xwe ji stûyê xwe daxist.

Çawîş destê xwe avêt pirça sînga wî, çend ta jê kişandin û bi hêrs got:

—tu dê tivingên gund bidî hev an na?

Muxtar ji hêrsan dilerizî, çavên wî sor bûbûn û pirça canê wî weke ya jîjo lê gij bûbû. Piştî ku hebekî fikirî, got:

—Tu xwe du roja li me ragirî. Piştî du rojên din ezê hemû tivingên gund bidim hev û bi destên xwe bînim ji we re.

Hingî hemû gundiyan bi şaşmayî li çavên hevdu nihêrîn. Şika hemûwan ji hevdu çê bûn. Hinan di dilê xwe de gotin:"ma qey ev muxtar dêhn e, ma ji ku sîlah li gund mane".

Wê rojê heya bi êvarî leşkeran lêdan û îşkence li gundiyan kirin û li malên hemûyan yek bi yek geriyan. Tu qul di gund de nehiştin, ku lê negeriyan. Dawî, berî ku ji gund derkevin, dîsa çawîş ji muxtêr re got:

—Ger ku tu piştî du rojên din hemû sîlahên gund neynî teslîm nekî, ezê êgir bera gund bidim; ezê we gişkan bişewitînim. Berî ku tarî dakeve erdê, hemû leşker li tirimpêlên xwe siwar bûn û ji gund derketin.

Êvarî, hemû zilamên gund li oda gund vehewiyan. Hinan ji muxtêr pirsîn:

—Ma sîlahên me kê heye, ku te ji wan re got, tu dê piştî du rojên din sîlahan bibî teslîmî wan bikî?

Muxtêr serê xwe kil kir û bersiva wan da:

—Ez zanim ku tu sîlahên me kesî tune ne, lê ramanek din hate min, ku em hinek pere di nav xwe de bidin hev û herin hin tivingên kevn ji çawîşê qereqola vî gundê cîranê me bikirin û bibin teslîmî wan bikin. An na bêbavan dev ji me bernadin, ewê her roj bi vî awayî bigrin ser gund û namûsa me bînin peraki.

Çend peyayên rûspî peyva muxtêr di cih de dîtin û gotin:

—Law Welleh muxtar rast dibêje! Eskerên tirkan bêbav in, ew kanin êgir bi gundan bixin.

Peyakî kal bi qunkişkê ber bi pêş de kişiya, berê xwe bi civatê vekir û bi dilşewatî got:

—Lawo ma qey nayê bîra we, ku van bi saxî kurd dixistin kîsan û davêtin golan. Ku niha mirov li binê gola Wanê bigere, mirov dê bi hezaran miriyên kurdan tê de bibîne. Ma qey nayê bîra we, ku agir bi gundan dixistin, terş, teba û mirov tevde dişewitandin. Dîsan li wan wisa hatiye. Ew dîsan har bûne û tiştên ku bixwazin kanin bi serên me de bikin. Ma ka emê bi vî awayê xwe çawan zora wan bibin? Emê çawan bi ser kevin lawo? Em kêmhêz in, kêmhêz... Ji aliyê din jî em bi xwe-xwe kişiyane ber hev. Em bi xwe-xwe mala hevdu wêran dikin. Bila îro em yek biwana û em destek biwana, bila çend eskerên qancilik li me wisan bikira. Bila wan em şût û tazî bi-

kirana û jinên me li kolanên me siwar bikirana. Em kurd xerab in, xerab... Em dijminên hev in û em ji hev re xurtin. Em wek kew û tajiyê ne. Em dijminên qewmê xwe ne! Em xerab in, em bênamûs in!

Gava ku dipeyivî ji hêrsan temama canê wî dilerizî. Piştî ku cigarek vêxist, dîsan peyva xwe domand:

—Wan îro em peya tazî kirin, dê sibe jinên me tazî bikin. Ewê li ber çavên me dest biavêjin namûsên me!

Êdî hew peyivî, herdu lêvên wî lerizîn û çend dilop hêsir ji çavên wî hatin. Ji cihê xwe rabû û çû li quncika herî dawiyê rûnişt.

Bi wî awayî hemû gundiyan a xwe kirin yek û di nav xwe de pere dane hev. Yên ku perên wan tunebûn, ji yên din deyn kirin. Sibehê zû, muxtêr û du peyên din berê xwe dane qereqolê. Qereqol bi sê-çar kîlometreyan dûrî gundê wan bû. Gava ku gihîştin qereqolê, roj bi qamekê bilind bûbû.

Çawîş masek derxisti bû hewşê, bin siya daran û rûniştî bû taştê dixwar. Muxtar û herdu peya dageriyan hewşê. Gava ku çawîş çav li wan ket, wa bi devkenî got:

—Xêr e muxtar? Dîsan gundiyan li hev xistine?

Muxtar û herdu peyan çûn cem. Li dor masa çawîş, tenê du kursiyên vala hebûn. Muxtar û yek ji nav peyan li ser kursiyan rûniştin, yê din jî li erdê, li ser giyê rûnişt.

Çawîş dîsa pirsî:

—De bêje, xêr e muxtar?

Muxtêr derdê xwe jê re got û ew perên ku ji nav gundiyan dabû hev, danî ser masê.

Karê çawîş xukîxwarin bû. Wî ji hemû gundên dorhêlê xûkî dixwar. Gava ku çav li wan peran ket, çavên wî beloq bûn, qederê deqîqekê ziq li wan peran nihêrî. Dû re dest û devê xwe bi destmala xwe ya kaxizî paqij kir û rahişt wan peran. Piştî ku hejmart, xiste bêrîka xwe, rabû ser xwe û ji muxtêr re got:

—Ka hun bidin dû min!

Muxtar û herdu peyan dane dû çawîş. Herçar bi hev re ketin hundir embarekê. Embar weke şikeftekê kevn bû, hundirê wê cemidî û rewa girtî bû.

Çawîş çend tivingên kevn û xerabeyî, ku li gundan girtibû, ji sindoqê derxist, xiste çewalekî, da destên muxtêr; destê xwe yê rastê li milê wî xist û bi devkenî got:

—Ku tiştek ji te re lazim bû texsîr meke, ez li ber te sekinî me!

Muxtêr di mana "erê" de serê xwe hejand, rahişt çewêl, avêt nav milên xwe û bi herdu peyan re derket der.

Wê êvarê dîsan gundiyan li oda gund civîn çêkirin. Hinan gotin: "Emê van sîlahan bidin zarokan û bişînin, ew biçûk in, dibe ku ew ji girtinê bifilitin". Hinan gotin: "na camêr, emê çawan sîlahan bi zarokan re bişînin, ma kesî tiştên wisa dîtiye? " Hinan gotin: "Ya herî baş ew e, ku em sîlahan bi kalan re

bişînin".

Lê dikirin nedikirin li hev nedikirin, nedixistin serên hev. Dawî dawî muxtêr xwe da ber teslîmkirina sîlahan.

Roja piştî wê, sibehê zû muxtar ji xew rabû, kîsê sîlahan avêt pişta xwe û ji gund derket. Di nîvê rê de, du leşkerên li hespan siwar li muxtêr rast hatin, ew dane rawestan û bi hêrs jê re gotin:

—zû çewalê xwe veke! Ew çi ye di çewalê te de ye?

Muxtêr kîs ji pişta xwe danî û hêdî hêdî girêkên wî vekirin. Ji leşkeran tirê an titûn e, an jî malê qaçax e, lê gava ku çav li sîlahan ketin şaş û ecêbmayî man. Hema zû herdu destên wî li paş wî kelepçe kirin û ew dane pêşiya xwe.

# Bisiklêt

Gava ku Remo êvarê ji dibistanê vegeriya malê, kêfa wî ne lê bû, çentê di destê xwe de avête ser masê û li quncikeke xênî rûnişt.

Bavê wî jê pirsî:

—Dersa te îro çawan çû, lawê min?

Lêwik lêva xwe daliqand, milên xwe hejandin û tu bersiv neda.

Bavê wî dîsan jê pirsî:

—Ez ji te dipirsim lawê min, dersa te çawan çû?

Remo dîsan tu bersiv neda, serê xwe xiste ber xwe û fikirî.

Îcar bavê wî bi hêrs û bi dengekî gur bi ser de qêriya:

—Ez ji te re dibêjim, ker lawê keran, ma qey deng nayê te?

Remo tu bersiv neda, ji tirsan kirî bazda, lê dîsan baz neda; lêva xwe daliqand û di cihê xwe de bêdeng ma.

Piştî ku çend deqîqe di navberê de derbas bûn, diya wî şîv anî û li ser sifrê danî. Kêfa Remo pir ji wê şîvê re dihat, lê kir û nekirin, nexwar.

Îcar diya wî jê pirsî:

—Çi ye lawê min, ma çi bû ye? Qey dersdarê te bi te re xeyidî ye?

Remo dîsan jî bersiv neda, serê xwe vir de û wê de hejand û bêdeng ma.

Bavê wî rabû ku lê xe, lê diya wî nehişt, ew dîsa rûniştandin da û got:

—Çi ye tu evqas bi ser lêwik de diqîrî? Hela bisekine, qey derdekî wî heye!

Mêrik bi derdê wî zanî bû. Ji jinikê re got:

—Ma qey tu bi derdê wî nizanî? Derdê wî bîsîklêt e, bîsîklêt...

Berî ku ew malê bar kin bajêr, bavê wî jê re soz da bû, ku ew malê bar kin, ewê jê re bîsîklêtekê bikire. Li gund, gava ku carekê Remo bi bîsîklêta lawê axê leyisti bû, lawê axê lêxisti bû û serê wî şikandi bû. Bavê wî jî jê re goti bû "Lawê min, jehr di bîsîklêta lawê axê de be, nere cem wî; ku em malê bar kin bajêr, bi soz ezê ji lawê xwe re bîsîklêtekê bikirim. Bîsîklêteke ku bi deh qatan ji ya lawê axê xweşiktir û spehîtir".

Lê ev tam saleke wan bû, ku mal barkiri bûn bajêr. Gava ku Remo ji bavê xwe re digot:

—Bavo, ma kanî soza te? Ne te got, ku em malê bar kin bajêr ezê ji te re bîsîklêtekê bikirim?

Bavê wî jî pê re dixeyidî û digot:

—Kuro, ma ezê bi kenê xwe ji te re bîsîklêtan bikirim? Ma tu rewşa me nabînî?

Lawik ji qehran digiriya.

Îcar diya wî li ber geriya û got:

—Erê lawê min, hela were şîva xwe bixwe, emê dû re li ser bipeyivin.

Remo kelegirî bû:

—Na wele hun dîsan nakirin. Hun hertim dibêjin, emê li ser bipeyivin û hun nakirin.

Bavê wî bi dengekî hebekî bilind got:

—Niha ew jehtêketiyên bîsîklêtan bi çiqasî ne?

—Bi sed û pêncî lîran e, got Remo bi dengekî nizim. Dibe ku li cem Forsonê hîn erzantir bin.

Mêrik hebekî fikirî. Dû re li wî nihêrî û got:

—Hela tu were şîva xwe bixwe, ezê sibehê herim sûkê ji te re bîsîklêtekê bikirim.

Gava ku bavê wî wa got, hebekî dilê wî xweş bû. Rabû ser xwe, çû destên xwe şuşt, hat li ser sifrê rûnişt û xwarina xwe xwar.

Di ser şîvê de bavê wî jê pirsî:

—Te got ew bîsîklêt li cem kê hene?

—Li cem Forsonê hene. (Yekî din jî hebû, lê navê wî nedihate bîrê. Piştî ku piçekî fikirî û ew navê din jî anî bîra xwe domand) Yekî din jî heye, navê wî Mûsa ye. Dibe ku li ba Mûsa hîn erzantir be.

Forsonê û Mûsa her yekî dikaneke wan ya bîsîklêtan hebû. Lê wan bêtir bîsîklêtên xwe didan bi kirê. Pênc deqîqe bi lîrakê bû. Remo tew lê siwar nebûya, heftê du caran lê siwar dibû. Mesrefa ku bavê wî ji bo dibistanê didayê, wî nêviyê pir dida bîsîklêtan.

Bavê wî piştî ku ji xwarinê vekişiya, got:

—Ma tu cihê dikanên wan zanî?

Remo cihê herdu dikanan jê re got. Dû re bi delalî ji bavê xwe re got:

—Ger tu bixwazî, ezê sibehê destûra xwe ji mamoste bixwazim û ezê jî bi te re bêm.

—Na lawê min, tu ji dersa xwe nemîne. Ezê sibehê herim dikanan û ji lawê xwe re bîsîklêteke spehî bikirim.

Remo ji kêfan kirî bifiriya, ji cihê xwe rabû û çû riwê bavê xwe maçî kir. Wê êvarê heya bi dereng, wî xwe bi diya xwe û bavê xwe şelafî kir; Pirtûk û defterên xwe nîşanî wan dan û dersa xwe ji wan re xwend. Dû re bi çîrokeke bavê xwe bi xew ve çû.

Remo bîsîklêt di xwenê de didît. Bîsîklêta wî ne weke tu bîsîklêtan bû. Gava ku ew lê siwar dibû û diajot, tekerên bîsîklêtê ji erdê radibûn û difiriya. Di ser malan re, di ser çiyan re, di ser dar û diristanan re difiriya. Dû re wî lawê axê di xew de didît. Lawê axê di gel du lawikên din li wî dixistin û bîsîklêta wî jê distandin. Ew jî digiriya, bi dû lawê axê de direviya û digot:

—Ev ne bîsîklêta te yee... Ev bîsîklêta min eee... Bîsîklêta min nebeee... Bavê min ji min re kiriyee... Bîsîklêta min nebeeee...

Lê dikir û nedikir, lawê axê bîsîklêta wî nedidayê. Dû re lawê axê lê vedigeriya û heta ku jê dihat lêdixist. Dawî dawî, Remo jî direviya malê, kêreke mezin ji mal tanî û lawê axê dida ber kêran. Lawê axê weke dîwarekî dikete xwarê û dimir.

Di wê heyecanê de, diya wî lihêfa wî hêdî ji ser wî da alî û bang kirê:

—Remo, Remo, de rabe lawê min, tu ê ji dersa xwe bimînî ha! De rabe bavê diya xwe, dereng e!..

Remo veciniqî û hişyar bû. Weke ku mirov ew avê dakiri be, canê wî ji xwêdanê şil bûbû. Bi wê heyecanê xwe avêt hemêza diya xwe û giriya.

Diya wî bi ecêbmayî jê pirsî:

—Çi ye lawê min, çi bû ye? Ji bo çi tu digirî?

Remo bi îskînî got:

—Yadê, lawê axê, lawê axê...

Diya wî peyva wî birî:

—Çi bûye Remo? Ma te xêr î bavê diya xwe? Lawên axan maxan li vir tune ne. Em li bajêr in, bavo!

—Lawê axê, yadê, lawê axê gundê me... Min xewn dît ku min ew dikuşt...

—Hişş... Lawê min, qala kuştin muştinê meke; rabe taştiya xwe bixwe, ancax tu bigihêje. An na tu ê ji dibistanê bimînî ha!

Remo nedixwest ku tu caran ji dibistanê bimîne. Ji xwe tu caran jî jê nema bû. Zarokên ku ji dibistanê diman û dersên xwe nedixwendin, ew li paş jî diman û dibûne nezanên dibistanê. Lê Remo zaneyê dibistanê bû. Dersa ku wî herî pir jê hez dikir, dersa îro bû. Dersa wan matematîk bû. Remo wisan ji matematîkê hez dikir, ku li ser wê ruh û can dida. Wî ji yekê heya bi milyonan û deh milyonan kanî bû bihejmarta û binivîsanda. Ji bilî wê jî, hemû hesabê ba-

vê xwe wî çê dikir. Carina wî ji bavê xwe dipirsî:

—Heft caran heyşt çiqas dike, bavo?

Bavê wî difikirî û bi tiliyan dihejmart. Hingî Remo pê dikeniya. Bavê wî jî digot:

—Ma ezê ji ku weke te zani bim, lawê min? Ez li eskeriyê hinî xwend û nivîsandinê bû me. Ji xwe qet hişê min nagihêje van mîratên hesaban. Li eskeriyê jî qet hişê min nedigihîştê.

Remo piştî ku taştiya xwe xwar, ji diya xwe pirsî:

—Yadê, ma kanî bavê min?

—Yadê qurban, ew çû ye kar.

—Ma qala bîsîklê tê nekir?

—Çawa? Wî got, piştî kar ezê herim ji Remo re li bîsîklêtekê binhêrim, ku têkeve serê min, ezê jê re bikirim.

Remo diya xwe hemêz kir:

—Tu bi rastî dibêjî, dayê? Ma wî got, ku ezê ji Remo re bîsîklêtekê bikirim?

Diya wî jî ew maçî kir û got:

—Erê yadê bi qurban, bi serê te, wî got, ezê ji Remo re bîsîklêtekê bikirim.

Remo rahişt çentê xwe û bi lotikan ber bi dibistanê ve baz da. Êvarî, gava ku vegeriya malê, dît ku bîsîklêteke sor û nû li ber derî ye. Pêşî bi çavên xwe bawer nekir; dû re bazda û lê siwar bû. Ji kêfan kirî bifiriya. Hem dikeniya, hem jî hêsir ji çavan dihat. Lê hêsirên ku ji çavên wî dihatin jî, dîsan ji kêfan bû.


Khaled 86

# Qaçaxkeriya Bûbê

Bûbê rabû ser xwe, herdu destên xwe danî paş qûna xwe û ber bi pacê ve meşiya. Qederekî wisan bê deng, li ber pacê rawesta. Jina wî dîsan got:

—Bavê min kûçik be, ez hew di vî hundirî de disekinim, ez hew kanim bi vê kûçikahiya xwe zariwên te xwedî bikim! Qe bila dilê te bi me bişewite, çi dibe?

Bûbê bi ser de qîriya:

—Ma ezê çi bikim, keçê?

—Ma xelk giş çi dikin?

—Yê xelkê perên wan hene, xelk dewlemend in!

Jinikê berê xwe guhert û dîsan got:

—Yê min ez nizanim, ez hew kanim di vê malê de bisekinim.

Piştî ku Bûbê cigarek pêça û vêxist, got:

—Ezê dîsan herim xwe bavêjimê, dibe ku karekî bide min.

—Kuro, welleh ew tu karî nade te, ew tenê te dixapîne!

Bûbê hêrs bû, destê xwe li dîwêr xist û got:

—Ma ez wekî din çi bikim, ez bi ku de herim? Ez herim xwe biavêjim kê? Hi? .. Ka tu bibêje, tu aqilekî bide min!

Jinikê destên xwe li ba kirin:

—Lê lê! Ezê êqil bidimê, ezê êqil bi mêrê xerab dim!

Bûbê bû weke îsotê, pehînek du pehîn avêt jê de û bi dengekî gur bi ser de qîriya:

—Ger ku tu aqil nadî min, di karê min de jî xeber mede, zimanê xwe weke zimanê kûçikan dirêj me-

ke!

Herdu bîskê bêdeng man, lê tenê dengê îskîna jinikê dihat. Jinikê ji kerban û ji qehran nikanî bû giriyê xwe bisekinanda. Ji wê webû, ku mêrê wê ji qestî kar nedikir. Lê kar tune bû. Mêrê wê sibehan zû radi bû ser xwe û heya êvaran li bajêr, li kar digeriya; lê dikir nedikir tu kar bi dest nediket. Dawî dawî çû bazinê jina xwe fîrot û serkarkerek li kargehê bertîl kir, da ku kar bidiyê. Lê wî serkarkerî ew her roj dixapand û tu kar nedidayê. Bûbê her roj wisan polî-poşman û bi stûxwarî vedigeriya malê. Her ku wilo bê kar û bê pere vedigeriya malê, ew û jina xwe pevdiçûn, xeber û gotinên nemayî ji hev re dikirin.

Jinikê piştî ku bi dawa xwe hêstirên xwe û pozê xwe paqij kirin, rabû ser xwe û ber bi dergûşa lawê xwe meşiya.

Ji girî çavên lêwik sor bûbûn. Jinikê ew vekir, ji dergûşê derxist, xist hemêza xwe û pêsîra xwe xist devê wî. Gava ku devê lêwik kete pêsîrê, lawik aş bû û hew giriya. Jinikê îcarê xwe da ser kevnikekî û rûnişt. Dû re lawê xwe xist nav herdu çîpên xwe û ew hejand.

Bûbê piştî ku cigara xwe di xwelîdankê de vemirand, serê xwe xist nav çokên xwe û fikirî. Dikir nedikir tu rê ji hev dernedixist. Gelo çi bikira? .. Çend caran li şêlandina bankê fikirî, li diziyê fikirî, lê disan dev jê berda û ramana xwe guhert. Lê ku bihata girtin, hingî kî dê li jin û zarokên wî binhêrîna? E-

wê di nav xelkê de rezîl bibûya. Xelkê bigota: "Bûbê ji bo diziyê hatiye girtin"! Ku navê diziyê bihata ser kê, mala wan wêran dibû, tu kesî silav nedidane wan. Ji ber vê yekê, Bûbê ji wan ramanan pir bi dûr ket. Piştî ku qederekî serê wî di nav çokên wî de û bêdeng ma, dûre cigarek pêça. Bi cigare pêçînê re got:

—Keçê, min ji te re got, bajar ji me re nabin, em nikanin li bajaran bijîn, lê te bi a min nekir.

—Ma minê çi bi a te bikira? Hun her tim li ber hev bûn. Ma qey kuştin ji barkirinê çetir bû?

Bûbê hebekî bi hêrs got:

—Kuştin?.. Dê wî kûçikê birayê te ez bikuştima? Wî bênamûsê serpîrek?.. Keçê, min kanî bû çarika jina wî berepaş bida serê wî. Ma bi a te ew jî mêr e û kane mêran bikuje?

Jinikê tu bersiv neda, tenê kire îskîn û bi dawa xwe pozê xwe paqij kir.

Bûbê dîsa got:

—Hii... Tu wî kuçikê birayê xwe jî peya dihesibînî? Ji te weye ku ew segê birayê te jî kane mêran bikuje? Ew jina axê ye, keçê! Jina axê...

Jina wî li ber wî geriya, bi qunkişkê ber bi wî çû û serê xwe danî ser milê wî. Lêvên wê weke yên zarokan dilerizîn û hêsirên wê bi ser hinarîkên wê de dihatin xwarê. Qederekî welê bêdeng man. Dû re Bûbê destê xwe avêt çenga wê û berê wê bi xwe vekir. Bîskê li çavên hevdu nihêrîn, rabûn ser xwe û hevdu hembêz kirin. Du-sê caran wisa li ser hev hevdu hembêz kirin û kûr kûr li çavên hevdu nihêrîn. Paşê Bûbê ew berda û dîsa çû ber pacê û li derve ni-

hêrî. Jina wî jî da dû wî û ew ji paş de hembêz kir. Li der sê-çar zarokan dileyistin. Piştî ku Bûbê bîskê li wan zarokan nihêrî, li jina xwe zîvirî û ew hembêz kir. Jina wî jî heya ku jê hat xwe lê pêça.

Ev hevduhembêzkirina wan, weke ya deh sal berê bû. Deh sal berê jî hevdu wisan hembêz kiri bûn. Lê bi saw û tirs. Ew hembêzkirina wan li çiyê û di şikeftê de bû. Hingî gava ku bi hev re reviyabûn, axê du peyayên xwe û birayê jinikê bi dû wan xisti bûn, da ku wan bigirin û bibin ji axê re. Ji ber ku axê dê jinik ji lawê xwe re bixwesta. Lê dilê jinikê keti bû Bûbê û wextî li ser Bûbê dêhn bibûya. Ji ber ku mala bavê Bûbê feqîr bûn û tu erd û hatina wan tune bû, bavê jinikê ew nedidayê. Ku dil bikira jî, dîsan axê nedihişt. Axê ji bavê jinikê re goti bû "Bila haya te ji qehpa qîza te hebe, welleh ew bi hinan re baz de, ezê êgir bi mala te bixînim". Axê bi xwe zanî bû, ku dûr nêzîk, dê keçik bi Bûbê re baz de. Lê welhasil peyayên axê Bûbê bi dest nexistibûn. Bûbê piştî ku mehra xwe li gundekî din birî bû, ê dî barkiribû bajêr. Ji diya jinikê û mala bavê Bûbê pê ve, tu kesî nizanî bûn ku ev beşer bi ku de çûne.

Piştî ku hevdu têr hembêz kirin û xwe li hev pêçan, Bûbê jinik berda û ber bi dergûşa lawê xwe ve çû. Lawik ji dergûşê derxist, xist hembêza xwe û ew du-sê caran hol kir hewa û girt. Piştî ku bîskê bi lêwik re leyîst û henek pê kir, dû re da destê jinikê û got:

—Emo, ma tu zanî ku Ûsê cîranê me çi karî dike? Ma tu zanî ku ew van peran ji kuderê tîne? Ma tu zanî ku wî ev taxsî, sarinc û televîyon bi çi kirî

ne?

Emo milê xwe hejandin û got:

—No.

—Lê, Ûso qaçaxkeriyê dike. Şeva wî ne kêmî du hezar lîran e. Te fehm kir, du hezar lîran...

Emo li ber wî geriya:

—Nebe, nebe, Bûbê! Ez di bextê te û Xwedê de me, qaçax maçaxê meke! Tu dibînî, ku her şev teqîn e. Ma te nebihîst, ku wê roja han du kesan xwesti bûn ku keriyek pez derbasî binxetê bikin, lê eskeran li wan teqandi bûn; dawî dawî herdu jî hati bûn kuştin û eskeran meytê wan avêti bûn dû tirimpêlên xwe. Ew wisan bi mirîtî heya bajêr bi dû tirimpêlên xwe de kişandi bûn. Gava ku xwediyê wan çûbûn ser wan, ew nasnekiri bûn, tenê nêviyê laşên wan mabûn.

Bûbê bi tiliya xwe ya girdikê simbêlê xwe ji devê xwe derxist, kire niçe-niç û got:

—Ih... Na keçê, ma ji te tire ku ezê herim keriyên pezan derbasî binxetê bikim! Dîna Xwedê! Tiştê ku ez dibêjim, barkêşî ye. Xwediyê mal û esker bazara xwe dikin û du kes bi silah li nik eskeran disekinin, ta ku hemû mal tê kişandin. Ma gava ku du heb bi sîlah li nik eskeran hebin,dê esker çawan kanibin bera barkêşan bidin û wan bikujin? Ji te weye, ku hema ezê herim û bê me kuştin. Ez îşê xwe ji tu tiştî naynim. Ezê tenê barên xwe bikişînim û perên xwe bistînim. Ma ev du salên Ûso ye, ku vî karî dike, çima nehate kuştin? ..

Jina wî dîsa li ber wî geriya, bi nermî û bi stûxwarî jê re got:

—Bûbê, Xwedê carekê mala mirov wêran dike, Welleh tu bi a min bikî, parsê bike û qaçax maçaxê meke.

Bûbê serê xwe kil kir:

—Bi rastî jî aqilê pîrekan tune ye. Keçê qe peyvê fêhm bike! Ez ji te re dibêjim, ku talûka vî karî tune ye, tu hîna jî pit-pitê dikî. Ku talûkek di vî karî de he be jî, tenê lê rasthatin e.

Di wê navê de lawikê wan giriya, Emo du-sê caran destê xwe li qûna wî xist û pê sîra xwe xiste dev. Dû re ji Bûbê re got:

—Bûbê, ger tu li min nafikirî li vî tifalî û birayên wî bifikire, mala me wêran meke!

Bûbê serê xwe hejand û bi ser de qîriya:

—Keçê, te ez ji niha de xistime gorê, ma te xêrî, tu vê pit-pitê bi ser min de dikî?

Jinikê hew dengê xwe kir, rabû ser xwe, lawikê xwe xiste dergûşê û ew hejand. Piştî ku lawik bi xew re çû, rabû, çû teşta hevîr ji ser textê firaxan daxist, du-sê mist ard berda binê teştê, rûnişt û hevîrê xwe kir.

Bûbê jî cigarek nû pêça, vêxist û derket der ve. Taxa ku ew lê rûdiniştin nû ava bûbû. Hema hema hemû xanî yek qatî û bi pereketan hati bûn lêkirin. Xanî firk bûn, yek li vir, yê din taa li dera hanê bû. Erdên vala, yên ku di nava wan xaniyan de mabûn jî, hemû hati bûn firotin. Yên ku çend kevir li şûna erdê xwe danî bûn û yên ku qorek du qor asasên xaniyên xwe avêti bûn. Piştî salek-du salên din dê bi-

bûya taxeke nû di bajêr de. Mala wan nêzîkî Pira Alman bû. Ew çemê ku di bin Pira Alman de diherikî û diçû Binxetê, nêzîkî mala wan bû. Havîn bû. Gava ku dibû berdestê êvarê hênkayiyek dikete wê dorê, mirov digot qey buhar e.

Her êvar zarokên wê taxê li meydanê bi topê dileyistin. Carina jî zarok ji çem, ji avjeniyê vedigeriyan, lingên xwe li topê dixistin û ber bi meydana topê ve diçûn. Hemû pîrekên taxê jî, berdestê êvarê nanên xwe li tenûrê lêdixistin. Hingî dengê giriyên zarokan û dengên bangên çend dîkan jî dihat.

Bûbê çav li wan çar-pênc peyayên ku li ber siya dîwêr rûnişti bûn, ket. Wî xwe li civatê girt, çû nik wan, silav da û rûnişt. Gişan bi hev re silava wî lê vegerandin. Paşê bi dorê gişan jê re gotin:

—Merheba.

Dû re Ûso jê pirsî:

—Cîran, tu van rojan nexuya bûyî, ma tu bi derinan de çû bû?

Bûbê piştî ku cigara xwe bi binê şekala xwe vemirand, got:

—Erê Welle cîran, ez ber bi Kerwênê ve çû bûm.

—Çima, xêr bû?

—Xêr bû cîran, ji bo kar bû.

Ûso keniya, li civatê zîvirî û got:

—Karê cîranê min Bûbê nabe, vî bajarê Nisêbînê, yê mezin dihêle, dihere li gundan li kar digere. (Dû re berê xwe bi Bûbê vekir û jê pirsî)

—Ma ew çi kar bû, cîran?

—Karê cenaniyê bû, lo, cenaniya pembû...
—Eêê... Ma te çima dom nekir?
—Karê wan hew ew bû. Tenê du roj bûn.

Qaso cigara ku pêça bû dirêjî Bûbê kir. Bûbê cigare ji dest girt û got:
—Apê Qaso, ma tu ji nexweşiya xwe çawan bû? Min bihîst ku tu çû bû ser doktor.
Qaso serê xwe bi aliyekî de xwar kir û got:
—Wele birazî ez weke berê me. Doktor emeliyata min dixwaze, lê buha ye, qeweta min nagihêjê.
—Ma doktor nabêjin nexweşiya te çi ye?
—Dibêjin, kevir di gurçikên te de hene, ma ez çi zanim.
Memo peyva wî birî.
—Aaappê Qqqso, jjjibo kkkevir bbbbbbîra bbaş e. Bbbbbbbîra vvvexwe.
Paşê Memo paş guhê xwe xurand û keniya.

Memo lalikî bû, gava ku dipeyivî zimanê wî tim li hev digeriya. Emrê Memo di dora bîstan re bû. Qama wî dirêj û zeyif bû. Kincên wî tim pînekirî û pertal pertalî bûn. Carinan li nav taxê xwas digeriya. Porê wî tim meqeskirî bû. Serê wî piçûk û guhên wî mezin bûn. Di wê taxê de tu kes ji Memo nedixeyidîn û dilê xwe jê nedigirtin.

Ûso berê xwe bi Memo ve kir û got:
—Memo, van qeşmeriya meke, dê apê Qaso çawan bîra vexwe?

Piştî ku Memo solên xwe xistin bin milên xwe û

pal da, got:

—Wwwwelllleh eeeezz rrrrast ddddibêbêjjjim bb-ebbbîrrra jjjji bbbo kekkkevvvir bbebebbbaş e.

Qaso wa bi şaşmayî jê re got:

—Kuro bîra çi ye, Memo? Ev bênamûs qala araqî maraqiyê dike an...

Bûbê peyva wî birî:

—Na apo, na! Bîra avceh e, lê ez nizanim rast e an derew e.

Di wê navberê de Evdiko silav da wan û rûnişt. Piştî ku hemûwan silava wî lê vegerandin, Qaso henek pê kir:

—Kuro Evdiko, tu hew li me dipirsî, ha! Qey tu jî dewlemend bû yî?

—Na Wele apê Qaso, çi dewlemendî û çi hal, bi zorê roj di ser me de derbas dibin.

Îcar Bûbê jê pirsî:

—Evdo, min bihîst ku tu li Edenê kar dikî, ma li wê kar tune ye, lo? ..

Evdiko serê xwe bi neyînî hejand:

—Na cîran, karê çii halê çi...

Bûbê dîsan got:

—Welleh ez rast dibêjim, ger ku li wan deran kar marek hebe ezê jî bêm.

—Na Wele cîran, tu kar tune ye. Avahiya ku em tê de kar dikin vê sala were ewê bîst karkeran jê derxin. Ez ji xwe jî ditirsim. Ez ditirsim ku min jî derxin.

Piştî gavekê jina Bûbê bi teşta nên di ber civatê re derbas bû û got:

—Ma hun nanê germ naxwin?

Qaso bi devkenî got:

—Belê Wele keça min, hela tu bi xêra bavê xwe kefekê bi apê xwe de.

Emo teşta nên ji ser milê xwe daxist, danî ser çoka xwe, nanek jê derxist û dirêjî Qaso kir. Qaso ew nan kir du perçe, perçê din dirêjî Emo kir û got:

—Rehma xwedê li dê û bavê te be!

Memo jî ji cihê xwe pekiya, ew perçê din ji destê Emo girt û bi qertan kişiyayê. Dû re wextî tiştek bigota, lê Ûso peyva wî birî û nehişt ku ew bipeyive.

Emo ji Qaso pirsî:

—Min ji bîr kir ku ez bipirsim, apê Qaso, ma gelo nexweşiya te çawan bû?

Qaso herdu destên xwe ber bi hewa vekirin:

—Ez li ber rehma Xwedê me!

—Xwedê şifa xwe li te bike, apê Qaso. Dû re teşta nanê xwe danî ser milê xwe û ber bi mal ve meşiya.

Êdî hêdî hêdî tarî dikete erdê. Zarokên ku bi topê dileyistin, pîrekên ku li ser tenûrê nanên xwe lêdixistin, hêdî hêdî ew jî winda bûn. Peyayên ku li ber dîwêr rûniştî bûn jî rabûn ser xwe û herkes ber bi malên xwe ve çûn.

Piştî şîvê Bûbê ji jina xwe pirsî:

—Emo, ma em bîskê nerin mala cîranê min Ûso?

Emo bi rakirina firaxan mijûl dibû, piştî ku sifre rakir got:

—Baş e, wê çaxê ez lêwik şîr bidim, dû re em hirin.

Piştî ku zikê lêwik jî têr kir, lawik xist hemêza xwe, da dû Bûbê û derketin.

Herdu lawikên wan yên din çû bûn mala apê xwe. Bûbê li ber derî ji jina xwe pirsî:

—Ma zarok werin ewê zanibin ku em li mala Ûso ne?

Mala wan nêzîkî hev bûn. di nav mala wan de tenê du xanî hebûn. Gava ku gihîştin ber hewşê, jina Ûso ew dîtin, çû pêşiya wan, lawik ji destên Emo girt û bi hev re ketin hundir.

Ûso cigara wî di dest de bû, li ser doşekê pal da bû û li televizyonê dinihêrî.

Bûbê henek kir û got:

—Ma hun mêvanan vedihewînin?

Ûso keniya:

—Mêvan mêvanên Xwedê ne. Dû re ji cihê xwe rabû û cih da wan.

Bûbê derbasî ser doşekê bû, Emo û jina Ûso jî li jêrî wan rûniştin. Piştî ku Ûso cigare îkramî Bûbê kir, li Emo zîvirî û got:

—Maşale lawikê we mezin bû ye. Gelo navê wî çi ye?

Ji berdêla Emo Bûbê bersiv da:

—Navê wî Şoreş e. Lawê Qaso ev nav lê kiriye.
—Şoreş navekî pir xweş e, ma tu zanî mana Şoreş çi ye?
—Erê we, ez çawan nizanim.

Di wê navberê de nûçeyên televizyonê dest pê kir. Ûso rabû ser xwe û piçekî dengê wê bilind kir. Piştî ku li nûçeyan guhdarî kirin, jina Ûso çayê anî ber wan. Bi çayêvexwarinê re Bûbê ji Ûso pirsî:
—Cîran, riceke min ji te heye.
Ûso qedeha di destê xwe de danî û bi şaşmayî got:
—Estexfurulah cîran, kerem bike!
—Tu zanî ku ez bêkar im û tu kar bi destên min nakevin. Xwediyê xênî jî her roj kiriya xwe dixwaze...
Ûso peyva wî birî:
—Êê cîran!
—Gelo ma tu ê nikanibî li nik xwe karekî ji min re jî peyda bikî?

Ûso cigarek îkramî wî kir û yek jî vêxist. Piştî ku qurtek li çaya xwe xist, got:
—Wele cîran, di vê demê de parîkî dijwar e, lê emê dîsan jî kanibin ji te re karekî peyda bikin.

Wan wê êvarê heya bi dereng şevbuhêrkiya xwe li mala Ûso derbas kirin.

Piştî wê bi du-sê rojan, şevekê Ûso li deriyê wan xist û got:
—Cîran, rabe, xwe kar bike, emê îşev dakevin binxetê!

Gava ku Bûbê dengê Ûso bihîst, bi lez ji nav nivînên xwe pekiya, kincên xwe li xwe kirin, rahişt werîsê xwe, derket, da dû Ûso û lezand.

Çaxa ku Emo hişyar bû û li nav nivînê Bûbê nihêrî, Bûbê nedît, li ser nivînê wî rûnişt û heya derengê şevê jê re dua kir.

Şev reş û tarî bû. Ji xwe gava ku li Nisêbînê şev wisan reş biwa, xelkê digotin "Îşev şeva qaçaxkeran e". Şev wisan reş bû, ku ne ji şewqa lampên hin malan bûya, mirov nizanî bû ku tu kes li wê taxê dijîn.
Piştî ku ji çem derbas bûn, gihîştin nik hevkarên xwe yên din. Tam çil heb barkêşên qaçaxê di nav erdê nik Pira Alman, li hev kom bûbûn. Piştî ku bîskê li hev rûniştin û rêberan (rêzanan) şîret li wan kirin, rabûn ser xwe û her neh-deh heb bi derekê de çûn.

Bi her refekî re rêberek an du rêber hebûn. Rêber ew bûn, ku barkêş ji tixûp derbasî binxetê dikirin. Ji ber ku di erdê navbera binxetê û serxetê de mayin (bombe, qembere) hene. An em kanin bêjin, ku di erdê navbera Nisêbînê û Qamîşlo de... Salê bê hejmar qaçaxker di nav wan tixûban de têne kuştin. Yên ku bi guleyên eskeran û yên ku mayin bi wan de diteqin û têne kuştin Pirên wan jî seqet, kulek û bi lingekî dimînin. Gava ku mirov dihare Nisêbînê, mirov pir kesên ku bi lingekî û bi daran dimeşin, dibîne. Ew hemû jî di nava tixûban de li wan wisa hatiye. Erê xelk ji wan re dibêjin, qaçaxker, lê bi rastî

ew ne qaçaxker in, ew ji barkêşan pê ve ne tu tişt in. Qaçaxker ew in, ku şevê bi milyonan mal ji binxetê derdixin û ew bi xwe jî li malên xwe rûdinin û lingên xwe tavêjin ser hev. Ew tenê bi perên xwe dikin. Yên ku têne kuştin û seqet dimînin, barkêşên belengaz in.

Gurûba Bûbê û Ûso xwe di bin pirê de berdan û ber bi tixûb ve meşiyan. Ji xwe tixûb ne dûrî bajêr bû.

Bajarê Nisêbînê û Qamîşlo bi hev ve bûn, mirov digot qey herdu bajareke û tixûb di navbera wan de tune ye.

Piştî deh-panzdeh deqîqan ew gihiştin ber tixûb û xwe li wir qederê deqîqekê dane erdê û li rêber guh darî kirin.

Wê şevê dê xwediyê mal serê barkêş du hezar lîra bidaya wan. Ji ber ku Bûbê hîn nû bû, dê tenê hezar û pênc sed lîra bidaya wî. Piştî ku ew jî çendakî biçûya û bihata û jêhatî bûya, dê du hezar bidaya wî jî. Lê hezar û pênc sed jî dîsan ji Bûbê re ne hindik bû. Gava bihîst ku ewê hezar û pênc sedî bistîne, kêfa wî hat û di dilê xwe de got: "Ku ez şevê hezar û pênc sed lîran kar bikim, ne hindik e, kiriya xaniyê min ya du mehan derdikeve û ezê ji Emo û ji zarokan re jî hinek kinc minc bikirim û ji xwe re jî kîsek titûn..."

Bûbê pir poşman bûbû, ku heya niha ev karê bi pir pere nekiri bû. Wî bîskê jî hin xeyal meyal anîne ber çavên xwe.

Berî ku li têlan bixin û derbasî binxetê bibin, dîsan rêberê wan ji wan re got:

—Divê ku hun qet gavên xwe şaş mekin û ji ser şopa min şaş mebin ha!

Pêşî rêber keleşînkova xwe avêt milê xwe, bi meqesa ku mirov pê têlan dibire, têl birîn û hemû yek bi yek derbas bûn.

Hemû ketin rêzê û li dû hevdu bi qulûsî meşiyan. Lê dilên gişan bi tirs bûn. Ûso û Bûbê li herî dawiyê bûn. Piştî ku bi çend gavên baş di nav tixûbê binxetê de meşiyan, Ûso hêdî ji Bûbê re got:

—Cîran, tu lingên xwe şaş neavêjî ha! Ji ser şopa min danegere!

Bûbê bi tirs li dû hemûwan, beyî ku gavên xwe şaş biavêje dimeşiya.

Piştî ku neh-deh deqîqan wisan çûn, ji nişkê ve kozikek leşkeran li pêşiya wan derket û li wan teqandin. Rêberê wan jî xwe li ser zik avêt erdê û wî jî li leşkeran reşand. Şansê wan hebû, ku ew ji erdê bi mayin xelas bû bûn. Ûso ji ber ku zû de ev kar dikir, bi rewşê zanî bû. Wî hema xwe avêt destê Bûbê û bi heyecan got:

—Cîran, bide dû min!

Ûso, Bûbê û barkêşên din hemû destvala bûn. Ji ber vê yekê ew mecbûr man ku baz bidin û canên xwe xelas bikin. Hemû barkêşan baz dan, xwe avêtin paş girikekî nêzîkî Qamîşlo û xwe xelas kirin. Lê tenê rêber di nava leşkeran de ma. Wî û leşkeran her li hev diteqandin. Piştî demeke kurt, wî jî xwe bi

bazdanê gihande nik barkêşan. Wê şevê hemû bi saxî derbasî binxetê bûn.

Bûbê wisa poşman bûbû, ku ew di jiyana xwe de tu caran wisan poşman ne bûbû. Wî bîskê jina xwe û peyvên wê anîne ber çavên xwe:"Bûbê, Xwedê carekê mala mirov wêran dike. Weleh tu bi a min dikî, parsê bike û qaçaxê meke. Bûbê, ger ku tu li min nafikirî, li vî tifalî û birayên wî bifikire, mala me wêran meke".

Di wê navberê de Ûso tiştek got, lê Bûbê fêhm nekir, veciniqî û pirsî:

—Çi, ma te tiştek got, cîran?

Ûso zanî bû, ku Bûbê tirsiya ye. Ji ber, gava ku şeva pêşî ew derbasî binxetê bûbû, ew jî wisan tirsiya bû.

Wan di eynî şevê de mal derxistin. Ne di cihê berê de, lê di ciheki dûrî bajêr de... Derxistina mal tenê du saet kişand û mal hemû çayê bû.

Bûbê saet di çar-pêncê sibehê de vegeriya malê. Hêdî, beyî ku kesî hişyar bike, derî vekir û kete hundir. Ew hezar û pênc sedê ku kar kiri bû xist bin behlîfa xwe û tevlî kincan xwe avêt nav nivîna. Hema ku xilmaş bû, xewn dît. Lê çi xewn? Xewnek wisan, ku ew di nav tixûb de û bê heval meval ma bû. Leşkeran her li wî diteqandin û didane ser pişta wî. Lê wî dikir nedikir nikarî bû baz bida, gavên wî li hev digeriyan û diket xwarê. Dawî dawî leşkeran

nêzîkî lê dikirin û yekî ji leşkeran gule tajot ber tifinga xwe ku berdiyê, lê Bûbê kire qîrîn û hişyar bû. Bi qîrîna wî re jina wî jî hişyar bû. Gava Bûbê dît ku xewn e, hema xwe avêt jina xwe û ew hişk hembêz kir.

Jina wî ecêbmayî ma û jê pirsî:

—Çi ye, Bûbê? Ma çi qewimî? Ma ne tu ê îşev biçûya binxetê?

Bûbê keserek kûr berda û ji kêf û heyecanan hêsir ji çavên wî hatin. Dû re behlîfa xwe bilind kir, ew hezar û pênc sed lîrayên ku kar kiri bû nîşanî jina xwe da û dîsan ew hembêz kir.

# Serîhildana Zarokan

Bavê Gurî li deriyê sinifê xist û bi Gurî re kete hundir. Kincên bavê Gurî bi zarokên dibistanê hebekî ecêb hat. Şalwarê wî û kumê li serî hemû zarok da kenandin. Lê mamosta ew dane rawestandin û ji bavê Gurî pirsî:

—Te navê wî li ba midûr nivîsand?

Bavê Gurî destên xwe dane ser hev, serê xwe tewand û got:

—Erê...

Gurî emanetî wê kir û derket.

Piştî ku mamosta Gurî bi cih kir, ew bi zarokan naskirin da:

—Navê vî hevalê we Gurî ye. Gurî nû hatiye bajêr. Ew jî weke we tenê du salan çûye dibistanê. De hun jî xwe bi Gurî bidine naskirin.

Pêşî Şêro rabû ku xwe bi Gurî bide naskirin, lê ji ber ku pir keniya mamosta nehişt ew bipeyive û ew dîsa da rûniştandin. Dû re Biro rabû, wa hebekî bi şermokî xwe bi Gurî da naskirin. Di wê navberê de Beko destê xwe bilind kir û xwest bipeyive. Mamosta darê xwe ber bi wî ve dirêj kir:

—Bibêje!

Beko bi dengekî bilind keniya û got:

—Bi rastî jî navê vî hevalî xweş e.

Mamosta pê re xeyidî, erza wî şikand û got:

—Tu careke din gûyekî holê nexwe. Ev çi qeşmerî ye, te pê girtiye?

Lê, Beko dîsa rabû û peyivî:

—Bi rastî jî navê wî xweş e!..

Kêfa Gurî pir ji wan peyvê Beko re hat. Ji wî hebû Beko bi rastî dibêje, nizanî bû ku ew henekê xwe bi navê wî dike.

Beko dîsa xwest tiştekî bibêje, lê, mamosta peyva wî birî û nehişt ew beyî ku destê xwe bilind bike, bipeyive. Beko guh neda wê û peyva xwe domand:

—Mamosta, ma tu zanî mana gurîtiyê çi ye?

Mamosta wisa beheci, wextî darê di destê xwe de biavêta wî. Dû re çû ba wî, destê xwe avêt guhê wî û got:

—Kuro, ma ev çend car in ez ji te re dibêjim, zêde nepeyive? Ha? Ma qey peyv nakeve serê te? ..

Gava ku mamosta guhê wî berda û ber bi text çû, Beko ji paşiyê de henekê xwe bi wê kir, zimanê xwe derxist û çavên xwe şaşo maşo kirin.

Îcar Ken destê xwe bilind kir, destûra peyvê xwest û xwe bi Gurî da naskirin. Dû re Nûjîn, Mizgîn Bozo, Azad... Hemû zarokên di sinifê de yek bi yek xwe bi Gurî dane naskirin.

Pênc deqîqe ma bû li zengilê navbirê biketa. Berî li zengil bikeve, mamosta şîret li zarokan kir û Gurî emanetî wan kir.

Dîno:

—Mamosta, ezê bi Gurî re bibim heval.

Beko destê xwe li destê wî xist û bi hêrs got:

—Ew di rexmin de rûdinê, ezê bi wî re hevaltiyê bikim.

Tiştên Beko gotin, neketin serê Dîno. Îcar ew çi ye? "Ew di rex min de rûdinê ezê bi wî re hevaltiyê bikim" Wisa be, hema herkes dê bi yê ku di rex hev de rûniştî re hevaltiyê bikin. Dû re Dîno Beko dehf da û got:

—Haydê, biqeşite!

Beko bi destê wî girt, bada û got:

—Ancax ê mîna te biqeşitin ûlan!..

Mamosta bi ser herduwan de qêriya:

—Zû werine vir!

Dîno:

—Sûcê min tuneye mamosta, ma tu wî nabînî?

Mamosta dîsa qîriya:

—Min ji we re got, werine vir!

Dîno wisa serê xwe li Beko hejand, ku di awirên wî de mirov digot, qey dibêje "Ezê li der ve nîşanî te bidim".

Mamosta bi destên herduwan girt, li ser tûtikan, li ber wan rûnişt û hêdîka bi dengekî nizim ji wan re got:

—Binihêrin lawê min, divê hun bi aqil bin, hun ji hev hez bikin û bi hev re bileyizin. Divê hun ji Gurî re bi mînak bin. Ku hun li hev welê bikin, li hevdu xin, Gurî dê nebêje çi? Ma ewê henekê xwe bi me neke?

Herdu zarokan jî bi mana erê serê xwe hejandin. Dû re mamosta destê xwe di serê herduwan da û ew

şandin cihên wan.

Gurî di cihê xwe de şaş ma bû. Ew ecêbmayî mabû ku çawa pîrekek evqas tiştan bizani be û bizani be evqas şîretan li mirovan bike. Gurî di xeyalan de kûr çû û di dilê xwe de got:

—No! ez careke din nayêm vê dibistanê! Dibistana ku pîrek mamosta be û weke peya darê xwe bihejîne, bi guhên mirovan bigire, bi ser mirovan de biqîje û şîretan bike; ez naçime wê dibistanê. Ma ez sibehê herime gund dê gundiyê min ji min nepirsin, bê kî mamostê min bû? Ez li gun mamosteyê hemî pîrekan bûm û min ew hînî xwendin û nivîsandinê dikirin, Ma ew pîrekên gund bibihîzîn ku li bajêr pîrekek mamostê min e, dê ji min re nebêjine çi? No, Weleh ez hew tême vê dibistanê! Ku gundî bibihîzin mamostê min pîrek e, ezê ji şerman bimirim.

Mamosta ber bi quncikê çû û destê xwe danî ser qunçekekê. Ku wê tiliya xwe danî ser bişkokê, zirîna zengil hat. Bi dengê zirîna zengil, Gurî ji cihê xwe pekiya û ew tiştên lê difikirî, hemî ji bîrê çûn. Rabû ser xwe, deftera xwe danî ser pitûkê, pênûs danî ser defterê û bi zarokan re derket der ve.

Li der ve Gurî şaş bû, devê wî ji hev ma. Wî tu caran evqas zarok bi carekê nedîti bû. Piştî ku çend gavan ber bi hewşa dibistanê ve çû, bavo, ew çi bibîne; ku zarok li hewşa dibistanê weke axê ne. Gurî tu caran nedifikirî û aqil nedikir dê ewqas dibistan û ewqas zarok bi carekê de hebin. Ew di wê deqîqê de li gund û li dibistana gund fikirî. Bi tenê çardeh panzdeh şagirtên dibistana gund hebûn û ji dareke

tuwê pê ve tu tişt ne li hewşa dibistanê, ne jî li dervayî dibistanê hebû. Lê li vê dibistanê? Li vê dibistanê her tişt hebû.

Di wê navê de du zarokan tiliyên xwe ber bi wî ve dirêj kirin û keniyan. Kêfa Gurî qet ji wan re û ji kenên wan re nehat. Gurî bi hêrs ber bi wan herdu zarokan ve çû. Yekî ji wan zarokan nuqurçk ji hevalê xwe veda, tiliya xwe ber bi şalwarê Gurî ve kir û got:

—Hê hê! Li pîneyê şalwarê wî binihêre! Li pîneyê şalwarê wî binihêre!


Gotinên wî lawikî Gurî pir êşand, dilê wî bi wî şewitand.

Wî ji bavê xwe re goti bû "Ez bi vî şalwarê pînekirî naçime dibistanê" Bavê wî destê xwe di serê wî da bû, li ber wî geriya bû û goti bû: "lawê min, tu niha bi vî şalwarî îdare bike, bi xêr ezê ji lawê xwe re şalwarekî nû û xweşik bikirim". Lê, mixabin, bavê wî jê re tu kinc nekirî bû. Dibû ku perên bavê wî tune bûn, jê re kincan bikire. Ji xwe perên bavê wî hebiwa, hîn berî Gurî jê re bigota "Bavo ji min re kincan bikire", dê bavê wî jê re bikiriya. Lê nekirî bû, ma dê Gurî çi bikira? Gurî dîsan îdare nekir, fikirî û di dilê xwe de got:

—Bavê min ji min re kinc kirî biwa, van zarokan nedigotin: "Ha ha li pînên şalwarê wî binihêrin".

Lê, wan herdu zarokan dev ji Gurî bernedan. Geh kutik lêxistin, geh jî tilî avêtinê. Carinan jî digotin:

—Li pînê şalwarê wî binihêrin, li pînê şalwarê wî


Khaled 86

binihêrin û dikeniyan.

Pêşî ji hêrsan Gurî debar nekir û girî kete qirika wî; dû re herdu destên xwe kirin gurmist û êrış bire ser wan herdu zarokan. Gava çend gurmist avête yekî, yê din ji tirsa bazda.

Dîsan li zengil ket. Zarokên li hewşa dibistanê dileyistin, hemiyan lîtikên xwe nîvcî hiştin û bi çindikavêtinî bazdane sinifên xwe.

Bi rastî vî zengilî jî serê Gurî li hev dixist, lê wî zêde guh nedayê. Li gund tu zengil mengilên welê tune bûn. Tenê mamosta derdiket ber deriyê dibistanê û li pîpîskê (Pîpîk) dixist. Carinan jî tenê di pacê de bangî şagirtan dikir. Ji xwe bi tenê çardehpanzdeh şagirtên dibistana gund hebûn û ew jî ne weke van şagirtên bajariyan zimandirêj û qure bûn. Hema ku mamosta li pîspîskê bixista, an di pacê de bangî wan bikira, hemî dev ji lîstikên xwe berdidan û direviyan hundirê dibistanê.

Gava ku Gurî kete hundirê sinifê tu zarok neketi bûn hundir. Ku mamosta çav li Gurî ket, ji ser masa xwe rabû, destê xwe di serê wî da û got:

—Aferîn lawê min. Tu her dem wisa di wextê xwe de werî, erê?

Gurî wa bi şermokî di mana erê de serê xwe ber bi jêr ve hejand û çû li cihê xwe rûnişt. Piştî ku Gurî li cihê xwe rûnişt, hin zarokên din jî ketine hundir. Lê, bi tenê Beko û Dîno nehatin. Mamosta axînek kûr kişand û got:

—Ev bênamûsan her dem welê dereng dikevine dersa xwe. Nizanim ji bo ev rast bibin û guh bidine

dersên xwe ez çi bikim? Ew li vir biwana ., me dê niha dest bi dersa xwe ya jîmnastîkê bikira.

Hîn mamosta wisa dipeyivî, nihêrî ku herduwan hevdu dahf dan û ketin hundir. Şêro bi dengekî bilind got:

—Mamosta, va Beko û Dîno hatin!

Mamosta bi ser de qêriya:

—Erê erê, ma ji te weye ez ker û kor im ez wan nabînim?

Dû re berê xwe bi Beko û Dîno ve kir:

—Ev çend car in, ez ji we re dibêjim, di wextê xwe de werin? Ma ji we tirê ev mala bavê weye, ha!

Beko wa bi serîhildanî bersiva mamosta da:

—Çima tu wisa dibêjî mamosta? Here van peyvan ji midûr re bike. Wî ez şandi bûm dikanê ji bo ku ez jê re pakêteke cigare bikirim.

Dû re mamosta berê xwe bi Dîno ve kir û bi sert jê pirsî:

—Lê tu?

—Midûr ez jî bi Beko re şandi bûm.

Mamosta berê xwe bi hemû zarokan ve kir û ji wan re got:

—Ji niha pê ve ne midûr, sermidûr jî we di dema dersê de bişîne derekê neçin. Ku ji we bipirse, "çima"? hun bêjin "mamosta me ji me re got". Erê? We fêhm kir?

Hemî zarokan weke ku bi dengekî bersiv dan:

—Erê!

Di wê navberê de dengekî îskînî hate guhê ma-

mosta. Mamosta berê xwe bi Nûjîn ve kir û pirsî:

—Çi ye keça min, ji bo çi tu digirî?

Keçê hîn bêtir kire îskînî û bi dengekî bilind giriya. Ji girî bi zorê peyv ji dev derket:

—Beko bi qelema xwe li ser kitêba min ya matamatîkê xet kişandin.

Mamosta ji hêrsan hew kanî bû di cihê xwe de rûnişta. Rabû ser xwe, ber bi Beko ve meşiya û bi ser de qêriya:

—Kuro, ma qey peyv nakeve serê te? Ev çend car in, ez ji te re dibêjim li dibistanê tiştên wisa meke, weke mirovan be? Ezê îşev hemûyî ji dê û bavê te re bêjim. Dû re bi guhê wî girt û ji bo ku pênc deqîqan li qorzîkê, li ser lingekî raweste, ceze dayê. Paşê mamosta çû li cihê xwe rûnişt û ji zarokan re got:

—Îcar hebekî bêdeng bin, li min godarî bikin. Niha dersa me jîmnastîke. Dê Elî were ser dersa me ya jîmnastîkê. Divê hun li hemberî wî bêdeng û bi aqil bin û hun qîmeta wî bigirin; da ku ew bibêje: "aferîn, zarok divê ku wisa bin". Bila zani be ku di vê dibistanê de ji we zırektir, zanetir û jêhatıtir tune ne.

Ji bilî Beko hemî zarokan bi dengekî bilind gotin:

—Erêê!..

Mamosta ji Beko pirsî:

—Çima, ji bo çi deng ji te dernakeve?

—Ez ji dersa wî Eliyê şîşko hez nakim.

—Ji bo çi tu ji dersa wî hez nakî?

—Gava ku ew baz dide, qûna wî bi metroyekê ji laşê wî bi dûr dimîne, ji bo vê yekê ez jê hez nakim.

Bi wan gotinên Beko hemû zarok keniyan; Lê

mamosta hew hişt ku Beko bipeyive û ji bo ku ew wisan qeşmeriyan neke, şîret lê kir.

Beko bi pênûsa xwe li ser neynûka xwe ya tiliya girdikê tiştin nivîsand û di cihê xwe de bêdeng ma.

Pir tê neçû mamosta Elî kete hundir, paltoyê di destê xwe de bi dar de kir û hebekî krewata xwe sist kir. Piştî ku piçekî bi mamosta re peyivî, li zarokan zîvirî û bi devkenî ji wan pirsî:

—Kincên we hemiyan yê jîmnastîkê hene?

Gurî destê xwe bilind kir, destûra peyvê xwest û peyivî:

—No, kincên min yên jîmnastîkê tune ne.

Mamosta wa baş lê nihêrî û ji mamosta Hêlîn pirsî:

—Ev kîvroşkekî nû ye.

Ev peyva mamosta Elî kete serê Beko, keniya û got:

—Bi rastî jî ev nav tam lê tê. Eyn weke kîvroşka ye.

Gurî ji qehran serê xwe danî ser masê û kire îskîn. Ew çi bû îcarê? Du nav ne bes bûn îcar sê navên wî çêdibûn. Ma nizanî bûn, ku Gurı ne navê wî yê rastî ye? Îcar navê kîvroşkê jî lêkirin. Îcar ew dibû sê navî. Çepo, Gurî û Kîvroşk... Navê wî yê rastî Çepo bû. Lê, biçûkî, gava ku hinek pizik di serê wî de hati bûn û wer ku ew ji ber êşa pizikan giriya bû, Bavê wî hêrs bû bû û bi ser de qêriya bû:

—Hela bes e, Gurî, te em ji guhan kirin lawo, ma te xêr î?

Êdî ew nav di nava zarokên gund de belav dibe. Herkes navê wî yê rastî "Çepo" ji bîr dikin û jê re dibêjin Gurî.

Gurî serê xwe ji ser masê rakir û bi îskînî ji mamosta Elî re got:

—Ku ez kîvroşk bim, tu jî şîşko yî.

Lê ji ber ku Elî bi mamosta Hêlîn re dipeyivî, deng neçûyê. Ji xwe ku nepeyivî biwa jî, ji dengê qelebalixa zarokan deng nediçûyê.

Piştî ku mamosta Elî bi mamosta Hêlîn re peyivî, hemî zarok dane ber xwe û bire sinifa xwe. Dersa wan ya jîmnastîkê pir xweş derbas bû. Jîmnastîka wan qet ne weke ya gund bû. Ji xwe tiştê kêfa Gurî jî jê re hat ew bû. Dersên jîmnastîkê li gund qet ne wisan bû. Wan tenê du-sê caran li dora dibistanê baz didan û carinan jî tenê di sinifê de xwe çend caran vedizelandin. Lê li vir, bi musîkê û bi pir tiştên tewlomewlo dersên jîmnastîkê dikirin.

Piştî dersa jîmnastîkê hemî zarokan çentên xwe girtin û berên xwe dane malê.

II

Gurî wê êvarê heya bi dereng nehişt dê û bavê wî bîskê rûnên û bêhna xwe berdin. Hemî tiştên li dibistanê bûbûn, hemî tiştên bi serê wî de derbas bûbûn, rewşa zarokan, rewşa dibistanê, rewşa mamostan; hema wî çi kiri bû û çi dîti bû ji dê û bavê xwe re gotin. Bavê wî rabû ku nimêja eşa bike, lê, Gurî nehişt, ew dîsa rûniştandin da û dîsan her tişt ji serî heta binî jê re got. Gava ew herdu zarokên li dibistanê yên ku henekê xwe bi kincên wî kiri bûn, hatine bîra wî, çavên wî tije hêsir bûn û bi dengekî nîvqurmiçî ji bavê xwe re got:

—Weleh tu ji min re şalwarekî nekirî ez ne diherim dibistanê ne jı diherim ba melê. Min ji te re got, "Ez bi vî şalwarê pînekirî naçime dibistanê" Te got: "Tişt nabe lawê min, bajar ne weke gundan in, kes karê xwe ji karê kesî naynin û henekê xwe bi kesî nakin". Weleh tu ji min re şalwarekî nû nekirî ez ne diçim dibistanê, ne jî diçim ba melê. (îcar bi dengekî bilind giriya û got):

—Weleh ew zarokên wê dibistanê dê hemî bi min bikenin û dev biavêjin pînê şalwarê min. Ez zanim ew herdu pîncan dev ji min bernadin.

Bavê wî cigara qalind, ya ku pêça bû, xiste devê xwe û bi heste vêxist. Ji ber ku serê cigara wî baş tijî tûtin nebûbû, tenê pel şewitî û cigare vêneket. Dîsa hestê xwe vêxist û da serê cigarê. Dixana pêşî di dev û pozê xwe de berda û tûtina ku keti bû devê xwe bi hilma duduwan re, bi dixana cigarê re, wa bi nerm tif kir. Paşê destê xwe avêt ser stûyê Gurî, ew ber bi xwe ve kişand û bi bergerîn jê re got:

—Lawê min, Weleh ezê ji te re şalwarekî bikirim. Ne min berê ji te re soz daye, ku ezê ji te re bikirim. Lê hebekî xwe ragire heta ez meaşê xwe bistînim.

Gurî wextî dîsan bigiriya, lê wî bi toreya bavê xwe zanî bû. Wî zanî bû ku ew careke din bigirî û şalwar bixwaze, bavê wî dê lê xe û tu şalwar malwaran jî jê re nakire. Gurî deng nekir, weke pisîkek ku mirov paş guhan bimise, bê deng û melisî di hemêza bavê xwe de ma. Gurî neh salî bû, lê wî xwe di wê deqîqê de sê-çar salî didît. Wisan dilê xwe bi xwe dişewitand, ku carinan xwe nedigirt û hêstir ji çavên wî diherikîn.

Bavê wî destê xwe di serê wî da û got:

—Bi xêr ku îsal lawê min dibistana xwe xelas bike, ezê jê re qatek kincên xweşik û spehî bikirim. Ezê qatek kincên xweşik, ji qumaşê ingilîz ji lawê xwe re, li ba cildirû bidime dirûtin.

Lê, ji ber bêxewbûnê êdî hewesa Gurî zêde li ser peyvê nema. Xewê, xwe weke kabûsekî berdida ser wî. Çend caran li ser hev bawişkî û çavên wî hatin girtin. Bavê wî hêdî, beyî ku wî hişyar bike, serê wî danî ser çoka xwe. Dû re bi dengekî nizim bangî jina

xwe kir:

—Keçê, hela tu were vî lawikî bibe nav cihê wî.

Piştî ku jinikê nivînê wî li erdê raxist, hat û lawik bir xist nav nivînê wî. Dû re nivînê xwe û mêrê xwe jî li erdê pehn kir û bangî mêrê xwe kir:

—Ma çavên te lê ye tu li wir razê, lo? Ma tu jı nayê nakevî nav nivînê xwe?

Mêrik axînek bi derd kişand û ji cihê xwe rabû. Piştî ku çû daşirê mist, hat, kincên xwe ji xwe kir û kete paxila jina xwe. Jinik bîskê bêdeng ma, paşê got:

—Wer xuya ye zarokan dev avêti bûn pînê şalwarê Gurîkê min.

—Erê Wele...

—Weleh ev zarokên bajaran jî pînc in, ji ên gundan hîn xerabtir in.

—Ma tu tixup di navbera zarotiyê de heye? zarok li herderê zarok in.

—Çi? Weleh dema me qet ne welê bû. Hin zarok hebûn, xwas û bi kincên pertalpertalî jî digeriyan; lê, tu kesî ne dev diavêtin wan, ne jî ew dibehecandin.

Mêrik nexwest zêde li ser kincan bipeyive, peyva xwe guhert:

—Bila Gurî ji xwe re bixwîne, bibe tiştekî. Yê me hey me nexwend, em wisan bêkar, nezan û bê senhet man. Îro her tişt di xwendinê de ye. Xwendin ji mal û peran jî bi qîmettir e. Ma ne wisa ye lê? Ma li gund qîmeta lawê Cindî bi çiqasî ji ya lawê axê bêtir bû. Lawê Cindî nexwendi biwa,ew ne doktor biwa, ma dê kîjanî ji me gundiyan bêtir qîmet bida wî? Ma dê lawê axê ne di ser me hemî gundiyan re biwa?

—Belê! Weleh xatirê lawê Cindî bi deh qatan ji xatirê lawê axê bêtir e. Bi rastî jî lawê ne hêja ye neynûka lawê Cindî. Ferqa di navbera lawê axê û lawê Cindî bi qasî çiyan e. Neynûka lawê cindî bi lawê axê ye.

—Lê, ji bo vê yekê ezê Gurîko bidime xwendin. Heta jê tê bila bixwîne. Dibe ku xelk ji bo wî xatirê me jî bigirin.

Jin û mêr bi wî awayî heta bi dereng, li ser lêwik û rewşa lêwik peyivîn. Herdu bi wî awayî bi xew ve çûn. Di xewnên xwe de jî dîsan her lawik dîtin.

III

Sibehê zû, piştî ku Gurî taştiya xwe xwar, rahişt çentê xwe, diya xwe hembêz kir û ber bi dibistanê ve lezand. Di rê de ew qet nesekinî, rast çû ber deriyê sinifê û li derî xist. Lê tu deng ji hundir nehat. Gurî du-sê caran din jî li ser hev li derî xist. Gava ku tu deng ji hundir nehat, hêdî derî vekir û kete hundir. Hîn tu zarok nehati bûne hundir, hundir vikîvala bû. Gurî kirî bi paş de vegeriya, lê, gava ku çav li çentê li ser masê ket, venegeriya. Ew ber bi çente çû û destê xwe xiste hundirê wî. Gava ku wî welê çente peland, têhihîşt ku çentê mamosta wî ye. Piştî ku bi tirs li dora xwe nihêrî, zincîra çente kişand û çente vekir. Hema bi zûka herdu destên xwe xistin hundirê çente û destên xwe lê gerandin. Piştî ku baş hundirê çente li hev xist, tiştekî weke pênûsekê kete destê wî. Ew tiştê weke pênûsê boyaxa lêva mamosta wî bû; lê ji Gurî webû ew pênûs e. Gava ku di kaxiza ser masê da, sor nivîsand. Gurî ew xiste bêrîka xwe, çente weke berê kir û derkete der.

Êdî hewşa dibistanê ji zarokan tijî bû bû. Gurî li dora xwe nihêrî û çavên xwe li hevalên xwe yên si-

nifê gerandin. Wî zû hevalên xwe dît û ber bi wan ve bazda.

Hemî hevalên wî yên sinifê û zarokên sinifeke din li hev civiya bûn û ji bo maçê grûp ava dikirin. Gava ku Beko çav li Gurî ket, kêfa wî hat û got:

—Va hevalê me yê nû, bila ew jî di grûpa me keve.

Yekî ji sinifa din ku poz û guhên wî mezin bûn, dehfek da Gurî û got:

—Na, em viyê nezan û şalwarpînekirî naleyizînin.

Peyvên wî lawikê poz û guhmezin weke xencerekê li dilê Gurî ket. Gurî xwe avête destê wî, li hev ba da û da pişt wî.Hingî bû ayeaya lêwik û kirî bigiriya. Ku ne ji Şêro biwa, dê herdu grup têketina nav hev û hevdu biêşandina. Baş bû, Şêro biaqil derket û ew zû ji hev kirin. Piştî ku wî lawikê poz û guhmezin û Gurî ji hev kirin, zû grup çêkirin û dest bi maça xwe kirin. Wextê wan tenê panzdeh deqîqe bû. Di sêzdeh deqîqan de heryekî heft gol avêtine hevdu. Di herdu Deqîqên dawî de, Gurî bi serî goleke din avêt. Bi wî awayî, maça wan bi heşt û heft dawî hat.

Bi lêdana zengil re, hemî zarok belav bûn. Yên ku ber bi daşirê de bazdan û yên ber bi avê de...Piştî wê, hemî zarok ketine sinifên xwe. Hewşa dibistanê di wê deqîqê de vala bû.

Gurî dîsan berî hemû zarokan kete sinifa xwe. Vê yeka han kêfa mamosta wî anî, destê xwe di serê wî da û pê şa bû. Piştî ku hemî zarok ketin hundir û li cihê xwe rûniştin, mamosta ji bo ku Gurî navê xwe binivîsîne, rakire text. Gurî wa bi hêdîka û bi şermokî çû ber text, rahişt tebeşîrê û bi tîpine çeloxwarî


Khaled
86

navê xwe yê rastî, "Çepo" nivîsand.

Mamosta îcar xwe bi ser wî de tewand û hêdîka tîp bi tîp jê re got:

—Min ji te re got, navê xwe binivîsîne.

Gurî wî navê ku li ser text nivîsandi bû, bi tiliya xwe nîşanî mamostê da û got:

—Navê min yê rastî ev e, Çepo ye.

Mamosta wa bi şaşmayî jê pirsî:

—Ku navê te Çepo be, ji bo çi bavê te "Gurî" nivîsand?

—No, niha navê min Gurî ye. Navê min berê Çepo bû. Biçûkî, gava ku ez hîn sê salî bûm, hin pizik di serê min de hatibûn. Pizikên mezin... Wer ku ez ji ber êşa wan pizikan digiriyam, bavê min rojekê bi ser min de qîriya û got: "Lo Gurî, te em ji guhan kirin, ma te xêr î tu evqas digirî? ": Ev gotin kete devê birayê min yê mezin û ji bo ew bin bibehecîne, herdem ji min re got: "Gurî". Dû re ev peyv kete devê zarokên gund û hemiyan navê min yê rastî ji bîr kirin û ji min re gotin: "Gurî". Bi vî awayî navê min Gurî ma. Li nifûsê jî Gurî ye.

Mamosta destê xwe di serê wî da û bi devkenî got:

—Porê te ji yê min bêtir e, ka kudera te gurî ye?

—Nêviyê porê min yê pir weşiya bû. Bavê min çêleka me firot û ez birime Diyarbekir, ser doktor. Piştî serîdana doktor bi çendakî, porê min hêşin hat û ji yê berê hîn bêtir bû.

Mamosta daqûl bû, herdu destên xwe nermik li gepên wî xistin û got:

—Baş e, êdî ez zanim ji bo çi navê te Gurî ye.

Piştî ku Gurî şande cihê wî, deftera navan derxist, li ser masê rûnişt û dest bi xwendina nava kir. Ji Nûjîn pê ve hemî zarok li wir bûn. Mamosta li zarokan mêze kir û pirsî:

—Kesî ji we Nûjîn dîtiye?

Beko destê xwe hilda jor û got:

—Ew nexweş e mamosta, wê serma girtiye.

—Tu ji ku zanî ew nexweş e?

—Em cînarê hevdû ne. Diya wê êvarî ji me re got.

Mamosta serê xwe kil kir û got:

—Baş e.

Mamosta deftera navan danî qorziyeke masê, rabû ser xwe û du-sê caran di hundir de çû û hat. Dû re çû ber textê nivîsandinê, rahişte tebeşîrê û ji zarokan pirsî:

—Ma hun zanin îro çi roj e û mana wê çi ye?

Hin zarokan di mana nabûnê de milên xwe hejandin, hinan gotin, na, hinan jî destên xwe hildan jor ku bipeyivin. Mamosta ji nav ên ku destên xwe hildabûn jor, Gurî neqand û jê pirsî:

—Mana îro çi ye lawê min?

—Îro roja zarokan e.

Mamosta keniya û got:

—Aferîn. Ma we rojên wanî li gund pîroz dikirin?

Gurî kete heyecanê, rûyê wî sor bû û zimanê wî li hev aliqî. Piştî ku çend caran xweziya xwe daqurtand, got:

—Na, min li gund rojên welê nebihîsti bûn. Lawê cîranê me yê xwendevan duhî êvarî ji me re got.

Hingî misto zû, bê sebir destê xwe bilind kir û

peyivî:

—Ku îro roja zarokan e, ka em herin ber çem. Vê germa han qet kêfa min ji dersê re nayê.

Beko beyî ku destê xwe bilind bike û destûra peyvê bixwaze, bi bergerın ji mamosta pirsı:

—Bi rastı jı em ıro herine gerê, mamosta. Niha ber çem pir hênik û xweş e.

Mamosta serê xwe vir de û wê de hejand û got:

—Na, çênabe. Hun zû pênûs û defterên xwe derxin.

—Min çentê xwe li mal ji bır kiriye, pênûs û deftera min tune ye.

Mamosta bi ser de qîriya:

—Ma çente tê ji bîrakirin?

—Çima nayê ji bîrakirin? Min çentê xwe ji bîra kiriye û pênûs û deftera min jî tune ye.

Piştî ku mamosta axînek kişand, got:

—Ma tu îro bi pîsîklêtê hatiyî?

—Erê, ez bi pîsîklêtê hatime.

—Baş e. Wê çaxê tu zû li pîsîklêta xwe siwar bibe, here çentê xwe bîne û were.

Beko wa bi serhildanî got:

—Ezê çawan herim çentê xwe bınim? Ez naçim, mala min dûr e...

Mamosta bi sert peyva wî birî.

—Ez ji te re dibêjim, here çentê xwe bîne, zû!..

Beko bê dilê xwe rabû û çû. Ji nav hemû zarokan yê herî dewlemend Beko bû, deh dikanên bavê wî, hotêlek û hezar donim erdê wî yê avî hebû. Gava ku dinya nexweş biwa, baran bihata, an jî der ve hebekî sar biwa, bavê Beko ew bi texsiyê dibir û tanî... Ku

dinya xweş biwa, Beko bi pîsîklêta xwe diçû û dihat. Wî nedihîşt tu zarok bi pîsîklêta wî bikin. Ku carinan zarokan destê xwe pêbikirina û bixwestina serîkî lê siwar bibin, Beko bi wan re dixeyidî; zora li wan biçûya, li wan dixist. Kincên Beko hertim nû û ûtîkirî bûn. Ku kincên hin zarokan kevn û pînekirî biwa, wî henekê xwe bi wan dikir û ew dibehecandin. Bi qasî ku dewlemend bû, ewqasî jı pozbilind û ji xwe bawer bû. Li dibistanê bi a tu mamostan nedikir û bi tu zarokan re xweşikahî hevaltî danetanî. Lê ji nava hemû zarokan jî yê herî nezan û guhên xwe nedida dersan Beko bû.

Piştî ku Beko derket, mamosta ji her zarokekî wêneyeke ku maneya wê rojê bide, xwest. Zarokan defterên xwe yên wêna derxistin û dest bi çêkirina wêneyan kirin.

Berî li zengil bikeve, mamosta hemî wêneyên ku zarokan çêkiri bûn dan hev. Dû re li ser kursiya xwe rûniştû û yek bi yek li hemû wêneyan nihêrî. Ji nava hemû wêneyan, wêneyê ku Gurî çekiri bû eciband. Gurî pênc-şeş zarokên bi destê hev girtibûn,çêkiri bûn û hemû zarok bi rengê cihê cihê boyax kiribû.

Hîn welê mamosta li wêneyan dinihêrî, beyî ku li derî bikeve, derî vebû û Beko kete hundir. Mamosta bi ser de qîriya:

—Ev saeteke te, ma tu li ku bû? Ma mala te ewqasî dûr bû?

Beko dîsan weke hercar, bi derewan tiştin li hev anîn û xwe rast, mamosta jî derewîn derxist. Lê mamosta serê xwe hejan, keserek kûr kişandû hew tiş-

tek got.

Piştî ku li zengil ket û hemû zarok derketine der ve, mamosta ew hemî wêneyên ku zarokan çêkiri bûn bi hev ve zeliqandin û bi dîwêr ve bizmarkirin. Wê rojê zarok tenê danekî çûne dibistanê.

Çaxa ku Gurî wilo zû çû malê, diya wî şaş ma û jê pirsî:

—Çima lawê min, çima tu ewqasî zû hatî mal? ma qey tu neçû bû dibistanê îro?

Gurî çentê xwe danî ser kîsê genim û bi devkenî got:

—Belê yadê, ez çûbûm dibistanê, lê me îro zû xelas kir.

—Ez jî tirsiyam, mi got qey tu neçûbûyî dibistanê. Ma tu ne birçî yî?

Ji kêfan qet birçîbûn di bîra Gurî de nedihat. Lê gava ku diya wî li ber guhan xist, got:

—Belê, ez birçî me, ma ka çi heye ez bixwum?

—Min vê sibehê satilek mast kirî. Wa ye mast di bin teştê de ye, ji xwe re çend kevçiyan têxe tacikekê û bixwe. Lê tu hinek qîmaxê ser ji bavê xwe re jî bihêlî baş e.

Çavên Gurî di nîvê serê wî de beloq bûn

—Mast!..

Hema zû ji xwe re tacikek ji nava firaxan derxist û çend kevçî mast berda binê tacikê. Bi wî awayî çend dilop jî rijan de erdê. Gav ku dîsan teşt danî ser satilê, satil xwar bû û wextî hemû mast birijiya erdê. Gurî nanê sêlê kire kovik û weke gurekî birçî pê mast xwar. Ev tam saleke wî bû devê wî bi mast

nebûbû. Ji gava ku wan ji gund barkiri bûn, wî mast nexwari bû. Şîva wan her roj savar, an jî şorbe bû. Şorbe û savara ku ji êvarê dima, adinî rojê germ dikirin û dixwarin.

Piştî ku diya wî hevîr kir û destên xwe şuştin, jê pirsî:

—Dersa te îro çawan çû lawê min?

Gurî tiştên ku li dibistanê qewimî bû, heskirina mamostê ya li hemberî wî û jêhatîbûna xwe ji diya xwe re got.

Diya wî destê xwe di serê wî da, ew maçî kir û got:

—Aferîn lawê min, divê tu me li hemberî gundiyên me rûreş dernexî. Bila qet gundî nebêjin, lawê ûso bû pêxwasê bajêr. Ha wisan lawê min, dersa xwe bixwîne û me serbilind derxe. Rojekê ku em vegerin gund bila gundî xatirê me bigirin, weke lawê Cindî bi serê te sûnd bixwin.

Gurî ew mastê ku ji xwe re kiri bû tacikê, hemî xwar. Lê, wî têr nexwar. Ji bo ku çend kevçiyên din jî bixwe, li ber diya xwe giriya:

—Yadê, ma ez ji xwe re çend kevçiyên din jî tê-ximê?

Ji ber ku Gurî bi tenê bû û delaliyê malê bû, pirê caran diya wî ew nedişikand. Diya wî tacika wî ji dest girt û jê re çend kevçiyên din jı xistê.

Dû re ji aliyekî ji kêfan, ji aliyekî ve jî ji kerban hêstir ji çavên diya wî hatin. Lawê xwe yê din, yê ku miri bû anî ber çavên xwe. Şevekê wî jî wanî, weke Gurî çend serî penîr zêde xwesti bû lê diya wî nedabûyê û goti bû: "Na, tiştê te xwar bes e, dawiya

maye jî bila ji birayê te re be". Roja piştî wê lawik dikeve ber traktorê û dimire. Ji wê rojê diya wî didayê; çi bigota diya wî bi ya wî dikir. Lê bavê wî ne wisa bû. Tiştekî neketa şerê bavê wî û Gurî bixwesta bike, tu caran bavê wî nedihîşt û destûr nedida. Rojekê bavê wî cigarek di destê wî de dîtibû, ku ne ji diya wî biwa dê bavê wî ew bi lêxistinê seqet bikira.

Piştî ku Gurî xwarina xwe xwar, çentê xwe ji ser kîsê genim daxist û dersa xwend. Dû re ew tiştê ku ji çentê mamostê derxistibû da ber pozê xwe, bêhn kir û kefa destê xwe da. Kefa destê wî ji boyaxê sor bû. Piştî ku hebekî di kaxizê da, bangî diya xwe kir û tiştê xwe nîşanî wê da. Diya wî li nik rûnişt, ew tişt ji dest girt û baş lê nihêrî:

—Ev ne weke qeleman e lawê min, te ev ji ku anî?

—Min li erdê dît, yadê.

—Rast bêje lawê min, te ev ji ku anî?

Gurî dîsa got:

—Min li erdê dît.

—Kuro rast bibêje, tiştên welê dê mirov çawan li erdê bibîne? Ev ne malê dizî miziyê be? Weleh ev dawî malê diziyê derkeve û bavê te pê bihese, dê te ji lêxistinê biêşîne.

Êvarî gava ku bavê wî hate malê ruyê wî tirş bû. Wê êvarê ew ne keniya, ne jî peyivî. Lê, Gurî li ba wî rûnişt, xwe bi wî şêlavî kir û dîsa weke berê dest bi tiştên ku li dibistanê qewimî bûn, kir. Peyvên Gurî hebekî bêhna bavê wî fireh kir. Êdî hebekî ruyê

wî vebû û peyivî.

Di ser şîvê de diya wî ji bavê wî pirsî:

—Xêr e Ûso, ma îro tiştin qewimî ne, kêfa te ne li te ye?

Ûso bersiv neda, tenê di mana "nabûnê" de serê xwe vir de û wir de hejand.

Jinikê dîsan jê pirsî:

—Weleh helbet tiştin qewimî ne. De ka bêje, çi bû ye?

Mêrik qederê nîvdeqîqakê fikirî, dû re bersiva jina xwe da:

—Kardayê min dixwaze min û çend hebên din ji kar derxîne.

—Ji bo çi Ûso, pepûko?

—Ma ez çi zanim ji bo çi ye? Camêran dexînin wê derxînin. karê wan e!..

—Ey ma nabêjin ji bo çi?

—Qey karker hew ji wan re lazim in. Ew ne mecbûrin jî bibêjin ji bo çi.

Xwarin hew di ber jinikê de çû. Kevçiyê di destê xwe de danî û ji sifrê vekişiya. Ji kerban dixwest bigirî, lê dikir û nedikir hêstir ji çavan nedihat. Weke ku hêstirên wê di hundirê wê de ziwa bû bûn. Dîsa ji mêrê xwe pirsî:

—Îcar nabêjin dê wê kengî ji kar derxin?

—Ez niha nizanim, lê li ser kar xelk wisa qal dikin.

Gava ku Ûso wilo got, hebekî bêhna jinikê hate ber wê. Bi qûnkişkê ber bi wî çû û bi bergerîn jê re got:

—Ûso ez bi qurban, hema wan çi got qebûl bike. Tu li me nafikirî, li vî lawikî bifikire. Ji bo xatirê wî her

rezîliyê qebûl bike. Ku tu îro ji kar derkevî, emê çilo xwe xwedî bikin û vî lawikî bidine xwendin?

—Ku ez serkarker bertîl bikim, dibe ku min ji kar dernexîne.

—Ûso, ez bi qurban, hema wî çi xwest jê re bikire.

—Weleh min got, ezê jê re xalîçekê bikirim. Ev e, dema me her tişt bi bertîlan e. ne bi bertîlan be em nikanin bijîn û gava xwe bavêjin. Ne bi bertîlan be tu kar ji me re tune ye.

Çavên wî li wî tiştê ku Gurî ji çentê mamosta xwe derxisti bû, ket.

—Ew çi ye li wê erdê? Gurî, hela tu wê bi bavê xwe de.

Gurî û diya xwe li çavên hevdu nihêrîn.

Diya wî:

—Gurî ew li erdê dîtiye. Weleh ez dibêjim, ew ne qelem e.

Gurî rahiştê û da bavê xwe. Piştî ku bavê wî bêhn kir, ji Gurî re got:

—Kuro ev boyaxa lêvan e lawo! Te ev ji ku anî?

Gurî bi tirs got:

—Min li erdê dît.

Bavê wî hêrs bû:

—Rast bibêje, te ev ji ku anî? Ev ne ya mamosta te be?

Jinikê peyv jê girt:

—Ku ev boyaxan lêvan be, dê mamosta wî çi bike jê? Ma ne tenê pîrek lêvên xwe boyax dikin?

Mêrik:

—Mamosta wî pîrek e. (Dîsa ji Gurî pirsî) Te ev ji ku anî, lawê min?

Gurî zanî bû bavê wî ji derewan heznake, ya rastî got:

—Weleh min ji çentê mamosta xwe derxist.

Diya wî wa bi şaşmayî peyva wî birî:

—Te ji çentê mamosta xwe derxist? yanî te dizî?

Mêrik peyva wê birî û bi ser de qêriya:

—Hişş... Weke kuçika mereye. Lêwik ji ku diziye?

Wî bi xwe jî zanî bû, Gurî diziye; Lê ji bo ku Gurî rast jê re got, wî xwest merselê bi awakî nerm hal bike û Gurî wilo şîret bike, ku ew careke din destê xwe neavêje tiştekî xelkê û tiştekî kesî nedize. Wa bi nermî ji Gurî re got:

—Ma te ji bo çi ji çentê mamosta xwe derxist lawê min? Tu dê çi bikî ji vê boyaxa lêvan?

Gurî lêva xwe daliqand û milên xwe hejandin:

—Nizanim, min got belkî qelemeke sor e.

Mêrik bêdeng ma û serê xwe ber bi jêr ve hejand. Dû re serê xwe hilda jor, qederê nîvdeqîqekê li Gurî nihêrî û got:

—Binihêre, sibehê zû divê tu awakî ji vê boyaxa mamosta xwe re çê bikî. Sibehê, hîn berî zarok têkevin dersê, tu wê li bin masa mamosta xwe deyne. An na, mamosta te bi te bihese, ku tu ketiyî çentê wê û boyaxa wê derxistiyî, dê te ji dibistanê bavêje. Te navêje jî, tu dê li hember mamostê û li hember hemî zarokan rezîl bibî. Li dibistanê hew tu kes baweriya xwe bi te tînin. Erê, te fêhm kir? Weke ez ji

te re dibêjim bike û careke din gûyekî wenî nexwe. Dizî pîs e lawê min! Dizî ji bênamûsiyê û qûndetiyê jî xerabtir e. Xatir û qimetên kesên diz tune ne. Ku tiştek ji te re lazim bû, ji min re bibêje; qaweta min bigihîjê ezê ji te re bikirim, ne hewceye tu herî diziyê bikî, erê?

Tiştên bavê wî gotin, ketin serê wî. Li ba diya xwe ji bavê xwe re sûnd xwar, ku ew hew careke din diziyê dike.

Dê û bav û law wê êvarê li ser boyaxa mamostayê peyivîn. Li ser diziyê, li ser xerabî û nebaşiya diziyê peyivîn. Lê gava ku cîranê wan Ehmed hate şevbûhêriya wan, wan peyva xwe guhertin ser tiştekî din. Gurî zêde li civatê nema, ew çû kete nava nivînê xwe û raza.

Adinî rojê, sibehê zû, gava ku Gurî çû dibistanê, wî pêşî çû boyaxa mamosta xwe ya lêvan danî ber lingên kursiya wê.

Çaxa li zengil ket û hemû zarok ketine hundir, wextî mamostê ji zarokan bipirsiya; bê kî ketiye çentê wê, çentê wê li hev xistiye û boyaxa wê ya lêvan derxistiye. Lê gava ku li ber lingên kursiyê çav li boyaxa xwe ket, tişt negot; li cihê xwe rûnişt û navê zarokan xwend. Ji Nûjîn pê ve hemî zarok hati bûn. Zarok bi wêneyên xwe yên li dîwêr pir kêfxweş bûn. Ji nava hemû zarokan, tenê Beko tu wêne çênekiri bû. Tenê Beko rûtirş û bêkêf di cihê xwe de rûnişt. Wê rewşa Beko Gurî êşand, lê zîvirî û got:

—Ger tu bixwazî, ez û tu kanin ji te re jî wêneyekî çêbikin û bila mamosta wêneyê te jî bi dıwêr ve bike.

Beko li kêleka Gurî rûniştî bû; ku Gurî wisa got, kêfa Beko hat û kursiya xwe ber bi Gurî ve kişand. Herdiwan kirî dest bi çêkirina wêne bikirina , lê mamostê derseke din da ber wan. Ji ber wê yekê, çêkirina wêne hiştin navbirê. Piştî ku ew dersa xwe kirin û li zengil ket, Gurî û Beko derneketin der û ji Beko re wêneyek çêkirin. Piştî navbirê, Gurî ew wêneyê Beko dirêjî mamosta kir û ji bo ku li dıwêr bixîne, li ber wê geriya. Mamosta bi devkenî wêne ji destên Gurî girt û ew jî di rex wêneyên zarokên din daliqand.

## IV

Çend rojên destpêkê dibistan hebekî ji Gurî re dijwar hat. Lê jê pê ve Gurî lê vebû. Bi zanebûna xwe jî, xwe zû xiste çavên mamostaya xwe û ew ji hemû zarokan zîrektir bû. Hemû dersên malê, yên mamostê didayê wî çêdikirin. Ji xwe gava ku ew ji dibistanê diçû malê, tiştê wî bîrê dikir, çêkirina dersan bû. Ku wî dersa xwe çênekira, nediçû nav zarokên taxê, dileyist, ne jî tu xwarin dixwar. Carina ku ew pir birçî biwa, radihişte parçek nan û welê tisî dixwar. Piştî xwarinê, tiştê wî dikir dîsan xwendin bû.

Serê dê û navê wî ji kêfa digihişte asmana. Êdî baş baweriya wan pê hatibû, dê Gurî xwendina xwe bidomîne û bibe tiştekî. Ku ewê jî weke Lawê Cindî bibe doktorek û dê hemî gundî xatirê wan bigirin û bi çavekî mezin li wan binihêrin. Bavê wî bi meaşê xwe yê pêşî jê re şalwarek û qutikekî nû jî kirî bû. Gava ku bavê wî jê re ew kinc kirî bûn, pir kêfa Gurî hati bû. Ji roja ku Gurî bîr biri bû, wî tu kincên nû û xisûsî ji bo wî çêbûbin, li xwe nekiri bûn. Her dem diya wî kincên bavê wî, yên ku kevin dibûn, jê re biçûk dikirin û bi destan didirût. Kêlên diya wî cari-

nan weke kêlên koran xuya dikirin. Lê vî şalwar û qutikê nû, yên ku bavê wî xisûsî jê re li ser cildirû dabû dirûtin, bêtir kêfa wî ji jınê re û ji dibistanê re tanî. Gava wan herdu zarokên roja pêşî tilî avêti bûne Gurî û bi pînê şalwarê wî keniya bûn, çav li kincên wî yên nû ketin, çavnebarî û dexesî kirin. Gurî jî rojekê pînek li milê çakêtê yekî ji wan dîtibû, lê deng nekiri bû. Wî jî weke wan, tiliya xwe ber wî ve dirêj nekiri bû û negoti bû: "ha ha, li pînê çakêtê wî binihêrin? "

Gurî guh nedida kincên tu zarokan. Kîjan zarok çi kinc lêbiwa, ji wî re qet ne xem bû. Yên ku kincên wan pînekirî biwa, wî bi çavekî piçûk li wan nedinihêrî û yên ku kincên wan nû û xweşik biwa jî, bi çavekî mezin li wan nedinihêrî. Gurî weke mezinên biaqil difikirî. Bavê wî jê re qala xizanî û dewlemendiyê kiri bû û goti bû: "Gava ku ez weke te zarok bûm, em pir xizan bûn." Hingî Gurî peyva wî birî bû: "Ma hûn ji niha jî xisantir bûn? "

**Bavê wî destê xwe li ba kiribû û** gotibû: "Lo lo, ji niha jî xizantir bûn? Niha ne xizanî ye lawê min. Ma di dema me de nan bi destên kê diket? Pariyek nan li me hisret bû. Em giş feqîr, belengaz, tî, birçî û tazî bûn. Hingê traktor meraktor li gund tune bû. Hemû cot bi destan bûn. Me bi qantiran, gayan û keran cot dikir. Me her kar dikir, lê dîsan jî xizan, bêmal û belengaz bûn".

Diya Gurî peyva bavê wî birî bû û goti bû: "Erê erê, bes e qala çûyina xwe bike. Bes tu qala feqîrî û belengaziyê bike. Tu dê bi vî awayî serê lêwik xerab bikî".

Gava ku diya wî peyva bavê wî dibirî, dîn û îma-

nê bavê wî diçûn; hêrs dibû û bi ser diya wê de diqêriya. Kêfa Gurî qet ji pevçûna dê û bavê wî re nedihat. Gava ew pevdiçûn, Gurî nedixwest di hundir de bimîne û derdikete der ve. Lê niha Gurî bêtir bîr dibir. Dê û bavê wî pevbiçûna, ew dikete nava wan û weke kalekî rûspî ew li hevdu tanîn. Dê û bavê wî jî qet ew nedişkestandin. Çaxa Gurî dikete navbera wan, wan zû şerê xwe betal dikirin û li hev dihatin... Carinan gava bavê wî pir hêrs dibû, bi yek carê ve bi diya wî re li hev nedihat. Piştî demeke kurt tê biçûya, ji bo xatirê Gurî bi jina xwe re li hev dihat.

Rojekê, apê wî ji gund hatibû mêvaniya wan, çav li rewşa wan a bajêr ketibû û ji bavê Gurî re gotibû: "Niha tu bi xwedê kî ez li gund çi dikim? Çima ez jî malê barnakim ba we, bajêr? " Bavê Gurî alî wî kiribû û mala wî bar kiribû bajêr. Lê piştî du-sê mehan dîsan poşman bûbû û bi paş de vegeriya bû. Ji ber ku ne lawê wî kanîbû di dibistana bajêr de bixwenda, ne jî wî û jina xwe kanîbûn ji xwe re tu kar peyda bikirana. Hingê, gava ku dîsan mala apê wî bi paş de vegeriya bû gund, Gurî ji bo mêvaniyê çend rojan bi wan re çûbû. Hemî zarokên gund lê civiyabûn û li ser bajaran pirs jê kiribûn, Gurî tiştên di derheqa bajêr de zanıbû û tiştên dîtibûn, ji wan re gotibû. Jî wan re qala malan, dikanan, sînemayan û dibistanan kiribû. Hingê pirê zarokan ji Gurî bawer nekiribûn. Dê çawan zêdeyî sed dikanan di rêzekê de hebin û xaniyên heft-heşt qatî hebin? Tew sînema? Dê çilo însan li ser dîwarekî spî bisekinin, bipeyivin û bileyizin? Pir tiştên ku Gurî ji zarokan re gotibûn, neketibû serê wan. Hin zarokan di dilê xwe de gotibûn: "Na lo, Gurî jî çû ye bajaran bû ye dere-

wîn. Heçên diçine bajaran xerab dibin û welê dibine derewîn". Hinan jî di dilê xwe de gotibûn: "Xwezî me jî ji xwe re bajar bidîta".

Gurî li zarokan şaş û ecêbmayî ma bû. Yaho çima wan zarokan jê bawer nedikirin? Gava ku wî ji zarokên bajêr re qala gund û jîna gund dikir, zarokên bajêr jê bawer nedikirin. Ku ji zarokên gund re jî qala bajêr û jîna bajêr dikir, zarokên gund jê bawer nedikirin. Çaxa zarokan digotin:

—Em ji te bawer nakin.

Wî jî digot:

—Ku hun ji min bawer nakin, herin ji xwe re bi çavên xwe bibînin.

Baş bû rojekê mamosta wan li ser gundan û rewş û jiyana gundiyan peyivî bû.

Hingê zarokan di dilê xwe de gotibûn:

—Lawo Weleh xebera Gurî ye, tiştên ew dibêjin rast in.

Gurî kêm craran derew dikir.Ji xwe dîn û îmanê wî ji diziyê diçû. Hinekan li ba wî qala diziyê bikira, ew hêdî radibû ser xwe û ji nik wan dida rê û diçû. Lê wî bi xwe herdu jî kiribû. Hem dizî û hem jî derew... Bavê wî bi şîretan ew ji ser wê riya çewt dagerandibû. Bavê wî jê re gotibû:

—Lawê min, tu derew û diziyê neke, wekî din tu çi dikî bike. Tiştek ji te re lazim bû, tu ji bavê xwe re bibêje; qeweta min bigihîjê ezê ji te re bikirim. Ne hewce ye tu herî derew û diziyê bikî.

Şîretên ku bavê wî lê dikirin hemû ji bo wî bûn.

Bi şîretên bavê xwe ew tu caran poşman nedibû. Bi wî awayî ew hem li ber dilê bavê xwe û hem jî li ber dilê diya xwe zehf şêrîn dibû. Wî xwe bi wî awayî baş xisti bû çavên mamosta_ya xwe jî. Ji xwe mamosta wî rojekê ji bavê wî re gotibû:

—Weleh ev heft salên min in ez mamostetiyê dikim, ez hîn li şagirtekî weke Gurî zîrek û bi edeb rast nehatime.

Lê bavê Gurî ev peyva mamosta jê re negotibû. Ew ditirsiya ku jê re bibêje. Wî bi xwe-xwe digot: "Ku ez peyvên mamostê ji Gurî re bibêjim, ew dê qure bibe û hew guh bide dersên xwe". Bavê wî bi ser wî awayî de jî hertim jê re digot:

—Lawê min, tu guh bidî dersa xwe û dersa xwe bixwîne.

Gurî jî digot:

—Erê bavo, ez dersa xwe dixwînim.

Bavê wî jê re negota jî, wî bi xwe dersa xwe dixwend.

Bi wî awayî pênc-şeş mehên Gurî li wê dibistanê qediya. Wî hema hema xwe bi hemî zarokan û bi mamostan dabû hezkirin. Ji xwe Beko rojekê Gurî nedîta sebra wî nedihat. Bi xêra Gurî êdî Beko jî guh dida dersên xwe û bi hevalên xwe yên sinifê re bi awakî xweş dida û distand. Ku wî weke berê pêxwasî û qüretî bikira, ew bi tenê û bê heval dima. Pêşî di sinifa Gurî de zarok bûne du grûp. Grûpek li aliyê Gurî bû, grûpa din jî aliyê Beko bû. Lê vê yeka han pir dom nekir. Piştî wextekî kurt, tu berberî di navbera herdu grûpan de nema û herdu grûp bûne destek. Wan bi her awayî zora sinifên din dibirin. Çi qa-

yiş li dibistanê çêbibiwa, sinifa Gurî yekemîn derdiket. Ji xwe bi fûtbolê ew di hemû dibistanê de hati bûn naskirin.

Rojekê, gava Gurî ji dibistanê derket, ku here malê, sê zarokên sinifa sisiyan riya wî birîn. Lê, Gurî ne kete heyecanê, ne jî tirsiya; bi xweşikahı ji wan re got:

—Lawo, dev ji min berdin û bi riya xwe de herin. Yê min ez şer naxwazim.

Yekı ji wan zarokan xwe avête stûkura çakêtê wı û got:

—Tu dê careke din li dibistanê quretiyan bikî an na?

Gurî destên wî ji bersdika çakêtê xwe avêt û dîsan bi nermî got:

—Binihêrin lawo, ez tu quretiyan muretiyan nakim. Ez ji we re dibêjim, bi riya xwe de herin; ez şer naxwazim.

Îcar yekî din xwe da pêşiyê, destê xwe avêt çenga Gurî, bilind kir û got:

—Kuro li çavên min binihêre, ma tu xwedayê vê dibistanê yî, ku tu evqasî quretiyan dikî? Ha!.. Ma tu bû çi ûlan, tu hemî zarokan didî dû xwe?

Gurî du-sê caran serê xwe vir de û wir de hejand. Piştî ku bi hêrs axînek kişand, got:

—Kuro ez ji we re dibêjim, dev ji min berdin û bi riya xwe de herin!

Îcar yekî ji wan zarokan pehîneк li çoka Gurî xist. Gurî hêrs bû û ji hêrsan laşê weke hêlkanê hejiya. Lê, ji wan zarokên din webû, Gurî ji tirsan dilerize. Gurî hema zû çentê xwe avêt erdê û hutikek li

zikê yekı ji wan zist. Ji tirsan herdiwên din beyî ku li paş xwe binihêrin, baz dan. Yê din jî destê xwe avêt zikê xwe û bi kulîn bi dû hevalên xwe de baz da.

Gurî rahişte çentê xwe û ber bi malê ve lezand.

V

Gava ku dibistan xelas bû û Gurî ji sinifa dudan derbasî sinifa sisiyan bû, mamostaya wî ew hembêz kir û got:

—Gurî, heya ji te bê tu bixwînî lawê min. Ez hêvîdar im tu dê bigihîjî armanca xwe.

Êvarê Gurî kaxiza xwe nîşanî diya xwe û bavê xwe da; ku baskên dê û bavê wî hebiwa, ew dê ji kêfan bifiriyana. Wê şevê bavê wî çû sûkê pirtûqal, sêv, şekir û biskiwît kirî û ji bo Gurî kêf kirin, xwarin û vexwarin. Adinî rojê jî dîkek serjêkirin û cîranê xwe ezimandin xwarinê. Piştî şîvê, bavê wî pakêtek anî û ji Gurî re got:

—Ev pakêt ji te re ye, ka tu tê derxî bê çi tê de heye?

Gurî li pakêtê nihêrî, fikirî û got:

—Ez nizanim.

Bavê wî pakêt nedayê, dîsan jê pirsî:

—sê caran b êje,

Gurî dîsan li pakêtê nihêrî. Piştî ku biçûkbûn û mezinbûna pakêtê di mejiyê xwe de derbas kir, got:

—Vezel e.

Bavê wî serê xwe kil kir:

—Du carên te man.

—Ez nizanim, de çi tê de heye, ka tu bide min.

—Na, ku tu tê dernexî ez nadime te.

Gurî dîsan hebekî fikirî, destên xwe da pakêtê û pakêt peland; dû re got:

—Ha, çakêt e!

Bavê wî di mana erê de serê xwe kil kir û keniya:

—Te tê derxist. Ha ji te re, pîroz be li wê bejna te

Hema Gurî zû zû pakêt vekir, çakêt jê derxist û li xwe kir. Dû re bazda ber neynikê û li xwe nihêrî. Çakêt tam jê re bû û zehf jî li bejna wî dihat. Dû re stûkura qutikê xwe ji bin vezel derxist û danî ser stûkura çakêt. Gurî di bin wî çakêtî de donzdeh salî xuya dikir. Bejna wî kurt bû. Porê wî yê reş û kurîşk kurt bû. Gurî ne qelew bû, lê bi navmil bû. Wî piştî ku xwe li ber neynikê baş xemiland, çû civatê û xwe nîşanî wan da. Ku diya wî çav li wî ket, kêfekê ew girt û bi dilşahî got:


—Wey ez bi qurbana zavekê xwe yê biçûk bim. Binihêr, bê çiqas çakêtê wî li bejna wî tê. Li te pîroz be lawê min, tu bi xêr û selamet biqetînî.

Gurî çend carên din jî bazda mezela din û di neynikê de li xwe nihêrî. Ev tam sê salên wî bûn, dixwest ji xwe re çakêtekî bikire, lê perê bavê wî tune bû û jê re nedikirî

Piştî Gurî ji ber neynikê, ji mezela din hat, bavê wî jê pirsî:

—Çakêtê te çawa ye lawê min, te jê hez kir?

Gurî du-sê caran bişkokên wî girtin û vekirin û bersiva bavê xwe da:


Khaled 86

—Erê, min zehf jê hez kir.

Çaxê xewê, berî ku razên; Gurî çakêtê xwe baş qat kir, kursiyek kişande ber serê xwe û çakêtê xwe li ser kursiyê bi cih kir. Heya bi dereng, di nav nivînan de dîsan li çakêtê xwe fikirî.

## VI

Wê salê hejmara bajarê Nisêbînê ji deh hezaran bû huvdeh hezar. Ji gundên dorhêla Nisêbînê û ji bajarên dorhêlê ên biçûk mirovan bardikirinê. Her roj, ku mirov biçûya ser riya Nisêbînê, mirov dê kamyonên malan, ên ku ji gundan bardikirine Nisêbînê, bidîta. Bajarê Nisêbînê, yê xerabe û wêran, di wê salê de bû bajarekî mezin, xweş û bajarê kar. Derbenda lê ava bû, petrola lê derket, bajar hîn xweştir û dewlemendtir kir. Riyên nû yên qîr û zift çê bûn, texsiyên nû hatin û otobosên belediyê hatine bajêr. Dibistanên nû û xweştir ava bûn û asasên fabrîkan hatine avêtin. Yên ku ji gund û bajarên dora Nisêbînê hatin, pirên wan dest bi tevirdan û hevdana pembû kirin. Hejmarek biçûk jî dest bi qaçaxçîtiyê kirin. Lê pirên wan dest bi tevirdanê, eşêfê û hevdana pembû kirin. Ji bilî yên ku malên wan li bajêr bûn jî, gundî bi demsalî ji bo kar hatine Nisêbînê. Gava ku hejmara bajarê Nisêbînê welê bi yek derbê re bilind bû, bajarî li hember gundiyan derketin, li wan xistin, ew tehdît kirin û nehiştin ew êdî werine bajêr. Bi wî awayî dîsan hin gundî ji tirsa ba-

jariyan vegeriyan gundên xwe. Lê tenê hejmareke zehf biçûk. Hejmara mezin jî xwe kirin yek û li hemberî bajariyan serî hildan. Heya ku berberiya di navbera gundiyan û Nisêbîniyan ji ortê rabû, demeke dirêj derbas bû. Gundî jêhatî û karker bûn. Karên bajariyan hemî gundiyan dikirin. Gundiyên ku hati bûn bajêr, ji keda wan pê ve ne tu tiştekî wan, ne jî hatineke wan hebû. Lê bajariyên bi cih, xwedî dikan û xwedî erd bûn. Bi qasî ku dewlemend bûn, evqasî jî bêûcdan bûn. Pîrekên gundiyan, ên ku bi satilan mast tanıne bajêr, van kesên dewlemend, ên bajarî, çav tavêtin namûsa wan û pirê caran qîzên çardeh-panzdeh salî bi dûcanî dikirin. Peyayên kal, ên ku bi keran êzing tanîne bajêr ji bo firotinê, zarokên dewlemendan henekên xwe bi wan dikirin, barên êzingên wan werdigerandin û bi xeber û gotinên xerab ew diêşandin. Gundiyên ku li bajêr bi cih bûn, êdî tu tirsa wan ji bajariyan neman. Yên ku ji wan ji xwe re çayxane, xwaringeh û dikan vekirin, ên din xwe li wan digirtin û ji wan dan û standin dikirin. Lê ji gundiyan, ên ev îmkan kete destên wan tenê hejmarek biçûk bû. Hejmara mezin bêkar man, an jî bi tenê salê du-sê mehan kar bi destên wan ketin. Yên ku dest bi barkêşiya qaçaxçiyan kirin, pirên wan di nava tixûb de hatin kuştin, an seqet man. Lê karên Nisêbînê, yê ku li gund û bajarên dorhêla Nisêbînê hatibûn naskirin, tevirdan û hevdana pembû bû. Ne tenê gundiyên ku nû bar kiribûn bajêr, bajariyên kevin, ên feqîr jî bi wî karî debara xwe dikirin.

Piştî demekê ew berberiya bajartî û gundîtiyê hêdî hêdî ji ortê rabû. Lê îcar berberiyek nû serî hil-

da. Berberiya di navbera karker û xwedîerd û xwedîperan de... Pirê caran xwedîerd perên karkeran sê -çar mehan bi derengî dixistin û carinan jî bi fen û fûtan nîvê perên wan dixwarin. Ji ber ku karker ne di tu sendîkan de bûn, mafê wan yê pirsê jî tune bû. Xwedîerd ji ber vê yekê qet ji wan neditirsiyan û tu hesab ji wan nedikirin. Ku carinan hin ji karkeran li hember xwedîerdan rabûna û li mafê xwe bipirsiyana, ew kes zû ji kar dihate avêtin. Ji ber ku karker pir bûn û kar hindik bû; tu hewcedariya xwedîerdan zêde ji karkeran tune bû. Gava xwedîkarek sibehê zû biçûya sûkê, ji karkeran mirov ax biavêta li erdê nediket. Wî xwedîkarî karker li hev dicivandin û bazara kar bi wan re dikir. Dawî dawî bi buhakî pir hindik komek karker dida ber xwe û dibire berdida nava erdê xwe. Ji rohelat heya bi roava bi wan kar dikir û roja wan perakî pir hindik dida wan. Karkerên Çûkûrova bi du qatî wan pere distandin û karên ku dikirin jî ji yên wan hindiktir bûn. Hingî hin kes çûne Çûkûrova ji bo kar; lê dîsan kara wan di xisara wan de nedihate der û berepaş vegeriyan. Ji ber vê yekê mal ji wan re ji dûriyêxweştir bû. Ku li mal nexweş biketina, dê nas, dost û mirovên wan guh bidana wan.

Lê li Çûkûrova? Ma dê kê li kê binihêriya û alîkariya kê bikira? Kî li nav wan erdên Çûkûrova, di konan de nexweş biketana, ew welê bi stûxwarî dimirin û tu kes li wan xwedî dernediketin. Ji xwe nexwşî, ta û mirin ji bo karkerên pembû jiyana rojê bû. Ev ne tenê li Çûkûrova, li Nisêbînê jî welê bû. Lê ku li Çûkûrova mirov bi dermanan dimirin, li Nisêbînê bi awakî din bû. Karkerên Nisêbînê bêtir di-

ketin ber traktoran û kamyonan û dimirin. Carinan jî kamyon û traktorên wan li hev diqelibîn û karker birîndar dibûn û dimirin. Ji xwe birîndarên ku bihatana nexweşxanê jî, xelasiya wan tune bûn. Ji ber ku carinan ne doktor hebûn, ne jî hemşîre...

Rojekê, danê nîvro sê-çar texsî û dolmîşek weke bayê di sûka Nisêbînê de derbas bûn û ber bi nexweşxanê ve çûn. Li nexweşxanê mirovên ku bi alîkariya doktoran û xelkê ji wan tirimpêlan hatine derxistin, nîvê wan serî pelixî bûn; yên din jî dest û lingên wan jê bû bûn. Gava ku hinekan ji şoferan pirsîn:

—Gelo ma xêr e, ev çi kes in?

Şoferan gotin:

—Ev karkerên pembû ne, kamyona wan di pirê werbûye û çend kes ji wan mirine.

Ji xwe mirov li wanên ku hatibûne nexweşxanê binihêriya, mirov bawer nedikir dê kes ji wan xelas bibin. Bi rastî jî wilo bû. Piştî heftekê, ji keçikeke piçûk pê ve tu kes xweş neman, hemî mirin. Keçika ku nemir û xelas bû jî, seqet bi lingekî ma.

Dîsan rojeke din li Nisêbînê xelkê ji hev pirsîn. Jinan li ser tenûran ji hev pirsîn:

—Ma we bihîstiye xwehê, dibêjin dîsan nexweşxane ji kerkerên pembû yên birîndar tije bûye.

Mêran li çayxanan ji hev pirsîn:

—Yaho dibêjin, dîsan hin karkerên birîndar anîne nexweşxanê, ma kesî ji we bihîstiye?

Hingî yekî ji wan peyayên li çayxanê ji çayger pirsî:

—Lawo, ma haya te jê heye, bê ew nexweşên ku

hatine nexweşxanê kî ne?

—Dibêjin karkerên pembû ne dîsan. Dibêjin ku karkeran kuvkarekên bi jehr xwarine û hemî bi jehrî ketine. Heya bi niha du heb ji wan mirine.

Yekî ji peyan:

—Hela, hela!

Lawikê çayger peyva xwe domand:

—Bi saloxan van karkeran li gundekî jêr di emrê axakî de pembû didane hev. Lê piştî ku sermayê û baranê destpêkiriye, van karkeran xwestine herine malên xwe. Lê axê nehiştiye, dest da ye ser perên wan û gotiye: "Heya tayek pembûyê min li erdê bimîne ez yek çerxî nadime we. Divê hun pembûyê min gişî biçinin."

Karker jî ji mecbûrî li ser erd, di konên xwe de mane. Lê piştî ku baran dibare, konên wan bi ser wan de dikevin û hemî dan û xwarina wan li ber avê diçe; ew mecbûr dimînin ku bi çolan kevin û ji xwe re pincêr û kuvarkan bidine hev, da ku xwe pê xwedî bikin. Şansê wan kuvark hemî jehrî derdikevin û hemî karker dikevine haletê mirinê.

Xwediyê çayxanê bi hêrs bangî çayger kir:

—Kuro, ma tu çi sohbetê dikî lawo? Ev çayê li vir bûne qeşa!

Çayger peyva xwe birî û ber bi ocaxê ve bazda. Piştî ku çayger çû, yê herî ciwan kursiya xwe ber bi pêş ve kişand û bi dengekî nizim got:

—Ma hun nabêjin em çi bikin lo? Ma em ji van xwedîerdan re tiştekî nebêjin?

Yê herî bi emir, ku porê wî spî bûbû û çend ta-

yên spî ketibûn simbêlê wî, kursiya xwe ber bi masê ve kişand û got:

—De here lo! Ma emê bi vî awayê xwe çi bikin û çi ji xwedîerdan re bibêjin? Ji we tirê ev karê zarokan e? Ji xwe peyva li çayxanan û li ser masan pir xweş e.

Ev peyvên peyayê hebekî bi emir, li telê yê ciwan ket. Yê ciwan hebekî bi hêrs got:

—Ji xwe heya yên weke we tirsonek hebin, dê halê me ev be...

—Kuro tirsonek yê mîna te ne. Tu li gorî emrê xwe bipeyive.

—Çend tayên spî ketine porê te, ji te tirê tu biaqilî niha?

Peyayê bi emir bi milê wî girt, ew hebekî dehf da û bi hêdîka got, ji bo ku deng neçe mirovên din yên li çayxanê:

—De rabe ji vira lo; her ji xwe re li cihekî din rûnî.

Yê ciwan zû cigarek ji pakêta xwe derxist û vêxist. Dû re serê xwe bi hêrs vir de û wir de hejand û got:

—Weleh ez ji xwe şerm dikim, an na...

Peyayê bi emir rabûyê ku lêxe, lê yên din ew dane rawestan û ji herdiwan re gotin:

—Kuro dev ji van awayên xwe û dev ji vî serê hişk berdin. Ne em dibên, emê alîkariya karkeran bikin. Ku em her roj li hevxin û dilê hev bihêlin, emê çawan alîkariya karkeran bikin? Dibe ku we nebihîstibe, lê dibêjin, dê xwendevan karkeran têxînin

grevê. Ne hewceye hun li vir rûnên û li ser problema karkeran dilê hevdu bihêlin.

(Mêrik cigarek vêxist û peyva xwe domand)

Lê nêviyê karkeran naxwazin dev ji karên xwe berdin. Îcar xwendevanan biryar dane, ku sibehan zû derkevin ser riyan û karkerên ku bixwazin herine kar, wan bi paş de vegerînin. Ev yeka han ne tenê li vir dibe. Li Wêranşar, Girêsor û Dêrikê jî palan dev ji kar berdane. Ev hemî jî tesîra xwendevanên wan bajaran e, li ser Nisêbînê bû ye. Lê ez ditirsim leşker û polîs xwendevanan biêşînin. Ji ber ku karkerên pembû ne di tu sendîka mendîkayan de ne.

Ew di wir de sekinî û li çavên yên din nihêrî. Gava ku tu kes ji wan nepeyivîn, mêrik peyva xwe dom kir:

—Hema çawan be dê karker bi tiştên welê bihesin. Ewê zanibin ku grev mirev hene. Ku xwendevan bêne girtin jî tişt nabe. Ji xwe jîna van xwendevanên me herdem di talûkê de ye. Bi xwe-xwe pevneçûyana û hevdu nekuştina çiqas baş bû.

Di wir de yekî peyva wî birî:

—Bi rastî jî bi xwe-xwe hevdu nekuştana kanî bûn pir tişt bikirina.

Gava ku du polîs ketine hundirê çayxanê, wan peyva xwe dagerandin ser tiştekî din. Lê ev munaqeşe di nav bajarê Nisêbînê de bûbû jiyana rojê. Herkesî, li her derê qala karkerên pembû û xwendevanan dikirin. Wisan xwendevanan heftekê dev ji dibistanên xwe berdan û bi karkeran re çûne ser erdan. Wan di hundirê wê heftê de karker hînî pir tiştan kirin. Weke şagirtek guh bide mamostayê xwe, kar-

keran jî welê guh didane xwendevanan û li gotinên wan guhdarî dikirin. Ew têgihîşti bûn ku xwendevan ji bo wan têdikoşin. Ne ji bo wan biwa, dê ji bo çi xwendevanan dev ji dibistanên xwe berdana û biçûwana nav wê erda germ. xwendevan sibehan zû bi wan re li traktor û kamyonan siwar dibûn, diçûne nav erdan û êvaran jî bi wan re vedigeriyan. Her ku kamyon û traktorên wan diçûne nav erdan û vedigeriyan wan di nava sûkê de bang dikirin:

—Rojan palan erzan e, heqê kîlok bacan e!

Ev gotinên han di nava bajarê Nisêbınê de belav bûbû. Zarokan li kuçan bang dikirin:

—Rojan palan erzan e, heqê kîlok bacan e!

Karkeran li ser erdan bang dikirin:

—Rojan palan erzan e, heqê kîlok bacan e!

Xwendevanan li ser dîwaran dinivîsandin:

—Roja palan erzan e, heqê kîlok bacan e!

Bi vî awayî, hemî bajarê Nisêbînê bi van gotinên "Roja palan erzan e, heqê kîlok bacan e" hesiyan.

Pir tê neçû karker ketine grevê. Ev greva karkeran xwendevanan pîlan kiribûn. Armanca greva wan ew bû, ku roja karkeran ji sîh lîran bibe çil û rojê heşt saet kar. Lê xwedîerdan ev pêşniyara karkeran û xwendevanan qebûl nekirin û xwestin bi darê zorê karkeran bibine ser erdan. Xwendevan li hember vê zilma xwedîerdan derketin û nehiştin ku karker herine ser erdan. Dû re xwendevanan belavok nivîsandin, armancê grevê tê de dane xuyakirin û ew belavok di nava bajarê Nisêbînê de belav kirin. Paşê xwendevanan li ser canpolan "Roja palan erzan e, heqê kılok bacan e" nivîsandin û sibehekê zû di gel

karkeran, di sûkê de meşiyan. Li ba stasyona trênê polîs û leşker di pêşiya wan de derketin. Ew leşker û polîsana hema gihîştine kê ew dane ber dar û qûndaxên tivingan. Xwendevanan bi vê yekê zanî bûn, loma ji hemiyan re goti bûn:

—Ku polîs û leşker bêne me û li me xin jî, li hemberî wan ranebin. Ji ber ku em bêhêz in û ew dê me hemiyan perîşan bikin.

Kesî li van gotinên han guhdarî nekirin. Gava ku polîs û leşkeran li karkeran xistin, yekî ji nava karkeran kevirek avête jîpa leşkeran. Bi avêtina wî kevirî, weke ku hêzek ji karkeran re çêbû; heryekî ji hêla xwe kevir avêtin polîs û leşkeran. Lê, polîs û leşkeran jî bi debançe û keleşnîkovên xwe bersiva karkeran dan. Hingî çend karker hatine birîndarkirin û zêdeyî pêncî kesan jî hatin girtin.

## VII

Diya Gurî zû de hişyar bûbû û li deng û qelebalixa sûkê guhdarî dikir

—Weleh hebe tune be dîsan telebe û hukûmet ketine ber hev, got bi tirs.

Carekê ji nişkê ve û bi dengekî hebekî bilind got:

—Ma ne karkeran dev ji kar berdane îro. Gelo ne xwedîerd û telebe bin?

Paşê ber bi nivinê Gurî ve bazda, bi herdu destan ew hejand û got:

—Gurî, Gurî! Hela tu rabe ser xwe lawê min! Bajêr hevdu xwar! Ma dengê teqe teqa tivingan nayê te?

Ji ber ku Gurî şeva çû dereng raza bû, bi yek carê ve hişyar nebû. Tew gava ku diya wî bang kirê, wî digot belkî xewn e.

Îcar diya wî lihêf ji ser avêt, bi herdu destan milên wî hejandin, bi dengekî bilin û bi heyecan got:

—Gurîî!.. Hela tu rabe ser xwe lawê min! Ma deng nayê te? Dinya xerab bû! bavê te jî ne teva wan be lawo?

Piştî ku Gurî xwe du-sê caran vir de û wê de bir û


Khaled 86

anî, rabû ser xwe û li ser nivînê xwe rûnişt. Çer ku Gurî rûnişt, destek tiving, li kuçê li ber deriyê wan hate berdan. Gurî pêşî tirsiya, dû re rabû ser xwe û bi tena derpîkê kinik bazda ber deriyê hewşê.

Diya wî bang kirê :

—Kuro were hundir lawo, dê gule mile li te kevin!

Hîn wilo, birek leşker, polîs û karker bera ser piş-ta hev dan û derbas bûn. Gurî ji ber tepe rep û bazdana wan hebekî tirsiya û berepaş vegeriya hundir.

Diya wî du-sê caran di hundir de çû û hat, li wêneyê bavê wî yê ku bi dîwêr ve bi dardekirî bû, nihêrî, kelegirî bû û got:

—Gurî, lawê min, gelo tiştek bi bavê te jî neyê? Ne wî jî dev ji kar berda ye; ew jî bi xwendevanan re ye. Tiştek pê neyê, bavê diya xwe? Ku ew bê girtin an kuştin, em dê çi bikin, kî dê li me binihêre lawê min?

Gurî bi wan peyvên diya xwe pir hêrs bû, dîsan xwe negirt û ber bi deriyê hewşê ve bazda. Lê diya wî bi dû wî de bazda, bi milê wî girt, ew ber bi hundir ve kişand û got:

—Kuro were hundir, ma xwîna te ketiye çavên te? Dengên teqe teqa tifingan nayê te?

Dengê teqe teqa tifingan, dengê hewar û gaziyê, dengê giriyê zarok û pîrekan tevlî hev dibûn û bi hênkahiya sibehê re li bajêr belav dibûn û di ser tixûbê di navbera Nisêbînê û Oamişloyê de derbasî binxetê dibûn. Carina jê wan dengan tirs dixistin dilê Gurî, carinan jî ew hêrs dikir. Bi awayekî din jî

dengê teqîna tifingan ne pir ecêb bû. Tiştê tirs dixiste dilê diya Gurî û Gurî ne ew bû. Guhên wan û yên hemî bajariyan hînî dengê teqîna tifingan bû bûn. Ji xwe li bajarê Nisêbînê roja ku bombe an tifing neteqiya tune bû. Lê ew teqîn pirê caran bi şev çêdibûn. Carina jê sê-çar saetan leşkeran û qaçaxçiyan li hev diteqandin. Bi şevan, ji ber ku Gurî dikete xewa kûr, deng nediçûyê. Lê vê sibehê? Gurî li wî deng û qelebalixa bajêr ecêbmayî mabû.

Toreyek Gurî hebû; ew ne zû ditirsiya, ne jî zû hêrs dibû. Gava hêrs bibûwa jî, pir hêrs dibû. Çavên wî beloq dibûn, laşê wî dixuriya û çokên wî weke hêlkanê dihejiyan.

Piştî ku hebekî dengê qelebalixa bajêr hate birîn, ew li ber diya xwe geriya:

—Yadê, ma çi dibe lê, tu destûra min bide ez herime bajêr! Va dengê teqîna tifingan jî hate birîn.

Ji xwe qidûmê diya Gurî şikesti bû. Her qala şer û kuştinê dibû li wê wilo dihat. Riwê wê zer dibû û xwîna wê ziwa dibû. Ku mirov li wê dinihêrî, mirov digot, qey piça xwînê di laşê wê de nema ye.

Bersiva wê da Gurî dîsan "na" bû.

Gurî îcar bi hêrs got:

—Weleh tu bihêlî nehêlî ezê herim! Ma te xêr e, tu evqas ditirsî? Ji te tirê bavê min tenê li bajêr e? Ji te tirê dê tenê ew bê kuştin?

Diya Gurî li ber geriya:

—Baş e lawê min, tu diharî here, lê balo çavên xwe li bavê xwe bigerîne, bê tu wî nabînî.

Gurî derket û bazda. Gava ku li serê kuçê çav li leşkeran ket, gavên xwe sist kirin û hêdî meşiya. Ku ew hebekî din çû, li serê qorzîkê, li ber çayxana Hemo li hevalekî xwe rast hat. Hevalê wî bi kêf hate ba wî, destê xwe li milê wî xist û bi henek got:

—Tu di ku de bûyî lo heya bi niha? Piştî şer betal bû tu derdikevî! Eh, min jî digot, tu mêrxas î! Ji sibehê de em û leşker û polîs bera ser pişta hev didin Ma çi ji xewê derdikeve Gurî?

Gurî bi peyvên hevalê xwe hebekî êşiya. Xwe di wê deqîqê de newêrek, tirsonek û xerab dît. Di dilê xwe de got: "ev hemî sûcê diya min e, hemî wê li min welê kir". Dû re ji lêwik pirsî:

—Ka we çi kir, ma kes hatine girtin an kuştin?

Lêwik bi destê wî girt, kişand û got:

—Ka tu were, em herine ba polîsxanê.

Gurî dîsa jê pirsî:

—Erê, emê herin; ma pir kes hatine girtin?

Piştî ku ber bi polîsxanê ve meşiyan, lêwik got:

—Pir kes hatine girtin, lê dîsan ew hatine berdan. Niha tenê neh-deh kes girtî mane.

—Ma kî û kî girtî mane, tu navê wan zanî?

—Tu çîko nas dikî?

(Piştî ku hebekî fikirî peyva xwe domand)

Tu Keriz Humal nas dikî?

—Erê, ez wî nas dikim, ma ew jî hatiye girtin?

—Erê, Keriz Humal jî hatiye girtin. Wekî din çend mamosta, çend telebe û çend heb jî karker girtî mane. Dibêjin mamosta te jî girtine

Gurî li ber mamostaya xwe ket, lê Keriz Humal ji bîrê nediçû.

—Ji bo çi Keriz Humal hatiye girtin? got. Wî çi

kir ku hate girtin?

—Eh... Weleh çi kir Kerîz Humal kir. Pêşî namûs ji wî çêbû û kevir avête polîsa. Lê pir kes dibêjin; Kerîz Humal nebaş kir ku kevir avête polîsan û hemî bajar bera ber hev da.

—Êê... Wekî din çi bû?

Heya ew gihîştin ber deriyê polîsxanê, lêwik ji Gurî re qal kir. Welê bi heyecan digot, ku carinan xwe diavêt vî alî û wî aliyê Gurî. Gurî zehf poşman bû bû ku derneketi bû û tevlî wan nebû bû. Lê gava ku gihîştin ber polîsxanê, Gurî şaş ma. Li ber deriyê polîsxanê û lidor polîsxanê mirov ax biavêta li erdê nediket. Wir tijî mirov bû bûn. Heya ku pir mirov derketi bûn ser kursiyên li çayxana hember polîsxanê û li hêla polîsxanê dinihêrîn.

Hîn wilo, dengek bi aparloyê hat:

—Mileet! Guhdarî bikin!.. Ku hun di hundirê panzdeh deqîqan de belav nebin emê emrê lêdanê bidin!..

Wî dengî sê-çar caran li ser hev welê got. Mirovên li wir hatibûn ser hev, bêçare man û hêdî hêdî belav bûn. Wan zanî bûn ku ew belav nebin dê polîs û leşker li wan bireşînin.

Gurî di nava qelebalixê de çavên xwe li bavê xwe digerandin. Wî her çiqas çavên xwe li bavê xwe gerand jî, dîsan bavê xwe nedidît. Ji çend hebên nas jî pirsî, lê wan jî bavê wî nedîti bûn. Weke tiştekî mirovi yê biçûk wenda bibe û mirov lê bigere, Gurî jî wilo li bavê xwe digeriya û çavên xwe her di nava qelebalixê de li wî digerandin. Gava ku ew vegeriya mal û gihîşt ber deriyê hewşê, kirî dîsan bi paş de

vegeriya û li bavê xwe bigeriya; Lê venegeriya, deriyê hewşê vekir û kete hundir.

Diya wî li hewşê qutikê wî radixist.

—Tu hatî lawê min? got bi hêvî.

—Lê min bavê xwe nedît, ma ez dîsan vegerim û lê bigerim?

Bavê wî ji hundir bang kir:

—Gurî were lawê min, va ez li mal im!

Gurî wa bi şaşmayî ji diya xwe pirsî:

—Ma bavê min hatiye malê?

—Erê lawê min, ew berî niha bi nîvsaeteke hat. Hema çer tu ji mal derketî ew jî hat.

Gurı reviya hundir û ji bavê xwe pirsı:

—Ma tu kengı hat, bavo?

—Ez berı niha bi nıvsaetê hatim lawê min!

—Ma te jı dev ji kar berda bû?

—Ezê çawan dev ji kar bernedim lawê min? Ev devjkarberdan ji bo me hemiyan e. Ev ji bo me palan e, lawê min!

Rûyê Gurî hebekî tirş bû. sê-çar caran birûyên xwe hejand û got:

—Ku we dê dev ji kar berdaya çima te ji min re negot? Ma ji bo çi te haya min jî negîhandê? Ji te weye ez hîn zarok im?

Bavê wî hebekî fikirî û li bersivekê geriya. Dû re got:

—Na layê min, bi serê te min bi xwe jî nizani bû wan dê îro dev ji kar berdana. Erê min bihîsti bû, lê min nizanî bû îro ye.

Gurî hebekî hêrs bû:

—Na weleh te zanî bû, lê te ji min re negot.

—Weleh bi serê te min nizanı bû.

Diya Gurî destê xwe bi dawa xwe paqij kir û kete hundir. Li mêrê xwe û li lawê xwe nihêrî û ji wan pirsî:

—Çi ye, hun li ser çi dipeyivin?

Bavê Gurî destê xwe ber bi Gurî ve dirêj kir û got:

—Gurî dibêje; "ku we dê îro dev ji kar berdaya, çima te ji min re jî negot".

Diya Gurı keniya û bi henek got:

—Eh, ma ji te re bigota tê dê çi bikira? Ji te tirê ev karê zarokan e?

Herdem wisa bû. Ku tiştek bibûya û Gurî lê bipirsiya hem diya wî û hem jî bavê wî digotin: "Ev ne karê zarokan e lawêmin". Gava ku wan holê digotin, Gurî pir hêrs dibû. Ew wisan hêrs dibû, ku carinan ji hêrsan digiriya. Gurî dîsa weke hercar hêrs bû û bi wê hêrsbûnê ji diya xwe re got:

—Çi ye, hema çi dibe tu dibêjî "Ev ne karê zarokan e". Ma ji te weye ez qet tiştekî fêhm nakim?

Bavê Gurî peyv guhert û ji diya wî pirsî:

—Tişt tune ye ez bixwim lê? Weleh ez ji birçîna mirim.

Diya Gurî rabû ser xwe, ew tirşika ji duhî êvarê de mabû, li hewşê, li ser kuçik germ kir û anî li ber Gurî û bavê wî danî.

Bavê Gurî bêyî ku destên xwe bişo kişiya ser xwarinê û xwar. Lê Gurî wisan hîn bûbû, ku wî destên xwe neşuşta, tucaran xwarin nedixwar. Piştî ku Gurî destên xwe şuşt, hat li ba bavê xwe rûnişt û bi

wî re xwar.

Diya wî di ser xwarinê de ji bavê wî pirsî:

—Erê we dev ji kar berda, ma ka we çi safî kir?

Mêrik pariyê di devê xwe de cût û got:

—Me hertişt safî kir. Me roja xwe ji sîh lîrayî kire çil û me hêza xwe nîşanî hukûmetê û xwedîerdan da û me bi xwe jî hêza xwe nas kir. Bi rastî min nizanîbû em evqasî bi hêz in.

—Pepûko, ma ew çi dengên tifingan bûn li bajêr, ma tu kes hatin kuştin?

—Na na, tu kes nehatin kuştin; tenê yek birîndar bû. Şansê wî hebû, gule ji navê û berjêr ketibû; an na tu xelasiya wî tune bû.

Gurî peyv ji diya xwe girtin û ji bavê xwe pirsî:

—Dibêjin Kerîz Humal pir mêrxasî kiriye, rast e?

—Erê Weleh, rast e. Pêşî namûs ji wî çêbû û wî li ber leşker û polîsan dest hilanî. Lê hinek jî dibêjin, wî nebaş kir.

Diya Gurî:

—Ev Kerîz Humal çi teba ye? Çima navê wî wa bi ecêb e?

Gurî keniya, bavê wî dom kir:

—Kerîz Humal, lê, yekî dînik e; li sûkê herkes qeşmeriyên xwe pê dikin.

—Ku dêhnik be çima ji we re seroketiyê dike?

Gurî keniya. Wî zanî bû ku diya wî çirok fêhm nekiriye. Piştî ku xwarina di devê xwe de daqurtand got:

—Na yadê, ew ne tu serok merok e. Lê dîsa ew ji pir serokan mêrxastir derketiye.

Bavê wî:

—Weleh camêr mêrxas derket. Dînik dibe, çi di-

be bila bibe. Ji xwe mirov hebekî ne dînik be tu tişt ji mirov çênabe.

Jinikê dev ji biaqilbûn û dînbûna Keriz Humal berda û jê pirsî:

—Êê, ma ka hunê kengê dest bi kar bikin dîsan?

—Van du-sê rojan emê betal bin û li benda bersiva xwedîerdan rabiwestin. Kengê wan pêşniyara me qebûl kir, emê dest bi kar bikin.

—Ma hîn tiştên we ji wan xwestiye qebûl nekirine? Ne te got, roja me ji sîh lîran bû çil.

—Erê erê, lê hîn hemî xwedîerdan ev qebûl nekirine. Piraniya wan qebûl kirine û ez wa zanim emê di vê heftêya pêşiya me de dest bi kar bikin.

Gurî ji sifrê vekişiya, çû li ser mînderê rûnişt û ew rojnemaya ku lawê cîranê wan berî niha bi sêçar rojan dabûyê, xwend. Bavê wî jî piştî têr xwar, xwe li ser kulêv dirêj kir û pir tê neçû bi xew ve çû. Lê, diya wî weke hercar bi karê malê ve mijûl bû.

## VIII

Havîn çû, payiz çû, bihar çû; salek derbas bû hîn jî dibistana Gurî venebû bû. Gurî her sibeh radihişt çentê xwe û diçû dibistanê. Lê, her carê midûr ew bi paş de dişind û digot:

—Îro jî mamosta tuneye.

Rojekê, Gurî di gel Beko û Nûjîn ji midûr pirsîn:

—Ka çi bi mamosta me hat, ewê kengî were?

Pêşî midûr nexwest bersiva wan bide, dû re hebekî bi hêrs got:

—Mamosta we û çend mamostayên din hatine girtin.

Gurî ji midûr pirsî:

—Ji bo çi ew hatine girtin? Ew dê kengî bêne berdan?

Midûr li dora xwe nihêrî û wa hêdî, di ber xwe de bersiva Gurî da:

—Ji bo greva karkerên pembû ew hatiye girtin.

—Ji bo greva karkerên pembû?

—Erê, ji bo greva karkerên pembû.

Midûr hew peyivî, cigara xwe vêxist û derkete der

ve.

Gurî, Nûjîn û Beko jî derketin û berên xwe dane malê.

Di rê de Beko di ber xwe de got:

—Weleh mamosta me zahf baş bû. Ma tu dibê dê çi bikine jê, Gurî?

Gurî milê xwe hejand:

—Nizanim.

—Ma ew pîrakan jî diavêjine hebsê?

Beko bersiva Nûjın da:

—Erê, ew pîrekan jî diavêjin girtîgehan. Ji bo pirtûkeke kurdî ev saleke keçika cîrana me ye, di girtîgehê de ye. Carekê polîsan kirî lawikê cîranê me jî bigirin, Bavê min nehîşt.

Nûjîn:

—Ma ew pîrek û peyan dixin ba hev?

—Ew wan carinan dixine ba hev, carinan jî cihê wan cihê ye.

Beko baş bi vê yeka han nizanî bû, lê, weke bi her tiştî zanibe bersiv dida. Ev toreyek wî ya kevn bû. Berê hinekan tiştek jê bipirsiyana hema raste rast, zani biwa nizani biwa bersiv dida. Wî pirê caran bersivên şaş û ne rast dida. Ku hin zarok li hember bersivên wî derketina, zora wî di zarokan de biçiya li wan dixist, ku zora wî di wan de neçiya, digiriya û digot:

—Weleh ezê ji bavê xwe re bibêjim, bila bavê we bide girtin.

Piştî hevdunasîna wî û Gurî, Beko bû Bekoyekî din. Ku ji bin nehatibiwa guhertin jî, pir guhertinên

mezin tê de çêbû bûn. Berê hema hema peyva rastw ji dev dernediket û her derew dikir. Lê niha pir kêm derew dikir. Wî berê bi tu zarokan re nikari bû hevaltî bikira; niha ji bilî Gurî zêdeyî deh hevalên wî hebûn... Di gel van guhertinên di wî de çêbûbûn jî, dîsan Gurî jê nexweş bû. Ji ber ku hindik biwa jî, dîsan derew dikir.

Di rê de Gurî ji Beko pirsî:
—Beko, ma tu cara hatiyî girtin lo?
—Ez? Ee... No, ez nehatime girtin.
—Ma tu hatiyî girtin?
—No.
Nûjîn ji Gurî pirsî:
—Ma ne bavê te hati bû girtin carekê?
—No, ew cîranê me bû.

Piştî wê bi heftakê dîsa Gurî, Beko û Nûjîn ji dibistanê vegeriyan û bi hev re çûne mala Gurî, lê kes li mal tunebûn; ne diya Gurî, ne jî bavê Gurî li mal bûn. Gurî û Beko pêlavên xwe ji pê kirin û derbasî ser mînderan bûn. Lê, Nûjîn derbasî hundir nebû; ew li ber derî, li ser lingan rawesta.
Gurî jê pirsî:
—Çima tu derbas nabî Nûjîn?
Nûjîn hebekî şermokî bû; gava dipeyivî serê xwe dixist ber xwe, wê qet li çavên mirovan nedinihêrî.
—Na, ezê herim malê, got bi şermokî.
—Çima? Tu dê li mal çi bikî?
Nûjîn milê xwe hejand û tu bersiv neda.
Beko henek pê kir:
—qey naxwaze tevlî lawikan bileyize.

Nûjîn keniya, Gurî got:

—Bi rastî tu naxwazî tevlî lawikan bileyizî?

—Belê, ma kê gotiye, ez naxwazim ? Lê ez ne weke we bêkêr im; hun lawik tu karî nakin, hun tenê dixwin û radizên...

Beko peyva wê birî:

—Em dirîn jî.

Hersê jî keniyan.

Nûjın:

—Divê ez herime malê û alîkariya diya xwe bikim. Diya min dê niha hevîr bike û dê birakê min ê biçûk bigirî.

Hîn wilo, diya Gurî kete hundir. Gava ku ew wilo çav li Nûjîn ket, bi devkenî jê pirsî:

—Çima tu li wir rawestiyayî keça min, qey tu derbasî hundir nabî?

—Na amojnê, ezê hereme malê.

—De de, tu jî rûnê û tevlî Gurî û Beko pariyek nan bixwe. Tu dê niha herî malê çi bikî?

Nûjîn solên xwe ji pê kir û derbasî ser mînderan bû.

Diya Gurî bi qasî ji Gurî hez dikir, ji hevalên wî jî hez dikir. Ew, zimanê ku bi Gurî re dipeyivî, bi hevalên wî re jî dipeyivî. Ji ber vê yekê hevalên Gurî jî ji wê hez dikirin. Gava ku ew dihatin mala wan, wan xwe li malê didîtin. Nemaze Beko... Tew mirov digot qey Beko bûye lawê malê. Roja ew nehata mala Gurî tunebû. Tew carinan, gava şev dereng dibû, ew nediçû malê û li mala Gurî radiza.

Diya Gurî ji wan re çend bacan û çend îsot di nav hev de qijiland û anî danî ber wan.

Pêşî Nûjîn şerm kir û nexwest bixwe, lê diya Gurî jê re got:

—Çima tu naxwî, keça min?

Hingî wê jî pariyê xwe tê dakir û hêdî hêdî bi wan re xwar.

Diya Gurî ji wan pirsî:

—Ma dê heya kengî dibistana we girtî be, ma qey hew vedibe?

Gurî:

—Mamosta me jî bi mamostayên din re hatiye girtin. Heye ew neyê berdan, dê dibistana me jî wenî girtî be.

—Çima, ji bo çi feqîrka mamosta we hatiye girtin, ma wê çi kiriye? Ji bo çi wê bernadin?

Beko xwe avêt ortê :

—Dibêjin, wê jî alîkariya karkerên pembû kiriye.

Diya Gurî wa bi ecêbmayî:

—Lê lê, ma ew jî bi karên holê re dilebike? Ma qey ew jî telebe ye?

Gurî:

—Ji te tirê tenê telebe bi karên wisan re mijûl dibin?

Beko keniya.

Beko bi du-sê mehan ji Gurî biçûktir bû. Ew jî ketibû sala xwe ya donzdehan. Lê ew ji Gurî dirêjtir û bi navmiltir bû. Çavên wî mezin û hêşin bûn. Porê

wî zer bû. Carinan rabûn û rûniştina wî weke ya mezinan bû, carinan jî dibû weke zarokên sêçar salî. Gava ku wî henek bikira, dikire fişefîş û piştа tiliya xwe ya girdikê li serê pozê xwe dixist. Ku ew û Gurî bi hev re dimeşiyan, mirov digot, bi kêmanî ew bi du salan ji Gurî mestir e. Bejna Gurî ji ya wî kurttir bû, lê navmilê Gurî ji yê wî firehtir bû. Gurî bi her awayî ji wî girantir bû. Wan bi hev re tiştin bikirana, an bi derekê de biçûwana, ew herdem bi Gurî dişêwirî. Bi rastî jî kêm caran poşman dibû. Lê hin hevalên wan yên din, dev tavêtin Beko. Rojekê yekî ji Beko re gotibû: "Ma qey tu jina Gurî yî, tu herdem li dû wî digerî û ji ya wî dernakevî". Beko jî bi wî lawikî re pevçû bû, başbûn û jêhatibûna Gurî jê re gotibû. Piştî demeke kurt ew lawik jî bûbû hevalê wan û ew herdem bi wan re digeriya.

Hema ku Gurî ew ji xwarinê vekişiyan, ew lawik kete hundir. Ji xwe Gurî, Nûjîn û Beko jî behsa wî lawikî dikirin. Ku lawik kete hundir, Gurî got:

—Binihêr, mêrê çê wilo bi ser navê xwe de tê.

Beko du-sê caran kire fişefîş û bi henek got:

—Ne ku mêrên çê bi ser navên xwe de tên. Rastiya gotinê li ba me wa dibêjin: "Gava ku mirov behsa kûtiyan bike, divê ku ço di destên mirovan de be".

Lawikê ku kete hundir:

—Yanî ez kûçik im?

Beko keniya:

—Na, lo, heşayî kuçikan...

Lêwik hebekî dilê xwe girt. Beko destê xwe li

milê wî yê rastê xist û xwest ku wî aş bike:

—Ez henekan dikim loo... Hema bila ez kûçik bim, ma çi dibe?

Lêwik jî henek kir:

—Ji xwe şika min ji wê tuneye, ez zanim tu kûçik î.

Gurî ji lêwik pirsî:

—tu ne birçî yî?

—No, spas.

—Kuro ku tu birçî bî were bixwe!

Lêwik du-sê parî ji xwarinê xwar û vekişiya. Piştî ku ji xwarinê vekişiya û destên xwe paqij kir, ji Gurî pirsî:

—Min bihîst, dê waliyê Mêrdînê were vira û we gotiye hun dê li hember wî bimeşin. ma rast e?

Beko li çavên Gurî mêze kir.

Gurî:

—Kê got?

—Weleh ev du roj in, li dibistanê her qal e. Hema hema herkes pê hesiyan e. Ji midûr bigire heya bi sinifa yekan.

—Mamosta jî pê hesiyane?

—Erê, erê, ew jî pê hesiyan e.

—Midûr jî?

—Erê camêr, giş, giş... Lê midûr pir hêrs bû ye. Ew dibêje, zarokên ku vê yeka han bikin, ezê wan ji dibistanê biavêjim.

Gurî serê xwe kil kir, Nûjîn hebekî tirsiya; lêwik

domand:

—Midûr li hemî sinifan geriya û ji hamû zarokan re got, ku ew tiştekî weha bikin, ewê ji dibistanê bêne avêtin. Lê, gava ku midûr pişta xwe dida zarokan, zarokan gişan bi ya xwe dikirin û digotin ku ewê li hember walî bimeşin.

Beko ji lêwik pirsî:

—Ê baş e, ma ew nabêje, kê li zarokan wisan kiriye û dê wan li hember walî bimeşînin?

—Çawan nabêje?

Li çavên Gurî nihêrî:

—Dibêje, çi kir wî pîncê Gurî kir. Midûr digot, ku ew bi dest min bikeve, ezê serê wî ji nav milên wî hilqitınim; ez nahêlim êdî lingên wî bi hewşa vê dibistanê bibe.

Gurî:

—Ew çi dike, bila bike. Ji xwe ev nêzîkî salekê ye dibistana me girtî ye û mamosta tune ne. Lê, rast e, em dê bimeşin. Ger ew wilo dibêje, çima ew ji me re mamostan peyda nake. Ew qebûl nake, bila here serê xwe li dîwaran bixe. Lê emê bimeşin.

Lawik:

—Weleh dibistana me jî rojekê heye deh rojan tuneye. A îro dîsan tune bû. Mamosta tune ne, ku dibistan hebe.

Di wê nǎberê diya Gurî di gel hin kincên şuştî kete hundir; ku bihîst ew behsa dibistanê û mamostan dikin, ji lawik pirsî:

—Ma dersdarê we jî hatiye girtin, bavo?

—Na, jinapê, ew nehatiye girtin, lê weke ew jî girtî be. Di hemî dibistanê de bi tenê çar mamosta

hene.

—Ma çar mamosta têra we nakin?

Gurî xwe avêt ortê:

—Ma ji ku têra me dikin? Çar mamosta ne, lê em zêdeyî çarsed zarokan in.

Nûjîn:

—Jinamê, Weleh mamosta me pir baş bû. Wê pir ji me hez dikir.

Beko xwe avêt ortê:

—Ji ber ku jin bû ji te hez dikir. Çima wê ji min hez nedikir?

—Tu baş biwa, dê ji te jî hez bikira. Piştî hatina Gurî wê ji te jî hez kir. Tu berê qet nebaş bû. Min jî ji te hez nedikir. Min ji te xu dikir.

Ew heya saet sisiyê piştî nîvro li mala Gurî man. Dû re rabûn û çûne mala hin hevalên xwe, yên din. Lê, Nûjîn bi wan re neçû, wê xatir ji wan xwest û çû malê.

Gurî di gel neh-deh hevalên xwe heya bi derengê şevê li ser meşa li dijî walî peyivîn û raberizîn kirin. Wan bi boyaxa sor li ser paçikên spî hin nivîs nivîsandin. Wan bêtir sloganên welê nivîsandin: "Mamostên me berdin". "Em mamostan dixwazin" û bi tıpên hûr jî di bin wan nivîsan de "Serîhildana zarokan" nivîsandin.

Ew sibehê zû, bi rohilat re, di gel wan paçikê xwe çûne hewşa dibistanê. Hîn tu kes nehati bûn; ne şagirt, ne jî mamosta... Lê bi tenê paqijkerên dibistanê hati bûn. Yek ji paqijkerên dibistanê pîrejineke qelew bû. Gava ku ew pîrejin dimeşiya, wer ku qelew bû, mirov digot qey ew dikule. Ku ew çav

li zarokan ket, melkes û paçikê di destên xwe de danî, hate ba wan û ji wan pirsî:

—Ma hun zanin dê îro waliyê Mêrdîn were û dibistan bi dibistan bigere?

Gurî:

—Erê, em zanin.

—Ku hun zanin, çima we kincên xwe yên dibistanê li xwe nekirine? Ma ku walî we di vê rewşê de bibîne, ewê nebêje çi?

Beko destên xwe xistin bêrıkên şapikê xwe û bi du gavan bi pêş de hat:

—Îro tu zarok nayên dibistanê, emê li hemberî walî bimeşin.

Jinika xizmetkar:

—Çii? .. Hun îro nayêne dibistanê?

—Îro tu zarok nayên dibistanê, got Gurî bi dengekî hebekî nizim.

Jinikê wa bi ecêbmayî jê pirsî:

—Hun çawa nayên dibistanê, kuro?

—Em nayên, got Beko. Heya ew ji me re mamostayan peyda nekin û mamostên me bernedin, tu zarok nayên.

Jinik her bi wan re peyivî, ber bi satila xwe ya avê çû û dest bi paqijkirina xwe kir.

Ew her pênc-şeş zarok heya bi vebûna dibistanê li hewşa dibistanê rawestan. Hêdî hêdî kîjan zarokên ku hatin jî xwe li wan girtin. Hin zarokên din jî weke wan li ser paçikan nivîsandi bûn. Wan hemî tiştên xwe yên ku nivîsandi bûn spartin hewşa dibista-

nê û xwe jê re kirin talde; da ku midûr û hin mamosta wan nebînin.

Gava ku li zengil ket û mamosta ketin hundirê sinifan, sinif hemî vikîvala bûn. Hingî hin mamosta ecêbmayî man û di dilê xwe de gotin:

—Îro ne Şemî be?

Lê tu zarok neketine dersan. Hemû li dora Gurî û hevalên wî kom bû bûn. Di wê navê de xortekî bejinkurt, ku ji simbêlê wî devê wî xuya nedikir di wir de derbas bû. Gava ku ew xort çav li wan paçikan û nivîsên ser wan ket, dageriya ba zarokan û ji yekî ji wan pirsî:

—Ma ev çiye kuro, çima hun nakevin dersên xwe?

Wî lawikî hêdî bi dizî, bi tiliya xwe Gurî nîşanî wî da û got:

—Hemî ew lawik wa dike, ew xwe peyakî mezin dihesibîne.

—Gurî ew e?

—Erê.

Ew xort ber bi Gurî çû, hêdî destê xwe li milê wî xist, ew kişande qorzîkekê; bi dizî tiştin jê re gotin, rojnameke dupelo dayê û bi riya xwe de çû.

Saet li dor yekê nîvro, di wê kelekela germê de tirimpêla walî di gel deh-panzdeh tirimpêlên din bi tîtetît di sûka Nisêbînê de derbas bûn û ber bi sarayê ve çûn. Lê, çer ku ew derbas bûn, zarok weke kuli-

yan li sûkê peyda bûn. Hema hema zarokên hemî dibistanên Nisêbînê li hev civiya bûn. Di wê deqîqê de te bi ku de gava xwe biavêta zarok bûn. Mirov tu caran bawer nedikir, dê evqas zarok li bajarê Nisêbînê hebin. Tu caran tiştên holê li bajarê Nisêbînê nebûbû. Mezinên ku çav li wan diketin, şikin dikirin, tiştin ji hev dipirsîn û bi riya xwe de diçûn. Serê zarokan li sûka qaçaxçiyan û dawiya wan jî li ba dibistana taxa qişlê bû. Carinan gişan bi dengekî û bi hev re bang dikirin:

"Me mamosta divên, mamostên me berdin"

Dengên wan, bajar dixiste bin saw û tirsê, pirça xortan li wan gij dikirin, leşker û polısên bajêr ditirsandin û cih li walî teng dikir. Zarok bi xwe jî bi dengê xwe hêrs dibûn, bi xurtî û bi êrişî ber bi sarayê ve dimeşiyan. Lê,berî ku bigihîjin ba sarayê bi panzdeh-bîst gavan, leşker û polîs di pêşiya wan de rabûn, bi dar û qamçiyan pirên wan ji hev belav kirin. Dû re leşkeran bi hewa de tifeng berdan. Hingê bajar li nav guhên hev ket. Nîvê pir yê zarokan her yekî bi cihekî de bazdan. Teqe req, qîj û wîj, hewar û gaziyê kelekela germê dida ji bîrkirin. Mezinên ku ji sibehan heya bi êvaran li çayxanan rûdiniştin, rabûn ser xwe, yên ku xwe bi dizî gihandine malên xwe û yên ku xwe di quncikên dikanan de veşartin. Lê Gurî, Beko û hevalên xwe nereviyan. Ew her ber sarayê ve dimeşiyan û bang dikirin. "Mamostên me berdin! me mamosta divên!" Hîn welê, darek li paş stûyê Gurî ket; yekî din û yekî din... Gurî şewişî û li erdê ket. Wilo, çend dar li Beko û zarokên din jî ketin. Bi wan daran hin ji wan jî ketin. Leşkeran Gurî,



BERDIN
S.Z.
Khaled
86

Beko û bîst-sî zarokên din jî girtin û ew avêtine tirimpêlên xwe.

Gurî di gel wan zarokan du heftan li girtîgeha Mêrdînê man. Hefta sisiyan ku hatin berdan, îcar bi alîkariya xwendevanên lîse meşeke din jî çêkirin. Piştî meşa dudan, mamostên wan hatin berdan û dibistanên wan vebûn. Gurî û hevalên xwe dîsan dest bi xwendina xwe kirin û xwendin.

Lê, Gurî di gel dersên xwe yên dibistanê, bi pir tiştên din ve jî mijûl bû. Pirtûkên li ser stêrkan, yên dînî, yên li ser evînê, yên li ser edebiyatê; hema çi têketa destên wî dixwend. Di hundirê demeke kurt, ji bilî tirkî û kurdî xwe hînî erebî kir. Piştî ku mewlûda kurdî ji ber kir, êdî dest bi nivîsandina helbestan kir. Pêşî bi tirkî, dû re jî bi kurdî nivîsand. Dawî dawî, bi hemû hêza xwe, xwe da siyasetê. Ji ber vê yekê nanê wî ji welêt hate birîn û derkete derveyî welêt. Pêşî li welatên ereban, dû re jî li Ewropayê bi cih û war bû.

A va ye; niha jî bi bîst saliya xwe, li serbajarê Swêdê, li Stockholmê, di xaniyê xwe yê xalî de rûniştiye û serpêhatiya xwe dinivîsîne.


Khaled 86

# Diya Miho

Du caran li derî xistin, cara sisiyan ku derî venebû, bi pehînan û qûnê tifingên xwe derî şikandin û ketin hundir.

Pîrê di quncika xênî de, di nav nivînê xwe ê gemarî û pînekirî de razayi bû. Herdu leşker çûn ser; yekî ji nav wan lingê xwe li lihêfa ser wê xist û bi qîrîn got:

—Haydê, zû!.. Ger tu lawê xwe tînî bîne, ger tu naynî emê te bibin ji berdêla wî.

Pîrê bi dengê xwe ê ku weke vizîna mêşekê bersiv da:

—Bavo, Welleh ez nizanim lawê min li ye! Ev serên du mehan in ku çavên min lê neketiye.

Leşker bi ser de qêriya:

—Hiş be, derewa meke... Ev çend car in, ku tu me bi van derewan dixapînî. Ger tu cihê wî dibêjî bibêje, ger tu nabêjî, rabe, bide pêşiya me!


Ev deh rojên pîrê bû, ku nexweş û di nav nivînan de bû. Qermîçokên rûyê wê hîn bêtir qemiçî bûn, çavên wê kort bûbûn û destên wê dilerizîn. Pîrê bersiv neda û bêdeng ma.

Leşker dîsan lingê xwe li nivînê wê xist û got:

—De, zûka cihê wî xayinî bêje!

Pîrê tu tişt negot, weke zarokan kire îskîn û hêsirên wê li ser hinarîkên wê ên qermiçokî hatin xwarê.

Îcar leşker pehînek li zikê wê xist û bi ser de qîriya. Leşkerê din li çavên wî nihêrî, hêrs bû û lerizî,



lê tu tişt negot.

Gava ku pîrê derxistin der, temama gundiyan li bênderê hati bûn civandin. Dehfek dane pîrê û ew ber bi koma gundiyan ve şandin. Pîrê herdu destên xwe dane ser hev û kete rêza gundiyan. Lê nikarî bû di cihê xwe de rawestiya. Dest û çokên wê wisa dihejiyan, ku mirov digot, "A wextî pîrê bê xwarê".

Serçawîş destên xwe dane paş qûna xwe û du-sê caran di ber rêza gundiyan re çû û hat. Dû re li gundiyan zîvirî û bi dengekî bilind û gur got:

—Dê û bavê Miho bila derkevin vir, û bi destê xwe qad nîşan da.

Pîrê weke ku bikule, xwe da ser darê xwe û ji nav rêza gundiyan derket.

Serçawîş ber bi wê çû û bi hêrs got:

—Kanî lawê te?

Pîrê baş deng neçûyê, ji wê webû ku serçawîş li mêrê wê dipirse.

—Bavo heyrano ev deh salên mêrê min e ku çûye rehmeta Xwedê. Serçawîş welê tê gihîşt, ku pîrê wî dixapînê, pehînek li darê wê xist û got:

—Ez ji te re dibêjim, kanî lawê te?

Gava ku serçawîş pehîn li gopalê wê xist, pîrê ket xwarê û li erdê berê xwe bi gundiyan vekir û got:

—Bavo, ma we kê Mihokê min dîtiye, kî ji we zane bê Miho li ku ye?

Îcar serçawîş darê pîrê ji dest girt, bi rêzê li gundiyan xist û got:

—Miho, Miho! Hun cihê wî dibêjin bibêjin, an na


Khaled 86

ezê we gişkan bişewitînim.

Hingî Mistiko ji nav rêza gundiyan derket. Navê wî ê rastî Misto bû. Lê ji ber ku feqîrê gund bû, temama gundiyan jê re digotin "Mistiko". Mistiko tiliya xwe kil kir û got:

—Tu me hemûwan dişewitînî bişewitîne, em cihê Miho nizanin.

Serçawîş emir da du leşkeran:

—Bi milên wî bigrin bavêjin makînê.

Leşkeran tifingên xwe ji milên rastê avêtin yên çepê û milê Mistiko girtin, birin avêtin tirimpêlê.

Serçawîş çend xort ji nav rêza gundiyan veqetandin, bi qundaxa tifinga xwe li zikê wan xist û got:

—Cihê Miho ji me re bibêjin! Ger ku hun naxwazin bên kuştin û bên girtin zû cihê wî bibêjin.

Xortan xwe li nezaniyê danîn:

—Em cihê wî nizanin.

Pênc-şeş leşker li wan civiyan, ew dane ber kulm û daran, avêtin erdê û bi pehînan kişiyan ser zikê wan.

Pîrê xwe avêt ber lingên wan û li ber wan geriya. Serçawîş pehînek lêxist û got:

—Bimire pîra heram! Miho, Miho... Gerek hun cihê wî bibêjin, hun cihê wî xayinê welêt bibêjin.

Pîrê îcar xwe avêt lingên wî û got:

—Bes e, qe bila ûcdan bi te re hebe!

Serçawîş du pehînên din jî lêxistin û got:

—Ûcdan!.. Min ji we re got, ku ezê we gişan bişewitînim, ku hun cihê Miho nebêjin. Ezê mala we wêran bikim...

Dû re serçawîş emîr da leşkeran ku li gundiyan xin. Piştî ku bi dar û qamçiyan gundî ji hal de xistin, xwestin ku wan gişan bavêjin makînê û bibin.

Pîrê nihêrî ku rewş xerab e, ji bo ku gundiyên xwe xelas bike, tiştên ku li ber guhên wê ketibûn, got:

—Bisekinin, bisekinin! Dev ji gundiyan berdin, ezê cihê Miho bibêjim.

Hîngî serçawîş û hemû leşker sekinîn û berê xwe bi wê vekirin.

—Lawê min çû ye Bêrûdê. Berî niha bi mehekê min xeber girt, ku ew li Bêrûdê ye.

Serçawîş wa bi şaşmayî:

—Li Bêrûdê? .. Çû ye nav Filîstîniyan ha!..

Du leşkeran bi milên wê girtin û ew avêtin dawiya tirimpêlê. Dû re hemî leşkeran xwe avêtin makînên xwe û ji gund derketin.